K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

# BINGEHA WÊNEYÊN HUNERÎ DI HELBESTÊN HÊMIN DE

TEZEA LÎSANSA BILIND

AMADEKAR: Mangoor Rasool Aba Baker MANGURÎ

ŞÊWIRMEND: Doç.Dr. Vechi SÖNMEZ

VAN-2016

T.C
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
SANTA TARİHİ ABD
KÜRT DILI VE KÜLTÜRÜ BİLİM DALİ

**HÊMİN'İN ŞİİRLERİNDE SANATSAL GÖRÜNGÜLERİN**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN: Mangoor Rasool Aba Baker MANGURI

DANIŞMAN: Doç.Dr. Vechi SÖNMEZ

VAN-2016

K.T.
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

# BINGEHA WÊNEYÊN HUNERÎ DI HELBESTÊN HÊMIN DE

TEZEA LÎSANSA BILIND

AMADEKAR: Mangoor Rasool Aba Baker MANGURÎ

VAN-2016

Ev xebat ji aliye jûriya me ve, di Şaxa Makezanista**..................................**

**.............................** wekî **LÎSANSA BILIND** hatiye qebûlkirin.

Îmza

Serok : ..........................................................................................................

Endam (Şêwirmend) : ..............................................................................

Endam : .......................................................................................................

Endam : .......................................................................................................

Endam : .......................................................................................................

PESENDKIRIN: Ez pesend dikim ku Şanavên li jor yên endamên perwerdekarên navborî ne.

.... / .... / 2016 ..................................................

Mudîrê Enstîtûyê

Tezea Lîsansa Bilind

Mangoor MANGURI

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
Haziran, 2016

## BINGEHA WÊNEYÊN HUNERÎ DI HELBESTÊN HÊMIN DE

### KURTE

Ev lêkolîn bi navnîşana (Bingeha wêneya hunerî di helbestên Hêmin de) ye. Lêkolîn bi giştî behsa girîngî û bihayê wêneya hunerî wek beşekî sereke di helbestê de dike. Di vê lêkolînê de hatiye zelalkirin ku helbest bêyî wêne gewdeyekî bêgiyan e, çimkî wêne û helbest du rûyên diravekî ne. Ev lêkolîn bi giştî ji sê beşên sereke pêk tê ku her beşek ji van beşan behsa girîngî û taybetmendiyên wêne di helbestê de dike.

**Di beşê yekem de:** Bi giştî me behsa têgeh û konsepta wêneya hunerî kiriye, piştre me behsa girîngiya rêgezên wêneya hunerî kiriye, me girîngiya wan rêgezan nîşan daye ka gelo heta çiqasî di binyata wêneyê de girîng û pêwist in. Piştre me behsa wêneya hunerî di du qonaxên helbestê yên cuda de kiriye ku wek wêne di helbesta kevin û wêne di helbesta nû de tên naskirin, dûre me behsa çawaniya wêneya hunerî kiriye.

**Di beşê duyem de:** Bi navnîşana (Çavkaniya wêneya hunerî di helbestên Hêmin) de, ku di vî beşî de me ronahî xistiye ser wan çavkaniyên ku dibin hîmê peydabûna wêne li ba Hêmin. Ev çavkanî jî, çavkaniyên xweyî û çavkaniyên babetî ne. Çavkaniyên babetî jî ji (çavkaniyên xwecihî û çavkaniyên mirovî) pêk tên û her yek ji van çavkaniyan jî çend liq û şaxek jê vedibe ku her yek ji van liq û şaxan jî girîngiya wan di binyata wêne de li ba helbestvan heye. Herwiha siruşt, jin û realîte çavkaniyên sereke yên peydabûna wêne ne ku me behsa wan kir. Piştre me behsa çavkanî û jêderên olî kir ku me ola (Îslam û Mesîhî) wek mînak wergirt, piştre jî me behsa girîngiya edebiyata derdorê kir, wek mînak edebiyata farsî.

**Di beşê sêyem de:** Bi navnîşana (cure û şêwaz û wêneyên hunerî yên Hêmin) e. Di vî beşî de, me ronahî xist ser cure û şêwaz û wêneyên hunerî li ba Hêmin. Di destpêkê de me behsa wêneyê di warê binyatê de kir ku wêneyê tek dirust kiriye bi her yek ji şêwaza hestguherîn û kifşkirinê, dûre me behsa wêne kiriye di warê hestên zihnî de. Piştre wêne di warê rawestan û tevgerê de. Piştre me ronahî xistiye ser wêne di warê şêwazê ku wêneyên (efsaneyî, derûnî, remzî –sembolîk- û ronbêjî) vedihewîne.

Kilîlê Peyvan : Hêmin

Jimareyên Rûpel : 164

Şêwirmend: Doç. Dr. Vechi SÖNMEZ

Yüksek Lisans

Mangoor MANGURİ

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
Haziran, 2016

**HÊMİN'IN ŞİIRLERİNDE SANATSAL GÖRÜNGÜLERİN**

## ÖZET

Bu araştırma Hêmin'in Şiirlerinde Sanatsal Görüngülerin Kaynağı adlı bir çalışmaya dair olup şiirde sanatsal görüngünün önemi ve değeri konusunde genel bir çerçeve çizer. Resim ve şiir birbirine koşut iki sima olduğu için resimsiz ve görüntüsüz bir şiirin ruhsuz bir gövdeye benzediğinin altı çizilir. Bu çalışma üç bölümden oluşmaktadır, ki her bölüm şiirde hasıl olan sanatsal görüngünün özelliklerini vurgular. **Birinci bölümde:** sanatsal görüngünün kavramsal açıklamasını yaptık, ardı sıra sanatsal görüngünün nasıl oluştuğu konusunda bilgi verdik. Sonra şiirdeki iki sanatsal görüngünün iki evresini ele aldık, ki bu iki konak eski şiirde görüngü ve yeni şiirde görüngüdür. **İkinci bölümde:** Hêmin'in beslendiği nesnel ve öznel kaynakları aydınlığa çıkarttık, ki bunlar içsel ve dışsal insani arka plana sahiptir. Bu kaynaklardan farklı dalların ve yolların oluştuğu gözlemini ve tespitini yaptık ve bunun şairin sanatsal imgelemine nasıl yansıdığını araştırdık. Bundan da kadın ve realitenin temel esin kaynakları olduğu sonucuna vardık. Sonrasında İslam ve Hırıstiyanlığı minval kabul ederek dini referanslardan bahsettik. Çevre edebiyatlardan da söz ettik, fars edebiyatı gibi. **Üçüncü bölümde:** Hêmin'in şiir türü, üslubu ve sanatsal imgesi üzerine tartıştık. Hêmin'de bu konular nasıl dile geliyor sorusunu aydınlığa kavuşturduk. Duygusal ve zihinsel dışavurumlarda sanatsal imge ve görüngünün aslının nereye dayandığını belirtmeye çalıştık. Durağanlıkta ve harekette neye tekabül ettiğini izah ettik. En sonunda ima, sembol ve yoğun anlatımı ihtiva eden içsel ve efsane içre üslup ve metodolojisine dair aydınlatmada bulunduk.

Anahtar Kelimeler : Hêmin

Sayfa Adedi : 164

Tez Danışmanı : Doç. Dr. Vechi SÖNMEZ

Master Thesis

Mangoor MANGURI

YUZUNCU YIL UNIVERSTY
SOCIAL SCIENCES INSTITUTE
June, 2016

**The Structure of Artistic Imagery in Hemn's Poems**

## ABSTRACT

This research paper entitled (The Structure of Artistic Imagery in Hemn's Poems). The research questions the importance and role of artistic imagery as the most essential part of poems and literary works. Since, art and image are like two sides of the same coin. Therefore, this study describes the poems without having a clear image as body without soul or dead body. The study divided into three main chapters illustrate the importance and characteristic of artistic imagery.

**Chapter One:** we have thoroughly explained the term and concept of artistic imagery. In addition, we have pointed out importance of the main elements of artistic imagery. We have elaborated to what extent the existence and presence of these elements in artistic imagery are required. Then, we have focused on artistic imagery in two different times known as artistic imagery in ancient times and contemporary artistic. Finally, we have done the qualitative analysis for artistic imagery.

**Chapter Two:** entitled (the source of artistic imagery in Hemn's Poems). In this section more clearly and precisely the main imagery inspiration sources covered which leads to inspire Hemn as a poet. While, these imagery inspirational sources are more objective and self-oriented sources including internal or external humanistic sources. Moreover, these sources are classified into various types and branches having their own specifications and characteristics in structuring imagery inspirational motives for composing poem. In the paper the astonishing nature, mountains, valleys, trees, reality, and women have been foremost imagery

inspirational sources for his art are clearly stated. Furthermore, the role of religion such as (Islam and Christian) as an example as well as the hegemony of the local and neighbourhood poets and literary works such as Persian poets have been taken into consideration so that we can have a better understanding about the imagery inspirational sources for Hemns' poems.

**Chapter Three:** entitled (types and forms of Hemns Artistic Imageries). In this section, more specifically deals with types and forms of artistic imageries in Hemn poetry work. At the beginning we have describe artistic imagery in terms of structural composition by a singular image whether formed in correspondence or reciprocate style. Then, we have illustrated the artistic imagery in terms of sense and intelligence; also, we have described the artistic imagery in terms of dynamism and staticness. Finally, we have figured out the artistic imagery forms in terms of (mythical, psychological, symbolic and eloquence)

Key Words : Hêmin

Quantity of Page : 164

Thesis Supervisor : Doç. Dr. Vechi SÖNMEZ

**SIPAS KIRIN**

Ez pir spasiya mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê kurdî li Zanîngeha Yüzüncü Yılê dikim ku bi ked û dilsoziyeke herî mezin bi me re westiyan. Herwiha ez pir spasiya (Dr. Vechi Sonmez) dikim ku erkê serpereştiya vê lêkolînê li stûyê xwe girt û spasiyeke min a bêhed ji birêz (Dr. Derya Cemal Hewêzî) re heye ku li beşê kurdî yê Zanîngeha Koye mamoste ye û pir alîkariya min kir. Ez spasiya birêz (M. Mistefa Seyd Mîne) jî dikim ku li beşê kurdî yê Zanîngeha Raperînê mamoste ye û di bersivdan û zelalkirina hinek pirsan de alîkariya min kir. Herwiha ez spasiya wan hemû kesên hêja û ezîz dikim ku alîkariya min di nivîsandina vê lêkolînê de kirin.

Pir spasiya malbata xweyê ezîz dike im û gelek sipasiya havjîna xweya qedir giran dike im ku hertim alîkarî ya min buye çavên her dû zarokê xwe ( MEND Û MEM) maç dike im.

**Mangoor Rasool Aba Baker**

# NAVEROK


**KURTE** ........ **I**

**ÖZET** ........ **III**

**ABSTRACT** ........ **IV**

**SIPAS KIRIN** ........ **VI**

**NAVEROK** ........ **VII**

**PÊŞGOTİN** ........ **X**

**DESTPÊK** ........ **1**

**JÎNENÎGARÎYA HÊMİN** ........ **4**

**1. TÊGEH Û KONSEPTA WÊNEYA HUNERÎ** ........ **6**

1.1. Konsepta Wêneya Hunerî ........ 7

1.2.Têgeha Wêneya Hunerî ........ 8

1.3.Rêgezên Wêneya Hunerî ........ 16

1.3.1. Ziman ........ 17

1.3.2. Soz (Hest-Hîs) ........ 21

1.3.3. Bîr (fikir-hizr) ........ 25

1.3.4. Endîşe (xeyal) ........ 27

1.3.5. Realîte ........ 31

1.3.6. Nest (jêrhiş- subconscious) ........ 33

1.4.Wêneya hunerî di helbesta kevin û nû de ........ 35

1.4.1. Wêne di helbesta kevin de ........ 36

1.4.2. Wêne di helbesta nû de ........ 39

1.5.Çawaniya dirustbûna wêneya hunerî ........ 41

1.6.Erkê wêneya hunerî ........ 44

**2. ÇAVKANİYÊN WÊNEYA HUNERÎ Dİ HELBESTÊN HÊMİN DE** ........ **50**

2.1. Çavkaniyên Xweyî (zatî-girêdayî helbestvan bixwe) ........ 51

2.2. Çavkaniyên Babetî (objektîf) ........ 55

2.2.1. Çavkaniyên Xwecihî/xwemalî ........ 56

2.2.1.1. Çavkaniyên edebiyata pêşiyan ........ 57

2.2.1.2. Çavkaniyên kelepûra gelêrî ........ 74

2.2.1.2.1. Helbesta folklorî ya kurdî......75
2.2.1.2.2. Beyt......77
2.2.1.2.3. Dastan......79
2.2.1.2.4. Pend û Gotinên Pêşiyan......84
2.2.2. Çavkaniyên Mirovayetî......89
2.2.2.1. Çavkaniyên Dîrokî......89
2.2.2.2. Çavkaniyên Olî......94
2.2.2.2.1. Ola Îslamê......95
2.2.2.2.2. Ola Mesîhî......96
2.3. Xweza/Siruşt......97
2.4. Jin......102
2.5. Realîte......106
2.6. Çavkaniya edebiyata derdorê......113
**3. CURE Û ŞÊWAZÊN WÊNEYA HUNERÎ Dİ HELBESTÊN HÊMİN DE......117**
3.1. Wêne Di Warê Bingehî De......117
3.1.1. Şêwaza Hestgorînê......117
3.1.2. Şêwaza pevguhertina hestpêkirî......119
3.1.2.1. Bercestekirin......119
3.1.2.2. Şêwaza bi ten kirin (bi laş an bi gewdekirin)......121
3.1.2.3. Şêwaza bi kes kirin......122
3.2. Wêne Di Warê Hestbarî Û Zihnî De......123
3.2.1. Wêneya Hestbarî......123
3.2.1.1. Hesta Dîtinê......124
3.2.1.2 Hesta Bihîstinê......126
3.2.1.3. Hesta Bêhnkirinê......127
3.2.1.4. Hesta Çêjtinê......129
3.2.1.5. Hesta Berketinê (Destlêdan - Pelandinê)......130
3.2.2. Wêneya Zihnî (Jîrî)......131
3.3. Wêne di aliyê rawestan û tevgerê de......132
3.3.1. Wêneya Rawestiyayî......132
3.3.2. Wêneya livbar/bi tevger......134
3.4. Wêne di aliyê şêwazê de......136
3.4.1. Wêneya Efsaneyî......136

3.4.2. Wêneya Derûnî (Psîkolojîk) ........................................................................ 139
3.4.3. Wêneya Sembolîk.............................................................................................. 141
3.4.4. Wêne di aliyê ronbêjiyê de (zelalbêjî-eşkerebêjî) ................................................ 143
3.4.4.1. Wêneya Lêkçûnê - Mînandinê ........................................................................ 145
3.4.4.2. Wêneya Mecazî ............................................................................................... 149
3.4.4.3 Wêneya Dirkeyî –metafor - ................................................................................ 152
**4.Encam............................................................................................................... 155**
**5. JÊDER............................................................................................................... 157**
**XWE JÎNENÎGARÎ ............................................................................................... 164**

## PÊŞGOTİN

Edebiyata kurdî mîna edebiyata hemû miletên din, xwedî pikhate û çend nirx û rêgezên taybet e. Lewma eger ji edebiyatên din ne zêdetir be, bêguman ji wan ne kêmtir e. Cîhana edebiyata kurdî gelek zanistan lixwe digre ku dîroka edebiyata kurdî xemilandine. Edebiyata kurdî (helbest, roman, pexşan, gotinên pêşiyan, hîkayet û çîrokan…hwd) lixwe digre. Yanî xwediya berhem, folklor û zargotineke kemilî ye. Folklor jî nasnameya her miletekî ye. Nabe miletek xwe wek milet bibîne eger folklora wî nebe. Folklor bi roleke sereke bo nasandina miletekî bi neteweyên din ên cîhanê radibe. Çimkî gelê Kurd xwediyê folkloreke taybet e, lewma pêwist e her takekesekî civaka kurdî rêza edebiyat û folklora miletê xwe bigre û di her qonaxekê de ji bo parastin û hîştina vê edebiyatê amade be. Herwiha pêwist e her takekesekî Kurd ji bo nasandina edebiyata xwe bi edebiyata gelên din ên cîhanê kar bike daku cureyek ji tevlîbûna edebî pêk were û ew edebiyat bandorê li ser hev bikin û nirx û girîngiya hev nas bikin.

Eşkere ye ku edebiyata kurdî yek ji wan edebiyatan e ku ji destpêkê de sûd ji xasiyetên edebiyatên din wergirtiye, nemaze di rêza yekê de edebiyata farsî û di rêza duyem de edebiyata erebî û di rêza sisêyan de jî edebiyata tirkî. Vê sûdwergirtinê hîşt ku edebiyata kurdî ji edebiyatên din cudatir be.

Yek ji pêkhateyên herî girîng ên edebiyata kurdî jî helbest e. Ji kevin de, helbestvan û nivîskaran karîbûn rol û girîngiya helbestê berçav bikin. Bikaranîna wê teknîka ku di encama tecrûbeya helbestvan û feraset û berfirehiya xeyala wî de pêk hatiye, helbestê bedewtir dike. Herwiha helbest bi wêneyan bedewtir dibe. Wêneyên helbestî herdem dibin alîkar bo zindî hîştina helbestê, çimkî eger çavkaniya wêneyan baş û sazkar be, wê çaxê helbest kemilî û geştir derdikeve. Helbestvanên Kurd jî girîngiyeke berçav dane wêneyên hunerî. Hêmin yek ji wan helbestvanan bû ku hostetiya xwe di vê hunerê de nîşan daye, lewra jî helbestên wî herdem xemilandî û bihêz dixuyên.

**DESTPÊK**

Wêneya hunerî ew rêgeza bingehîn e ku xwe şemitandiye nav hembêza her helbestekê û karîbû cureyek ji aramiyê diyarî wê hembêzê bike û cihê xwe di nav cîhana sihrbaz a helbestê de bigre. Çimkî her çiqasî helbest bihêz be jî, lê eger wêneyên helbestî nikaribin gelek raz û nihêniyan vehewînin, bêguman wê çaxê wêne nikarin xwe wek pêwist nîşan bidin. Ji ber ku wêne yan îmaj rêgeza herî çalak e di helbestê de û bi gelek erkên cuda cuda di binyata giştî ya helbestê de radibe. Çimkî derbirîn yan bikaranîna wêneyan gelek şêwe û taybetmendiyên xwe hene. Hemû şêwe, derbirîn û bikaranîna wêneyan di helbestê de girêdayî girîngiya wêneyan bi xwe ye. Eger ew hesta helbestvan nebûya, nikarîbû hestên di nava xwe de asêmayî bi çend îmajan nîşan bide. Lewma eger helbest rêyek be bo derbirîna raz û nihêniyên di nava helbestvan de, wê çaxê wêneyên di helbestê de jî amûrtin bo derbirîna wan raz û nihêniyan. Lewma gelek caran ew wêne wek birînpêçên nava helbestvan tên dîtin. Helbestvanekî wek (Hêmin) ku piraniya jiyana xwe di nexweşî û derd û bela û revê de derbas kir û dûrî welat, ax, av û hewa û merivên xwe bû, ev birînên xwe bi helbestê derman dikirin û gelek caran xwîner jî bi van helbestan aram û rehet dibûn.

**Sedemê hilbijartina vê mijarê:** Hilbijartina vê mijarê girêdayî girîngiya mijarê bi xwe ye. Heta niha gelek kesan karîbûn gotar û lêkolînên edebî li ser jiyan, berhem û helbestên Hêmin binivîsin, lê hîn negihîştine hemû ked û têkoşîn û xebata Hêmin. Kesayetî, welatperwerî û helbestên sihrbaz ên Hêmin herdem bandora wan li ser min hebû, lewma min ev derfet bikar anî ku ez lêkolînekê li ser helbestên wî bikim bi navê (Bingeha wêneyên hunerî di helbestên Hêmin de), çimkî Hêmin yek ji wan helbestvanan e ku hostatiya xwe di wêneyên hunerî de nîşan daye. Ev jî sedemekî sereke bû di danîna vê navnîşanê bo vê lêkolînê de.

**Armanca lêkolînê:** Armanca vê lêkolînê pêşî nasandin û nîşandana têgeha wêneya (îmaja) hunerî ye, piştre diyarkirina rêgezên (pêkhateyên) wêneya hunerî ye, ka gelo heta çiqasî rola van rêgezan di binyata wêneya hunerî de heye. Piştre hûrbûn e li ser wan çavkaniyên ku helbestvan ew kirine çavkaniyên wêneyan, dûre diyarkirina wan çavkaniyan e ku helbestvan di avakirina wêneyan de bikar anîne. Ev

hemû dibin armanca sereke ya lêkolînê û xwe di girtina derzekê ji derzên rexneya me ya edebî de dibîne.

**Kêşe û astengiyên lêkolînê:** Diyar e wek piraniya lêkolînan, kêşe û astengiyên vê lêkolînê jî hebûn. Bi taybetî kêmbûna jêderan li ser mijara îmaja hunerî, herwiha dûrbûna mamosteyê min ê serpereşt û pirbûna dîwanên çapkirî yên helbestvan.

**Metoda lêkolînê:** Me di lêkolîna xwe de metoda wesfî ya şîrovekar bikar anî. Pêşî me metoda wesfî bikar anî daku em aliyê teorî yê lêkolînê bi awayekî zanistî nîşan bidin. Piştre ji bo ravekirin û şîrovekirina şiîr û helbestên helbestvan, me metoda şîrovekar bikar anî.

**Struktûra lêkolînê:** Ev lêkolîna me ji kurtiya mijarê bi kurmancî û zimanê tirkî û ingilîzî û pêşgotin û destpêk û sê beşan û encam û lîsta çavkaniyan pêk tê. Di pêşgotinê de, behsa helbest, îmaja şiîrî û edebiyata kurdî bi giştî tê kirin. Di destpêkê de, kurtiyek li ser wêneya hunerî û sedemê hilbijartina mijara lêkolînê û armanca lêkolînê û kêşe û astengiyên ku ketin ser rêya lêkolînê tevî metodên ku me di lêkolîna xwe de bikar anîne, hatine behskirin.

**Beşê yekem:** Me behsa konsept û têgeha wêneya hunerî bi giştî kiriye. Piştre me behsa girîngiya rêgezên wêneya hunerî kiriye. Me girîngiya wan rêgezan pêkhateyan berçav kiriye ka gelo heta çiqasî di binyata (struktûra) wêne de girîng û pêwist in. Piştre me behsa wêneya hunerî di du qonaxên şiîrî yên cuda de kiriye ku wek wêne di helbesta kevin û wêne di helbesta nû de tên naskirin. Dûre jî me behsa awayê wêneya hunerî kiriye.

**Beşê duyem:** Bi navnîşana (Çavkaniya wêneya hunerî di helbestên Hêmin) de ye, ku di vî beşî de me ronahî daye ser wan çavkaniyên ku dibin sedemê derketina wêneyan li cem Hêmin. Ev çavkanî jî, çavkaniyên şexsî û çavkaniyên babetî (objektîf) in. Çavkaniyên objektîf jî ji (çavkaniyên xwecihî û çavkaniyên mirovatî) pêk tên. Her yek ji van çavkaniyan jî çend leq û şaxên wan hene ku xwedî girîngiyeke taybetin di binyata wêne de li cem helbestvan. Herwiha, xweza, jin û realîte çavkaniyên sereke yên dirustbûna wêne ne. Piştre me behsa çavkaniyên olî kiriye û me ola (Îslam û Xirîstiyanî) wek mînak girtiye. Piştre me behsa girîngiya edebiyata derdorê kiriye wek edebiyata farsî. Piştî danasîna teorî ya van çavkaniyan,

me hewl daye bi wêneyên şiîrî yên Hêmin mijarê dewlemendtir bikin û piştrast bikin ka gelo helbestvan heta çi astê û çawa sûd ji van çavkaniyan wergirtiye.

**Beşê sêyem:** Bi navnîşana (Cure û şêweya wêneyên hunerî yên Hêmin) e. Di vî beşî de me bal kişandiye ser cure, şêwe û wêneyên hunerî li cem Hêmin. Pêşî me behsa wêneyê di aliyê binyatê de kiriye bi herdu şêweyên hestgorîn û hestpêkirî (pêhesîn), paşê jî me behsa wêneyê di aliyê hesta zihnî de kiriye. Piştre wêne di aliyê rawestan û tevgerê de, dûre jî me bala xwe daye ser wêne ji aliyê şêwazê ku wêneyên (efsaneyî-psîkolojîk- sembolîk û rewanbêjî) lixwe digre.

## JÎNENÎGARÎYA HÊMİN

Nivîskar û helbestvanê Kurd ê mezin Hêmin, navê wî Seyd Mihemed Emîn kurê Seyd Hesenê Şêxulîslamê Mukrî ye û di şeva (4) li ser (5)ê meha 5an a sala 1921 (04-05.05.1921), li gundê (Laçînê) yê nêzîkî bajarê Mehabadê li Rojhilatê Kurdistanê ji dayik bû.[1] Li ba mamoste (Seîd Nakam) dest bi xwendina xwe ya seretayî kir. Piştre bavê wî ew şand bajarê Mehabadê û di dibistana (Seadet)ê de dest bi xwendina fermî kir û heta pola çaran wek şagirtekî jîr xwend. Piştre bavê wî ew ji wê dibistanê derxist û ew bir xaneqa Şêx Burhan daku li wir dest bi xwendina meletiyê bike û wî çar salan li wê xaneqayê xwend û di temenê 17 saliyê de dev ji xwendina meletiyê berda û bû ciwanekî xwendevan ê hişyar û şehrezabûneke baş di edebiyata kurdî û farsî de peyda kir û di sala 1941 de aliyê helbestvanî li ba wî bihêz bû û wî dest bi hûnandina helbestan kir. Di destpêkê de Hêmin çav li helbestvanên klasîk ên mezin ên Kurd û Fars ên berî xwe kir lê piştre bû xwediyê stîl û dengekî taybet.

Bi damezrandina Komeleya (Jiyanewey Kurdistan – Vejandina Kurdistanê) re ku wek (JK) hat naskirin, di 16.09.1942an de, Hêmin bû endamê wê rêxistina ramyarî ya kurdî. Dema ku di 16.08.1945an de navê wê komeleyê hat guhertin û bû Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê[2], Hêmin bû endamekî wê partiyê û helbestên neteweyî û gotarên binirx belav dikirin. Dema ku Komara Demokrat a Kurdistanê jî bi serokatiya Pêşewa Qazî Mihemed di 22.01.1946an de hat damezrandin, Hêmin helbestek di wê munasebeta pîroz de xwend û tevî helbestvan Hejar bû helbestvanekî hezkirî yê Qazî Mihemed û dema ku ev komara temenkurt di 17.12.1946an de hilweşiya jî, Hêmin xwe ji ber çavê dezgeha ewlekariyê ya şahînşah winda kir û dema nûçeya îdamkirina Qazî Mihemed û hevalên wî bihîst xwe gihand Başûrê Kurdistanê, heta rewşa Rojhilatê Kurdistanê aram bû vegeriya gundê xwe û demekê li Mehabadê jî jiya[3].

Piştî destpêkirina şoreşa Îlonê ya rizgarîxwaz li Başûrê Kurdistanê, Hêmin hate Başûrê Kurdistanê û li kêleka şoreşgeran sekinî û piştî peymana dîrokî ya 11ê Adara

---

[1]Dîwana Hêmin, Tarî û Rohn, ç 1, Çap û Belavkirina Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 325.

[2]Marif Xeznedar, Dîroka Edebiyata Kurdî, Cildê 7, Çapa 1, Çapxaneya Aras, Hewlêr, 2006, r. 423.

[3]Dr. Osman Deştî, Hêminname, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2009, r. 161.

1970, pêlekê li Bexdayê wek penaber jiya û bi destpêbûna şoreşa gelên Îranê di Sibata 1979an de vegeriya Rojhilatê Kurdistanê û Kovara (Sirwe) derxist, heta di roja 17.04.1986an de wefat kir. Hêmin çend berhemên balkêş û xweş ên helbestan belav kir ku niha wek gencîneyeke edebî tên dîtin. Berhemên Hêmin ev in:

1. Bargeha Yaran (Helbest)
2. Tarî û Rohn, Helbest û pexşan, 1974
3. Paşerok, Helbest û pexşan
4. Şahesera Muzeferye ku ya Oskarman e, Hêmin wergerand zimanê kurdî.
5. Şazade û Geda
6. Keleha Dimdimê
7. Wargeha Vala
8. Gurzek Gul, Gurzek Nêrgiz
9. Efsaneyên kurdî yên nivîskarê mezin Qenatê Kurdo ku Hêmin wergerandin zimanê farsî
10. Nalîna Cudahiyê, Helbest 1979
11. Paşeroka mamoste Hêmin, Gotar, Mehabad 1983[4]

[4] www.hemenmwkryani.net.

## 1. TÊGEH Û KONSEPTA WÊNEYA HUNERÎ

Wêneya hunerî mijareke herî sereke ya helbestê ye. Helbest bêyî wêne (îmaj) wek laşekî bêcan e. Wêneya hunerî di helbesta kurdî de cihê têbînî û lêfikirînê ye. Piraniya herî zêde ya helbestvanên Kurd di hemû qonaxên nivîsandina helbestê de girîngî dane vî aliyê hunerî yê helbestê. Cîhaneke berfireh û bêsînor a wêneya hunerî heye. Roj bi roj ew dîmen û wêneyên ku di dîtina mirov de li şûn dimînin û wêneyên nû lê zêde dibin û bi berdewamî di berfirehbûnê de ne. Herdem xwîner dibe hogirê wan metinên (tekstên) bedew û sosret ku dinyayek ji wêneyên bedew di sînga xwe de parastine ku bi sihrbaziya peyv û ramanên xwe dinyaya helbestê bi wêneyên bedew û sosret dixemilînin. 

Wêne di helbestê de hevawayê tîrêjên rojê ye ji ruhberan re. Bi derketina wan tîrêjên ku ji rojê derdikevin re, jiyan û ronahî û şewqê didin ruhberan. Bi heman awayî jî, zindîtî û bedewiya teksta helbestê di wêneyan de derdikeve. Lewma her ku wêne di tekstê de hebin, bêguman bedewî û xemla tekstê zêdetir dibe ku mîna bayekî hînik dilê xwîner hînik dike. Ev hemû jî girêdayî helbestvan bi xwe ne. Çiqasî helbestvan xwedî ferhengeke zimanî ya bihêz û teknîkekê hûrbîn be, di rêxistina peyv û hevokên tekstê de, ewqasî dikare hêzdariya xwe tekez bike. Piraniya lêkolînvan, rexnegir û helbestvanan girîngiyeke taybet dane wêneya hunerî, lewra jî lêkolînvan û rexnegiran di lêkolîn û gotarên xwe de cihekî berfireh jê re veqetandine. Li gor Coleridge ((*Helbest bê metafor pêkhateyeke mirî ye, çimkî wêneya metaforîk jiyanê diyarî helbestê dik.*))[5] (Robert Frost) di wê baweriyê de bû ku ((*Gelek tişt hene dikarin di danasîna helbestê de bên gotin, lê tiştê sereke xaze yanî metafor e*)) [6] (Ehmed Isfûr) dibêje: ((*Wêneya edebî bingeha herdemî ya helbestê ye*))[7] yanî tu helbestek di tu serdemekê de bêyî wêne pêk nayê û helbestvan jî heta bi rêya hestên xwe wêne neguhêze nikare helbestê binivîse. Her ji ber vê ye jî ((*wêneya hunerî ne tiştekî bo bedewiyê ye, lê çavkaniyeke girîng a ezmûna helbestê ye û diyardeyeke hunerî û zimanî ya helbestvan e û rastiya helbestê diyar dike, bîr û bawerî û fenomen û têkiliyên jiyanê hevgirtî dike bi rêya rasterastiya peyv û hevokan xwe bi me dide*

---

[5] Dr. Dilşad Elî Mihemed, *Dilan û ezmûnkirina şiîrî*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2007, r. 168.

[6] Jêderê berê, r. 168.

[7] Dr. Cabir Ehmed Isfûr, *Îmaja Hunerî di Kelepora Rexneya Rewanbêjî de*, Dar el Seqafe Welneşr, Qahîre, 1974.

*nasîn, lê di sedsalên 16-17-18an de, wek amûreke xemilîner hatiye behskirin, lê ne wek rêgezeke binyata metinê*)) [8] (Îbn Sîna) jî li ser têkiliya helbest û wêneyê dibêje: ((*Helbestvan wek wênegir e. Lê ne tenê wêneya tiştên şênber digre, lê wêneya tiştên wateyî jî digre wek tembelî û hêrsbûn*)) [9], çimkî nabe çavê helbestvan tenê wan wêneyan bigre ku şênber in û wênegirtina wan hêsan e, lê divê di xema girtina wan hemû wêneyan de be ku dibin alîkar bo bedewkirina hemû wêneyên hunerî ku ev jî girêdayî jîrî û hûrbîniya çavê helbestvan e.

### 1.1. Konsepta Wêneya Hunerî

Têgeha wêneya hunerî ku derbasî nav dinyaya edebiyata kurdî bûye, ne xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Edebiyata kurdî jî ne xwediyê vê hunerê ye. Lê piraniya miletên cîhanê xwediyên vê hunerê ne. Lê divê em bizanin ku wêneya hunerî bi peydabûn û derketina helbestê re derket holê. Lê pêşî ev huner nehatibû fêmkirin. Kok û rehên vê hunerê vedigere Rojavayiyan, nemaze edebiyata Yûnanî û edebiyata Romanî ku pêşeng bûn di vê hunerê de, piştre miletên din jî girîngiya vê hunerê nas kirin û edebiyata xwe pê dewlemend kirin. Bi awayekî ji awayan, ev huner girêdayî hest û hişê mirov e û em dikarin bêjin ev huner bandorê li ser dil û psîkolojiya xwîner dike, çimkî têkildarî nava mirov e. Lewra jî mirov biryarê li ser metinê dide ka gelo ev metin sihrbaziyeke balkêş e yan na, ((*wêne di rexneya ewropî de wek (îmaj) tê naskirin ku peyveke ingilîzî ye*))[10], ((*eşkere ye ku peyva ingilîzî (imagition) ji peyva (imaginato) ya Latînî hatiye wergirtin, miqabilî wê di Yûnanî de jî (phantasia) ye û rasterast peyva fancy û imagination û amajekirina wan bo wêne yan ew şiyana ku wan dirust dike ji bo demeke dirêj bi hevwateyî mane heta hatina Romaniyan*))[11], yanî ((*peyva (imagition) tê wateya xeyal, di Yûnanî de jî (phantasia) tê wateya xeyal, lewra ku xeyal rêgezeke mezin a helbestê ye û beşdariyeke berçav di çêkirina wêneya hunerî de dike, lewma em dibînin di farsî de têgeha (sûrey xeyal) yanî (îmaja xeyal) tê bikaranîn*))[12], ((*Vê rola girîng a hizr û xeyalê di pêkanîna*

---

[8] Ebdilqadir Mihemed Emîn, *Wêneya şiîrî di rêbaza romantîk ya kurdî de*,Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2002, r. 12.
[9] Jêderê Berê, r. 12.
[10] Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*,Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî 2004, r. 25.
[11] Jêderê Berê, r.26.
[12] Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 19.

*wêneya helbestê de bala helbestvanekî wek (Goran) kişand, lewma bi jîrî navê (nîgarxaneya xeyalê) lê dike*))[13], ((*di edebiyata erebî de jî konsepta (sûre şiîrî ye) (wêneya şiîrî) yan (sûre feniye) (wêneya hunerî) tê bikaranîn yan (el sûre el edebiye) ku wêneyên helbest û pexşanê vedihewîne. Di edebiyata kurdî de jî têgeha (wêneya edebî) û (wêneya şiîrî) û (wêneya hunerî) tên bikaranîn. Lê têgeha (wêneya edebî) wateyeke berfirehtir dide, çimkî bêhtir wan wêneyan vedihewîne ku di nav cureyên edebî de pêk tên*))[14]

Nerîna kesê xwîner li ser wê têgehê zelaltir û hêsantir e. Vê yekê jî kiriye ku têgeha wêneya edebî wateyeke zêdetir û kûrtir vehewîne li hember têgehên edebî yên din ên zimanê kurdî. Hebûna van hemû têgehan bi tena xwe dewlemendî û pirbûna konseptên wêjeyî nîşan dide.

### 1.2.Têgeha Wêneya Hunerî

((*Helbest wênegirtineke hunerî ya ezmûnên girêdayî hestan e û wêne jî rêgezeke zindî ji rêgezên pêkhateya psîkolojîk a ezmûna şiîrî ye ku di binyateke zimanî ya aloz de teşe digre û tiştekî wiha ye ku hizr di tevegra xwe bi cîhana şênber re qet dev jê bernade. Dema ezmûnên girêdayî hestan derbasî hişê mirov dibin, li wir destkariya binyatê tê kirin û dibe wêneyeke hunerî ya bihêz û çavkaniya bandora helbestê*))[15], wêneya hunerî wan rewşan bergewde dike ku nikarin bi zimanê normal bên nîşandan, çimkî bêhtirî ku zimanê derbirînê be, zimanê afirandinê ye. Eger wêneya hunerî ne xwedî taybetmendî bûya, wê çaxê dê her takekesekî axêver bibûya helbestvan û wê çaxê me kesê normal û kesê helbestvan ji hev cuda nedikir. Lê ya ku girîng e, ew hest û soza kûr û hestyar a helbestvan e ku wan ji kesên normal cuda dike nemaze ku helbestvan wateyeke din didin peyvan. Her vê yekê jî wiha kiriye ku fikirîna kûr û nerîna wan bo helbestê cuda be. Wan kir ku peyv sihrbaz be û xwe bi sihrbazî nîşan bide û hîştin ku li pişt her peyvekê dinyayek armancên veşartî hebe, ((*ziman ne tenê alava gihandina nîşaneyan e, lê bandorê li ser nîşanekiriyan jî dike û dixwaze wan di nav konteksta pêkhateya metinê de bicih bike ku qesîde (helbest) li*

---

13 Dr. Dilşad Elî Mihemed, *Dilan û ezmûnkirina şiîrî*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2007, r. 168.

14 Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 19.

15 Ebdulselam Salar Ebdulrehman*, Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Slaih de*, nameya doktora, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r. 8.

*gor vê bingehê nêzîkî efsaneyê ye. Efsane wek pêkhateyeke hizrî, ne li ser dîtina wateyê, lê belê li ser lêgerîna li wateyê kar dike*))[16]Cecil Day-Lewis derbarê wêneya hunerî dibêje: ((*wêne vekişîn e ji rastiyê bi armanca zêdekirina bandorê li ser wê*))[17] dema wêne çavkaniya xwe ji rastiyê digre, bedewtir derdikeve bi şertê ku ne guhastina rastiyê wek wê be yanî ne kopî be, lê guhastin bi destkarî bedewtir dibe, ((*vekişîna ji rastiyê tiştek e di wateya peyvê de diqewime dema ku ew peyv ji bo wateyeke din tê bikaranîn. Ev dûrketina ji rastiyê (heqîqetê) jî, armanca wê ew e ku wê wateyê bêhtir di mejiyê kesê guhdar de bicih bike, bikaranîna hêma (sembol) dîsa bi armanca bicihkirina wê wateyê ye ku di rastiyê de heye û helbestvan dixwaze wê biçespîne*))[18] Pêwendiya ku di navbera helbest û hêmayê de heye, pêwendiyeke têkilhev û aloz e û ji hev nayê cudakirin. Çimkî hêma xwedî enerjiyeke veşartî û berfireh e û dibe sedemê kûrkirin û dewlemendkirina ezmûna şiîrî li ba helbestvan ((*hêma di edebiyatê de ji xaze (metafor) û mecaz û şibandinê ji dayik dibe, yanî pir ji hevdu nêzîk in*))[19] ango helbestvan bi rêya van hunerên rewanbêjî hewl dide wateya giştî ya helbestê sînordar bike.

((*Wêneya hunerî pêkhateyeke girîng a binyata şiîrî ye û dişibe şêweya tabloya şêwekar, madeyên wê peyvên bedew û xeyala psîkolojî ya helbestvanin ku bi rêya wê helbestvan tecrûbeya xwe û nerîna xwe li diyardeyên derdora xwe dixe nav çarçoveya teksta xwe ya şiîrî, yanî wêneya hunerî dibe alavek ku helbestvan bi rêya wê dîmenên ku hest bi wan dike bigihîne xwîner*))[20] Pêwist e helbestvan hemû rêyan biceribîne daku bikare wê teksta şiîrî ku di şêweya tabloyê de ye bigihîne xwîneran û bala xwîneran bikşîne ser nerîna xwe, ((*wêneya helbestî ji xewnên kûr ên helbestvan ji dayik dibe û bi rêya peyv û rîtmê dibe nivîs, ne tenê naveroka şiîrê ye lê şiîr bi xwe ye, lewma ne tiştekî balkêş e eger helbestek tenê ji wêneyan pêkbê*))[21]

---

[16] Yadgar Resûl Balekî, *Sîmayên nûjenkirina helbesta kurdî (1893-1932)*, Çapxaneya Wezareta Perwerde, Hewlêr, 2005.
[17]Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Slaih de*, nameya doktora, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r. 12.
[18] Sî Dî-Lewis, *Wêneya şiîrî*, w: Ehmed Nesîf el Cenabî, çapa 1, Bexda, 1982, r. 114.
[19] Rêbîn Xelîl Qadir, *Hêmaya efsaneyî di helbestên Hêmin de*, Kovara Raman, hejmara 159, 2010, r. 53.
[20] Seid Farûq Yûsif Şêx Bizênî, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Ehmed Muxtar Caf*, Çapxaneya Rewşenbîrî ya Hewlêrê, Hewlêr, 2011, r. 151.
[21] Îsmaîl Tenya, *Wêneya Şiîrî*, Kovara Karwan, hejmara 11, 1994, Xula Raperîn, r. 59.

Eşkere ye ku wêneya hunerî ne wêneyeke çavlêkera xwezayê ye, lê xeyala bilind a helbestvan û xweza (siruşt) bandorê li hev dikin û tuxmên wan tevlî hev dibin û di encamê de wêneyeke bedew ji derûna helbestvan tê afirandin. ((*Wêneya şiîrî wek her rêgezeke şiîrî, girêdayî rêgezên din ên wêjeyî ye. Lewma helbestvanên Kurd hîn ji pêşî ve wêne bi şêweyeke bedew bikar anîn û şiyan û îmkanên xwe di hunera wênesaziyê de bikar anîn. Her fikirîneke mirov wêne pê re heye, çimkî wêne û zimanê şiîrî rêgezên din ên edebiyatê temam dikin, her yek ji van tê de nebe helbest xwe nîvcomayî nîşan dide, her wêne jî dibe sedemê peydabûna ramanekê*))[22], wêne dihêle hestên helbestvan bilivin. Eger ne ji wêneyan bûya, dibe ku siruş an îlhama helbestî xwe bi rengekî din bixista nav nîgarxaneya xeyala helbestvan, wê çaxê dê bi hesteke cudatir û bi tameke cudatir biketa ber dîtin û hestên xwîneran. Lewra jî kesê ku hinekî di edebiyatê de bi giştî û di helbestê de bi taybetî şehreza be dizane ku, qet wêneyeke hunerî ji xweber peyda nabe, lê divê helbestvan xwediyê paşxaneke baş be.

((*Wek her hunereke din, pêwistiya wêne bi talênt û rewşenbîrî û tecrûbe û karkirin û tama perwerdeya taybet û şarezaya û mijûlbûnê heye*))[23], çawa pêwist e leşker hemû hunerên leşkerî û şer bizane yan çawa divê siwarek huner û teknîkên hespsiwariyê bizane û ji nû siwariyê bike, wiha jî pêwist e helbestvan wêne û teknîka helbestê fêm bike, ((*Bi rêya xeyal û fikirînê, wêneyên taybet li cem helbestvan çêdibin, lê neçar dibe bi rêya malzemeyên normal wêneyên xwe pêk bîne, tevî ku helbestvanê kevin bi wê yekê tê cudakirin ku piraniya wêneyên wî şênberin û wan bi rêya hestan diafirîne, lê bi rastî her çiqasî wêne abstrakt be, helbestvan neçar dibe malzemeyên konkrêt bikar bîne*))[24], Lewma di binyata wêneya giştî ya helbesta nû de çend wêne cih digrin, lê ne bi temamî serbixwe ne û ji bo pêkanîna binyata wêneya sereke ya helbestê pêwendiyeke bihêz wan bi hev ve girê dide. Dibe ku her yek ji wan bi hêmayeke (semboleke) taybet bê destnîşankirin ku bi hêmayên din re, bi têkiliya wan bi hêmaya mezin a binyata giştî ya helbestê re li hev dikin, ((*lê di helbesta klasîk a kevin de, heta asteke berçav ev wêne serbixwe ne û mirov dikare bi*

[22] Dr. Husê Xazî Kake Emîn Gelalî, *Rêbaza nûjenkirina helbesta kurdî li Başûrê Kurdistanê di navbera salên 1980-1991 de*, Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr, 2010, r. 52.
[23] Kakey Fellah, *Wêneya şiîrî çi ye*, Kovara Karwan, hejmara 49, 1986, r. 42.
[24] Cebar Ehmed Hisên, *Estetîka metina helbesta kurdî ya Kurdistana Iraqê 1950-1970*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2008, r.96.

*hêsanî sînorê wan destnîşan bike. Pir caran tu rêgezeke hevbeş di navbera wan de tune ku wan bi hev ve girêbide. Sedemê vê yekê jî ew e ku binyata helbesta kevin belawela û berbelav e. Lê binyata helbesta nû hevgirtî û bihêz e û yekîtiyeke organîk a tund di hemû astan de heye. Di şiîra nû de, ev hevbeşiya di navbera wêneyên şiîrî de, pir caran sînorê helbestekê derbas dike û digihe gelek helbestên di dîwaneke taybet de*))[25], herwekî tê zanîn wêne bêhtir li ser beşên şêwe û teşeya helbestê tên hejmartin, lê (Ebû Hîlal el Eskerî), di vî warî de cudahiyekê dixe navbera wêne û şêweyê de û dibêje: ((*Wêne navek e li ser hemû şêweyên tiştekî ye ne ku li ser hinekan ji wan e. Herwiha ne li ser şêweyê ye. Lewra tê gotin wêneya vî tiştê wiha ye û em nabêjin şêweya wî wiha ye û şêwe di binyatê de ye*))[26]

Li gor Ebdulqahîr Curcanî, ((*Wêne pîvaneke rexneyî ye ji bo nirxandina helbestê û divê rexnegir vî tiştî piştguh neke. Li gor min, helbestvanê herî serkeftî ew e ku barê wêneyên xwe yên hunerî bi ciwankariya peyvan giran neke*)) [27]

Îbn Reşîq el Qeyrewanî li ser wêneya hunerî dibêje: ((*Tevgera wêneyan ji valahiyê peyda nabe, lê tevîheviya du makan e (konsept, gewde) û (wate, giyan)*))[28]

Îbn Ruşd jî dibêje: ((*Her tiştê ku bikeve qalibê texmînê, wêneya wî heye wek hest û sozan û çawanî û çendîtî…hwd, lê cudahiyeke berçav di navbera şêweya wêneyê û babeta wê de heye, lewma wêne taybetmendiya tiştên şênber e*))[29], wêneya hunerî di helbestên klasîk de xwe bêhtir di rewanbêjiyê de dibîne, lê eşkere ye ku wêne ne berhema serdemeke destnîşankirî ye ku xasiyetên wê serdemê bibin sedemê derketina wê û ligel bidawîhatina xasiyetan jî ew jî nemîne. Lê ligel jiyana mirov bûye heval û gav bi gav pê re berdewam bûye di hemû serdeman de ku helbest geş bûye, wêne jî geş bûye, di wan serdemên ku helbest di wan de pîr bûye û dawerivî ye, wêne jî bi heman awayî guheriye, ((*helbest tiştekî hêvî û bawerbûn e bi paşerojê,*

---

[25] Cebar Ehmed Hisên, *Estetîka metina helbesta kurdî ya Kurdistana Iraqê 1950-1970*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2008, r.95.
[26] Saman Îzedîn Sadûn, *Binyata hunerî di helbestên Letîf Helmet de*, Çapxaneya Kemal, Silêmanî 2010, r. 242.
[27] Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 37.
[28] Dr. Adil Mecîd Germiyanî, *Wêneyên babetî di helbestên Goran û Seyab de*, r. 37.
[29] Saman Îzedîn Sadûn, *Binyata hunerî di helbestên Letîf Helmet de*, Çapxaneya Kemal, Silêmanî 2010, r. 243.

*tenê rêzkirina peyvan nabe helbest, resenî û paqijî du hîm û binemayên sereke ne*))[30] Danasîna kevin a rexnegirên Ereb ji helbestê re ev e ku dibêjin: ((*Helbest axaftineke kêşedar û bi wezn û qafiye ye û wateyê dide xwîneran*))[31] Di pênaseyeke din de dibêjin: ((*wêneya hunerî ne xemilandin lê derbirîn e û pişta xwe bi şibandin û metaforê girêdide wek rêyekê daku cîhana navxweyî ya helbestê bibîne*))[32], wêneya hunerî rasterast nehatiye wergirtin, lê hunereke ciwankarî ye û metafor û sembolan vedihewîne.

Mamoste Hêmin di Tarî û Rohn de diyar dike ku eger helbest jê re hat nikare dernebire, lewma ew hestên xwe nîşanî me dide. Li gor wî ne girîng e, kê jê razî ye û kê jê nerazî ye. Dibe ku pêşî li ba piraniya helbestvanan helbest hizireke taybet be û ew bi xwe çêj û sûdê jê werbigre, dûre di hizra me de jî em heman çêj û sûdê jê werdigrin. Eşkere ye ku bîr û baweriyên cuda derbarê wêneya hunerî hene heta wê asta ku hinek nivîskar û rexnegir di wê baweriyê de ne ku zehmet e pênaseyeke hûrbîn û berfireh ji bo helbestê û wêneyên wê yên hundirîn bê danîn. Sedemê vê cudahiyê jî girêdayî cudahiya bîr û baweriyên felsefî û hunerî ye.

Kakey Felah dibêje: ((*Dema ku em behsa wêneyê dikin yekser wênekêş tê ber çavê me ku bi firçe û wêne mijûlî wênekêşanê ye. Hunermendekî din jî heye ku ew jî helbestvan e bi peyvan wêneyên hunerî tev lî berhemên xwe yên şiîrî dike. Helbestvan bi rêya ziman û tîp û peyvan bi rêya helbestê hest û nestên xwe tevî peyv û hevok û dariştinê dike*))[33] Wek em dibînin malzemeyên bikarhatî di herdu wêneyan de cuda ne. Di wêneya tabloyê de hunermend bi firçe û boyaxê û rengan wêne dike. Lê di wêneya hunerî de helbestvan bi tîp û peyvan, wêneyên zindî dixe çarçoveya helbestên xwe. Derbarê pêwendiya di navbera van herdu huneran de ka gelo hunermend bi vê rêyê çav li siruştê dike, (Plato) dibêje: ((*Karê huneran ew e ku wêneya tiştên şênber derxin, ew jî bi çavlêkirina tiştên nimûneyî, ew jî ji wêneya wêneyekê ne zêdetir e yan wêneyeke kopî ye*))[34], (Aristotle) li ser heman rêçika

[30] Îsmaîl Rojbeyanî, *Çend têbîniyek derbarê helbesta me ya îro*, Kovara Beyan, hejmara 64, Tîrmeha 1980, r. 30.
[31] Cebar Ehmed Hisên, *Estetîka teksta helbesta kurdî ya Kurdistana Iraqê 1950-1970,* Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2008, r. 76.
[32] Dr. Kemal Marûf, *Rexneya nû ya kurdî,* Silêmanî, 2007, r. 137.
[33] Kakey Fellah, *Wêneya şiîr çi ye*, Kovara Karwan, Hejmara 49, 1986, r. 32.
[34] Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991),* Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 180

(Plato) baweriya wî bi teoriya çavlêkirinê hebû, lê baweriya wî bi vê jî hebû ku ((*Çavlêkirin di helbestê de bi her şêweyê be ne çavlêkirineke kor e, lê têgeha çavlêkirinê li ba Aristotle tê wateya zîrekiya hunerî, çimkî huner bi vî rengî çavlêkirina siruşta diyardeyên hebûnê ye*))[35], ji ber vê yekê tevgera bi rengan re ne tenê karê şêwekar e, yan helbestvan jî bi komkirina rengan mijûl in. Şêrko Bêkes di vî warî de dibêje: ((*Bi baweriya min, pêwendiyeke bihêz di navbera helbest û hunera şêwekarî de heye. Çimkî helbest ji bo guh e wek muzîkê. Hunera şêwekarî ji bo çav e, dema ku helbest dipeyîve hunera şêwekarî tev lî dike, dema ku çavê ziman tûj dinere bi rêya wêne hokara bihîstinê jî li cem xwîner bihêz dike. Diyar e çi hunera şêwekarî û sînema pir nêzîk in ji wêneyên şiîrî ku em behsa wan dikin çavê wan kamera ye û bi dû tiştan de digere*))[36], ev herdu huner sûdê ji malzemeyên hevdu werdigrin, çimkî wêne li ser hîm û bingeha wesfkirinê tên avakirin, lê çêj û dîtina her yekê ji wan cuda ye.

Ferhad Pîrbal diyar dike ku ((*Nîgarkêşî ji kevin de li ba kurdan ne xerîb bû û zanîbûn ku pêwendiyeke xurt û bihêz di navbera hunera nîgarkêşî û hunera helbestê de heye û kifş kiribûn ku estetîka van herdu huneran (helbest û nîgar) stratejiya wan, armanca wan, wek aşiq û maşûq e, çiqasî nêzîk û tevlîhev e*))[37] Nav û dengê nîgarkêş (Manî) di helbesta kevin ya kurdî de deng daye. Navê vî hunermendî li ser zimanê piraniya helbestvanên Kurd bûye bi taybetî di sedsala 19an û şûn de, (Manî) nîgarkêşekî bi navûdeng ê Îranê bû, (Nalî) bi vî rengî wî wesf dike:

Nûkî xamey min ku bêtû meena arayî Kemal

Xet bi xet îzharî neqşî surety Manî deka[38]

Herwiha (Safî Hîranî) dibêje:

Kesê lem esre neydîwe beşer wek le be şîrînî

Tehebyûrma le teswîrt eger neqqaş eger Manî[39]

[35] Azad Ebdilwahid Kerîm, *Sosyolojiya helbesta kurdî*, 2005, çapa 1, r. 103.
[36] Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 142.
[37] Dr. Ferhad Pîrbal, *Dîroka hunera şêwekarî li Kurdistanê*, (ji kevin de heta salên 1950), 2006, 66.
[38] *Dîwana Nalî*, çapa 6, Çap û Weşanên Kurdistan, Sine, 2006, r. 100.
[39] *Dîwana Safî Hîranî*, Çapxaneya Wezareta Perwerde, Hewlêr, 2004, r. 243.

Herwiha (Kurdî) dibêje:

Ke Manî hate serkêşanî ebroy to le paş çawit

Lemestî destî wa lexezî ke çi hat xetî perrgarî[40]

Sedema derbirîna wan hemû hest û soz û xeyalên ku di dilê helbestvanekî de asê mane helbest e ku di metina şiîrê de bergewde dibe. Pir caran ew metin hemû wêne ye, çimkî dema mirov du malikên helbestekê dixwîne, ev helbest dîmenekî yan serpêhatiyekê nîşan dide, wêne derbasî nav mejî û hestên xwîner dibe, lewra jî pir caran wêne rê ye bo guhastina ezmûnan, çimkî hemû bûyerên xweş û nexweş ku di jiyana wî de rû didin bandore li ser hizr û zihniyeta helbestvan dikin. Ev jî wiha dike hemû wan ezmûnên jiyana xwe bi helbestê derbibire û wêneyên bedew biafirîne, ((*wêneya hunerî şêwazeke nimûneyî ye bo derbirîna ezmûna şiîrî heta hinek lêkolînvan dibînin ku baştirîn tişt e ku li şiîrê tê, çimkî wiha li xwîner dike agehdarî wan wateyan be ku wêne wan disepîne, ev jî bandorekê di navbera wêne û xwîner de pêk tîne û wateyan bêhtir di zihnê xwîner de diçespîne*))[41].

((*wêneya hunerî wê demê xwe bilind û binirx û livîner û sûdmend nîşan dide dema pêwendiyeke bihêz di navbera wêne û tekstê de hebe û bi cureyekî di nav hev de heliyabin, yanî kengî helbestvan mijara dildarî derbirî pêwist e peyvan ji ferhenga dildarî bîne der, wêneyên şiîrî heman wêneyên dildarî bin*))[42], wiha jî ew hemû wêneyên ku di mejiyê helbestvan de dirust dibin, xeyal rêbertiya wan dike, her çiqasî xeyal kûr û rewşen be bandora wêneyê zêdetir dibe û xwîner çêjeke zêdetir jê werdigre û di hizra wî de bi nemirî dimîne û berdewam hewla xwehîştinê dide, bi cureyekî weke guleke di nav guldankê de lê tê ku xwediyê wê bi berdewamî li dijî çilmisîna gulê şer dike.

((*wêneya hunerî enerjiyeke dînamîk e, ji jiyan û tevger û rîtm û siruş (îlhamê) pêk tê. Hêza wê di wê yekê de ye ku tiştên belav û asayî derbas bike, daku bi hûrbînî û pêşdîtinê bide pêşiya demê û lewra jî wek laş û giyanê helbestê binav dikin. Mirov*

[40] *Dîwana Kurdî*, 2010, r. 124.
[41] Safiye Mihemed Ehmed, *Şêwaza helbestên kurdî yên Pîrbal Mehmûd*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2014, r. 2014.
[42] Binere li Dr. Refîq Şiwanî, *Edebiyat û civak, gotareke edebî*, Çapxaneya Wezareta Rewşenbîrî, Hewlêr, 2008, r. 55.

*bi rêya wêneyên hunerî dikare cudahiyê di navbera helbestvanan de bike û bi şêwaza bikaranîna wan jî dikare cudahiyê di navbera kevin û nû de bike*))[43] Dema em helbestên du helbestvanan dibînin di aliyê teşe û naverokê de, bi mercekî ew kesê helbestê dibîne û wan dixwîne di aliyê têgihîştina edebî de heta hedekî baş be, êdî guman tê de tune yek ji wan herdu helbestan bedewtir û rewşntir derdikeve hem di aliyê tekstê û hem jî di aliyê bedewî û zelaliya wêneyên tekstê de, çimkî helbestvan bi helbesta baş divê bikare bandorê li ser xwîner dirust bike, ev bandor jî girêdayî bedewî û bihêzbûna wêneyan e. Şiyana helbestvan di dirustkirina wêneyên kevin û çêkirina guncandinê di navbera wan de daku wêneyeke afirîner jê dirust bike, di vê rewşê de bedewiya vê wêneyê li ser siruşta eqlê helbestvan û berfirehiya xeyala wî dimîne, lewma ((*wêneya hunerî ne wêneyeke kopîkirî yê tişt û diyardeyên realîteyê ye*))[44], lê xeyala wî bi awayekî tev lê dîmenê wênegirtî dibe ku wê ji çavlêkirina realîteyê dûr dixe û realîteyeke afirandî ji me re dirust dike.

((*Wêneya hunerî berhema çalakiya xeyal e, nayê wateya guhastin û kopîkirina cîhanê, lê tê wateya vegera pêkhateyan, dîtina pêwendiyeke temam di navbera diyardeyan de û komkirina navbera dûr ji hev û dijîhevan e*))[45], bi şêweyekê ew tiştên ku zehmet e wêneyeke kêrhatî ji wan re bê danîn, ev helbest e wiha dike wêne bo wan tiştên ku dijî hevin dirust bike û can bide wan, ku wan ji tiştên dirustkirî yên derdora wê cuda bike, çimkî helbest ew şiyana bihêz e ku tiştan ji nebûnê tîne hebûnê. ((*Wêneya şiîrî ji nav xewnên kûr ên helbestvan ji dayik dibe û bi rêya peyv û rîtmê dibe nivîs, neku tenê navika helbestê ye lê belê helbest bi xwe ye. Lewma ne tiştekî balkêş e ku helbestek tenê ji yek wêneyê pêk bê*))[46], di dinyaya helbestê de gelek helbestên me hene ku ji yek wêneyê pêk tên, lê her vê wêneyê gelek wêne li dora xwe kom kirine. Lewma ji ber berfirehî û kûriya babeta wêneya hunerî heta niha dijwar e ku bi tevahî pênaseyeke pir û tije jê re bê kirin, lê dîsa jî em dikarin bêjin wêneya hunerî pêkahteyeke girîng a binyata helbestê ye û dikare bi tabloyeke şêwekarî bê şibandin. Malzemeyên wê peyvên bedew û xeyala derûnî ya helbestvan

[43]Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Slaih de*, nameya doktora, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r .
[44] Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 35.
[45] Dr. Kemal Marûf, *Rexneya nû ya kurdî*, Silêmanî, 2007, r. 136.
[46] Îsmaîl Tenya, *Wêneya Şiîrî*, Kovara Karwan, 1994, r. 59.

in ku bi rêya wan helbestvan ezmûna xwe û nerîna xwe li diyardeyên derdorê dixe nav çarçoveya teksta xwe ya şiîrî, yanî wêneya şiîrî dibe sedemê wê yekê ku ew dîmenên helbestvan hest bi wan dike, bi rêya wêneya şiîrî bigihin xwîner.

### 1.3.Rêgezên Wêneya Hunerî

Wêneya hunerî ji çend rêgezan pêk tê. Bi hevgirtin û tevlîhevkirina van rêgezan wêneya hunerî pêk tê. Lê tiştê ku girîng e û pêwist e bê naskirin çiloniya bikaranîna wan rêgezan e di helbestê de. Jixwe eger helbestvan nikaribe di helbestê de wan hemû rêgezan bicivîne, êdî helbest rastî jiberçûna wêneyî tê, çimkî helbestvan çiqasî bi hostetî û jêhatîbûn li ser bikaranîna wan rêgezan kar bike, ewqasî helbest bedew û balkêş dibe lê eger nikaribe wan rêgezan weke hev bikar bîne, êdî dibe sedemê seqetiya helbestê.

Ew hemû rêgezên ku wêneya hunerî pêk tînin girîngî û taybetmendiya xwe hene di nav helbestê bi xwe de. Hemû weke hev pêwistin ji bo pêkanîna helbestê wek çawa mirov xwediyê çend pêkhateyên cuda ye çi ji hundir ve û çi ji derve ve û her yek ji wan girîngî û taybetmendiya xwe heye û her yek bi karekî radibe û karê xwe dike. Hemû bi hev re jî zincîrekê diafirînin bo berdewamiya jiyanê. Eger biçûktirîn kêşe yan rawestanek yan nebûna yekê ji wan pêkhateyan di mirov de rûbide, êdî bi rengekî ji rengan ew mirov dimire yan eger nemire jî tûşî kêmendambûnê dibe û nikare wek mirovekî sax bê dîtin.

Bêguman helbest jî li ser heman şêweya mirov e. Eger rêgezên wêneya hunerî wek pêwist yan bi kêmasî yan bikarneanîna yekê ji wan rêgezan di helbestê de hat dîtin, wê çaxê nikare wek teksteke wêjeyî bê temaşekirin, çimkî ew rêgez hemû wek hev girîng û bihêzin û her yek ji wan xwediyê girîngî û taybetmendiya xwe ye û her yek ji wan hewl dide helbestê bedewtir û xweştir bike. Hemû girîngiya wan rêgezan li ser bikaranîna helbestvan bi xwe dimîne, çimkî ew dibe hokar di ku de ew rêgez bên bikaranîn. Eger ew rêgez hemû bi awayekî kêrhatî di cihê kêrhatî de bên bikaranîn, êdî ev hostetî û zîrekiya helbestvan nîşan dide. Lê eger bi berevajî bû, êdî nehişyarî û kêm ezmûniya helbestvan nîşan dide, bi cureyekî baş û xirabiya helbestê bandoreke erênî û neyînî li ser xwîner bi xwe dirust dike, wexta ew rêgez hemû bi rengekî wekhev û kêrhatî bikarhatin êdî guman tê de tune xwînerê wê baş û bandora

wê baş dibe, lê eger helbestvan guncandin û danîna wan rêgezan bi awayekî baş û tendirust di helbestê de nizanibe, ne bandora wê baş dibe û ne serkeftî dibe û di heman demê de jî xwînerê wê jî baş nabe.

Ramana helbestê bi bikaranîna wan rêgezan ronîdar û bedew dibe. Nabe bi tu hawî yek ji wan rêgezan ji hêla helbestvan bê piştguhkirin, çimkî her yek ji wan ji aliyê xwe ve hokar in bo bedewî û bihêziya helbestê, lewma piştguhkirina her yekê ji wan helbestê lawaz dike, eger hemû rêgez bi rengekî bedew û zîrek di helbestê de bên bikaranîn, dê nemiriyê diyarî metina berhemhatî bikin.

### 1.3.1. Ziman

Ziman rêgezek e ji rêgezên wêneya hunerî û malzemeya sereke ya helbestê ye. Ziman bi roleke bibandor di bedewî û nazikiya helbestê de radibe, bi curekî ku çiqasî ziman xwerûtir û bihêz be, wêne rontir û geştir dibe, çimkî zimanê nivîsandina helbestê ji zimanê axaftinê yê rojane cuda ye, ((*ziman aliyekî herî girîng ê edebiyatê bi giştî û helbestê bi taybetî ye. Cure hunerek di zimanê helbestê de tê dîtin ku ji zimanê civakê cuda ye*))[47] lewma Aristotle di hunera helbestê de girîngiyeke mezin dide malzemeyên hunerê, çimkî bi baweriya wî ((*ew malzeme cureyê huneran destnîşan dikin ku ev jî dibe hokara cudakirina huneran ji hevdu, û ji bo vê armancê jî wî du cure destnîşan kirine.*

*1. Yên ku bi çav tên dîtin wek (nîgarkêşan, peykersazî, bînasazî.)*

*2. Yên ku bi guh tên bihîstin, ku ev jî sê cure ne (kêş, rîtm, ziman)* ))[48] her yek ji van têgehan amaje ne ku endamek ji endamên laşê mirov wêneyê dixe zihnê mirov. Nîgarkêşan û peykersazî û bînasazî bi rêya çav dibin wêne li ba xwîner û herwiha kêş û rîtm bi guh tên bihîstin û dibin wêneyên şênber û xwîner dikare bi rêya ziman her yekê ji wan binirxîne.

((*Zimanê wêneyê ew huner e ku bi rêya tevrabûna rast ramanê şênber dike û naveroka wêne derdixe. Em dikarin bêjin guherîneke organîk di binyata helbestê de di navbera teşe û naverokê de heye. Tevrabûn wêne diafirîne, wêne jî naverokê eşkere dike. Ji ber ku naverok teşeyê diafirîne herwekî teşe naverokê diafirîne. Herdu*

---

[47] Tariq Salih, *Wêneya hunerî di hinek helbestên Goran de*, Kovara Raman, hejmar: 199, 2013, r. 61.
[48] Aristotle, *Hunera Şiîrê (Şiîrnasî),* w: Ezîz Gerdî, Çap û Weşanên Rênima, Silêmanî, 2004, r.118.

*dirijin nav çarçoveya giştî ya karê hunerî*))[49] Bi awayekî giştî em dikarin bêjin ku teksta helbestê wek zincîreke bi xelek e ku hemû xelekên wê hevdu temam dikin. ((*Zimanê helbestê ne wek zimanê axaftinê ye û ne tenê amrazek e bo ji hevdu fêmkirinê, lê bikaranîna ziman ji bikaranîna giştî derdikeve û dibe bikaranîneke taybet. Peydakirina çend xasiyetên nû yên estetîkî, bi curekî xwe wek zimanekî ciyawaz nîşan bide*))[50] Bêguman eger zimanê helbestê hêsan bûya, dê her kesî bikaribûya bibe helbestvan, lê tiştê ku zimanê helbestvan ji zimanê kesê normal cuda dike, ruhliberkirin û bedewkirina peyvan e bi sihra xwe. Divê helbestvan wiha li peyvê bike ji bilî wateya xwe çend wateyên din jî bide bi cureyekî ji cureyan peyvên nav tekstê bedewî ji wan bibare û derdora xwe rewşen bikin û bedewiyê diyarî seranserê tekstê bikin.

((*Zimanê helbestê ku helbestvaniyê pêk tîne, wê demê ye ku pêwendiyeke nû di navbera mirov û tiştan de yan di navbera tiştan bi xwe de dirust dike, yan di navbera peyvekê û peyveke din de yan di demekê de ye ku wêneyeke nû ya jiyan û mirov pêşkêş dike. Lewma zimanê helbestê helbestvan dike xwediyê teknîka nû û bi binyateke nû wêneyên wî wêneyên jiyan û mirov û tiştan vedihewînin û nihêniyên metinê eşkere dike, realîteya civaka paşketî jî diguhere*))[51] , lewma hemû helbestvanên ku di dema xwe û piştî xwe karîbûn xizmeta edebiyata xwe bikin navê wan bi nemirî ma û miletê wan şanaziyê bi wan dikin, ev şanazîkirin jî ne ji ber xatirê çavên helbestvan e, lê ji ber wî ziman û wê teknîkê ye ku di helbestên xwe de bikar anîne û karîbûn bandorê li ser xwîner dirust bikin, ((*gava ferhenga peyvên helbestvan bihêz be, hewl dide bi balkêştirîn şêwe helbesta xwe bi peyvên nû darêje, mebest ji peyva (nû) jî ne ew e ku helbestvan ji xweber peyvan saz bike û dirust bike û wateyan bide wan, na, divê ew peyv di ferhengê de yan di nav xelkê de hebin. Helbestvan di encama ger û lêgerîna zêde û girîngîdana bi zimanê helbestê ew bergewde kiribin*))[52] çimkî eger helbestvan ne şareza û jêhatî bû di danîn û rêzkirina peyvan de yan eger zimanê şiîrî yê helbestvan dewlemend bû di warê hevwateyî û

[49]Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 62.
[50] Dr. Perêz Sabir, *Rexne û meseleyên nûkirina helbestê*, Dezgeha Çap û Weşanên Aras, Hewlêr, 2008, r. 288.
[51] Binere li Ebdilqadir Mihemed Emîn, *Wêneya şiîrî di rêbaza romansî ya kurdî de,* Çap û Weşana Serdem, Silêmanî, 2002, r. 27.
[52]Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 41.

pirwateyiya peyvan de, wê çaxê curek ji bêzariyê li ser xwînerê helbestê diyar dibe û nabe teknîka peyvên helbestvan di çend peyvên kêm ên dubarekirî de asê bibe.

Çiqasî ferhenga zimanê helbestvan dewlemend be di warê peyvên nû û kêm dubarebûna peyvan, ewqasî helbest di aliyê teşe û naverokê de bihêz dibe. Ziman di helbestê de yekem diyarde ye ku pêwistiya wê bi lêfikirînê heye. Eşkere ye ku zimanê helbestê ji zimanê zanist û felsefeyê cuda ye, çimkî pêwistiya zanist û felsefeyê bi zimanekî heye ku armanca xwe yekser bide, lê ((*helbest tiştekî din e û taybetmendiya xwe heye, çimkî zimanê helbestê taybet e û çend naverokan li xwe digire û bi hêsanî dev ji wate, mebest û rehendan bernade, lê pêwistî bi cureyekî lêfikirînê li hêmayên wan peyvên ku helbestvan wan di tevahiya binyata helbesta xwe de bikar tîne heye*))[53]

Kamil Besîr dibêje: ((*Hestyarê rasteqîn ku dixwaze tiştekî nû ji derûna xwe ya taybet derbibire yan karûbarekî demkî nîşanî serdema xwe bide, divê pişta xwe bide zimanê helbestî yê samanî û kilîşeyan, dûre zimanekî hunerî yê nû yê taybet bi rewşa derûnî û taybet bi hest û nest û taybet bi serdema xwe saz bike. Vêca bila ew ziman ji ferhenga çespandî nehatibe wergirtin jî. Herwiha bila wêneyên hunerî jî bi ber guhê kesî neketibin, girîng ew e ku ev ziman alaveke rastgo be di nîşandana hest û nest û sozeke resen de*))[54].

((*Divê helbestvan di helbestê de peyvan bi awayekî derbibire ku hest û soz û helbestvaniya wî tê de reng bidin û bandoreke mezin jî li ser xwîner dirust bike, ne tenê peyv lê hevok û rêxistina frazan jî*))[55] Ji vê jî diyar dibe ku tenê teknîka peyvên bedew û xemilandî ne bes e da helbest yan metin bi germ û tîneke bedew û rewneqdar derkeve. Lê divê helbestvan hemû peyv û hevokan bi awayekî rêk bixe ku bi naveroka helbestê yan metinê re bigunce, çimkî nabe ji bîra me here çiqasî bedewiya naverokê bandorê li ser xwîner dirust dike, bi heman awayî jî bedewiya teşe yan formê jî girîng e daku bikare bandorê li ser xwîner dirust bike. Lewra her çiqasî naverok bedew û bihêz be, eger teknîka teşeyê lawaz bû, helbest yan metin bedewî û bihêziya naverokê jî ji dest dide yanî pişka herduyan weke hev e. ((*Sihreke din a peyvê di zimanê helbestê de ku wateyan derdixe guherîna peyvan û tiştan bi*

---

[53] Saman Îzedîn Sadûn, *Binyata hunerî di helbestên Letîf Helmet de*, Çapxaneya Kemal, Silêmanî 2010, r. 205-206.
[54] Cemal Hebîbellah, *Derwazeya şiîrnasînê*, Hewlêr, 2012, r. 39.
[55] Dr. Fazîl Mecîd Mehmûd, *Siruşt di helbesta Goran de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2007, r. 134-135.

*şêweyekê ku tişt li derveyî hebûn û hişyariya me hene, lê dema helbestvanê dahêner wan "tiştan" bi cureyekî din tîne nav metina helbestê wê çaxê wateyeke din diyarî wateya wî tiştî dike, lê bi vî cureyî her tiştekî felsefeya xwe heye û helbestvan dikare di tekstê de wê felsefeyê bergewde bike*))[56], ((*kirdeya çavdêrîkirina vê proseyê me ber bi wê yekê ve dibe em bêjin tişt di tekstê de bi wî cureyî nedibûn eger bi tenê wek takekî ferhengî yê diyarkirî bihata bikaranîn, lê dema astên cuda cuda yên tiştan derdikevin wê çaxê nerîna cuda ya helbestvan jî li tiştan derdikeve. Ango "tiştên" helbestvan desthilata xwe ji wateya wî tiştî werdigre ku lixwe girtiye, ew desthilata ku li ser hişyariya me û di amadebûn û di binyata karê edebî û hunerî de heye*))[57], bedewiya teksta helbestê girêdayî bedewî û dilrevîniya wêneyên wê ye û bedewiya wêneyan jî bedewiya wî zimanî çavkanî digre ku wan bergewde dike, lewra jî tê gotin ((*wêne ji ziman nayê veqetandin, çimkî wêne ji ziman dizê û ziman jî ji hêlekê bi rêya deng û peyvan di binyata metinê de bi rolekê radibe û ji hêleke din ve jî ji ber bezandina wateya normal a peyvan û xwe gihandina wateyeke nû aktîf dibe*))[58], bi şêweyekê ku her zimanek şiyana wî heye wan peyvên ku di tekstê de bikar tîne ji kirasê wan derxe û noqî nav peyv û hevwateyên bedewtir bike û di heman demê de jî her ew ziman dikare di rêzkirina peyvên bêwate de bi roleke xirab rabe, lewma dibe helbestvan beriya bikaranîna ziman li ser awayê bikaranîna zimên kar bike, çimkî her kêmasiyek di derbirîna ziman de bandora wê xirab dibe.

((*Çiqasî helbestvan nihêniyên ziman kontrol bike û ji siruşt û pêkhatina peyv û têgeh û hevokan agehdar be û bi pisporî bi wan re tevbigere, ewqasî li hember afirandina rewşa helbestê serkeftî dibe û wan xewn û xeyalên ku di derûna wî de asê mane, hêsantir û rêzkirîtir û bedewtir nîşan dide. Helbestvan dikare nihêniyên ziman kontrol bike dema di ziman de kûr bibe û hewl bide nihêniyan bibîne û wêneyên hunerî yên nû û xemilandî dirust bike. Zimanê şiîrî di navbera rêgezên din ên binyata şiîrê de xasiyeteke taybet dide tekstê û helbestê pêk tîne û zimanê normal derbas dike û di encama guncandina peyv û dengan de awazeke taybet dide teksta helbestê*))[59], ji

[56] Newzad Ehmed Eswed, *Ezmûna xwendina çend rûpelên rexneyî*, Silêmanî, 2006, r. 92.
[57]Newzad Ehmed Eswed, *Ezmûna xwendina çend rûpelên rexneyî*, Silêmanî, 2006, r. 93. .
[58] Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 35.
[59]Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 44.

aliyekî din ve jî helbestvan di paqijkirina zimanê helbesta kurdî ji peyvên biyanî, dihêle ku zimanê helbestê nêzîkî zimanê axaftina rojane ya xelkê bibe.

lê armanca wan ne ew e ku zimanê rojane yê xelkê û zimanê helbestê bibin wek hev, lê mebesta wan ew bû ku zimanê normal bi rengê helbestê bê avakirin, ((*di helbestê de jî wêne malzemeya derbirînê ye ku dîmenekî zindî vediguhêze û ezmûneke mirovatî diyar dike. Di helbesta nû de, bedewiya rêgezan yan kirêtiya wan qet ne girîng e, lê tiştê girîng ew e ku wêne bi giştî hestên rastgo nîşan bide û wan bi rengekî balkêş veguhêze*))[60].

lewma helbestvanê baş ew e yê ku serkeftî be di hilbijartin û bikaranîna wî zimanê ku peyama xwe pê digihîne kesên ku wê peyamê werdigirin. (Aristotle) careke din dibêje: ((*Mezintirîn xisleta başiya helbestê ew e ku zelal û eşkere be lê ne dubarebûyî be*))[61], ev jî tekezkirineke bihêz e li ser awayê gihandinê û asta kûrî û rastî û bandora wê li ser kesê ku wê peyamê werdigire. (Horas) dibêje: ((*Her bi tenê ew ne bes e ku helbest bedew be lê divê ew hêza efsaneyî tê de hebe ku ruhê guhdar ber bi wan daxwaziyên ku armanca wî y*ê *bikşîne*))[62], lewma tevî hemû pêwistî û girîngiya zimanê helbestê ((*divê ziman wek amrazekê (wesîleyekê) lê ne wek armancekê di nav helbestê de bê bikaranîn, çimkî eger ziman bû armanca helbestê, hingê helbest û wêneyên wê yên babetî dê bibin qalikeke zimanî û bargiranî li ser wergirê peyamê `xwîner`*)) [63] . Lewma bikêr nayê di helbestê de ziman wek malzemeyeke zimanî bê hejmartin, lê divê ziman wek aliyekî wêjeyî bê dîtin û ciwankarî bide metinê helbestê.

### 1.3.2. Soz (Hest-Hîs)

Rêgezek din ji rêgezên wêneya hunerî ye. Soz an hîs wek hîm û binemayeke sereke ya binyata helbestê tê hejmartin. Çimkî soz an hest wek lerizîn û tevzînokekê ye ku di nav damarên laşê mirov de diçe û hemû laş û damar û şane hest bi wê tevzînoka pir bihêz dikin. Di vî warî de (Kamîl Hesen Besîr) dibêje: ((*Di zanista derûnî de, soz an his wiha tê naskirin ku diyardeyeke wijdanî û psîkolojîk e. Ji hest û*

---

[60] Rêzan Salih Mewlûd, Hizrîna şiîrî di navbera rêbaza klasîk û rêbaza romantîk ya kurdî de di Kurmanciya Jêrîn de, Çapxaneya Şehab, Hewlêr, 2009, r. 109.
[61] Aristotle, *Hunera Şiîrê (Şiîrnasî)*, w: Ezîz Gerdî, Çap û Weşanên Rênima, Silêmanî, 2004, r.83.
[62] Rizgar Umer Fetah, *Romansîzm di helbestên Hêmin û Mihemed Nûrî de*, Çapxaneya Mukiryanî, Hewlêr, 2013, r. 178.
[63] Jêderê Berê, r. 178.

*nestên xwediyê xwe dizê. Ji ber çend sedemên şênber hizr û coşana wî wek şepêlan diherike û teşe digre. Di reng û deng û tevgera laşê wî de tê nîşandan. Ev diyarde eger hat û di wêjeyê de hat pêkanîn, jê re tê gotin soz an şiûra wêjeyî. Şiûra wêjeyî jî wiha tê naskirin ku hêzeke di derûna xwîner û wêjeyê de bi sedema xwendina metinê wêjeyî li ba dibe û danerê metina wêjeyî binyat dike*))[64], ji vê danasînê diyar dibe ku soz an hisa wêjeyî ji soza normal bibandortir e, çimkî soza wêjeyî di encama xwendina çend tekstên edebî yan helbestî de pêk tê û cihê xwe di nav dil û derûna xwîner de digre. Lê soza normal ji xweber di dil de dirust dibe bi awayekî ku neketiye jêr bandora tu tekstekê.

Bi baweriya ( Îzedîn Mistefa Resûl), ((*Soz an his ne tenê ew e ku di encama hejîna helbestvan bi xwe de be, lê ew e ku xelkê jî bihejîne*))[65], soz jî ketiye jêr bandora ceribandinên helbestvan yanî ((*ceribandin bi xwe dibin sedemê coşbûna soz û hestên helbestvan*))[66], nabe ew yek ji bîra me here ku roleke bibandor û berçav a soz û hestan di binyat û afirandina wêneya hunerî de heye, çimkî hemû tekstên ku soz û hest di wan de bibandor e encama ceribandina helbestvan bi xwe ye ku karîbû peyvan bi hest û sozan mişt bike. Bi rêya wêneyan ew his û hestên helbestvan ji xwîner re tên veguhestin. Eger his û sozê karîbe tev lê hemû peyv û hevokên tekstê bûbe yan derbasî nav dilê peyvan bûbe, bêguman şiyana tekstê çêdibe ku bandorê li ser xwîner pêk bîne. Ev bandor jî wê demê xuya dibe gava soz û hisên kesê xwîner di dema xweşî û nexweşiyê de tên hejandin. Di dema nexweşiyê de hêstiran dibarîne û di dema xweşiyê de jî bi rengekî din xweşiya xwe nîşan dide.

(Şêrko Bêkes) derbarê his û sozê dibêje: ((*Di helbestê de hest û soz dibin beşekî herî girîng ê afirandinê. Pileya germê di helbestê de bî pileya sozê tê pîvankirin. Eger ev pîle di helbestê de nebe, ji gelek aliyan ve bedew e, lê nikare bigihe astekê ku helbesteke sozdarî be*))[67] Eger helbestvan ne xwediyê his û sozeke cudatir be ji kesê normal, bêguman şiyana wî nabe ku bi tîra soza xwe li dilê xwînerê xwe bide û wî/wê ber bi xwe ve bikşîne. Lewma eger soz û hest di helbestê de nebe, bedewiyeke wê ya berçav çênabe, lewra ((*zimanê wêneyê ew huner e ku fikir wê şênber dike û bi*

---

[64] Dr. Kamîl Hesen Besîr, *Rexnesaziya pêrewkirina dîrokê*, Çapxaneya Korra Zanyarî ya Iraqê, Bexda, 1983, r. 17.

[65]Rêzan Salih Mewlûd, *Hizrîna şiîrî di navbera rêbaza klasîk û rêbaza romantîk ya kurdî de di Kurmanciya Jêrîn de*, Çapxaneya Şehab, Hewlêr, 2009, r. 100.

[66] Jêderê Berê, r. 100.

[67]Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 70.

*rêya soza rasteqîn naveroka wêneyê nîşan dide. Diyar e xeyal û soz û hilçûn jî girêdayî hevin û bi berdewamî wêneyan diyarî helbestvan dikin. Soz piştî nemana hilçûna demkî di sînorekî diyarkirî de radiweste û pêwistiya wê bi hêza xeyalê heye ku wê vejîne û alav bide û dariştineke hunerî ya nimûneyî encam bide*))[68], pêwistiya helbestvan bi wan hemû nestên derhiş heye daku bi rengekî ronîdar xwe di nav dinyaya helbesta xwe de bibîne, ((*soz rêgezeke girîng a helbestê ye di heman demê de jî derbirîn karekî heqîqî yê nav teksta helbestê ye, bi wateyeke din eger giyanê sozdarî di tekstên helbestî de bê rakirin, dê giyanê tekstê bikeve rewşeke xirab, çimkî soz û hest zindîtiyê diyarî teksta edebî dikin.*

*lewma ( Wehîd Subhî) derbarê sozê dibêje: ((Wêne bêyî sozên germ nikare bandorê li ser psîkolojiya xwîner pêk bîne*))[69], lê tiştê ku di sozê de tê kifşkirin ne şert e heta çi radeyekê bedewiya wêneyê ligel jîngeha derdorê bigunce yan na. ((*Bedewiya wêne ne bi wê yekê ye heta çi radeyê ligel realîteyê cot dibe lê heta çi radeyekê hest û sozê tev radike. Helbestvanê dahêner jî dema tiştên siruştê bi têkiliyên curbicur bi hev ve girêdide bi vê yekê sozên rewiştî tev radike*))[70], giyanê sozê di nav tekstê de me dixe rewşa raman û axkişandin û hesretê, bo wî zemanê ku helbestvan bi wêneyên şiîrî ji me re kişandine û bi bîr û soz ji me re nîşan dane, bi rengekî di nav de di hêle.

Soz karvedana kar û bandora diyarde û dîmen û bûyeran e li ser hest bi awayekî bandorê li ser derûn dike û xeyal ber bi dawiya sînorê yaxîbûnê dibe, yaxîbûn jî karvedan e, vêca ew karvedan yan bi başî ji helbestvan vedigere civakê û xwînerê tekstê dilbijê xwe dike yan bi xirabî û nehêja li helbestvan vedigere. Lê eger çavkaniya sozê ronîdar û sakgar be, armanc jê bihêzkirina tekstê ye. ((*Soz ne xwediyê qewareyeke taybet e û nikare bi rengekî rasterast bê bergewdekirin*))[71], girîngiya sozê di wê yekê de ye ku nayê bergewdekirin, lê îlhamek e ku helbestvan hespê xwe yê helbestê pê dibezîne û wiha li peyvan dike ji peyvên asayî cudatir derkevin,

[68]Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 86.
[69] Binere li Tariq Salih, *Wêneya hunerî di hinek helbestên Goran de*, Kovara Raman, hejmara. 199, 2013, r. 63.
[70]Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Salih de*, nameya doktora, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r. 24.
[71] Dr. Dilşad Elî Mihemed, *Binyata helbestê di helbesta kurdî de*, Çapxaneya Renc, Silêmanî, 1998, r. 44.

lewma karkirina li ser teksteke ku soz tê de bibandor be hêsantir û çêjdartir e ji teksteke ku soz tê de hatibe piştguhkirin.

((*Soz bi tenê nikare armanca xwe bigihîne, lewma ziman bikar tîne daku bikare wê wateya kûr bigihîne xwîner. Helbestvan ziman dike pir û bi rêya ziman soza tekstê digihîne xwîner. Lewra jî divê helbestvan xwe ji bikaranîna peyvên giran û xerîb û wateyên aloz dûr bike, ji ber di rewşeke wiha de xwîner bi aliyê zimanî dadikeve û ji hizr û soza tekstê dûr dikeve. Herwiha pêwendiyeke kartêkirina dualî di navbera soz û hizrê de heye û tu yek ji wan bêyî ya din nikare wêneyên balkêş biafirîne*))[72], çimkî ((*soz taybetmendiyên wêne rave dike, bandor û bedewiya wê jî vediguhêze, lewma pêwist e helbestvan bi başî sozê bigihîne û veguhêze û ev jî pêk nayê eger helbestvan bi başî ziman bikar neyîne*))[73], çimkî soz wêne rave dike û ziman jî wek pir e, lewra pêwist e helbestvan hemû şiyanên xwe yên veşartî di dema nivîsandina teksteke helbestî de bikar bîne da ku wêne bi awayekî bedew û balkêş derkeve û bihêle di dema xwendinê de çend wêneyên cihêreng ji xwîner re dirust bibe. Helbestvan û rexnegirê ingilîz Colerdige dibêje: ((*Herçiqasî wêneya şiîrî bedew be, helbestvanê serkeftî destnîşan nake eger bi sozên nazik û hizrên afirîner nehatibe xemilandin daku bikare hest û sozên guhdar yan xwîner bihejîne*))[74], yanî teknîk û ceribandin û nerîna helbestvan bi roleke rasterast radibin di bedewkirin û xemilandina teksta helbestî de, bi awayekî herçiqasî helbestvan zîrek be ku şiyana wî nebû nava xwîner bihejîne, wê tiştekî berçav neke, lewma ((*Tu teksteke edebî ku helbest be bêyî soz tune, diyar e zimanê sozê jî divê nazik û dilrevîn be û dûrî konseptên zanistî û peyvên giran be daku xwîner ji ramana sozê dûr nekeve û xwe bi aliyên din ve mijûl neke. Eger helbestvan ziman bi başî bikar neyîne nikare sozê bigihîne xwîner. Helbest warê livandina sozê ye, vêca ev ji tecrûbeya helbestvan be ku tê de aliyekî derûnî berçav bike yan bi rêya tecrûbeya şexsî be di kêşeyên civakê de wer bibe*))[75]

[72] Binere li Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de,* Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 50.
[73] Binere li Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de,* Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 50.
[74] Kerîm Şareza, *Wêneya şiîrî di helbesta kurdî de çawa dirust dibe û bi çi mebestekê tê wergirtin,* r. 6.
[75] Kejal Heme Emîn Ehmed, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Ferîdûn Ebdul Berzencî de*, nameya master, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, 2010, r. 105.

### 1.3.3. Bîr (fikir-hizr)

Bîra edîb û nivîskar rêgeza sereke ya berhema edebî ye. Ew hemû metinên helbestî ku di edebiyata her neteweyekê de tên dîtin, rih û koka wan bîr e. Bîr jî ew hest e ku tê mejiyê helbestvan. Helbestvan hewl dide pisporî û bîrtûjî û nerîna xwe nîşan bide, bi awayekî ka gelo heta çiqasî dikare bandorê li ser xwîner pêk bîne. Jixwe eger helbestvan nikaribe vê bandorê biafirîne, êdî guman tê de tune ku bîra wî kurtbîn bû û bi awayekî ji awayan nikarîbû armanca xwe pêk bîne.

((*Bîrokeya wêneyê jîriya ezmûnê ye. Di demekê de ku wêneya şiîrî hevtayê hunerî yê bîrokeyê ye, helbestvan hevkêşeyên bîrkarî diguhere û wan dike ezmûna şênber. Yanî helbestvan atmosêfra şiîrî bo wê bîrokeya zihnî ku dixwaze çareser bike peyda dike. Ev jî ew cudahî ye ku di navbera helbestvan û bîrmend de heye*))[76] Yanî wêne bi awayekî ronîdartir derdikevin û bi awayekî hêjatir û guncawtir di nava xwîner de cih digrin. Şêwaza belavkirina wê bi rêya wêne û muzîka şiîrî li ser nava mirov serdest dibe, bi mercekî ku ew wêne amaje bidin bîr û hestan û wan bi eşkereyî nîşan nedin, çimkî hêza helbestê di amajekirina bîrokeyan de bi rêya wêneyan şênber dibe, lê ne bi rêya ragihandina bîrokeyên petî û zêdegavî di wesfkirina wan de.

((*Bîr ew bîr û bawerî ye ku nivîskar dixwaze bigihîne xwîner, ev jî yekem hunera razîkirinê ye*))[77], ev bîr jî divê bi rengekî bedew û xemilandî bên nîşandan daku bêhtir bala xwîner bikşînin. Wiha jî wêne bi rengekî bihêztir derdikevin û bêhtir cihê xwe di dilê xwîner de digrin. (Rousseau) dibêje: ((*Eger xewnên min bibin tiştekî rasteqîn û hemû jî di realîteyê de pêk bên, ez hîn jî jê misoger nabim, lê ji wiha zêdetir hizr dikim xewnan bibînim, çimkî sînorê arezû û hewesên min tune, di derûna min de ez hest bi valahiyekê dikim herçiqasî tiştekî dikim dîsa tije nabe*))[78], lewma mirov hertim xewnên wî yên pir û xeyalên wî yên zêde hene, bi awayekî ji awayan şiyana têrbûnê kêm caran heye bigihe pîvanekê ku amajeya têrbûnê bike. Herwiha (Matthew Arnold) dibêje: ((*Di helbestê de bîr hemû tişt e*))[79], eger helbestvan bi bîrê

[76] Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 44.
[77] Şukriye Resûl, *Edebiyata kurdî û hunerên edebiyatê,* Çapxaneya xwendina bilind, Hewlêr, 1989, r. 11.
[78] Xorşîd Reşîd Ehmed, *Rêbaza romantîkî di edebiyata kurdî de*, r. 40.
[79] Hitler Ehmed Heme, *Wêneya şiîrî li be Nalî*, nameya master, koleja ziman, Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2001, r. 8.

rêbertiya şiîrê kir, bêguman wêneyên wê şiîrê bi şêweyeke bihêz derdikevin, çimkî şêwaza belavkirina wan cudatir derdikeve. (Bulsnkî) dibêje: ((*Huner bîrkirin e bi wêne*))[80], lewma dema mirov dixwaze karekî bicih bîne, berî destpê bike bi wêne ava dike piştre pêngavên pratîk diavêje.

Lewra jî em dikarin bêjin bîr rêgezeke sereke ya wêneya edebî ye bi giştî û wêneya hunerî bi taybetî, çimkî bîr jî wek hemû rêgezên din ên edebiyatê berpirs e ji bedewkirin û bihêzkirina wateya helbestê, divê bîr jî bi rengekî bedew û xemilandî bê nîşandan daku bêhtir bala xwîner bikşîne û bihêle ew bi coşdarî li nihêniyên veşartî yên di tekstê de bi hûr û gir bigere. Çiqasî teknîka bîrê jî hûrbîn be bêguman nihêniyên zêdetir vedihewîne, wê çaxê divê xwîner bi zîrekî bi wêneyên tekstê re tevbigere. Her teksteke edebî berhemê bîrê ye, çimkî tu tekst nikare li derveyî sînorên bîrê pêk bê, çimkî tiştek ji nebûniyê pêk nayê eger hokarek nebe bo pêkhatina wê. Li vir tecrûbeya helbestvan bi rolekê radibe û nabe kesekî ku tecrûbe û paşxaneke wî ya dûr û direj hebe bi kesekî ku nû dest bi nivîsandina helbestê kiriye di yek terazîyê de hevseng bên dîtin. Lewma bîr pêkhênerekî girîng ê wêneya hunerî ye, ev jî du cureyên bîrê vedihewîne:

1. ((*Bîrê giştî ku di mejiyê hemû mirovekî de kom bûye wek felsefe û lojîk û civaknasî ku ev ne mebesta helbestvan e, lê dibe ku cureyê duyem mebesta helbestvan be.*

*2. Bîrê îdeolojîk ê hunermend. Îdeolojiya hunermend di wêneyên beş beşî de rêbaza xwe werdigre. Ew wêneyên beş beşî kamil dibin û di çarçoveya yekîtiyeke organîk de bîra giştî ya hunermend derdikeve*))[81], lê ((*divê em agehdar bin ku pêwist e wêne bi bîrên pir giran an tîr neyên barkirin, çimkî dibe sedemê felcbûna wêne herwekî çawa hestê pir lawaz dike*))[82], dema hunermendekî wênekêş tabloyekê dikşîne bi awayekî hemû pêdiviyên kişandina tabloyê li berdestê wî ne û wênekêş dikare beriya destpêkirina tabloyê wêneya tabloyê di mejiyê xwe de afirandibe, lê ya girîng ew e ku nabe wênekêş ji pêwistiya tabloyê zêdetir boyaxê bikar bîne, çimkî

---

[80]Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 83.

[81]Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Salih de*, nameya doktora, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r. 25.

[82] Ebdullah Esaf, *Wêneya hunerî di helbesta pêşbînîker de*, cildê 1, Çapxaneya Dîcle, Sûriyê, 1996, r. 39.

dibe sedemê qerebalixî û tîrbûn an himbiz bûna tabloyê û di encamê de jî tablo nirxê xwe ji dest dide, lewra divê malzeme li gor pêwist bên bikaranîn. ((*Dîroka edebiyata mirovatiyê mişt e bi wêneyan, bi taybetî jî wan wêneyan lixwe digre ku meseleyên zindî yên mirovatiyê di wan de şênber bûne. Herçiqasî navê vê rêgezê kirine (ne şiûrî-derhişî) jî, lê bilindî û meziniya helbestê bi vê rêgezê pîvan kirine, çimkî ezmûna helbestê bêyî bîrê dibe têkilheviyeke şewişî ku tu rêxistin tê de tune*))[83]. Şiûrî be yan derhişî be wiha li xwe kiriye payebilind be çimkî di nav hemû tekstên bedew yên edebî de hebûna xwe selmandiye û bedewiyek diyarî derdora xwe kiriye û ew bedewî jî li ba xwîner hest pê tê kirin.

### 1.3.4. Endîşe (xeyal)

Endîşe diyartirîn û belavtirîn rêgez e ji rêgezên wêneya hunerî. Gelek pisporên edebiyatê di wê baweriyê de ne ku, wêneya hunerî li ser endîşe tê avakirin. Çimkî têkilkirin û kartêkirina hunerî ya rastî bi xeyalê re ye bi armanca pêkanîna bandorê li ser derûna aliyê beramber. Bi baweriya (Aladîn Secadî), ((*Endîşe ku xeyal e, ne guman û tesîreke tûj û derbasbar a nihênî ye di dil de yan ne hêzeke nihênî ye, tapoya wan bîranînan dihêle ku hokarên wan winda bûne. Bêguman eger endîşe nebe, karê beyan û edebiyatê radiweste. endîşe bûye stûneke herî mezin a edebiyatê, tew eger endîşe nebe peyv nikare wêneya hunerî bikşîne û tijî bike*))[84], lewma endîşe wek giyan e bo helbestê. Endîşe hêz û şiyaneke bêsînor dide helbestê. Jixwe eger endîşe di helbestê de nebe, ew hemû peyvên bedew ku bo wesfê helbestê tên bikaranîn nabin. Çimkî ew hêz kapasîteya wê ewqasî pir e ku mirov bi ber her peyvek yan teksteke şiîrî ve bike, dê bibe xwediyê giyanekî saxlem û bi awayekî bi lez geş bibe. ((*Endîşe hêzek e ji hêzên derûna mirov. Wêjer bi rêya wê dikare bi peyvan û hevokan wêneyên hunerî û şêwaza rewnabêjî saz bike û soz û hilçûnê di babetekê de bigihîne guhdar û xwîner*))[85], çawa di şevê de heyvê bedewî û girîngî û taybetmendiya xwe heye, bi şêweya xwe ya sihrbazî jî dema ku derdikeve erdê rewşen dike, bi heman şêweyê jî hebûna endîşe di helbestê de giranî û girîngiya xwe

[83]Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Salih de*, nameya doktora, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r. 25.
[84] Aladîn Secadî, *Edebiyata kurdî, lêkolîn li ser edebiyata kurdî*, r. 78.
[85]Dr. Kamîl Hesen Besîr, *Rexnesaziya pêrewkirina dîrokê*, Çapxaneya Korra Zanyarî ya Iraqê, Bexda, 1983, r. 159.

heye û çêja xwîner bo tekstê zêde dike û hemû bedewiyên têkstê pê dide naskirin. Nabe ew yek jî ji bîra me here ku ((*helbestvan xewn û xeyal û endîşeyan wek cîhanekê dibînin ku mişt e bi wekhevî û hezkirin û biratî û lêborînê. Di cîhana wan a rasteqîn de û di realîteyê de ev tişt pêk nayê, lewma helbestvan bi neçarî berê xwe didin xewn û xeyalan û wan dikin alternatîfên realîteyê*))[86], gava mirov di xewn û xeyalan de dijî bi berdewamî endîşeya xwe bo nerînên bedew û xemilandî alî dike, dûr ji jiyana realîst a bi xirecir ku tê de dijî, lewma pir caran tê gotin jiyankirin li nav dinyaya xeyalan tam û çêja xwe ya taybet heye. (Cabir Ehmed Isfûr) dibêje: ((*Yek ji taybetmendiyên endîşeya helbesta resen, ji têkşikandina sûra hestpêkiriyên me yên naskirî pêk tê. Herwiha wiha li me dike em hest bi wê yekê bikin ku her tişt ji nû ve destpê dike û her tişt wateyeke bê mînak ji nûjenî û resenatiyê bidest tîne*))[87]Lewma jî endîşe yek ji rêgezên wêneya hunerî ye û mecalekî berfireh di dinyaya edebiyatê bi giştî û helbestê bi taybetî de dagîr dike. Ji ber girîngiya statû û rola wê, gelek lêkolîn li ser hatine kirin ((*endîşe wek malzemeya xemilandina teksta helbestî tê hejmartin. Çimkî zimanê endîşe heman zimanê nazik ê helbestê ye. Lewma helbesta bedew hertim fêkiya endîşeya bedew e da bikare çêja hunerî ya bedew bide, yanî di warê helbestê de xewn û endîşe du qutbên girîng in. Proseya endîşe bêhtir li pey bîrkirina mirov tê danîn û di vê rewşê de qaseya zimanvanî yan qaseya peyvan di mejiyê helbestvan de bandora xwe dike bo hilbijartina wêneyên bedew û sosret di xemilandina tekstê de*))[88], lewma çiqasî endîşe terr û teze be ewqasî karîgeriya ciwanî û nazikiya wê li ser helbestê diyar dibe, çimkî dema kesek bi wijdaneke mişt xeyal bîr dike, ewqasî zêdetir endîşeyên xeyalî berhem tê ta pileya bilind firrînê, wê demê hemû derdora xwe dibîne wek tîrêjek ronahiyê dide. Lewma dema behsa helbestê tê kirin nabe xeyal bê piştguhkirin, çimkî mîna rêgezên din rêgezeke girîng e di dariştina wêneya hunerî de.

Yanî ((*xeyal pêkhateya sereke ya wêneya şiîrî ye û em nikarin wêne bêyî endîşe bikşînin, herçiqasî karê wê bi pileya siruşta bilind be jî, dirustkirina wêneya şiîrî û ev mulkekî siruştî ye û em dikarin bi rêya ceribandinê demê vegerînin û wan dirust*

[86]Rêzan Mihemed Xefûr, *Rêbaza romansîzmê di şiîra kurdî de 1918-1945*, nameya master, Koleja Perwerde, Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2005, r. 112.
[87] Cabir Ehmed Isfûr, *Wêneya hunerî di kelepora rexneyî û rewanbêjî de*, Dar el Seqafe, Qahîre, 1974, r. 18.
[88]Rêzan Salih Mewlûd, *Hizrîna (endîşeya) şiîrî di navbera rêbaza klasîk û rêbaza romantîk ya kurdî de di Kurmanciya Jêrîn de*, Çapxaneya Şehab, Hewlêr, 2009, r. 104.

*bike û di wêneyeke şiîrî ya zindî de darêje*))[89], helbestvan dikare di dirustkirina wêne de penaya xwe bibe ba çavlêkirina xeyalî, lê deq bi deq çavlêkirin wek tiştê çavlêkirî nebe, bi şêweyek dikare sûdê jê wergire û di berhemên xwe de bi şêweyeke cudatir bikar bîne.

Lewma ((*xeyal yek ji wan malzemeyan e ku qet hunermend jê têr nabe, çimkî eger ne bi alîkariya xeyalê be, hunermend nikare nerîna xwe bo tişt û bûyeran di wêneyên bihêz û zindî de diyar bike*))[90] Hemû wêneyên bihêz û zindî di encama ((*Kombûna bandorên nestî (derhişî) de peyda dibin*))[91], wexta ew hemû bandorên derhişî di hundirê helbestvan de asê dimînin, her yek ji wan armanceke xwe heye, dûre ew hemû hestên derhişî yên ku asê mane di encamê de rastî teqînê tên û diherikin nav dinyaya helbestê bi giştî û dinyaya helbestvan bi taybetî. Êdî eger teknîka helbestvan di bikaranîna wan hestên derhişî yan nestan de bihêz bû, wê demê wêneyên bedew ji dayik dibin. Lê eger bi berevajî be wê demê şewişîna wêjeyî rû dide û ew hestên derhişî nikarin bi karê xwe yê realîst rabin.Lewra dema em behsa endîşeya şiîrî dikin, em behsa wan hest û sozan dikin ku di dilê her yekî ji me de asê mane, lê hest û sozên ku di dil û derûna kesê normal de asê mane, ji wan hest û nestên ku di dilê helbestvan de asê mane cuda ne, çimkî hest û sozên helbestvan geştir û bedewtir in dema ku konsepta endîşe tevlî peyvan dike.

Fîlosofê alman (Kant) guherîneke seranserî di konsepta endîşe de pêk anî dema ku ((*Endîşe wek bilindtirîn şiyana mirov hesiband ku tu şiyaneke din nikare şûna wê bigire*))[92], herwiha dibêje: ((*Xelkê pir kêm qedr û metirsiya endîşe fam kirine. (Kant), dema xeyalê lêkolîn dike sê astan cuda dike.*

*Yekem – Endîşeya peydaker ku dûre Coleridge wek texmîn binav dike.*

*Duyem – Endîşeya berhemhên ku li hember endîşeya sereke ye li ba Coleridge ew pir e ku di navbera cîhana bîr û cîhana tiştan de ye.*

---

[89]Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 57-58.
[90] Mihemed Kurdo, *Lêgerîna li helbest û cudahiyê*, r. 42.

[91] Laurence Perrine, *Helbest çi ye*, w: Ebûbekir Xoşnaw, Çapxaneya Pîremêrd, Silêmanî, 2008, r. 33.

[92]Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 70.

*Sêyem – Endîşeya estetîkî, ev jî berhemhênek e bi cîhana ezmûna hestewerî ve ne girêdayî ye.*))[93]

Lewma jî Coleridge endîşe dabeşî du cureyên sereke dike:

**Endîşeya sereke**

((*Ev endîşe hemû mirov tê de hevbeş in. Ev endîşe pir serdest e li ser helbestên hemû helbestvanên afirîner, çimkî di bîrkirineke azad de ye, dûrî ji dem û cih û pişta xwe bi destûra (brainstorming-lehiya mejî) girêdide*))[94], ev cure endîşe bêhtir dikeve xaneya hestan û zanyarî kom dibin, di heman demê de jî der-îradî ye, ew bixwe nikare zanyariyan kom bike, lê tenê ew çavkanî ye bo komkirina zanyarî û hestan.

**Endîşeya ne sereke**

Li ba Coleridge ((*taybet e bi warê afirandinê di warê helbestê de, lewra ev cure endîşe wek endîşeya (estetîkî) jî tê binavkirin*))[95] Diyar e ev cure endîşe bi wê yekê ji endîşeya sereke cuda dibe ku ev taybetmend e bi helbestvanên bilîmet û dahêner û ya din bo hemû mirovan e, lewma endîşeya ne sereke bi temamî xwe ji endîşeya sereke venaqetîne, ((*yanî ew endîşeyên ku Coleridge wan diyar dike bi xwe binyatên wêneya helbestî ne, yanî endîşeya ne sereke ew hêz tê de ye ku bi rêya wê wêneyeke diyarkirî yan hesteke diyarkirî ber bi wê yekê here ku komek wêne û komek hest di tekstekê de kom bike, tew wan di nav hev de jî bihelîne*))[96]

---

93 Jêderê Berê, r. 71.

94 Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 57-58.

95 Kemal Memend Mîrawdelî, *Felsefeya bedewiya hunerê (estatîka)*, Çapxaneya Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 1979, r. 265.

96 Binere li: Rêzan Salih Mewlûd, *Hizrîna (endîşeya) şiîrî di navbera rêbaza klasîk û rêbaza romantîk ya kurdî de di Kurmanciya Jêrîn de*, Çapxaneya Şehab, Hewlêr, 2009, r. 40.

### 1.3.5. Realîte

Mirov li her qorziyeke vê dinyayê be û jiyanê bike rastî çend bûyerên xweş û nexweş tê. Ev bûyer rasterast ji civaka mirov, ji realîteya ku tê de dijî bingeh digrin. Êdî hinek ji wan bûyeran xweşiyê ji mirov re di afirînin û mirov ji xirecirî û reşatî û xirabiya rewşê dûr dixin. Hinek bûyerên din jî ji wan bûyerên ku mirov rastî wan tê, mirov tûşî şewişîna derûnî û reşbînî û ne aramiyê dikin, çimkî hemû bûyerên ku tên serê mirov, civak bi xwe çavkaniya wan e,

(Hisên Arif) dibêje: ((*Her edîbek berhemên wî heta radeyekê rengdana jiyana wî bi xwe ye*))[97], lewma dema helbestvanek yan wênekêşek wêneyekê diafirînin eger ji sedî sed ne rengdana hundirê wan jî be, bêguman çavkaniya wê di civaka wan de ye. Ji ber ku helbestvan jî beşek ji civakê ye û wê demê hevkêşe hevseng dibe, yanî nabe tu demê helbestvan rola realîteyê ji bîr bike. Helbestvanekî mîna (Ebdulla Peşêw) dema dîwana Birakujî afirand, hemû helbestên wî ronahî dixistin ser wê rewşa têkçûyî û xirab ku kurdên Başûrê Kurdistanê wê çaxê tê de derbas dibûn. Lê dîsa jî ((*Realîte bi tena ser*ê *xwe nikare di ser helbestê serdest be, lê rengdanê di nava helbestê bi xwe de berçav dike.*

*Bi vî rengî helbest bi xwe di navenda hêla navbera helbestvan û realîteyê de ye û helbestvan bi rêya helbestê bandorê li ser peyamwergirê xwe dike bi saya wê bîr û çêja hunerî ku diyarî wî dike*))[98], lewra di vê rêgezê de jî çiqasî paşxan û teknîka helbestvan dewlemend û bihêz be, ewqasî şiyana wî heye peyama xwe bigihîne derûna xwîner û xwîner bide axaftin yan bi rengekî ji rengan şiyana wî hebe bandorê li ser xwîner pêk bîne, çimkî çiqasî wêneya hunerî di dinyaya helbestê de girîng e, ewqasî jî ferheng û paqijiya ziman û teknîka helbestvan girîng e, ((*Herçiqasî dibêjin divê helbest ligel xeyalê bê tevlîhevkirin, lê pêwist e realîte tê de reng bide. Bedewkirin û mezinkirina realîteyê jî pişta xwe bi xeyalê girêdide, bi rola bedewkirina tiştên realîst radibe, yanî herçiqasî xeyal û realîte du tiştên hevdij bin, lê di aliyê bandora edebî de mil bi milê hevdu diçin û wêneyên şiîrî yên bedew dirust dikin*))[99], ((*Çimkî bikaranîna xeyalê aliyekî din ê karên edebî ye, nemaze di*

[97] Hisên Arif, *Koktêl*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2005, r. 266.
[98] Adil Mecîd Germiyanî, *Wêneya babetî di helbestên Goran û Seyab de*, r. 103.
[99] Seid Farûq Yûsiv Şêx Bizênî, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Ehmed Muxtar Caf*, Çapxaneya Rewşenbîrî ya Hewlêrê, Hewlêr, 2011, r. 159.

*berhemên helbestî de, hokarek e ji wan hokarên ku bedewiyê dide wêneya helbestî*))[100]

((*Lewma mirov û realîte du hokar in bandorê li hevdu dikin. Mirov bandorê li realîteyê dike û wê diguhere û realîte jî bandorê li mirov dike. Lewma helbestvan jî wek kesekî hestyar ê nav civakê û ew realîteya ku tê de dijî hest pê dike û bi wêneyên şiîrî ji me re dikşîne. Helbestvan girêdayî realîteyê ye û jê cuda nabe û nikare dev jê berde, lê dikare wê biguhere. Helbestvan di helbestên xwe de wêneya hundirê xwe ji me re dikşîne derbarê wan tiştên ku di realîteyê de gotine yan hêvî ji wan xwestiye*))[101], lewma ((*çawaniya tevgera helbestvan bi realîteyê re ne bi rengekî sade ye, çimkî erkê wî bi tenê di wê yekê de ranaweste ku wêneyeke dubare ya realîteyê ji me re digre, yanî pêwendiya realîte û wêne pêwendiyeke dualî ye, çimkî eger realîte nebe wêne jî nabe, lewma hinek kes dibêjin: wêneya hunerî şêweyeke taybet a rengdana giştî ya cîhanê ye*))[102].

bi awayekî giştî em dikarin bêjin ku helbestvan û hunermendê wênekêş heta radeyekê dikevin bin bandora realîteyê û ev bandor di berhemên wan de reng dide, lewma (Horas) dibêje: ((*Helbestvan û wênekêş di serbestiya dahênanê de mafê wan wek hev hebû*))[103], helbestvan bi arezûya xwe yarî di nav wê realîteyê de kiriye ku tê de jiyaye, sûd ji qencî û xirabiyên wê realîteyê dîtiye, wênekêş dema destê xwe daye firçeyê sînorê hemû rengan têkşikandiye bi arezû û teknîka xwe yarî bi rengan kiriye, lê nabe em bêjin ku helbestvan û wênekêş siruşt wek ku heye kopî kirine û di berhemên wan de reng daye, lê em dikarin bêjin kêm zêde wan sûd ji siruştê dîtiye bo bedewkirin û geşkirina berhemên xwe.

Dema helbestvan yan wênekêş sûdê ji realîteyê werdigrin bi destkarî, bi vê yekê wêne bêhtir geştir û birîqedar dibe, çimkî bi tevlîhevkirina realîte û wan hest û sozên ku di hundirê wî de asê mane, şiyana wêneyê ya xwe guncandina ligel her dem û heyamekê heye, wêne neynika rewş an realîteya civakê ye û bandora wê girêdayî wê yekê ye pêwendiya wê bi realîteya rasteqîn re heye. Dema ku dibêjin divê helbest

---

[100] Fûad Qeredaxî, *Riwangeh û şîroveyên kor, riwangeh yar û nayarên wê,* amadekirina Hisên Arif, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2005, r. 144.
[101] Tariq Salih, *Wêneya hunerî di hinek helbestên Goran de,* Kovara Raman, hejmar 199, 2013, r. 64.
[102] Hitler Ehmed Heme, *Wêneya şiîrî li ba Nalî,* nameya master, koleja ziman, Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2001, r.6.
[103] Horas, *Hunera şiîrê,* w: Hemîd Ezîz, Çapxaneya Zeman, Bexda, 1979, r. 15.

ligel xeyalê bê têkilkirin, lê pêwist e jî realîte tê de reng bide. Yanî herçiqasî xeyal û realîte du tiştên hevdij in, lê di aliyê karê edebî de mil bi milê hevdu dimeşin û wêneyên hunerî yên bedew dirust dikin, çimkî helbestvan nikare behsa tiştekî realîst bike lê xeyalê tê de bikar neyîne, çimkî di helbestê de bikaranîna xeyalê bedewiyê dide helbestê ku ev jî aliyekî din ê edebî ye. Ji ber ku di dinyaya helbestê de çiqasî girîngî bi xeyalê bê dayîn, helbest ciwantir derdikeve.

### 1.3.6. Nest (jêrhiş- subconscious)

Em dikarin nest wek banka komkirina wan zanyarî û wêneyên ku ji hêla beşên hestewerî tên arastekirin bi naw bikin, bi awayekî ku her yek ji wan hestan li gor girîngî û bikaranîna wan wêne araste dikin. Ew hemû tiştên ku li derdorê ne ku mirov wan dibîne yan wan dibihîze yan wan tam/çêj dike, rasterast di nest de kom dibin yanî ((*Nest bingeha binyatkirina her dahênaneke hunerî ye*))[104].

nest dikare rêbertiya wan hemû wêneyan bike ku ji binhişê helbestvan derdikevin di dema derketina wan de bi sedan wêne tên rêzkirin. Lewma eger wêne di binhişê helbestvan de nebe, bêguman şiyana wî ya dirustkirina wêneyên hunerî nabe, çimkî ew hemû helbestvanên ku şiyana wan a dirustkirina wêneyên bedew û ciwan hene, ((*Jiyana wan tije ye bi karesat û îşkence û girî û ken. Helbestvan rêbwarek e, di tûrikê dil û derûna wî de bi sedan wêneyên cuda cuda û bîranîn hene*))[105], lewra nest rêgezeke din e ji rêgezên wêneya hunerî û nabe rola wê bê piştguhkirin. Hinek rexnegir nest wek bibandortirîn rêgez ji rêgezên edebî dijmêrin.

(Mihemed Xenîme Hilal) dibêje: ((*Her wêneyek di dahênana hunerî de, kok û rihên wê di cîhana nest de heye. Çimkî li pişt wê çirûska ku em di derûna xwe de hest pê dikin, warekî tarî heye ku tije ye bi diyardeyên derûnî tije ye û ji xeynî rengdana wê ya aloz, em tiştekî derbarê wê nizanin*))[106] Diyar e hokarên derûnî girîng in bo arastekirina mirov bi rêyên hestewer bi giştî û nest bi taybetî. Nest wiha li mirov dike cudatir tevbigere, lewma ew hemû wêneyên ku me bi dirêjiya jiyanê dîtine û wan dibînin bûne gencîne. Dema di temenê zaroktiyê de arezûya me lîstikeke zarokane

---

[104] Kejal Heme Emîn Ehmed, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Ferîdûn Ebdul Berzencî de*, nameya master, Koleja Ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, 2010, r. 108.
[105] Muhsin Aware, *Rengdana wêne di helbesta nû ya kurdî de*, Kovara Roşinbîrê Nû, hejmar 75, 1979, r. 63.
[106] Dr. Mihemed Xenîmî Hilal, *Rexneya edebî ya nûjen*, r. 371.

bû, lê bi her awayekî ji awayan me nikaribû çêja xwe bi rêya lîstikê têr bikin, vê têrnebûnê di nesta me de cihek dagîr kiriye, ev cih dagîrkirin jî girêdayî têrnekirina çêjê ye. Lê mabûna wê jî bi piranî girêdayî têrnebûnê ye. Jixwe eger bihata û me ew çêj tam bikira, gumana mabûna wêneyê nedima yan eger bimaya jî qelstir dibû, yanî em dikarin bêjin ew wêneyên ku şiyana wan a mabûnê di nesta mirov de heye, ew in ku mirov negihîştiye wan, herçiqasî hest û xewndîtin dîmenên cuda cuda bêhtir di bîrdankê de asê dimînin, heta wiha lê tê ew hemû hest û sozên asêmayî wek volkanê diteqin, wêneyekê berhem tînin ku dikare sînorên wêneya hunerî têkbişkîne. ((*Cîhana wêneya hunerî ne hevawayê cîhana nest e, lê wêneyeke afirandî ye, tevî ku berdewamiya daxwazên mirov e bo cîhaneke baştir, wêne nest derbas dike, eger na mirêkek e reng bi şewişîn û dudilî û xewnan dide, lê ne wêneyeke afirandî ye*))[107]

Cîhana nest ne destçêkirî ye û bi şêweyekî ye mirov nikare nest berhem bîne. Lê nest cîhaneke derhişî ye, bêyî ku mirov hebûna wê kifş bike, wek tevzînokekê di laşê mirov de digere heta digihe cihê xwe. Lê wêneya hunerî bi hest û sozên hundirê helbestvan tê dirustkirin. Ew nesta asê mayî wiha dike ku nerîna helbestvan ji kesên normal cuda be, lewma.

((*Nest bi nediyarî di derûna helbestvan de dimîne û dernakeve heta di wêne de şênber dibe. Lewma divê helbestvan jî şiyaneke wan a bilind hebe daku wan di bedewtirîn teşe de şênber bikin. Wêneya şiîrî sînorê tiştan dikşîne û ji kûrahiya derûn rastiyên veşartî dertîne. Wêne derbirîna derûna helbestvan e û bi wan wêneyan dibe ku di xew de bên dîtin*))[108], piraniya wan xewnên ku mirov wan di xew de dibîne, ew nestin ku di jiyana rojane ya normal de endîşeya wî diçe ser wan, lê nagihe wan û di encamê de ew negihîştin wiha li mirov dike bi berdewamî li wî tiştî bifikire heta di xew de, eger bo demeke kurt jî be digihe wan, kêm zêde derûna xwe bi xewê û bûyerên nav xewê aram dike, ango xewndîtina helbestvan jî ji ya kesên normal cuda ye, lewma dibe ku di xew de jê îlhama şiîrî ji helbestvan re bê, çimkî çavê helbestvan rojane wêneyan digre û wan dişîne bo nest, dema helbestvan ji derdorê vediqete dîsa bi rêya nestê wêneyên şiîrî dertên meydanê.

---

[107] Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 52.

[108] Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 90.

(Freud) dibêje: ((*Wêneya şiîrî sembolek e sermiyanê wê derhişî ye. Diyar e sembol jî dewlemdntir û rewantir û bibandortir e ji rastî û realîte ji dastan û hîkayet û efsane û gotinên pêşiyan û hemû cureyên edebiyata gelêrî derdikeve*))[109], eger sermiyanê helbestê derhişî be, êdî dikare şoreşa şiîrî pêxîne çimkî şiîr bi rêya derhişî hest bi bedewî û bihêziya peyvên helbestê tê kirin, ew giyanê wê bi zindîtî dihêle ((*Her wêneyek di dahênana hunerî de kok û rehên wê di cîhana nest de ne*))[110], lewma ew wêneyên ku bi nestan hatine barkirin, xwedî sihreke taybet in. Psîkolog dahênana hunerî bi nestan girêdidin, û bawer dikin ku wêneyên şiîrî bîranîneke kevin e û ne merc e ew wêne bi dîtinê be. Xeyal jî rêyek e diçe nav mexzena nestê, her bi vê rêyê helbestvan dikare hinek wêneyên di mexzena nestê de bîne pêş çav, endîşe jî di bedewkirina van wêneyên nestî de bi rolekê radibe. Helbestvan Goran derbarê helbesta Geşta Hewraman dibêje: ((*Ev gername ji Helebce destpê dike û ne tenê dîtin û bîrhatinên yek geştê ne, lê hest û xewndîtina çend geştên dem û demsalên cuda cuda yên berê ye ku di bîrdanka me de asê mane*))[111].

### 1.4.Wêneya hunerî di helbesta kevin û nû de

Wêneya hunerî wek yek ji pêkhateyên girîng ên binyata helbestê tê hejmartin. Wêne di helbestê de ne tiştekî nû ye, ligel hestpêkirina mirov bi helbestê yan ji wexta ku îlhama şiîrî jê re hatiye û şiîr hûnaye wêneya şiîrî hebû. Lê di helbesta kevin û nû de cuda bû yan helbestvanekî di serdema klasîk de dibe ku wêne û sembolên bedewtir û hêjatir bikar anîbe li gor helbestvanekî ku di serdema nû de helbest nivîsiye. Ev jî girêdayî paşxan û berfirehiya bîr û baweriyên helbestvan bixwe ye. Lewra em hemû dizanin ku di dîroka edebiyatê de helbest beriya hemû cureyên din bû. Çimkî ew hêza wê hebû ku hestên mirov bilivîne û mirov noqî şepêlên bêrehm ên helbestê bike.

((*Lewma pêwist e li gor qonaxa dîrokî bê temaşekirin, heke na nirxê xwe yê civakî û dîrokî ji dest dide*))[112], yanî dikare bi qasî dîroka xwe rêz lê bê girtin û bê

---

[109] Jêderê Berê, r. 90.
[110] Dr. Mihemed Xenîmî Hilal, *Rexneya edebî ya nûjen*, r. 372.
[111] Mihemed Mela Ebdilkerîm, *Dîwana Goran*, cildê 1, Çapxaneya Komeleya Zanistî ya Iraqê, Bexda, 1980, r. 127.
[112] Îsmaîl Tenya, *Wêneya şiîrî*, Kovara Karwan, hejmar 11, 1984, r. 58.

temaşekirin, helbest û jiyana civakî du tiştên bi hevdu ve girêdayî ne û bandora wan li ser hev heye, bi awayekî ew hemû bûyerên ku di helbestê de tên dîtin, ew civaka ku helbestvan tê de dijî havênê wêneyên şiîrî yên helbestvan e. Lewra her serdemekê li gor bîr û baweriyên helbestvan û rexnegir û lêkolînvanan behsa wêneyan kirine û ew lêkolîn kirine bi awayekî ew şiyana wan hebû helbestên baş û xirab diyar bikin û piştevaniya helbestên baş bikin û planên kêrhatî bo baştirkirina helbestên xirab deynin. Di encamê de nirxên wan ên estetîkî nîşan dane.

Di helbestên kevin de, bi piranî helbest li ser kêşa aruza erebî nivîsîne. Bi baweriya helbestvanên kevin, eger helbest li ser vê cure kêşê neyê berhemanîn, tu bedewiyek di helbestê de nayê dîtin, tevî ku bedewî yan kirêtiya helbestê bi vê pîvanê ne zêde zanistî ye. Ew di wê baweriyê de bûn ku kêşa irûz tekane zanista estetîka helbestê bû ku helbestvanan bikar aniye berevajî helbesta nû, di helbesta nû de helbestvanan ew qeyd û bendên irûzî yên klasîk têkşikandine û helbesta serbest û kêşên xwecihî bikar anîne ((*wêne pîvaneke rexneyî ye bo nirxandina helbestê û divê rexnegir vî tiştî piştguh nekin, ku serkeftîtirîn helbestvan li ba min ew e ku barê wêneyên xwe yên hunerî bi ciwankariya peyvan giran neke*))[113], bikaranîna peyvên giran hokar e bo bedewiya helbestê, lê bedewî di helbestê de girêdayî zimanê helbestê û teknîka helbestvan û jîngeha helbestvan e. Lewma nabê eger giranî û bîr alozî tev lî peyvên helbestê hat kirin em bêjin dê helbesteke kemilî be. Lewra di kevin û nû de girîngî bi helbestê hatiye dayîn, lê em ê ji çend aliyan ve cudahiyên wan berçav bikin.

### 1.4.1. Wêne di helbesta kevin de

Rast e rexneya kevin girîngî daye wêneyê û lêkolîn kiriye, lê di nav xeleka teşe û naverokê de maye. Hinek ji wan hîm û binemaya karê edebî di wateyê de dibînin û hinek jî di peyvê de dibînin. Wêneya hunerî di helbesta klasîk de, di binyata helbestan de bi roleke berçav radibe, herwek (Mamoste Mesûd Mihemed) dema behsa wêneya şiîrî li ba (Nalî) wek mînakeke klasîk dike, dibêje: ((*Nalî û tevî belavkirina reng û bêhna beheşta helbestê bi rûyê me de, wêneyeke hunerî ya wiha jî ji durr û gewherên peyv û hevrîşma hûnandinê nexşandiye, hevtaya tabloyên*

[113] Kamil Besîr, *Binyata wêneya hunerî di helbesta erebî de*, Bexda, 1987, r. 35.

*resamên mezin ên cîhanê ye, Kurd kesî wan nebû bi (firçê) wêne bikşîne, Nalî hat û helbesta wênegirî danî*))[114].

yanî helbestvanên me yên klasîk di vê hunerê de destekî wan ê bilind hebû. Ev rêçik jî bi dirêjiya qonaxên helbestê nehatiye girêdan û ber bi pêş ve çûye ((*di helbesta klasîk de, wêne di sînorê xêzê de asê mabûn, ji xêzekî derbasî xêzeke din nebûye yanî wêne bi piranî tekane bûn û hemûyan bi hev re wêneyeke giştî pêk dianîn. Li ba helbestvanê kevin wêne ne girêdayî hev bûn, wek ku armanca wî tenê ew be ku wêneyan biafirîne. Di edebiyata klasîk de, li gor şêwazeke şênber wêne hûnandine ku ji hunerên rewanbêjî derbas nekirine yan em çend wêneyeke kêm û dubarebûyî dibînin*))[115], lewma wêneya hunerî di helbesta klasîk de xwe bêhtir li gor rewanbêjiyê dibîne wek amrazeke xemilandin û bedewkirina metinê û hokarek bo armanca helbestvan dihate temaşekirin. Ji aliyekî din ve jî, eger em bala xwe bidin wêneyên di helbesta klasîk de, em ê bêhtir aliyê hestewerî bibînin lê ne aliyê jîrî yan zihnî, lê ((*Eşkere ye ku wêne ne jidayikbûyê serdemeke diyarkirî ye ku xasiyetên wê serdemê bibin sedemê derketina wê û ligel bidawîhatina wê, xasiyetên wê jî nemîne*))[116], wêne ne girêdayî ye bi serdemekê, lê bi tesîra jiyanê wêne ji serdemekê heta serdemeke din rastî guherînê tên. Guherîn jî di naverok û teşeya peyvên di metin û di helbestan de tê dîtin, wek mînak dibe ku helbestvanekî peyvek bi şêweyekê bikar anîbe ku helbestvanekî din bi şêweyeke din bikar anîbe, di her yekê ji van bikaranînan de jî sihra peyvê cuda bûye. Di wêneya kevin de helbestvan bêhtir ber bi derbirîneke petî ve diçûn ku wêne tê de kêm be, da ku bêhtir çêjê bigihîne eql neku xeyalê.

(Plato) jî di wê baweriyê de bû ku nabe helbestvan xwe radestî xeyalê bike, çimkî xeyal wî şaş dike, lewma wî di Komara xwe de helbestvan rexne kirine, tew ew ji komara xwe dersînor jî kirine. Plato bawer dikir ku ew helbestvanên ku xeyal rêbertiya wan dike, bi berhemên pûç û hîç derûna xwîneran têk didin, lewra dozê li hunermend û helbestvanan dike ku xwe teslîmî eql bikin û eql rêbertiya wan bike.

---

[114] Mesûd Mihemed, *Çepkêk li gulzara Nalî*, Weşanên Aras, Hewlêr, çapa 2, 2007, r. 121.
[115] Şino Mihemed Mehmûd, *Rola Siwareyê Îlxanîzade di nûgeriya helbesta kurdî de*, Çapxaneya Çarçira, Silêmanî, 2007, r. 162.
[116] Kejal Heme Emîn Ehmed, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Ferîdûn Ebdul Berzencî de*, nameya master, Koleja Ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, 2010, r. 102.

Di kevin de wêne xwe tenê di hunerên rewanbêjî (şibandin, metafor) de nîşan dida û pişta xwe bi pêwendiyên wek lihevçûn û pêwendiyên metaforî girêdida ku dûr bûn ji liberçavgirtina rewşa derûnî û wijdanî ya helbestvan, yanî tenê girîngî dida wêneyên hestewerî û wesfkirina pêwendiya navbera şibandî û pêşibandî ((*Helbestvan dixwest ku wêneyeke hestewerî ya hevtayê wî tiştî bîne. (Mihemed el Welî) derbarê guhastina peyvê ji wateya wê ya ferhengî bo wateya metaforîk*))[117], bêguman di kevin de girîngiyeke mezin bi wêneyan hatiye kirin û helbest jî vê rastiyê piştrast dikin, çimkî dema mirov helbestên klasîk dixwîne yan guhdarî dike, çend wêneyên bedew û balkêş xwe nîşan didin bi awayekî ku hemû ji çavkaniyeke sazkar dizên ((*Rast e rexneya kevin girîngî daye wêneyan û lêkolîn kirine, lê di nav xeleka têşe û naverokê de asê maye. Hinek ji wan hîm û binemaya karê edebî di wateyê de dibînin û hinekên din di peyvê de dibînin. Beşekî din bi eynî çavî li peyv û wateyê dinerin. Di wê baweriyê de ne ku girîngîdana bi wêneyê di wê bedewiyê de ye ku di kêşeya peyv û wateyê de pêk tê*))[118], helbest di hemû serdem û sedsalekê de ne mîna hev e, ne rawestiyayî û bêdeng e, lê belê şiyana pêşketin û guherîn û nûbûnê tê de heye, lê di her dem û cihekî de bi nemirî dimîne, ((*Rexnegir, helbesthez û cemawer ew helbestên ku beriya niha hatine gotin û niha jî hîn tên gotin, li ser zemîna resentiyê hatiye dinyayê, helbestvanên nû navê helbesta (klasîk) li wan kirine*)) [119] Diyar e helbestvanên nû dema navê klasîk li ser wan ferz kirine, mebesta wan ne ew bû ku bihêzî û xweşiya helbestê kêm bikin yan bi awayekî ji awayan eybdar bikin, lê mebesta wan ew e ku di aliyê demê de maweyek di ser re derbas bûye û temenek peyda kiriye heke na helbesta klasîk li ba hemû edebdostan çi yên klasîk û çi yên nûjen nirxê xwe heye û tu kes wî mafî nade xwe ku ji qîmeta helbesta klasîk kêm bike.

Di wêneya kevin de, helbestvan li gor yasayên rewanbêjî wêneyên xwe yên şiîrî dadirişt, lewra pêkan bû xeyala hûrbîn a helbestvan bê dîtin, dema ku xeyala helbestvan jî dihat dîtin axaftina li ser naverokê yan li ser wateya resen a helbestê hêsantir bû çimkî yasayên rewanbêjî cihê xwe girtine. Wêneya kevin bi berdewamî

---

[117] Binere li Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Salih de*, nameya doktora, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r. 38.
[118] Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 38-39.
[119] Cemal Hebîb Allah, *Derwazeya şiîrnasînê*, Hewlêr, 2013, r. 10.

çavlêkirina hevdu bûn. Tenê di ziman de rastî guherînan hatine, yanî di naverokê de hemû li dora çend wêneyên diyarkirî dizîvirîn ((*Nerîna klasîkan bo wêne ji çêjwergirtina ji bedewiyê li ser aliyê hestewerî rawestiyabû, bi şêweyeke bedew ew hemû tiştên ku hestê aram dikin wesf dikirin û wêneya wan dikşand*))[120] Wek mînak Nalî dibêje:

Le hesret serûy qedit çawî Nalî

Dû cogeh bellku dû rûbare bê to[121]

Li gor vê helbestê, di helbesta kevin de (çav) bi cok û robar hatiye şibandin, lê di helbesta nû de Hêmin dibêje:

Leber derkî reşmalan debînî çaw kejalan

Dilan deben be talan kas deken kur û kalan[122]

Li gor helbesta nû jî (çav) bi jina bedew û şox û şeng hatiye şibandin. Çav bi rêya vê şox û şengiya xwe agir berdaye dilê xortan.

### 1.4.2. Wêne di helbesta nû de

Wêne di helbesta nû de temamkera wê cure wêneyê ye ku helbestvanên klasîk destpê kirin çimkî wêne her wêne ye, lê di du qonaxên cuda û di jîngehên cuda de, yanî ew qonax û jîngehên cuda dikarin bandorê li ser helbestvan û teknîka wî bikin. Lewma wêne di rexneya nû de berevajî ye û ne xemilandineke şênber e, lê erkê wêneya şiîrî ne xemilandin lê belê derbirîn e. Lewra jî pişta xwe bi şibandin û metaforan girêdide wek rêyekê da cîhana navxweyî ya helbestvan bibîne.

çimkî wêne di helbesta nû de ((*Dahênaneke pak a giyan e ji nêzîkbûna navbera du rastiyên dûr ji dayîk dibe, çiqasî ku pêwendiya navbera rastiyan ji hevdu nêzîk be, ewqasî wêne jî bihêztir û bibandortir dibe. Herçiqasî di helbesta nû de wêne ji hevdu dûr bin jî, helbestvan wan ji hevdu nêzîk dike, çimkî pêwendiyên navbera wan ne bi*

[120] Dr. Ebdilfetah Salih Nafi, *Wêne di helbestên Beşar Bin Berd de*, Çapxaneya Fikir, Oman, 1983, r. 77.
[121] Mihemedê Mela Kerîm, *Nalî ji kilaw rojney helbestên wî*, Çapxaneya akademya Iraqê, Bexda, 1979, r. 39.
[122]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. .

*rêya hestan, lê bi rêya giyan û endîşe tê dîtin*))[123], lewma nerîna rexneyê derbarê konsepta wêneyê ber bi pêş çûye ((*Lêkolînên rewanbêjî amaje dane siruşta xemilandina wêneya şiîrî li gor wê nerîna ku şêwaz û wêne du rêgezên derveyî karê edebî ne, rexneya nû jî girîngî daye wan pêwendiyên çalak ku wêne bi karê hunerî ve girê dide. Wêneya hunerî, ku (xeyal û derbirîna muzîkê ye) xeyalxwestin û şibandin û hemû hunerên metaforê lixwe digre, derbirîna muzîkê jî bingeha wê têkilbûna dengan û hevahengiya peyvan û hevokan e ligel wate ku derbirîn wan digihîne xwîner*))[124], yanî divê hemû peyv û dengên di helbestê de pêwendiyeke wan a bihêz û hevgirtî hebe bi rengekî li hevdu aliyabin ku cudakirina wan zehmet be.

((*Her wêneyek pêwendiya wê bi wêneyeke din re heye û pêwendiyeke organîk di tekstê de pêk tîne. Wêne di helbesta nû de ne berhema eqlê şênber e, lê endîşe bi rolekê tê de radibe*))[125], pir caran wêneya şiîrî di helbesta nû de nirxê wê ewqasî bilind dibe ku gelek caran li ba rexnegiran dibe hîm û binemayek bo rexnegirtinê. ( Zekî Mubarek) wêneya şiîrî wek bingehekê dibîne di rexneya helbestê de di navbera helbestvanan de, lewma dibêje ((*Wêneya şiîrî ew karê girtî yê helbestvan e ku bi cureyekê wesfa tiştên dîtbar dike, ku xwîner nizane helbestekê dixwîne yan li hember yek ji dîmenên hebûnê rawestiyaye. Dema wesfa aliyê wîjdanî dike, bi rengekî ku xwîner wiha xeyal dike ku bi xwe re diaxive, neku helbestê dixwîne*))[126], lewra gelek helbestvan di helbestên xwe de girêkên derûnî ku di hundirê wî de kom bûne bi helbestê vedike di demekê de ku xwîner nizane eslê bûyerê ji çi çavkanî girtiye, lewma bûyera di metinê de di rengê xelekeke girtî ku helbestvan bi xwe di navenda wê xelekê de ye, yanî bikaranîna wêne wek pîvaneke rexneyî di helbesta nû de ne karekî hêsan e.

Eger helbestvanê nû bi şêweyeke giştî li kêleka wêne, amraz û teknîkên din ên helbestê bikar bîne wê demê ((*Hinek ji rêbazên rexneya nû ya helbestê bi şêweyeke sereke pişta xwe bi wêneya şiîrî girêdidin, wek mînak helbesta suryalîst ji zincîr yan*

---

[123] Dr. Kemal Marûf, *Rexneya nû ya kurdî*, Silêmanî, 2007, r. 137.
[124] Kejal Heme Emîn Ehmed, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Ferîdûn Ebdul Berzencî de*, nameya master, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, 2010, r. 105.
[125] Dr. Mihemed Xenîmî Hîlal, *Lêkolîn derbarê ekolên helbestê û rexneya wê*, Çapxaneya el Nehze, Qahîre, r. 78.
[126] Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 30.

*xelekek wêneyan pêk tê*))[127], lewra jî li ba helbestvanê nû her ku diçe wêne derbarê xeyalê berfirehtir dibe û bi girîngî tê dîtin, peyvek dibe ku di xêzeke helbestekê de ji ber jêhatîbûn û bilindiya asta helbestvan bi şêweyeke wiha balkêş bê bikaranîn ku çend wêneyan pêşkêş dike û hemû berhemên astbilind li ser hêmayê tên avakirin.

Di helbesta nû de, tekeziya mezin li ser çêjwergirtina di metinê de tê kirin, lê ev di helbesta kevin de zêde li ber çav nayê girtin û helbestvanên kevin bêhtir li rastiyê digeriyan. Eger di helbestê de xeyalê rêbertiya helbestê kir, dikare piraniya sînoran derbas bike û bişkîne. Çimkî di hemû serdeman de xeyal faktorekî mezin bû ji bo bedewkirin û xemilandina helbestê, lewma hejmareke zêde ya helbestvanan berê xwe dane bikaranîna xeyalê. ((*Wêneya nû pişta xwe bi binemaya dirustbûna nimûneyê nû girêdide. Wêneyên şiîrî li ba helbestvanê nû bêhtir bi rêzkirî tê xwarê û pêwendiyeke bihêz jî di navbera wêneyan de heye, dixwaze yekem tişt wêneyên nû bi hev ve bike û duyem tişt ew wêne bibandor bin û girêdayî hev bin*))[128], şoreşa helbesta azad şoreşek bû bi wêneyên hunerî hate pêkanîn. Di helbesta nû de, helbestvan wêneyên wan tiştan dikêşe ku girîngî bi wan dide.

### 1.5.Çawaniya dirustbûna wêneya hunerî

Wêneya hunerî ji aliyê malzemeyê ve pêkhateyeke zimanî û hunerî ye. Rêgezên wêneya hunerî ku me li jor girîngiya her yekê ji wan şîrove kir û beşekî sereke û bingehîin ku di naveroka wêneya şiîrî de bi roleke berçav radibin, ji xeynî wan çend rêgezên din hene wek (wêne-babet-muzîk), her yek ji van rêgezan bi rengekî ji rengan dibin faktor ji bo bedewkirin û dewlemendkirina wêneya hunerî, bi hevbeşî awaza şiîrî dirust dikin. Lê ev ji qonaxekê heta qonaxeke din yan ji serdemekê heta serdemeke din cuda ye. Di serdema kevin yan klasîk de, kêş û qafiye pêdiviyeke sereke bûn bo helbestvan. Lê di çaxê niha de, li şûna kêş û qafiyeyê cureyek muzîk seranserê helbestê bihêz û rêk dixe, ku bi şêweya dariştineke hunerî tê avakirin û wek helbesta azad yan serbest tê binavkirin.

((Tê*şeya helbestê ji pêkhênerê aliyê derve yê helbestê pêk tê û bi naverokê re ku aliyê navxwe yê helbestê ye, du pêkhênerên sereke yên helbestê ne û bi kombûna*

---

[127]Dr. Kemal Marûf, *Rexneya nû ya kurdî*, Silêmanî, 2007, r. 138.
[128]Kerîm Mistefa Şareza, Kovara Karwan, hejmara 81, 1989, r. 20.

*herduyan di tekstekê de helbestê diafirînin*))[129] Form (teşe) û naverok du pêkhateyên sereke yên wêneya hunerî ne di helbestê de û ji hev nayên cudakirin. Bêguman babet jî di her ceribandineke helbestê de, nerînek yan têbîniyek dibe naveroka babetî ya wê ceribandinê ku derbirîna xweşî û nexweşiyê ye bi rêya wan bertekên derveyî ku bandorê li ser hestên helbestvan pêk tînin. Hîm û binemayên rewanbêjî ku bandorê li ser ziman dikin, estetîka helbestê pêk tînin, çimkî her teksteke şiîrî aliyê rewanbêjî tê de nebe dibe gotinên normal û tam û çêjê ji dest dide, metafor rêgezeke sereke ya rewanbêjî ye. ((*Ku têgeha (mecaz û xaze yan metafor û hevalwate) jê re hatiye danîn, ji bikaranîna peyvekê bo gihandina wateyekê ji xeynî wateya wê ya sereke pêk tê*))[130], ev jî wiha dike ku peyv ne tenê girêdayî wateyekê be, bi vê jî zimanê şiîrî ji zimanê wateyî û rêzimanî rizgar dibe. Yanî binemayên rewanbêjî ronahîbexş in di wêneya hunerî de û sembol jî yek ji pêdiviyên cuda yên wêneya hunerî ye ku diyardeyeke dîtbar e ku hertim di hest û bîrdanka helbestvan de di hevrikî û berberiyê de ye.

((*Di hemû wêneyan de ziman xwe di çarçoveya realîteya jiyanê de vedişêre û li pêşber kêşe û bûyeran rastî hevrikiyeke darîştî di çarçoveya tundûtûjiyê de tê. Bi awayekî din ziman dikare di çarçoveya wêne û rîtma muzîkê de wêneyeke romantîk û zimanekî piralî..wêne aliyên nihênî û veşartî yên wateyê kifş bike*))[131] Nerîna realîst li derdorê tenê mecalekî berfireh e dûr e ji rehendên sembolîzmê, lê divê xeyal bandorê li ser wê realîteyê bike û hevkêşeya wateyan ber bi têkşikanê bibe û rê veke li ber helbest û estetîkê û teşe (forma) wêneya şiîrî. Siruşta sembolê ew e ku tekstê ber bi amajeyeke ne rasterast a mişt nihênî bibe, daku xwîner mecbûrî lêgerînê bike li pey cewhera çêjê ya di tekstê de, yanî sembol rêgezeke din e di nav pêkhateyên wêneya hunerî de û xizmeta alî û rehendên wateya helbestê dike.

Bi bikaranîna hunerên rewanbêjî û rêgezên sereke û malzemeyên din ku di dirustkirina wêneya hunerî de beşdar in, bi tevlêbuna wan di nav siruşta realîteyê de dibin hevîrekî amadekirî ji bo her karekî hunerî wek wêneya hunerî. Lewra pêwistî bi hunermend yan helbestvanan heye daku selîqe û xeyala xwe ya kûr û xemilandî û talênt û bîr û baweriyên xwe bidin xebitandin û daku bi wê ezmûnê ku bingeha

[129]Yadgar Resûl Balekî, *Sîmayên nûjenkirina helbesta kurdî (1898-1932)*, çapa 1, Çapxaneya Wezareta Perwerde, Hewlêr, 2005, r. 130.
[130]Rojan Nûrî Ebdulla, *Ferhenga ziman û têgehsaziya kurdî*, çapa 1, Hewlêr, 2007, r. 177.
[131]Dana Esker, *Wate û hêmayên veşartî yên tekstê*, çapa 1, Hewlêr, 2009, r. 55.

dahênanê ye şaheserên mezin berhem bînin. Yanî zîrekî û talênta helbestvan çavkaniyeke girîng a wêneya hunerî ye. Hevkêşeyeke aloz û wêneyeke bi mij û moran e û binemaya wê ya felsefî heye û pêwist e ew hevkêşe bi hevsengî lenger bigre, daku tûşî zêdegavî û fentazya nebe. Jiyan bi xweşî û nexweşiyê tijî ye. Her dîmen û kêliyek wêneyek e. Yanî bi hezaran wêneyên rabirdû di bêagehiyê de hene. Dibe ku em bi armanc bixwazin hinekan ji wan dîmenan ji bîr bikin, lê di encama mijarekê yan bûyerekê de em hest bi gurrbûna derûn û nest dikin. Bi taybetî çimkî hest û nestên helbestvan naziktir in, ew dîmen jê re dibin robar û paşxaneke rewşenbîrî ya dewlemend ku dikare wêneyên hunerî tê de biafirîne.

Wêneya hunerî mînaka bedewiya wê realîteyê ye, bi cureyekî naziktir û qeşengtir tê nîşandan ku dibe xwedanê nirx û biha û girîngiyeke estetîk a bilindtir dema ku helbestvan wan bîr û bawerî û lêkolînên hûrbîn di qalib û şêwazên hunerî de pêşkêş dike. Ev şêwaz ji kesekî heta kesekî din cuda ye. Ev jî tiştekî normal e ku nivîskar stîleke xwe ya taybet hebe û xwediyê dengê xwe be. Hinek kes bawer dikin ku bi du cureyan helbest tê nivîsandin bi taybetî di aliyê naverokê de.

1. Ew in ((*Ku di hemû aliyan de durû ne li gor nerîna xwe mineta wan bi ezmûn û çavkaniyan nîne û ew bi xwe desthilat û felsefe û pîvan in, çimkî li gor wan, bi xeyalê hemû fezayên marîfî derbas kirine*))[132], weke ku me li jor diyar kir ku helbest ji çend malzeme û rêgezên mezin û biçûk pêk tê ku li gor binema û prensîbeke yasayî kar dikin bo bedewkirin û têgihîştina realîteyê. Helbest nabe ji derdorê û pêwendiyên civakî ku rengdana civakê ne û çavkaniyên malzemeyê ne bo helbestê û sûd jê wergirtin li ser van hemûyan jî rayê wê ji felsefeyê bê birrîn, çimkî helbest bi xwe berhemeke civakî ye û diçe nav qalibê felsefî.

2. Ew komin ku ((*Bi rêya hevrikiya huner û wate û kar û karvedan û hevkêşeyên babetî û pêwendiyên lojîkî yên veşartî û neveşartî yên peyv û hevok û frêz û bend û yasayên rexneyî yên Lucien Goldmann û Gérard Genette û Derrida û* Saussure û *Chomsky kar dikin û hertim li pişt dîwarê koma yekem in*))**[133]** Ji ber ku wêneya hunerî pêkhateyeke helbestê ye, ezmûna helbestvan di babet û pêwendiyên civakî de

[132]P. Dr. Zahir Letîf Kerîm, *Nirxandina teorî li dînamîkiya helbestvanên durû*, Kovara Ayînde, hejmar 76, 2005, r.5.
[133]P. Dr. Zahir Letîf Kerîm, *Nirxandina teorî li dînamîkiya helbestvanên durû*, Kovara Ayînde, hejmar 76, 2005, r.76

û girêdana wî bi karê edebî û bîr û bawerinê zihnî erkekî sereke ye di karê hunerî de. Wêneyeke hunerî ya berfireh û bihêz diafirîne li gor koma yekem ku tenê pişta xwe bi xeyalê girêdidin û mineta wan bi ezmûn û çavkaniyan nîne, û tu pêwendiyeke tevlîhevbûna fikirî û felsefî û civakî di navbera edebiyatên cîhanê de dirust nabe.

Piştî hatina Îslamê, gelê Kurd wek piraniya gelên misilman ket bin bandora wê olê de di her sê astên wê yên sereke (şerîet – heqîqet û terîqet), nemaze her du astên terîqet û şerîetê bandoreke mezin li kurdan kirin. Rengdana sofîgerî û şerîetê di edebiyata kurdî de, bi taybetî di edebiyata kurdî ya klasîk de bandoreke berçav li ser awayê dirustbûna helbestê kir çi di aliyê wêneya hunerî û çi di aliyê teşe û kêşê de. Di aliyê wêneya hunerî de, felsefeya Hellac di helbestên helbestvanan (Melayê Cizîrî – Ehmedê Xanî – Bêsaranî – Mewlewî – Mewlana Xalid- Nalî û ...hwd) de tê dîtin ku navê hinekan ji wan wek helbestvanên sofîger tên binavkirin. Naveroka wan bêhtir Xwedênasiya rasteqîn û çavnetirsiya ji gotina heqiyê ye. Di aliyê teşeyê de, bikaranîna kêş û qafiyeya aruz erebî hebû ku di bin bandora olê de ev kêş û irûz bikar anîn. Di heyama niha de jî, hinek helbestvan eger ne sofîger bin jî, lê rengdana olê di helbestên wan de diyar e. Ev babet hemû çi sereke bin yan ne sereke di dirustbûna wêneya hunerî de beşdarin.

### 1.6.Erkê wêneya hunerî

Wêneya hunerî beşekî birîqedar e di nav dinyaya edebiyatê de, bi awayekî eger em bixwazin wateyekê derbibirin bi wê wateya ku di rastiyê de jê re hatiye danîn, em tu tam û çêjekê jê wernagirin, berevajî jî tam û çêja xwe dibe eger bi rêya girêdaneke weke wêne hat gihandin ((*Erkê sereke yê wêne ew e ku wateyê di mejî û derûn de bi rêya kartêkirinê biçespîne*))[134], nerîneke aloz û bedew bicî bihêle û her wêneya hunerî ye ku aliyên curbicur û hevdij ên jiyanê derdibire û ezmûnên bisoz têkilbûneke wiha dideyne ber destê me ku di kûrahiya derûna mirovatiyê de wer bibe û wêneyê bigre ((*Helbestvan bêyî ku hest bike, tiştê ku di derûna wî de heye, bi rêya wêneya hunerî eşkere dibe*))[135], wexta ku xemgîniyeke kûr di hundirê helbestvan de hebe, ne pêwist e ji kesên derdora xwe re eyan bike, lê ji bo derbirîna wan xem û

---

[134]Dr. Ebdilfetah Salih Nafi, *Wêne di helbestên Beşar Bin Berd de*, Çapxaneya Fikir, Oman, 1983, r. 79.
[135]Jozef Mîşal Şerîm, *Rêberê lêkolînên şiîrî*, r. 78.

kovanan helbestan diafirîne û wan bi peyvan derdibire. Lewra jî wêne baştirîn rê ye bo nîşandana derûna helbestvan. Wêne teşeya şênber kirina wê bîrê ye ku ji zihnê dizê.

((*Wêneya serkeftî ew wêne ye ku wateya petî û tek bû bi şêweyeke wiha derxe ku hest pê bê kirin. Ev rêgez yanî wêneya hunerî di helbestê de wek rengê birîqedar e di tabloyê de û bandora wê fena bandora tîrêj û sîbera tabloyê ye. Her bi rêya wêneya hunerî em derbasî nav cîhana cadûger a helbestê dibin, nexasim dema her wêneyek erkê xwe di sînorê wê pêvajoya ku wêneya giştî ye bicî bîne, çimkî her wêneyek blokeke di binyata wêneya giştî ya helbestê de û bi dû hevdu de hatina wêneyan, wêneya giştî û binyata helbestê pêk tê*))[136], bi cureyekî wêneya hunerî xwedî şiyan e ku xwîner wiha rakişîne bo wê wateya ku di wêneyê de heye bi şêweyeke wiha berçav dike, wiha li me dike em bêhtir ber bi aliyê wateyê herin.

Ji aliyekî din ve wêneya hunerî ji ber jirêderketin û xwe mijûlkirina bi nîşaneyên ne sereke, gihîştina me bi wateyê bipaş dixe. Ev jî girîngiya wêneyê nîşan dide. Nabe dema xwîner helbestekê dixwîne bi sadeyî wêne hawar bikin, eger bi vî rengî be jî wêne bê nirx dibe, lewma ((*Wêne şêwaza xapandina guhdar vedihewîne û bedewî jî di wê xapandinê de ye*))[137], lewra divê xwîner ji tîrî û himbizî û aloziya wêneyan hişyar be, bi cureyekî bikare wêne û armancên wê rave bike û ji her wêneyeke di helbestê de bêhtirî wate û egerekê deyne, çimkî eger wêne bi wî rengî aloz bin, tenê kesên pispor dikarin wan analîz bikin û nabe her kes hewl bide wan wêneyên şiîrî rave bike.

Di demekê de ku erkê wêne ew e ku hêsankariyê bike bo kesên ku xwe dixin nav cîhana şîrovekirina helbestê bi giştî û wêneyê bi taybetî. Ev bixwe jî çalakî û girîngiya wêne derdixe, diyar e mebesta me ((*Wêneya dagirtî ye ku dikare bi hemû aliyan de tîrêjan bavêje û rê bide derketina wateyên bêhtir, her dema ku mirov bi hestên xwe pê re werbû û bi rastî ev cure wêne, wêneyeke bexşende ye û bi berdewamî perdê ji ser rûyê tiştên nû radike*))[138], lewma em dikarin bêjin ku wêneya

[136]Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Salih de*, nameya doktorayê, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r. 32.
[137]Dr. Cabir Isfûr, *Wêneya hunerî di gotara rewanbêjî û rexneyî de*, r. 428.
[138]Dr. Îzedîn Îsmaîl, *Şîrovekariya tekstê di edebiyatê de*, Çapxaneya Ewde û Seqafe, Beyrût, 1980, r. 100.

şiîrî bi xwe kilîta tekstê û havêyna kamilbûna wê ye û yek ji erkên wê dewlemendkirina ezmûna helbestî ya helbestvan e û pêwendiya helbestvan bi tiştên derveyî û navxweyî yên cîhanê ye li wê gorê ku erkê helbestê ((*Wênegirtina êş û kovanên xelkê bi giştî ye ku hemû milet pê karîger dibin û herwiha helbest ji kûrbûna helbestvanan bo nav hundir û kûrahiya civaka ku tê de dibin nûnerê hêvî, êş û hestan pêk tê*))[139], yanî di vî erkî de helbestvan xwe û babetên xwe yên şiîrî dixebitîne bi armanca xizmetkirina jiyan û civakê.

Diyar e ev babetên şiîrî ku di hundirê helbestvan de dirust dibin, rengdana civakê ne û bandorê jî li ser xizmetkirin û pêşketina civaka wî di hemû warên jiyana neteweya wî de dibe. Lewra wêneya hunerî çend erkên din jî vedihewîne wek van erkên li jêr.

1. Wêneya hunerî herdem bi karê bedewkirin û rohnkirinê di binyata helbestê de radibe. Ew hemû wêneyên ku ji hêla xeyala bedew ve hatine kişandin, xwedan şiyan bûn ku bi xwîner re biaxivin û bi awayekî ji awayan ketine jêr wê kartêkirina ku helbestvan di plana wêne û teksta xwe ya şiîrî de kişandiye. Yanî em dikarin bêjin ku paşxan û ezmûn û felsefeya helbestvan xwedan bandoreke rasterast e li ser gihandina wateya wê wêneya ku ji xwîner re hatiye veguhastin.

2. Wêneya hunerî xwedan şiyan e ku hemû hestên helbestvan bicoşîne bi rêya wan hestan wêne biafirîne. Yanî dikare xwedan şiyan be gava ku xwîner wê helbestê dixwîne ku li ser temamiya hestên helbestvan hatiye avakirin, hemû hestên xwîner jî bilivînin û bi rêya wan hestan ((*Wêne tenê karvedana hilçûn û coşa helbestvan ji me re venaguhêze, lê wê bîrokeyê jî digihîne me ku bûye çavkaniya hilçûna helbestvan*))[140], hestnazikiya helbestvan ji hundirê mişt êş û derd û keser çavkanî digre. Hemû kesên ku helbestan diafirînin sozeke bêsînor di hundirê wan de asê maye. Ev soz wiha li helbestvan dike di rûyê peyvan de biteqe û wêneyan ava bike.

3. Bedewî û xemilandina teksta şiîrî, ev jî gelek caran ji ber derbaskirina wateya normal a peyvan dibe. Li vir dikare peyvek ji bilî wateya xwe, wateyeke zêdetir bide û ev wateya zêde wiha li peyvê dike ku sihrdar be û bi peyvên li derdora xwe bilîze û

---

[139]Nesredîn Reûf Îsmaîl, *Erkê helbestê di edebiyata kurdî de 1920-1958*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2010, r, 154.
[140]Dr. Îzedîn Îsmaîl, *El Edeb We fnun,* Cildî.6, Dar al Fikrî El Erebî, 1976 , r.139 .

bandoreke wateyî li ser peyvên li derdora xwe dirust bike. Yanî peyvek dikare hem bi rola îrîgûlar û hem rola rîgûlar rabe ((*Wêne bi bedewî û dilrevîniya xwe dikare kemerbendekê ji bedewiyê diyarî kirêtiyê bike û wiha li çêja hilçûna şiîrî yan çêja dahênanê bike ku, rohntir be ji hestkirina bi wê kovana ku wêneyê pêk aniye*))[141], wêne dikare bi berevajî jî kar bike û tiştên bedew û dilrevîn û birîqedar bi awayekî kirêt û nezelal û çilmisî nîşan bide.

4. Wêne cureyekî rêzbendîkirinê di navbera xwîneran de dirust dike, çimkî wiha li xwîner dike ew şiyan û qudreta wî hebe ku wêneyên îrîgûlar û pûç û bêreng destnîşan bike û bedewî û bihêziya wêneya kemilî bilind binirxîne, çimkî ku wêne nikarîbe armancekê bigihîne dikare rastî rexneyê bê ((*Wêne ew e ku derûna wergir dide axaftin û dilivîne û wiha lê dike razî be yan razî nebe bi wê teşeya ku bi rêya wê wate tê pêşkêşkirin*))[142] Ne merc e ew teknîka teşe û naveroka ku di helbestê de heye bi dilê her xwînerekî be. Gelek kesên ku hogirê helbestê bi giştî û wêneya hunerî bi taybetî ne, bêhtir ligel naveroka wan helbestan tên ku ji hundirê wan nêzîk in an bi cureyekî rengdana hundirê wan in. Lewra nabe helbestvan hestên xwe kêm bibîne ji bo kesekî ku helbesta wî ne bi dilê wî ye. Yanî nabe helbestvan guh bide wê yekê ka gelo heta çiqasî helbesta wî sînorê hesta xwîner derbas dike.

5. Wêne xwedan şiyan e ku careke din wê rastiyê dirust bike ku helbestvan helbesta xwe li ser ava dike. Bi şêweyekê siruşt û jin û evîna welat û ol û gelek warên din xwe tevlî nav xeyal û hizra helbestvan dikin. Helbestvan jî bi teknîk û felsefeya xwe wan waran hemûyan dike wêne û wan vediguhêze nav dinyaya edebiyatê bi giştî û helbestê bi taybetî. Yanî ((*Erka wêne cardin afirandina realîteyê ye wek ku mirov bi xwe dixwaze û tê de gihîştiye neku wek ku heye*))[143], wêne realîteyê di bergekî cuda de diafirîne, bi şêweyekê ku bi xwe dixwaze û bi lêkirina bergekî cudatir ji bergê wê yê siruştî.

6. Hinek bûyer û rewş hene eger ne wêne be tiştek nikare wan derbibire, yanî nîşandana wate û rewşên veşartî ye. Her ev jî wiha dike em bi tevahî nikaribin wê

---

[141]Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 69.

[142]Dr. Atif Ebû Hemade, *Wêneya hunerî di helbestên Mehmûd Derwêş de*, Çapxaneya Yekîtiya Giştî ya Navendên Çandî, Xeza, 1998, r. 169.

[143] Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 99.

bedewî û çêj û bandorê rave bikin ku wêne li ser xwîner bi xwe û li ser xewn û xeyalên xwîner bicî dihêle lewma ((*Eger me hewl da bandora wê bedewiyê rave bikin em dê bihayê wê kêm bikin. Bedewî bi xwe nediyar û bi mij û moran e û balkêşiya wê ji vê rewşê çavkanî digre. Wêne lorandina derûn û guftûgoya wîjdan û kartêkirina li ser hestan e*))[144] Şiîr nivîsa helbestvan bi hemû hest û soziya wî di derûna helbestvan bi xwe de dirust dibe ku şiyana axaftina wê ligel helbestvan bi xwe dibe cure guftûgoyeke taybet û rû dide û tenê helbestvan ji derûn û hestên xwe fêm dike.

7. ((*Gelek wêneyên hunerî siruşteke wan a aloz heye û her kes nikare derbasî hundirê wan bibe û wan lêkolîn bike ji bilî kesên ku xwedî şiyaneke rexneyî ya xurt in. Çimkî wêneya şiîrî erkekî pir giran dixe stûyê xwe ku ew jî nîşandana wateyên bilind e ku di ser wateya normal de ne*))[145], lewma her rexnegir nikare xwe nêzîkî her wêneyekê bike. Rexnegirê bihêz şiyana wî ya şîrovekirin û ravekirina hemû wêneyan di her helbestekê de heye, bi berevajî jî rexnegirê kêmtecrûbe ev şiyana wî nîne, lewma dibe şîroveyeke cuda ya wêneyê bike ku cuda ye ji wateya wê ya rasteqîn.

8. Erkekî din ê wêneya hunerî wênegirtina êş û kovana xelkê bi giştî ye û hemû milet pê karîger dibe û herwiha ji kûrbûna helbestvan bo hundir û kûrahiya civaka ku tê de dibe nûnerê hêvî û êş û hestên wê pêk tê ((*Pêwist e helbest rengdaneke rasteqîn a serdema xwe be*))[146] Di vê serdema nûgeriyê de, nabe û di şiyanê de nîne ku em pêngavan ber bi helbesta klasîk ve ber bi paş de biavêjin, çimkî her qonaxek bi helbesta serdema xwe û kêşe û pirsgirêkên serdema xwe bedew e, lewma nabe helbestvan di civak û serdemekê de bijî ku mişt be bi nexweşî û êş û derd û janan, lê belê bê û wêneyên civak û derd û jan û êşên civakeke din ji xwîner re veguhêze. Eger helbestvan pêngaveke bi vî rengî avêt, nikare bandorê li ser civaka xwe bike.

9. Erkekî din ê wêneya hunerî lêgerîn e li dû rastiyê bo bedewkirina jiyanê û di gera li wê bedewiyê de rastiyan dibîne. ((*Bedewî ne diyardeyek e di nav tiştan bi xwe*

---

[144]Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 71.
[145]Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r. 100.
[146]Qumrî Seîd Ezîz, *Helwest di helbesta kurdî de*, nameya doktora, r. 22.

*de hebe, yanî ne sîfeteke reha ya wî tiştî ye ku jê re dibêjin bedew*))[147], yanî erkê wêneya hunerî ne tenê wergirtina tiştên bedew e, lê çawaniya serastkirin û bikaranîn û dirustkirina ji nû ve ya jiyanê ye ku bi wêneya hunerî nîşanî me tê dayîn.

[147]Umêd Aşna, *Teşe û naverok çend lêkolîn li ser edebiyata kurdî*, 2007, r. 61.

## 2. ÇAVKANİYÊN WÊNEYA HUNERÎ Dİ HELBESTÊN HÊMİN DE

Wêne û helbest di hemû serdeman de temamker û dirustkerên hevin. Ne helbest bêyî wêne û ne jî wêne bêyî helbest nabin. Wêne wek yek ji diyartirîn stûnên hunerî yên helbestê tê hejmartin û helbest nikare qet dev ji wêneyan berde, çimkî dîrokeke kevnare ya wêneyê di dinyaya edebiyatê bi giştî û helbestê bi taybetî de heye. Lewma pir caran jîngeha helbestvan û rewşa derûnî û kultûra edebî ya kevin û nû bandorê li hev dikin û tevlîhev dibin. Di encama wê bandor li hev kirin û tevlîhevbûnê de, wêneyên cuda di malzaroka şiîrî ya helbestvan de ji dayik dibin, bi cureyekê ew wêne hemû bi rêya ezmûnên hestewer ji dayik dibin. Bi şêweyekê ku her yek ji wan ezmûnên hestewer kêm zêde beşdar in û ji aliyekî din ve jî xwendin û lêgerîn û berfirehiya bîr û baweriyên helbestvan jî di avakirina wêneyê de bi rola xwe radibin. Lewra nabe ew wêneyên ku helbestvan wan diafirîne pir dubare bibin, lê divê helbestvan bi berdewamî wêneyên nû û teze ava bike.

Hêmin yek ji wan helbestvanan e ku karîbû wêneyên pir bedew bikar bîne, çimkî Hêmin di rewşeke taybet de helbest afirand û vê rewşê kir ku Hêmin ezmûnên xwe yên hestewer bide herikandin.

Hêmin di serdemekê de jiya ku helbestvanên wek (Pîremêrd – Goran – Bêkes û Hejar) û çend helbestvanên din di heman serdemê de jiyane. Xwendina berhemên wan helbestvanan kir ku Hêmin armanc û jêderên helbestê bêhtir nas bike û peyda bike. Hêmin ket jêr bandora helbestvanên mezin ên klasîk ên Fars wek (Hafiz – Seidî Şîrazî - Mewlewî – Belxî..hwd) û helbestên wan xwendin û hizrîna wî yanî ya Hêmin bi awayekî berfireh kirin ku tiştên wan kifş nekiriye Hêmin ew kirin jêderên helbesta xwe û helbestên xwe pê dewlemend kirin. Astbilindiya felsefeya wan helbestvanan kêm zêde di helbestên Hêmin de reng daye û rûbera şiîra xwe pê dewlemend kiriye. (Ehmedê Xanî û Baba Tahirê Hemedanî û Hacî Qadirê Koyî û Nalî û Mehwî û...hwd) û çend helbestvanên din ên klasîk ên Kurd di wê dinyaya berfireh a ku Hêmin ket bin bandora wê de cih digrin. Lewma em dikarin bibêjin Hêmin ew valahî tije kiriye ku helbestvanên Kurd nikarîbûn bi xeyala xwe ya berfireh tijî bikin. Hêmin îlham ji wan hemû helbestvanên beriya xwe û wê jîngeha ku bi xwe tê de jiyaye wergirt. Vê jîngehê berê Hêmin da wênegirtina wan hemû bûyer û serpêhatî û tecrûbeyên rasteqîn ên ku dîtin yan bihîstin yan di bîrdanka wî de man. ((*Wêneyên*

*tiştûmiştên cîhana şênber di bîra xwe de tomar dike û malzemeyeke taybet bi xwe bidest dixe. Êdî gava rastî soz û hilçûneke xweyî û şexsî tê, endîşe sûdê ji wan malzemeyên bidestxistî werdigre û bîroke û wate û hestên xwe bi rêya wan nîşan dide*))**[148]**, Yanî ew hemû wêneyên ku helbestvan wan digre, ji siruşt û ji wê realîteya ku helbestvan tê de dijî çavkanî digrin. Helbestvan wan wêneyan digre û bi teknîk û pisporiya xwe wêneyan bedewtir û birîqedartir dike, çimkî soz û endîşeyê li wan zêde dike.

**Sî dî-Lewis**dibêje: ((*Babeta her helbestekê dibe ku ji yek ezmûnê bizê, lê belê wêneyên wî ji zeviyekî berfirehtir avê dinoşin wek ezmûna giştî ya jiyana helbestvan, bi awayekî bi alîkariya wî di afirandina helbestê de dibe xwedan rêxistineke bedew*))**[149]**, Ev jî ji wê yekê çavkanî digre ku di avakirina wêneyan de jêder bi roleke girîng û bibandor radibin, bi awayekî dema helbestvan wêne ji ezmûnan werdigre, wan bi rengekî hema bikar nayîne, lê wêneyan hildibijêre da ku geştir li ba wergir derkevin. Evên li jêr ew çavkanî ne ku helbestvan wan bikar tîne di dirustkirina helbest û wêneyên hunerî de.

### 2.1. Çavkaniyên Xweyî (zatî-girêdayî helbestvan bixwe)

Wan hemû wêneyan vedihewîne ku helbestvan bi xwe ew afirandine û pêwendiyên nû di navbera tiştan de dirust kiriye. Ev pêwendî dihêle ku helbestvan bi coşdarî li wêneyên nû bigere û ji ferhenga xwe ya herikbar gelek wêneyan ava dike ku qet ne helbestvanên beriya wî û ne helbestvanên piştî wî bîra wan wêneyan nebirine. Dema helbestvan bi vê rola mezin rabû ku wêneyek afirandiye ji kûrahiya hundirê wî bi wê soza pir germ û bi tîn serî hildaye, gelo dê wêneyeke çawa be? Helbestvanê xwedî ezmûn bi coşdarî li wêneyên teze digere ku wan ezmûnên ku di wan de jiyaye nîşan bidin, ku ew bi soza xwe ya sihrî kirine helbest. Dema ev yek rû da, helbestvan dibe dahênerê wêneyekê ku çavkaniya wê helbestvan bi xwe ye. Piraniya kesên ku wêne û wêneyên hunerî lêkolîn dikin, nemaze rexnegirên hevçax di wê baweriyê de ne ku ((*yekem kartêkerê derûnî ji bûyerên jiyanê û ezmûnên*

[148]Dr. Kamil Hesen Besîr, *Rexnesaziya pêrewkirina dîrokê*, Çapxaneya Korrî Zanyarî ya Iraqê, Bexda, 1983, r. 165-166.
[149]Sî dî Luies, *Wêneya Şiîrî*, r. 85.

*hestewer ên helbestvan pêk tê, beşek ji wan hewl dane gengeşeyê li dora wê kartêkerê bikin û kifş kirin ku ezmûn bi xwe ne îlhamder e herwekî çawa bedewî û matmayîna ezmûnê jî nabe sedemê dirustkirin û dîtina babetê bo helbestvanan, çimkî dîroka her kesekî normal dibe ku di bûyer û tecrûbeyan de hevawayê jiyana helbestvanekî dahêner be, lê rengdana kartêkeran li derûnê û siruşta hilçûna bi wan û piştre dariştina hilçûnan bi rengekî hunerî yê wiha ku perdê ji ser herêmên derûnî yên veşartî rake, ew e ku helbestvan ji kesên din cuda dike*))[150], lê tiştê pir balkêş ew e ku eger helbestvan wêneyeke nû afirand û di helbestê de bikar anî, nabe zêde dubare bike, lê pêwist e li dirustkirina wêneyên nû bifkire, çimkî helbestvan wêneyên xwe dubare bike, wê çaxê helbest bêhêz û lawaz dibe.

Lewra Nizar Qebanî di vî warî de dibêje: ((*Ez li ser keviya kaxezê rûdinim û bendewariya masiyên teze yên rengîn dikim, çimkî ew masiyên ku min ew nêçîr kirine êdî bala min nakişînin*))[151], yanî divê helbestvan xwe ji wêneyên dubare dûr bike û armanca wî bêhtirî wêneyekê be ku berê ava nekiriye.

Di vî warî de, Hêmin hostetiya xwe nîşan daye û gelek wêneyên xweyî-zatî afirandiye ku gihîştiye bilindtirîn çavkaniyên xweyî. Dema em li helbestên Hêmin dinerin û li jêderên wêneyan dinerin, em hejmareke zêde ya wêneyan dibînin ku ew xwedanê xasiyetê wan e, yanî xweyîtiya helbestvan bûye bingehê afirandina wan. Di vê helbesta li jêr de, helbestvan çavkaniyeke bihêz a xweyî bikar aniye û wêneyeke bedew ava kiriye ku pêwendiyeke bihêz di navbera rêgezan de bikar aniye.

Bo kiçe kurdêk

Kiçe kurdêkî neşmîl û lebarî

Bewey nîye maweyeke çûye şarî

Eger pêtxoşe her wa bit perstim

Nekey ladey le dabî kurdewarî [152]

---

[150]Buşra Mûsa Salih, *Wêneya hunerî di rexneya helbesta erebî ya nûjen de*, r. 87-88.
[151]Nizar Qebanî, *Çend gotar*, wergerandina: Teha Baban, Weşanên Navenda Edebî û Ronakbîrî ya Gelawêj, Silêmanî, 2004, r. 145.
[152]*Dîwana Hêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 299.

Di vê helbestê de wêne xweyî ne û helbestvan bi xwe ew dirust kirine bi zimanekî sade û zelal bi rengê gotûbêjê û nîşandana hundirê xwe yê asêmayî ji keçeke Kurd a gundî re radixîne. Wiha diyar e ji wê keça gundî hez kiriye, wê keçê gund terikandiye û vêga li bajêr dijî. Helbestvan giliyê wê yekê li keçê dike eger bê û tevger û adet û hizrên te biguherin, tevî ku tu ewqasî li ba min hezkirî yî, bi cureyekî gihîştiye asta peristinê, lê ez neçar im te ji dilê xwe biavêjim. Mebesta helbestvan bêhtir ew e ku ew bedewî û şox û şengiya te ya wê yekê ye ku tu li gund mezin bûyî û hatî xwedîkirin û te av û hewaya gund hilmijandiye, lewma helbest ji pêşî heta dawî wêneyeke kemilî ye û armanca xwe pêk aniye. Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Esîrî biskî alozî kiçe kurdêkî neşmîl im

Temaşaken çi seyrêke bedestî dîlewe dîl im [153]

Helbestvan di vê helbestê de ketiye bi bandora keçeke Kurd de, amaje dide wê yekê ku ew carekê dîlê biskê (zulfê) keçê ye û careke din jî dîlê keçê bi xwe ye, bi şêweyekî ew bisk sîber li dev û çavê keçê kiriye û bala helbestvan kişandiye, lewma helbestvan ne tenê carekê lê du caran xwe wek dîl nîşan daye. Kesê dîl jî pêwistiya wî bi hevsoza wî kesî heye ku ew zindan kiriye, encama wê dîlbûnê jî girêdayî şox û şengî û nazdariya wê keça Kurd e, biskên keçê agir berdane hundirê helbestvan û wî agirî jî wêneyeke herî bedew afirandiye. Hêmin yek bû ji wan helbestvanên ku bi şêweyeke zêde ji jinan hez dikir û di piraniya helbestên xwe de nîşan dide ku ew girîngiyê nade temen, bi awayekî ku Hêminê heyama pîrbûnê her heman Hêminê heyama xortaniyê ye. Lewra her dema ku keçeke şox û şeng didît, xwe nedigirt û helbest li ser diafirand û ew hemû helbestên ku jin çavkaniyên xweyî bûn, gihîştine bilindtirîn pileya wêneya hunerî û wek di helbesta (Ciwanî Bes Nîye) de, dibêje:

Ke kîjêkî ciwan debînim

Sarêj debinewe birînim

Ke debînim lencew larê

Hest nakem be çi azarê [154]

---

[153] *Dîwana Hêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 417.
[154] Jêderê berê, r. 174.

Dîtina keçeke bedew û qemûşkgirtina birînên wî û dîtina nazik û nazdarê û jibîrkirina êşa birînê hemû wêne ne, û ev wêne hemû jî xweyî ne û careke din dubare nabin. Helbestvan di vê helbestê de xwe mîna kesekî birîndar dibîne ku dermankirina gewdeyî li ba wî ne girîng e, lê temirandina agirê dilê wî bi dîtina wê keça bedew bidawî tê. Yanî helbest ji pêşî heta dawî wêneyeke hunerî ya birîqedar û bedew e bi awayekî wan wêneyan hemûyan karîbûn bandorê li ser wergir an xwîner bikin. Di helbesta (Mû Napsênim) de, wêneyeke din dikşîne û dibêje:

Emin demgut le dinya ta bimênim

Leber kes esteem ser danewênim

Keçî êsta ledawî biskî to da

Girftarim gulim mû napsênim [155]

Helbestvan di vê helbestê de wêneyeke cudatir dikşîne, bi awayekî ji aliyekî xwe wek kesekî dilêr û çavnetirs di civaka xwe de dibîne çimkî di tu rewşê de xwe bêyî desthilat û lawaz nedîtiye, ji aliyekî din ve jî bê desthilat nedîtiye, lê ji ber evîna yara xwe, xwe ewqasî biçûk kiriye heta digihe asta werbûna di girift û astengiyan de ji ber bisk (zulf)ê yara xwe, lê li vir jî nasekine û dibêje “mû napsênim” (Mû nepsan: Mû bi xwe tayekî zirav e, ji ber ziravî û lawaziyê pir caran ji xweber diqete. Helbestvan di vê helbestê de wesfê xwe pê dike û xwe ewqasî biçûk dike heta digihe wê asta ku êdî nikare mûyekî jî biqetîne!) Êdî mû nepisan bilindtirîn asta bêdesthilatiyê ye ku helbestvan wesfê xwe pê dike. Helbestvan di vê wêneyê de du tiştên berevajî hev bikar anîye û di encamê de wêneyeke bedew di malzaroka şiîrî ya helbestvan de ji dayik bûye. Di wêneyeke din de dibêje:

Her belayek le asmanewe bê

Ba lewêş nehatbê bo min

Ke geyşte ser zewî deka pirsyar

Erê lekwêye malî mam Hêmin [156]

---

[155]*Dîwana Hêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 415.
[156]Jêderê Berê, r. 418.

Di vê helbestê de, helbestvan bawer dike ku mirovbûna wî li gor mirovên din cuda ye, bi awayekî wesfê xwe dike wek ku ew çavkaniya wan bela, xem, azar, nexweşî û êşan be ku ji esman tên. Helbestvan bêhtir mebesta wî ew e ku ew jî mirovek e wek mirovên din normal e, lê eger normal e çima her belayeke ku ji esman tê mala Hêmin dike armanc? Li vir helbestvan hevkêşeya mirovbûna xwe berevajî dike. Helbestvan curekî şibandinê di vê helbestê de dirust dike û eşkere ye berf û baran gava digihin ser erdê di dawî de li cihekî tên ba hev, ew cih yan gola avê ye û yan derya ye. Hêmin, bela û xem û nexweşiyan mîna baran û berfê dibîne û xwe jî nola gola avê yan deryayê dibîne. Lewma çavkaniya vê helbestê helbestvan bi xwe ye. Tiştê ku bêhtir wêne bedew kiriye, sîfeta axaftinê daye tiştekî ku şiyana wê ya axaftinê nîne tevî ku nizane biaxive jî, lê bi her şêweyekê be gihîştiye armanca xwe ku mala helbestvên e.

Di wêneyên li jor de ji me re diyar dibe ku xweyîtiya Hêmin wek çavkanî bi rolekê di avakirina wêneyan de rabûye û bûye amrazek bo derbirîna hest û soza ezmûnên xweyî û anîna holê ya çend wêneyên wiha ku rêgezên wan bi pêwendiyên nû girdêdayî ne û hizrên teze jî nîşan didin. Ev hemû jî zindîtiyê didin wêneyan û vê zindîbûnê jî wiha kiriye ku bala xwîner ber bi dinyaya xwe ya sihrî bikşîne.

### 2.2. Çavkaniyên Babetî (objektîf)

Wan hemû cureyên helbestan vedihewîne ku helbestvan çavkaniya helbestên xwe ji wan derdixe ji xeynî çavkaniyên xweyî. Çavkaniyên babetî jî mecalekî berfireh di dinyaya helbesta kurdî de cih digrin, çimkî di çavkaniyên babetî de helbestvan destvekirîtir e û wêneyên zêdetir dibîne. Hevawayê kesekî ku ew kes li ser du sifreyan rûniştibe, li ser sifreya yekem tenê yek cureyê xwarinê li ser e, bi neçarî divê xwarinê bixwe û birçîtiya xwe pê têr bike, lê li ser sifreya duyem xwarinên curbicur hene, bi arezûya xwe ji her xwarineke ku bixwaze dikare bixwe, yanî mirov li ser sifreya duyem arezûyê wî zêdetir in, çavkaniyên babetî jî heman şêweya sifreya duyem e, çimkî helbestvan di çavkaniyên babetî de, çavkaniyên zêdetir û wêneyên zêdetir li ber destê wî ne, lewma helbestvan di wan cure çavkaniyan de zêdetir helbesta xwe geş dike bi awayekî gihîştiye wê asta ku kêm tişt mane wêneyên hunerî jê ava neke, helbest jî vê rastiyê nîşan didin, lewma Hêmin

yek bû ji wan helbestvanên ku bêhtir sûd ji jêderên babetî wergirtiye û îlhama xwe di binyata wêneyan de belav kiriye.

Hêmin yek bû ji wan helbestvanên ku kêm çavkanî hene helbesta xwe jê ava nekiribe, bi teknîk û şarezayî û ezmûn firehiya xwe yarî bi wan hemû çavkaniyan kiriye ku wêne li ser wan tên avakirin. Ev yarîkirina wî jî girêdayî wê rewşenbîriyê ye ku ji helbestvanên beriya xwe yan ên serdema xwe wergirtiye. Lewra eger helbestvanek bixwaze helbestên wî di nav civakê de reng bidin yan bandorê li ser civakê bikin, nabe tenê girîngiyê bide wan hest û îlhamên ku ji hundirê wî çavkanî digrin, lê divê helbestvan ji kesên normal bêhtir li pey xwendin û şopandina helbestê û rêgezên wê be, çimkî herçiqasî helbestvan xwedî ezmûn be, eger nikaribe teknîk û dariştina peyvan di helbestên xwe de bike, êdî guman tê de nîne ku nikare bandorê li ser xwîner dirust bike û bikarneanîna rêgezên helbestê jî ligel her çavkaniyekê helbestê lawaz dike, lewma divê helbestvan nola hosteyekî baş ê danîna dîwaran be. Ew çawa bi teknîk û jêhatîbûna xwe blokan li ser hevdu datîne, divê helbestvan jî bi wî rengî xwedî teknîka xwe be. Lewra divê helbestvan di wan hemû jêderên babetî de, xwediyê wan taybetmendiyan be ku me amaje da wan, heke na jêderê wêneyê nezelal di wêneyê de derdikeve û eger wêne jî bi nezelalî derket wergir an xwîner jê bêzar dibe.

### 2.2.1. Çavkaniyên Xwecihî/xwemalî

Ev çavkanî radeya hogirbûna helbestvan bi neteweya wî û hemû tiştên ku têkildarî neteweya wî ne nîşan dide. Ev jî li ser kesayetiya helbestvan dimîne, asta girêdana wî bi neteweya wî re heta çi pileyê ye. Hêmin ku helbestvanek e herdem hogir bû bi tiştên xwecihî ku li ber destê neteweya wî bûn, lewma em dikarin bêjin evîna neteweya wî û ziman, kultûr, dar, kevir, av, hewa û jîngeha çiya, şax û deşt û newal bi bedewî, kirêtî, xweşî û nexweşî, talî û şêrînî bi awayekî balkêş Hêmin aşiqê wan bû. Lewra ev hemû malzemeyên xwecihî jê re dibin malzemeyên sereke û di binyata wêneyên wî de bi roleke bibandor radibin.Bi giştî çavkaniyên xwecihî ((*Wan*

*hemû tiştan vedihewîne ku girêdayî vê neteweyê ne, bi kelepûr, berhemên nivîskî, folklor, dab û nerînên wî*...hwd)) [157]

Lewma her netewe xwedanê folklora xwe ye û babetên folklorê jî bi şêweyeke giştî bûne jêderên binyata gelek wêneyên hunerî li ba Hêmin ku xwe di vanên li jêr de dibînin.

### 2.2.1.1. Çavkaniyên edebiyata pêşiyan

Wan hemû berhemên kevin ên edebî ku beriya serdema helbestvan hebûn vedihewîne. Ew hemû berhemên kevin nola malzemeyeke giranbuha li ber destê helbestvan hebûn. Helbestvan bi her awayekî be helbestên xwe hemû di aliyê teşeyê de û hem jî di aliyê naverokê de bi wan bedew kirine, wexta helbestvan vedigere berhemên pêşîn nayê wateya ku ew ne xwedan ezmûn û felsefeya xwe ye, lê girîngîdan e bi berhemên xwe bi rêya wan berhem û edebiyata pêşiyan. Çimkî ew berhemên edebî yên kevin mişt in ji şaheserên edebî û helbestvan mejiyê xwe bi wan petî û zelal kirine û wêneyên bedew ji wan hilbijartine da ku wan bike jêderek û wêneyên bedew û wêneyên ku armanca wî ye wan darêje ku ev jî bi radeyeke zêde guhdan e bi berhemên pêşiyan û dewlemendkirina ezmûna şiîrî ya helbestvan e, bi cureyekê ew biha û taybetmendiyên ku di helbesta kevin de hatine bikaranîn, helbestvan wan veguhêze nav xeyal û bîra xwe bi wan berfireh bike, bi mercê ku dûr be ji çavlêkirina kor, lê belê helbesta xwe li jêr ronahiya helbesta pêşiyan, herwek.

(Steven Spender) dibêje: ((*Helbesta helbestvanên berê mîna çemekî berfireh e ku hemû jiyanê av dide, lewma divê helbestvanên nû rê li ber vî çem*ê *negrin, lê careke din zindî bikin*))[158], lewma herçiqasî helbestvan xwedan ezmûn û paşxaneke baş be nikare wêneyên hunerî yên serdema beriya xwe piştguh bike, çimkî wêneyên hunerî yên serdema berê şoreşeke wêneyan pêk anîne, lewra bi her şêweyekê be helbestvan xwestiye yan hewl daye pirîska wê şoreşê lê jî bikeve, lewma vegera helbestvan bo edebiyata pêşiyan qet ji helbestvanî û bihayê wî yê helbestvanî kêm

[157]Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2004, r.285.
[158]Steven Spender, *Jiyan û Helbestvan*, w: Dr. Mistefa el Bedewî, Pirtûkxaneya Anglo-misrî, Qahîre, r. 104.

nake, lê ew veger dibe motîfeke bihêz bo pêşveçûna helbestvan di dinyaya rengîn a helbestê de.

Lewma vegera helbestvan bo edebiyata pêşiyan ne bê sedem e, çimkî her helbestvanê nû dizane ku helbestvanên kevin çi wêne û sembol û hêma bikar anîne, wan hewl daye wê dinyaya balkêş a edebiyata pêşiyan nas bikin û di berhemên xwe de reng pê bidin. Lê pir caran ew wergirtin dibe sedemê kirêtbûn û lawazbûna helbesta nû, ji ber ku hinek helbestvan bawer dikin dema berê xwe didin edebiyata berê nabe destkarî bike yan wek xwe di teksta xwe ya şiîrî de bikar tîne, lewma dibe ku ev kêmezmûniya helbestvan nîşan bide, çimkî bi tu behaneyê nabe wêneya helbestvanekî din wek xwe bê destkarî werbigre eger helbestvan karekî wiha kir, bila xwedî ezmûn be jî, ev dê bibe sedemê ketin û hilweşîna berhema wî, lê bi şêweyeke giştî helbestvanê nû bi her şêweyekê ji şêweyan dikare sûdê ji wan hemû berhemên kevin werbigre û wan bike havêyna helbestê û dirustbûna wêneyên hunerî. Bêguman dema helbestvan bikare sûdê ji wan berhemên kevin werbigre, berhemên wî cudatir û birîqedartir derdikevin.

Guman tê de nîne ku helbestvanekî wek Hêmin karîbû bi şêweyekê ji şêweyan û bi xwe jî xwestiye sûdê ji wan berhemên kevin werbigre, çimkî Hêmin ji bilî ku rewşenbîrekî baş bû, dîwanên şiîrî yên piraniya helbestvanên Fars ên klîask fena (Hafizê Şîrazî – Sadî Şîrazî û Mewlana Celaledînê Romî) ne tenê xwendine, lê bi ser de jî piraniya helbestên wan jiber kirine. Lewma di cihê xwe de ye em bêjin gelek ji wan wêneyên rengîn ku di helbestên wî de tên dîtin, sûdwergirtina helbestvan bi xwe bû ji berhemên wan helbestvanên Fars. Ji hêleke din ve jî bandora helbestvanên klasîk ên Kurd jî li ser wî hebû, çimkî piraniya helbestên wan jî xwendiye û ev hemû jêderên bihêz bûn ku helbestvan kirin çavkaniyên helbesta xwe û berhemên xwe pê dewlemend kirin. Lewra em jî piştî hûrbûna me li ser wan wêneyan em tên wan nîşan didin ku her yek bi bedewî û xemla xwe bibînin heta çiqasî bala me dikşînin.

Mehwî dibêje:

Min roj reşim û ferqî nîye rojî min le şew

Sed roj eger helê leserim rojim her şewe [159]

Mehwî di vê helbestê de wêneyeke balkêş dirust dike. Di wêne de, xwe nola kesekî bextreş û çarereş nîşan dide bi cureyekê digihe asta ku bêje: Eger roja ronak jî xwe nîşanî min bide û li ser min hilbe, ew roja ronak ji ber bextreşî û çarereşiya min roja min a ronak dibe şev û divê ez hemû jiyana xwe di tarîtiyê de derbas bikim. Di bin bandora vê wêneyê de, Hêmin dibêje:

Qet le dûnya da nebû bêcige le naxoşî beşim

Mat û damaw peşê û bêkes û çarereş im

Serdemêk aware bûm û maweyekîş derbeder

Nemdî rûyî asûdeyî, her tûşî gêre û qereşim [160]

Hêmin çavkaniya vê wêneyê ji Mehwî wergirtiye, lê bi şêweyeke cuda dariştiye, bi cureyekî ku Mehwî wiha nîşan dide ku hertim mirovekî bextreş û çarereş e û qet rojeke xweş di jiyana wî de tune, tew rojên wî yên ronîdar jî ji ber bextreşiyê bûne rojên tarî. Lê Hêmin wêneyeke cudatir dikşîne ku ew tesaduf jî guman nake di jiyana xwe de, bi ser de hemû jiyana wî nexweşî û belengazî û tevlîhevî bû û li ba wê nexweşiyê jî ranaweste, lê digihe asta ku bi ser perîşaniya xwe de tûşî derbideriyê jî dibe.

Melayê Cizîrî dibêje:

Şox û şengê zuhre rengê

Dil ji min bir dil ji min

Awirên heybet pilingê

Dil ji min bir dil ji min [161]

---

[159] *Dîwana Mehwî*, çapa 6, Weşanxaneya Kurdistan, Sine, 2008, r. 410.
[160] *Dîwana Hêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 160.
[161] *Dîwana Melayê Cizîrî,* r.98.

Şox û şengî sîfeteke ku ji jinan re tê bikaranîn. Lewma çiqas gotinên bedewî û ciwaniyê hebin di peyva şox û şengiyê de kom bûne. Dema ji jinê re hat gotin (şox û şeng), yanî ew hemû peyvên ku ji bo wesfkirinê tên bikaranîn bi ser de hatine barandin. Lê Melayê Cizîrî ev wesf bedewtir kiriye. Wiha diyar e ew jina ku Melayê Cizîrî wesfê wê daye, xwedî taybetmendiyekê bû ji bilî şox û şengiya wê, çavnetirsiya jinê wek sîfeta piling dîtiye, ji ber ku piling ruhberek e xwedan dilêrî û çavnetirs e lewra helbestavn şibandin di navbera çavnetirsiya jinê û pilingê de kiriye, lewra helbestvan bi sedemê wê sîfeta ku di jinê de dîtiye, ligel her sêrkirinekê dilê helbestvan ji xwe re biriye û helbestvan bêdil kiriye, mirov jî nikare bê dil bijî. Di encamê de wêneyeke bedew dirust kiriye. Di bin bandora vê wêneyê de, Hêmin wêneyeke bedew afirndiye û dibêje:

Ke êwaran kezît dekirdin sê bengî û çawit derişt

Bew kezî û çawe nermane bê rehmane şiwant dekuşt [162]

Hêmin yek e ji wan helbestvanên ku di nav siruşt û civakeke kurdî ya petî de jiyaye. Vê siruştê bandoreke mezin li ser helbestvan kiriye, lewra dema Hêmin di biharê de diçe deştê û di dema doşîna pêz de bêriyek bala wî dikşîne ku wesfeke bedew lê dike, wê bêriya ku mih doşandiye, xwe ji bêriyên din cudatir nîşan daye û keziyên xwe kirine sê bengî di demekê de ku hemû jinên din keziyên xwe kirine du bengî yan kêm bêrî hebûn bo pezdoşînê wiha çavên xwe kil bikin, helbestvan ew bedewiyên ku li ba wê bêriyê dîtiye, lewra mîna şengebêrî wesfa wê kiriye, zêdetir jî xwe xemilandina wê ji bo wê yekê bû da ku bala şivên bikşîne, çimkî dizane şivan ji jinan dûr in û karê wan çêrandin û xwedîkirina pez û dewar û sewalan li çiya û deştan e. Ev yek jî bûye sedem ku çêja jinê bêhtir di dilê şivan de asê bimîne, bêrî jî bêrehm û bi wê şox û şengî û çavên xwe yên bedew ne tenê hişê şivên biriye, lê bi tîrên çavên xwe ew kuştiye. Yanî Hêmin wêneyeke bedew ji wê wêneya şiîrî ya Melayê Cizîrî pêk aniye.

---

[162] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 215.

Mewlana Celaledînê Romî dibêje:

Goft mehşwqî bi aşiq kay fetî

Tw bi xwrbet dîde ay bis şehreha

Pes kidamîn şehir zanha pigter ast

Goft: en şehr der wî dilber ast [163]

Di vê helbesta Mewlana Celaledînê Romî de wêneyeke bedew tê dîtin, ku cure guftûgoyek di wêne de hest pê tê kirin, hevawayê nîşandaneke biçûk û sade, lewra ew cure guftûgo bi helbestê hatiye derbirîn cudatir ji helbestên din û naveroka helbestê jî pirsyarkirin e, gava pirsyarê ji yara xwe dike qaşo ku tu li gelek bajar û gundan geriyayî û wek gerokekî li te hatiye, ji nav wan hemû cih û şûnên ku tu li wan geriyayî, kîjan li ba te xweş bû û bala te kişand. Di bersiva pirsyara xwe de, bersiveke cuda dide hezkiriya xwe ku hezkirin jê dibare û dibêje: Ew cih yan ew dever xweş e ku yar lê be. Bi baweriya wî her cihekî dûrî yarê bêqîmet e. Di bin bandora vê wêneyê de, Hêmin wêneyeke teze ava dike û dibêje:

Ke dil xoş bû dilo ba derbika dest

Şeket bê ba leş û asûde bê hest

Desêk bigirê be şew le milî nîgarê

Be roj mandû bê ba her le karê

Deswpencêk ke bwkşê ciwte memkê

Cemam nabê bekarê takû neşkê

Kew lêw bimjê şewane lêwî yar

Berenc kêşanî rojê nakirê bar [164]

Hêmin di vê helbestê de bi rêjeyeke mezin karîbû sûdê ji wê helbesta Mewlana Celaledînê Romî werbigre, lê bi teknîka xwe û şarezayiya xwe bi şêweyeke din

[163] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r.270 .
[164]Jêderê Berê, r.160.

dariştiye. Hêmin ji pêşî heta dawî wêneyeke wiha dirust kiriye ku pêwendiyeke bihêz di navbera wêneyan de heye. Hêmin bi bawer bû ku her deverek yan her cihek ku yar lê nebe, herçiqasî asûde be, bêbiha ye. Lê mirov herçiqasî betilî û nexweş û birçî û tî be, heta bigihe asta ku laşê wî jî biêşe, li ba wî ne girîng e eger li ba yarê û di hembêza yarê de be, çimkî bi baweriya helbestvan yara wî dermankera wan hemû azarên fîzîkî û derûnî ye ku wan di dûriya yarê de dikşîne.

Nalî dibêje:

Ey şoxî bê nyazw giran anzw xemze sûk

Tîrî mûjet nîşaneyî dil kun deka be nûk[165]

Nalî di vê malika helbesta xwe de wêneyeke edebî ya bedew afirandiye ku heta pileyeke bilind evîn û nazdarî jê dibare. Gelek wêneyên bedew ji kaniya bêbinî ya Nalî herikîne bi awayekî ku bandoreke mezin li ser helbestvanên serdema xwe û piştî xwe dirust kiriye. Armanca Nalî di vê wêneyê de ew e ku tîra mijangên yarê ewqasî tûj e ku hertim nîşana xwe kun kun kiriye ku mebest jê dilê dildar e. Herçiqasî tu ne muhtacê kesî bûyî lê belê nazikî û nazdariya te bi giranî li ser dildaran ketiye û tu dev ji wê pozbilindiya xwe bernadî.

Hêmin di bin bandora vê wêneya bilind a Nalî de, wêneyeke cuda û bi teknîkeke cuda ava dike û reng û bêhneke din lê zêde dike û dibêje:

Çawekem çawî reşî to afatî giyanî min e

Giyanekem birjangî tîjt nûke rimbî dûjmin e [166]

Helbestvan çavkaniya vê wêneya xwe ji Nalî wergirtiye. Li vir dema Hêmin dibêje çawekem (çavê min) armanca wî evîndara wî ye ku çavên reş û bedewiya yara xwe wek afat û bobelat û bela li ser canê xwe dîtiye, çimkî her cara ku ew çavên hezkiriya xwe dibîne tûşî sergerdaniyê dibe, lewra bi baweriya helbestvan eger çavên wê bi vî rengî bin, êdî mijgulên wê jî ne kêmtirî wan in û ew jî karê xwe dikin, çimkî di tûjbûnê de mîna serê rimên dijmin in û li nîşana xwe dikevin. Helbestvan di wêne

[165] *Dîwana Nalî*, çapa 6, Weşanxaneya Kurdistan, Sine, 2006, r. 264.
[166] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 162.

de bêhtir behsa wê yekê dike ku bi tu hawî ew hêz û şiyana wî tune xwe li ber karvedanên hezkiriya xwe rabigre yan liber xwe bide.

Nalî di wêneyeke din de dibêje:

Germî ûterî behare ke pişko kujayewe

Pişkoî gul ateştîn be nesîm bû geşayewe [167]

Nalî di kûriya wate û bedewiya wesfê de, bi astekê bilind bû ku gihîştiye asta helbesta neteweyên Fars, Tirk û Ereb, çimkî wesf yek ji armancên sereke yên helbesta kurdî ye û mecalekî berfireh di helbesta Nalî de dagîr dike, vêca ew wesf wesfa siruştê be yan kes be yan her tiştekî din be. Ev wêneya Nalî wesfeke şênber a biharê ye û bi dîtina wî ku bihar germî û terrî ye û dawîanîn e li sermaya zivistanê. Bedewî û pişkivîna wan gulên sor ên biharê jî bi bayê hînik ê biharê geş bûne. Hêmin di bin bandora vê wêneya Nalî de, wesfeke bedew a biharê dike nemaze bihara Kurdistanê û dibêje:

Şemal gat be galegal

Hewr bûn gewal gewal

Pişkwt gulî geş û al

Bilbil kewte nale nal

Belengêze, be baran

Be şine bay beharan

Tiwanewe wekû caran

Kewî befrî nisaran[168]

---

[167]*Dîwana Nalî*, çapa 6, Weşanxaneya Kurdistan, Sine, 2006, r. 51.
[168]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 147.

Wek piraniya helbestvanan, yek ji armancên şiîrî yên Hêmin wesf bû. Di vê wêneyê de, Hêmin îlhama vê wêneyê ji Nalî wergirtiye. Bi cureyekî bihara Kurdistanê ji me re dinexşîne hevawayê tabloyekê ku çawa wênekêş hemû cureyên rengan bikar tîne bo bedewkirina tabloya xwe, da ku bi şêweyeke birîqedar derkeve. Helbestvan bihar kiriye çavkaniya helbesta xwe çimkî demsala biharê bi keskahî û bedewiya xwe dikare xeyal û hestên helbestvan bilivîne û di wê navê de siruşt kirasekî rengîn û qeşeng li bejna xwe dike û guhertin di ax û av û hewayê de rû dide, êdî dawî li serma û ewrên zivistanê tê, ewr belav dibin û gul dipişkivin û bilbil dikeve xwendinê û berfa çiyan bi bayê hînik ê biharan dihele û kew li şaxan pir dibin, bi giştî di biharê de her tişt kirasekî nû li xwe dike.  Hacî Qadirê Koyî dibêje:

Be şîr û xame dewlet payedar e

Emin xamemem heye, şîr nadiyar e [169]

Hacî Qadirê Koyî helbestvanekî netewperwer bû, lewra di vê malika helbesta xwe de wêneyek kişandiye ku bingeha dirustbûna dewleta kurdî li ser du tiştan ava kiriye (şûr û qelem). Di naveroka helbesta xwe de diyar kiriye ku ew kesê ku qelem pê re ye ew bi xwe ye, lê kesê duyem ê şûrbidest ne xuya ye. Helbestvan bawer dike ku ne tenê bi qelembidest û ne tenê bi şûrbidestan dewlet payedar nabe, lê herdu dikarin bigihin wê xewnê, lê tiştê ku helbestvan dilgiran kiriye û bi zelalî di wêne de hest pê tê kirin nebûna kesekî wek wî ye ku xema neteweya xwe bixwe, çimkî Hacî bi qelemê berxwedanê dike, lê şûrbidest dibe ku nebe yan nediyar e.

Di bin bandora vê wêneyê de, Hêmin dibêje:

Lawekan! Dil pakekan! Çalakekan! Pêşmergekan!

Êwe şîrî lê bisûn û ême pir dedeîne qelem

Her beyekgirtin le dest bêgane dêyne derê

Xakî pakî kurdewarî nayelîn bo kes elem [170]

---

[169] *Dîwana Hacî Qadirê Koyî*, çapa 1, Weşanxaneya Kurdistan, Sine, 2011, r. 251.
[170] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 124.

Hêmin raman û bîrokeya vê wêneyê ji Hacî Qadirê Koyî wergirtiye, bi cureyekê ew jî bi heman şêweya Hacî tiyê dirustbûna dewleteke serbixwe ye û armanca wî ye kar bike bo teşwîqkirina hemû çînên civakê bo hişyarbûna wan ji bindestî û perçiqandina wan bi destê zordaran, ew jî bawer dike tenê bi rewşenbîr û qelemê dewlet ava nabe, lewra li tenişta qelemê pêwist e şûr yan çek jî hebe, çimkî bi herduyan em dikarin milet xweşbext û asûde bikin bo siberojeke geş. Wêneyên herdu helbestan di encama bilindiya hesta welatperwerî di hundirê her yekî ji wan de derketiye holê, çavkaniya vê hesta mezin jî vedigere helbestvanê mezin ê klasîk Ehmedê Xanî.

Di wêneyeke din de Hacî Qadirê Koyî dibêje:

Selahî êwe êstake sîlahe

Temahî gewreyî bê çek neken nek [171]

Hacî di vê wêneyê de hawar dike, dijminên sereke destnîşan kirine ku temahkar û dagîrkar in, bo rûbirûbûna van dagîrkeran jî çek wek baştirîn çareserî dîtiye û dozê li milet dike eger bîrokeya we ya damezrandina dewletê heye, bi tu hawî armanceke we nebe ku çek pê re nebe, çimkî bo standina mafê xwe û miletê xwe çek wek baştirîn çareserî dîtiye. Hêmin di bin bandora vê wêneyê de dibêje:

Pêt dalê nûkî qelem: nûkî qelem

Zor le şîr baştir e deparêzê elem [172]

Hêmin di vê wêneyê de ketiye bin bandora Hacî Qadirê Koyî de, lê bi şêweyeke cuda û wêneyeke cuda, çimkî Hêmin bawer dike bo rûbirûbûna temahkar û dagîrkeran û parastina welêt, qelem wek baştirîn amraz daniye bo bergirîkirina ax û welat û serweriyên her neteweyekê, eger em bikarin wê qelemê bi şêweyek baş û pêwist bikar bînin.

---

[171] *Dîwana Hacî Qadirê Koyî*, çapa 1, Weşanxaneya Kurdistan, Sine, 2011, r. 79.
[172] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 113.

Hacî Qadir di wêneyeke din de dibêje:

Ta rêk nekewin qebîlî ekrad

Herwa debin xerabe abad [173]

Hacî yek bû ji wan helbestvanên ku herdem xema gel û neteweya xwe dixwar, wî parçebûna kurdan bi çavê xwe dît, bi şêweyekê her yek ji aliyekî ve tê perçiqandin, lewma helbestvan bawer dike eger her bi vî rengî bidome tucar dewlet nayê avakirin, lewra dozê li kurdan dike û heta jê tê hawar dike bibin yek ji bona mana xwe û dirustbûna kiyanê we yê serbixwe. Helbestvan bawer dike ku Kurd bi yekîtiyê dikarin gelek tiştan bikin, lewra yekîtî û yekrêziyê wek çareseriya herî baş dibîne.  Hêmin dibêje:

Her beyekgirtin ledest bêgane dêyne derê

Xakî pakî kurdewarî, nayelîn bo kes elem[174]

Hêmin di vê wêneyê de jî ketiye bin bandora Hacî Qadir û wêneyeke bedew pêk aniye. Hêmin bi heman şêweyê bawer dike eger neteweya Kurd yekdeng û yekreng û yekziman be, tu hêz nikare axa wî dagîr bike û li ser axa wî zarokên wî biperçiqîne çimkî helbestvan bi çavê xwe dîtiye Kurd çawa bi hev re tevdigerin û bi şêwazeke çawa tevger bi wan re tê kirin. Encama wê cure tevgerê bi hev re wiha li kurdan kiriye axa wan bê dagîrkirin û wan li ser axa wan bê maf bikin. Helbestvan êşa dagîrkirina axê dîtiye, lewma ew dozê li kurdan dike bibin yek ji bona dirustbûna mirovekî ku xwediyê hestê neteweyî be û xema berjewendiyên bilind ên neteweya xwe bixwe.

Ev herdu wêneyên li jor, naveroka wêneyan yek armanca wan heye ku ew jî parêzvanî kirin û yekdengî û yekrêziya kurdan e li ser axa wan. Çimkî bi baweriya helbestvanan neteweya bê ax nikare aramiyê bibîne û her neteweyek bixwaze dikare zulmê lê bike û wê dagîr bike û xêr û bêrên axa wê ji xwe re bibe. Lewra bi nerîna

[173] *Dîwana Hacî Qadirê Koyî*, çapa 1, Weşanxaneya Kurdistan, Sine, 2011, r. 200.
[174] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 124.

helbestvanan, her neteweyek hevgirtî be tu hêz nikare aramî û istîqrara wê neteweyê têk bide, çimkî wan herdu helbestvanan jî tama nebûna axê û zulm û stemkariyê dîtiye.

Safî Hîranî dibêje:

Derdî dûrîm çeştiwe jehrî fîraqim noşî ye

Boye ke xoşîm nexoşî û nexoşîm xoşî ye [175]

Safî di vê malika helbestê de wêneyek kişandiye hevawayê tabloya nîgarkêşên navdar. Mebesta wêne ew e ku tu êş bi qasî azar û êşa dûriyê nîne, bi şêweyekê gihîştiye wê asta ku azara dûriyê bi jehrê re berhev kiriye û jehra wê dûrî û veqetînê jî noş kiriye, çimkî ji ber wê dûrî û veqetînê demên xweş jî li helbestvan bûne nexweşî.

Hêmin dibêje:

Derdî dûrî, derdî dûrî, kuştimî

Derdî wişyarî û sebûrî kuştimî

Yadî yaran û wilatim roj û şew

Lêy heram kirdim qerar û xwird û xew [176]

Hêmin çavkaniya vê wêneya xwe ji Safî wergirtiye. Wêneyeke nû bi teknîkeke nû ava kiriye. Dûrî li ba herkesî êşa wê heye. Helbestvan jî di vê wêneyê de ji bilî derdê dûriyê, ji derdekî din jî dinale ku nebûna hişyariya civakê ye, yanî helbestvan xwe bi tenê wek kuştiyê derdê dûriyê nabîne, lê derdê nehişyariya civakê jî lê zêde bûye, lewma ew xwe du caran wek kuştî dibîne.

Di wêneyeke din de, Safî Hîranî dibêje:

Bulbul ke daîm be şîn û zare

Heqye ke xunçey le dest exyare

Ew gul hemû dem her lelay xare

---

[175]*Dîwana Safî Hîranî,* Weşanxaneya Wezareta Perwerde, Hewlêr, 2004, r. 133.
[176]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 280.

Bo şerm naka le endelîban [177]

Hêmin di bin bandora vê wêneya Safî de, wêneyeke nû ava dike û dibêje:

Minîş ey bulbulî bendî weku tom

Weha dûr im le hêlane û gulî xom

Minîş weku to le kîsim çû gulî sûr

Minîş hêlanekem lê kirawe xapûrr [178]

Hêmin vê ramana Safî dubare dike, lê atmosfêreke şiîrî ya nû bi reng û bêhneke cuda di wêneyê de şênber dike ku ji hundirê wî bi xwe dizê, bi şêweyekê her yekî ji wan wêneyên hundirê xwe yên asêmayî û xwe jî dişibînin bilbil. Safî bawer dike bilbil tevî ku balindeyekî dengxweş û bedew û dildarê xunçe û gulan e, lê gul û xunçe li ba bilbil nenaskirî û biyanî ne, piştre êrişî wan kesan dike ku bilbil zindan kirine û ji wan re dibêje çawa şerm nakin ji wan bilbilan. Hêmin wêneyeke cudatir pêk aniye û bi şêweyeke din dariştiye, bi awayekî ku xwe dişibîne bilibl, ku çawa bilbil bi sedemê rekehê dûr e ji gul û gulzaran û helbestvan jî ji ber ku ji yara xwe dûr e, bawer dike mal û landik û jiyana wî hatiye wêrankirin.

Mewlewî dibêje:

Îmşew hemdîsan derun pir xemen

Esasey matem celamen çemen [179]

Li jêr ronahiya bilind a vê wêneyê, wêneyeke teze di malzaroka şiîrî ya Hêmin de ji dayik dibe û dibêje:

---

[177] *Dîwana Safî Hîranî*, Weşanxaneya Wezareta Perwerde, Hewlêr, 2004, r. 269.
[178] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 158.
[179] *Dîwana Mewlewî*, r 84.

Eger şew direnge saqî bom têke kemêkî tir

Kewa emşew serîhelda lenaximda xemêkî tir

Lebade em jeme têr kir minî tînwî ciger sûtaw

Beçî diyare ke debînim şewêkî tir, jemêkî tir! [180]

Hêmin wêneya Mewlewî aniye û kiriye çavkaniya binyatkirina wêneyeke nû ku bi teknîkeke cuda wêneya xwe birîqedartir kiriye. Mewlewî di wêne de amaje bo wê yekê dike ku xem tucarî dev ji helbestvan bernade û helbestvan wiha bêzar kiriye bi cureyekî tu şevê nikare bi aramî rakeve, her ew xem jî bûne çavkaniya wê yekê ku Mewlewî bi berdewamî şînê girêde bi cureyekî ku bi wan hatiye dorpêçkirin û nikare xwe ji wan rizgar bike.

Hêmin di vê wêneyê de amaje bo wê yekê dike ku dîsa xemeke din pêsîra wî girtiye û xweşiyên wî lê kirine nexweşî, ji bo rizgarbûna ji wan hemû xemên ku tûşî wan bûye, (mey)ê wek baştirîn çareserî dibîne ku wî rizgar bike, çimkî bi baweriya wî tenê bi bade û meyê têr vedixwe di wê şeva dereng de, û nepiştrast e jî ku şeva dahatû xemeke nû pêsîra wî digre yan na. Lewra jî helbestvan dibêje ez ne piştrast im ku şeva dahatû dijîm yan na, çimkî wiha ye jî bila ez têr meyê binoşim û xemên xwe birevînim. Goran di wêneyekê de derbarê payîzê dibêje:

Payîz! Payîz!

Bûkî pirç zerd

Min mat, to zîz

Herdû haw derd

Min firmêskim, to baranît

Min henasem, to bay sardit

Min xem, to hewrî giryant

---

[180] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 301.

Diwayî naye: dadim, dadt

Hergîz, hergîz

Payîz! Payîz!

Payîz! Payîz!

Şan û mil rût

Min mat, to zîz
Herdûkman cût
Herçend gul sîs ebê bigrîn
Altunî dar erjê bigirîn
Polî balder efirê bigirîn
Bigirîn.. bigirîn..çawman nesrîn
Hergîz, hergîz
Payîz! Payîz! [181]

Goran di vê helbestê de digihe romansiyeteke pir mezin û payîz dibe çavkanî û îlhama wêneyeke sosret di malzaroka şiîrî ya helbestvên de, di xemgîntirîn demsala salê de ku payîz e, helbestvan bi cureyeke wiha tevlî xweza û payîzê dibe ku herdu dibin yek û sînor di navbera wan de namîne. Di wêne de, helbestvan payîzê wek xwe dibîne ku heman derdê wan heye, lewma hevkêşe wê çaxê ber bi xilasbûnê diçe gava Goran danberhevê berfireh dike, xem û azar û hilwerîna xwe dişibîne xem û azar û hilwerîna payîzê:

Firmêsk = baran

Henase = bayê sar

Xem = ewrên girî

---

[181] *Dîwana Goran*, çapa 3, Çapxaneya Dalaho, Tehran, 2007, r. 135.

Goran payîz hilbijartiye, çimkî di wê demsalê de çûye hembêza xwezayê û mirina (bedewiyê) tê de dîtiye, bedewî jî li ba Goran hertişt e û nemana bedewiyê wî pir diêşîne û dixe dinyayeke tije jan û keser, çimkî nemana pel û daran û çilmisîna gulan helbestvan diêşînin bi awayekî ku tenê koça dawî ya Hîwayê kurê helbestvan ew bi vî rengî êşandiye, lewma di vê wêneyê de helbestvan û xweza du rûyên heman diravê ne û di dawî de herdu bêhêvî dibin. Hêmin li jêr bandora van hestên kûr û bicoş ên Goran, helbesta (Êwarey Payîz) bi teknîkeke cudatir ava dike, lê balkêş e ku em nikarin bêjin ev kartêkirin bi tevahî diçe qalibê edebiyata pêşiyan, çimkî Goran û Hêmin di temen de nêzîkî hev bûn, lê em dikarin bêjin bandora helbesta hevçax e.

Hêmin dibêje:

Le asoyekî dûre dest   awa bû zerdî payîz

Det gût bûkî bê naze   perde cêdêlê be zîzî

Pele hewrêkî çilkine   girtî swçêkî asman

Gelay zerdî darêk werî   ziryan birdî berew neman

Cûtêk kotrî ser bekwlawe   helkwr mabûn le swaneyek

Diyare lew dewrûberane   pêyan şik dêt hêlaneye

Pasarî ser darî gulan   firew cîkeyan birî

Qel firî..firî ta win bû   her rû reşî xoy pêbira

Şepolêk mosîqay besoz   hatw rabird beber gwêmda

Helbest bi vê wêneyê bidawî dibe

Gûtim: kewabû aşna   beşî ême lenêw çûne

Gûtî ((na, na, dûr binware...dûr binware aso rûne...)) **[182]**

Hêmin sûd ji heman wê çavkaniyê wergirtiye ku Goran di helbesta Payîz de wêneya xwe li ser wê ava kiriye, lê bi şêweyeke cudatir. Ev helbest yek ji helbestên

[182] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 287-291.

herî bedew ên helbestvan e, çimkî bi sozeke bedew û li jêr bandora xwezayê wêneyeke bedew ji me re kişandiye. Di naveroka wêne de cureyek reşbînî bi helbestvan ve diyar e ji ber wê rewşa ku helbestvan tê de jiyaye ku bi êvara rojeke payîzê berhev kiriye. Helbestvan bawer dike ku hertişt ber bi neman û xilasbûnê diçe, herçiqasî bi me nexweş be jî, pelên darê jî wek nimûneyeke bedew aniye ku di demsala payîzê de diwerin û firtone û babelîsok wan pelên zer û bedew bi xwe re dibin ber bi nemanê. Helbestvan wêneya çûk û beytikan ji me re dikşîne ku ji ber wê firtone û babelîsoka payîzê mal û cih û hêlîna wan hatiye wêrankirin. Payîzê ne tenê pelên daran weşandiye, lê bûye hokar jî ku firîn û çîveçîva wan çûkan jî bibire ku mala wan têk daye. Helbestvan jî xwe wek wan çûk û beytikan dibîne ku mal û cihê wan hatiye têkdan û bi tu hawî xweşî di dilê helbestvan de nehîştine. Di dawiya wêne de, hêviyek dikeve dilê helbestvan tevî wan hemû bûyerên nexweş ku di jiyana xwe de rûbirûyî wan dibe, hêj yek hebû asoya pêşberî helbestvan geş kiriye, gotiye li dûr binere aso hîn ronîdar e, di demekê de helbestvan di wê baweriyê de bû pişka wan tenê jinavçûn e. Ehmed Muxtar Caf dibêje:

Lexew hestin millet Kurd xew zerertane

Hemû tarîxî halem şahîdî fezl û hunertane

Bixwênin çunke xwêndin bo dîfahî tîxî dujmintan

Hemû anû sehatê heynî qelxan û supertan[183]

Helbestvan di helbestê de hawar dike û dozê li miletê Kurd dike ku ji xew rabe. Mebesta helbestvan bêhtir ew e ku hişyar bin li hember miletên din û bila êdî we neperçiqînin, ji ber ku hemû dîroka dinyayê şahidê mezinahiya we ye. Helbestvan bawer dike miletê Kurd bi xwendinê digihe armanca xwe, xwendinê wek bergirîkarekî dibîne li dijî dijminan. Helbestvan amaje dide wê yekê ku herdem pêwistiya kurdan bi xwendin û xwendewariyê heye, çimkî bi dîtina wî tiştê ku milet ji zulm û stemkariyê rizgar dike û nahêle stem lê bê kirin tenê xwendin e. Çimkî ji helbestvan re diyar bûye ku miletên nexwendewar û paşketî nikarin tiştekî berhem bînin. Li jêr bandora vê wêneyê, Hêmin dibêje:

[183] *Dîwana Ehmed Muxtar Caf*, Çapxaneya Edîb, Bexda, 1986, r. 35-36.

Rapere, heste lexew, axir çi wextî xewtine

Derke bişkêne, peçe bidirêne, rake medresa

Çarî derdî kurdewarî xiwêndine, her xiwêndine

Daykî zanaye kurî aza denêrête ceng [184]

Naveroka helbestê heman ew armanc e ku Ehmed Muxtar Caf wêneya xwe li serê ava kiriye. Lê Hêmin bi teknîkeke cudatir wêneyeke bedew pêk aniye. Armanca helbestvan bêhtir hişyarkirina miletê Kurd e bi giştî li hember miletên din, çimkî helbestvan bawer dike ku nabe millet êdî her mijûlî raketin û dem derbaskirinê be bi tiştên kelevajî, ji ber ku helbestvan gihîştiye wê yekê ku çareya derdê miletê Kurd xwendin e, bi xwendinê nifşekî zana û hişyar tê avakirin û ji bona rizgarkirina ax û milet û welatê xwe têkoşînê dike.  Di wêneyeke din de Ehmed Muxtar Caf dibêje:

Witim maçe kerem fermw be (Ehmed), bendeyî xote

Witî çî bikem ledest em kure begzade bê hare [185]

Helbestvan di vê wêneyê de wiha diyar e doza maçekê ji yara xwe dike di demekê de xwe wek bende û mirîdê yara xwe dibîne. Yara wî jî bêdesthilatiya xwe li hember vê daxwaza helbestvan nîşan dide, çimkî helbestvan kurê begzade ye û redkirina daxwaza kurê begzadeyan tiştekî sosret bû, lewra divê yara wî bi neçarî daxwaza wî qebûl kiribe û maçek dabe helbestvan. Li jêr bandora vê wêneyê, Hêmin dibêje:

Were giyanim çawim fîday reşî to

Were ba hest bikem germî leşî to

Were maçim deye maçî xwdayî

Ke bêzarim le maçî sînemayî [186]

---

[184]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 117.
[185]*Dîwana Ehmed Muxtar Caf*, Çapxaneya Edîb, Bexda, 1986, r. 113.
[186]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 298.

Di vê wêneyê de Hêmin bi şêweyeke cudatir ketiye bin bandora Ehmed Muxtar Caf . Gava helbestvan daxwaza maçê ji yara xwe kiriye, beriya maçê çend caran xwe qurban û gorî yara xwe kiriye û bi cureyekê gihîştiye wê asta ku jê re bêje were bila ez hest bi germiya laşê te bikim, di dilbijîna maça yara xwe de bêzariya xwe ji maça hewayî û fîzîkî nîşan daye, diyar e helbestvan tenê tama maça hewayî kiriye, lewra jî ewqasî ji wî cureyê maçkirinê bêzar bûye.

### 2.2.1.2. Çavkaniyên kelepûra gelêrî

Wan hemû kelepûrên edebî, hunerî û folklorî vedihewîne ku nifş bi nifş ji bav û bapîrên me ji me re mane wek hîkayet, gotinên pêşiyan, kevneşopî, helbesta folklorî û dastan û efsane û ...hwd. Ev berhem jî ji ber ku xwediyên wan nediyar in, wek mulkê hemû milet tên hejmartin. Helbestvan kurê vî miletî ye û li gor xeyal û berfirehiya bîr û baweriyên xwe û nerîna xwe sûdê ji wan çavkaniyan werdigre û bi şêweya xwe ya taybet û teknîka xwe sûdê ji wan berhemên folklorî werdigre. Bi awayekî helbestvan her ji heyama zaroktiyê ve bi awayekî ji awayan û kêm zêde wan jêderan nas dike û dibihîze, bi pileya yekem dapîr û bapîrên me xwediyên xezîneyeke mezin a çavkaniyên kelepûra gelêrî bûn, wek hîkayet û dastan û efsane û çend berhemên din. Lewra bi awayekî baş jî rengdana wan jêderan li ser helbestvan diyar e û tê hîskirin.

Edebiyata ku em îro jê re dibêjin edebiyata nû yan hevçax, nifş bi nifş ji kevin de heta îro gihîştiye, bi atmosfêra kelepûra gelêrî terr bûye, yanî ((*Ev terzê edebiyata ku îro navê wê dikin (folklor) nifş bi nifş li ser ziman geriyaye, heta gihîştiye îro, di nav xelkê de bi rengê efsane û hîkayet û gotinên pêşiyan û pendan û stranan...hwd belav bûye*))[187] Hemû helbestvan, ên klasîk jî di nav de, heta îro avê ji wê kaniyê dinoşin û bidawî nayê, çimkî ji çavkaniyeke bihêz derdikeve, her yekî bi şêweyekê helbesta xwe pê xemilandiye û bi teknîka xwe sihrbaz kiriye. Lewma bikaranîna wan hemû çavkaniyên kevin dibe sedemê mana wan û rizgarbûna wan ji windabûnê, çimkî her tişt bila binirx jî be wexta nehat bikaranîn ji nav diçe, lewra ((*Gelek caran folklor dibe bingeha dirustbûna gelek berhemên hevçax û serkeftî. Ev jî girêdayî wîjdana dîroka her neteweyekê ye û sîfet û xasiyetên folklor ku di kelepûra neteweyî*

[187] Dr. Necm Elwenî, *Nîşandana wêne di dîwana Pirrim le Eşqî Toda*, Rojnameya Kurdistanî Niwê, hejmara 531, 2007, Silêmanî.

*ya her neteweyekê de rewşa wê neteweyê ya dîrokî û qonaxên guherîna wê nîşan didin*))[188], lewma folklor li gor serdeman guherîn tê ser cureyên wê, li gor zêdebûn û bikaranîna berhemên folklorî yanî ((*Kelepûr ew malzarok e ku hemû tê de perwerde dibin, teşeya rewşenbîriya me ya seretayî tê de hatiye nexşandin, ewên dibêjin kelepûra wan nîne, wek ku bêjin dayika me nîne, kelepûr dostek e dilê me pê vedibe, em pê dişêwirin, ne ku polîsek e kelepçe bixe destê me û rûniştina mecbûrî li ser me ferz bike*))[189] Yanî em dikarin bêjin em hemû deyndarên kelepûrê ne, divê em bi canê xwe wê biparêzin. Hêmin yek e ji wan helbestvanên ku bi tu hawî kelepûr piştguh nekir û di piraniya helbestên xwe de bi kûrî bikar aniye, çimkî Hêmin xelkê parçeyekî Kurdistanê ye ku bi kelepûra milî û gelêrî pir navdar e.

Hemû ew kelepûra gelêrî ku Hêmin ronahî xistiye ser û esmanê helbesta xwe pê ronîdar kiriye, bi nerîneke cuda bi wan re tevgeriyaye, lewma em ê hewl bidin wan hemû berheman ku li jêr ronahiya kelepûrê hatine avakirin berçav bikin.

#### 2.2.1.2.1. Helbesta folklorî ya kurdî

Strangotin hunereke pir kevin a folklorê ye. Di serdemeke pir kevin a jiyana mirovatiyê de peyda bûye û sedemê peydabûna wê jî vedigere îş û karê hevpar. Di kevin de, karkirin bi rengê kolêktîf bû, li kêleka vî karê kolêktîf jî nehîştine bêtaqet bin û berê xwe dane gotina stranan. Ew stran jî bê tu muzîkekê hatine gotin, westiyan û bêtaqetiya xwe pê revandine û ji aliyekî din ve jî dibêjin stran yekem car ji strana olî çavkanî girtiye, çimkî bi baweriya wan di hucre û boneyên olî de cure straneke olî hatiye gotin ku gotinên vê cure stranê girêdayî olê bûn, bi şêweyekê her yek ji wan stranan bandora wan li ser guhdar hebû, bi taybetî strana olî û lewra jî dibêjin strana olî kevintirîn curê strana folklor e. Di strana hevpar de, peyv û awaz û deng tevlî tevgera endamên laş dibe, bedewtirîn mînak jî stranên paleyê ne (dirûn- dirûn)

Hey dirûne dirûne dirûne deskî daskî dasêm be rûn e (ji folklorê hatiye wergirtin)

---

[188] Azad Ebdilwahid, *Semaya berfa êvaran*, Kovara Rojî Kurdistan, hejmara 58, 1980, r. 22.
[189]Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 254.

Di dinyaya edebiyata kurdî de bi giştî û helbestê bi taybetî, gelek helbestên folklorî hene ku bûne stran wek vê helbesta folklorî:

Yarim şenge bêrîye

Delên ewro nobe xêrî ye

Ay aman aman

Ew çawaney mislî bazin

Mest û xumar pir le nazin [190]

Hêmin sûd ji vê strana folklorî wergirtiye û dibêje:

Şenge bêrî salî salan le kiwêstanî le nêw merî

Bo mer doşîn helt dekirdn ew baskî sipî mermerî

Leber harey goberok kirme û jêr çene

Nîweroye leber bêrê korî merî radeperî [191]

Helbestvan şêwazeke nû daye wê strana folklorî, bi awayekî aliyê wê yê folklorî wergirtiye û di kirasekî nû de xemilandiye û pêşkêş kiriye û pêwendiyeke nû di navbera rêgezên wêneyê de dirust kiriye, rûyê wê yê folklorî kiriye wesf û bi şêweya xwe ya taybet xemilandiye û tam û çêjeke din daye wêneyê, ev jî teknîka helbestvan bi xwe ye.

---

[190] Farûq Hefîdzade, *Helbest û strana folklorî ya kurdî*, Çapxaneya Newres, Silêmanî, 1982, r. 181-182.

[191] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 215.

### 2.2.1.2.2. Beyt

Helbesteke çîrokvanî ye, bûyerek yan çend bûyer tê de ne, berhem bêhtir babetî ye û naveroka babetê jî di aliyê babetî de dildarî yan qehremanî ye. Hinek beyt hene dualî ne, bi cureyekê hem dildarî û hem qehremanî ne ku ev jî hejmara wan kêm e. Di aliyê kêşê de, li ser binemaya kêşa hejmareyî ya bendan tê avakirin yan pir caran hejmara bendan ne wek hev e, lê ya ku wan ji hev nêzîk dike qafiye ye. Lewra bêhtir heft bendî ye. Di aliyê serwayê de jî, beyt li ser çend bendan dabeş dibin, her bendek serwaya xwe heye, bi şêweyekê serwayên wan ne têkildarî hev in. Beyt di kevin de ji ber beytbêjan bi piranî jî bi şevan û bi taybetî jî di şevên demsala zivistanê, di dema birêveçûna lîstik û yariyên kurdewarî û xwarina dendikan de, amadebûyî guhdarî wan beytan dibûn û xelkê jî bicoş ligel beytê bandor li hev kirine û ber bi wê dinyaya ku beyt lê hatiye avakirin çûne. Beytbêj jî li gor şehrezayî û jêhatîbûna xwe bi hestyariya beytê re guherîn bi ser tona dengê xwe de anîne, ji ber ku beyt xwedan dariştin û teknîkeke baş bûn, lewma piraniya helbestvanan sûd ji bûyer û wêneyên beytan dîtine û kêm zêde berhemên xwe yên helbestan pê dewlemend kirine û bi hêz û germ û tîneke cuda di helbestên wan de reng daye. (Hêmin) jî yek e ji wan helbestvanên ku sûd ji bûyer û wêneyên beytan wergirtiye.

**Beyta Las û Xezal**

Las kurê Ehmed Axayê Balkî ye. Xezal keça Mela Nebî Mamundyan e, ((*Las û Xanzadxan li hevdu hatibûn mehrkirin, heta piştî 12 salan Ehmed Axa mir, piştî demekê Mehmûd Axa jî mir. Piştî şeş salan mêrek çû Celebê, çû nav êla Mamûdînan, li wir çavê wî bi Xezala şox û şeng a Melanebiyan ketibû. Gava vegeriya got Lasê çeleng temenê te vala çû..îro min Xezala Melanebiyan dît, ji rokê re digot bi wir de here! Êdî ji te re baş e. Las rabû û welatê Balekiyan terikand û çû nav êla Mamûdînan û li wir dibe xizmetkarê Mela Nebî û têkiliyê bi keça wî Xanzadê re çêdike*))[192] Dema Las têkiliyê bi Xanzadê re çêdike, demeke xweş derbas dike, bawer dike kesekî xweşbext e lê nizane ku karekî çewt kiriye û destê xwe xistiye nav agir û piştî demekê (Çilkin) bi vî karê Las dihese, di encamê de bi tîrekê dilê Lasê Çeleng kun dike û wî dikuje. Ev bûyerên di nav beytê de bi giştî û bûyera kuştina Las bi

[192] Şêrko Bêkes, *Derbendî Pepûle,* Swêd (Stockholm), 1991, r. 57-58.

destê Çilkin bi taybetî li ba piraniya helbestvanan bû çavkaniya avakirina gelek wêneyên şiîrî yên bedew. Hêmin ew bûyera kuştina Las di helbesta xwe de bikar aniye û sûd jê wergirtiye û wêneyên nû jê dirust kiriye.

Hêmin li jêr bandora Beyta Las û Xezal ev wêne dirust kiriye û dibêje:

Las e şorêk bûm xenîmî dujminan

Êste engwawm be tirî çilkinan

Wam betenya lenêw xiwêna şelal

Kiwanê hêl û kiwanê Xanzad û xeyal [193]

Wêne û serpêhatiya Beyta Las û Xezal bandorê li Hêmin dikin, bîrokeya wê werdigre û dike çavkanî û havêyna wêneyekê di helbesta (Naleyî Cudayî) de. Wêne heman wêneya Beyta Las û Xezal e, lê bi teknîkeke cuda û reng û bêhneke din, cudahiya wêneyan di wê yekê de ye ku Las ji bo Xezalê çû Mamûdiyan da têkiliyê ligel Xezalê deyne, bi awayekî Las agirê dil hilgirt û di wê rêyê de canê xwe da. Lê Hêmin ji bo neteweya xwe da ser vê rêya dijwar û zehmet û tûşî vî derdî bû bi şêweyekê zulma stemkaran dilê Hêmin kun kun kiriye û xwîn jê diherike.

**Beyta Biraymok**

((*Biraymok kurê Mela Zîndîn bû. Bi nokerî hat ba Mîrşêx. Mîrşêx û Mîrhec bira bûn. Biraymok hat xizmeta wan kir heta heft salan. Biraymok ji Perîxan xatûnê hez kir. Perîxan xwîşka Mîrşêx û Mîrhec bû. Perîxan xatûn got Biraym tu dev ji Mîrşêx bernede û bibe rêberê hekîmên wî, îşella wî baş bike, ez ya te me*))[194] Beyt bi giştî û bûyereke nav beytê bi taybetî bala gelek helbestvanên Kurd kişandiye û wan kiriye çavkanî û haveyna bedewkirina berhemên xwe û bûyera bibandor jî ew e gava Biraymok û Perîxan jivanekê datînin di çilê zivistanê de, cihê jivana wan jî serkanî dibe. Di jivanê de, di seqayeke pir sar de, Biraymok kulavê ji Perîxanê re radixe û di

---

[193] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 282.

[194] Oskarman,*Tuhfeya Muzeferî*, Pêşgotin û saxkirin û anîna ser rênivîsa kurdî Hêmin Mukiryanî, beşê yekem, Çapxaneya Korrî Zanyarî Kurd, Bexda, 1975, r. 369.

hembêza hev de di xew re diçin. Mîrhec wan dibîne, biryara qewitandina Biraymok di wê zivistana sar de dide. Hêmin li jêr bandora vê wêneyê de dibêje:

Mangî kanwnê beçilwan derkiram

Wek Birayîm lew wilate rawniram

Kiwa Perîxan bendw bawm bo bilê

Bo nesûtêm nebime polwî ser kilê [195]

Ji ber girîngî û bandora bûyera di nav beytê de, Hêmin ne tenê ketiye bin bandora bûyerê, lê malikeke helbesta beytê wek wê bi rengê têhelkêş (têkilîhevkirin) di helbesta (Naleyî Cudayî) de bikar aniye. Hêmin hevawayê Biraymok di meha kanûnê de ji welat û cihê jidayikbûna xwe hatiye derbiderkirin. Lê ne wek Biraymok ji bo yara xwe, lê ji bo kurdîtiya xwe. Hêmin di wêne de bangî yara xwe dike daku li ber dilê wî bide û dilê wî aram bike. Lê ji yara xwe dûr e û dengê wî nagihe wê. Ew qewitandin û nedîtina yarê ye ku wiha li Hêmin kiriye bişewite û bibe komir, komir jî herçiqasî geş û bedew be di dawî de dibe xwelî û arî û namîne. Yanî Hêmin bûyera nav beytê kiriye çavkaniyeke bihêz ji bo jidayikbûna wêneyeke bedew û balkêş ku Hêmin bi teknîka xwe ciwankarî ji bo wêneyê kiriye da bêhtir birîqedar û bibandor be.

#### 2.2.1.2.3. Dastan

Yek ji berhemên folklorî yên pir kevin e û dîrokeke wê ya kevin heye. ((*Dastan berhemeke çîrokvanî ye, serpêhatiyeke bûyerî yan rasteqîn ku girêdayî jiyanê ye vedibêje. Rastiya jiyanê ji derûna xwediyê berhemê dertîne, wêneya qehremanî û mêrxasiyê nîşan dide*))[196] Dastan li nav piraniya miletên dinyayê heye û her miletek xwedanê dastanên xwe ye, wek mînak Kurd xwedanê dastanên (Mem û Zîn û Keleha Dimdimê) ne. Ereb xwedanê dastana (Leyl û Mecnûn) in. Dastana (Şêrîn û Ferhad), cihê qewimîna dastanê çiyayê Bêstûn e. Ev çiya dikeve axa Kurdistanê, lê Tirk û

[195] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 282.
[196] Kameran Mukrî, *Edebiyata folklorî ya kurdî*, beşê yekem, Çapxaneya Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 1984, r. 58.

farsan her yek û bi şêweya xwe kirine ya xwe. Ev dastan hemû jî bi rengê çîrokeke dirêj in, yanî qehremanê dastanê heye, vêca ew qehreman dildar e yan qehreman e, lewma gelek caran dikare qehremanê dastana dildarî qehreman jî be, bûyer û serpêhatî û qehremanên van cure dastanan bi dildarî û qehremanê rêgezên xwe di helbesta nû de kêm zêde reng dane û helbestvanan karîbû sûdê ji wan çavkaniyên dastanan werbigrin û bi şehrezayî û paşxana xwe ya rewşenbîrî wêneyên nû ji wan ava bikin ku ji wêneyên din ên helbestê cudatir bin. Çimkî helbestvan dikare ligel bûyera nav dastanê têkel bûbe yan bi awayekî ji awayan rastî heman bûyera nav dastanê hatibe.

**Dastana Mem û Zîn**

Ev dastan yek e ji şaheserên dastanên kurdî û dîrokeke wê ya kevin heye, nifş bi nifş bi şêweya devkî gihîştiye heta serdema me, lê her bi wê şêweyê nemaye (Ehmedê Xanî) sûdeke mezin ji wê dastanê wergirtiye û hatiye bi şêweya helbesteke dirêj dariştiye û ev berhema Xanî berhemeke pir hêja ye û girîngiyeke wê ya taybet di nav dinyaya edebiyatê de heye. Naveroka vê dastanê behsa eşq û evîndariya du kesên bi navê (Mem û Zîn) dike. Evîna wan bi awayekî bû ku bêsînor aşiqî hev dibin û çîroka wan li ser zar û zimanan digere. Mirovek bi navê (Beko Ewan) dibe kelem li ser rêya wan û nahêle ev herdu aşiq bigihin hev û dibe sedemê mirina Mem, çimkî ew demekê Memê dixe çaleke kûr û tarî heta can dide. Zînê jî ji qehra evîndarê xwe Memê dawî li jiyana xwe tîne. Dastana van herdu dildaran pir germ û bicoş e û bi vî rengî dawî lê tê û Beko Ewan jî cezayê xwe werdigre. Lewma bi hev negihîştina van herdu evîndaran û mirina Memê bi vî rengî çêjeke mezintir daye vê dastanê. Ev bûyer bi xwe jî bû hokarek ku agirê evînê di dilê helbestvanan de coşdartir bibe û bû sedemê jidayikbûna wêneyên şiîrî yên bedew li ba helbestvanan. Çimkî wek çavkaniyeke bihêz sûd jê wergirtin.

Hêmin hevawayê piraniya helbestvanan sûd ji vê dastanê dît û bû sedemê jidayikbûna wêneyên nû, lewra Hêmin dibêje:

Bekire şofar awî mwxey çinîm

Zêy Mem û Zînan wilatî lê tenîm

Kewtime nêw çalî dîlî wek Meme

Yaye zîn lekwêye hawarî kemê [197]

Hêmin li jêr bandora dastana Mem û Zîn wêneyeke nû di helbesta (Naley Cudayî) de ava kiriye, çimkî vê dastanê bandoreke mezin li ser Hêmin pêk aniye. Bi şêweyekê helbestvan di wêneyê de xwe wek Mem dibîne û bawer dike wek Mem demek e ew avêtine binê çalekê, lê ew çala ku Hêmin behs dike cuda ye ji wê çala ku Mem di tê de wefat dike. Ew ji hêla rêjîma Îranê ji ber bîr û hizrên xwe yên neteweyî bo nav çalê hatiye avêtin.

Kesên hevawayê Beko Ewan li derdora Hêmin pir bûn û bi berdewamî plan li dijî helbestvan girêdane, lê Hêmin hertim wek yarekê berê xwe daye welat û gelê xwe û bangî wan dike daku wî ji wê çala mişt kambaxî û tarîtî rizgar bikin û derxînin. Her li jêr ronahiya dastana Mem û Zîn, Hêmin di wêneyeke din de dibêje:

Pîr û zurhanim û êstaş dilekem her deyewê

Ser û malim be fiday xal û xet û perçem kem

Dastanî Mem û Zîn kone, kiçêkim gereke

Şilke ranî biguşim û bonî le sing û mem kem [198]

Di vê wêneyê de jî, Hêmin dastana Mem û Zîn dike çavkanî. Di helbestê (Nasorî Teşena) de, wêneyeke nû pêk aniye ku naveroka wêneya Hêmin ronahiyê dixe ser jiyana wî ya derbasbûyî. Bi baweriya helbestvan ew dastan xwedan temenekî mezin û zêde ye û pir kevin e jî, di keviniyê de xwe wek wê dastanê dibîne û îşaretê bi wê yekê dike ku ew jî temenê wî zêde ye û mezin bûye. Lê helbestvan mezinbûna temenê xwe girîng nabîne. Çimkî Hêmin kesek bû ku pîrbûna rûxsara wî jê re ne girîng bû, lê bêhtir dil li ba wî girîng bû, lewra bi wî temenê xwe yê mezin jî doza keçekê dike daku xemên dilê xwe pê birevîne û ji bo vê yekê jî hemû mal û serwet û

[197] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 282.
[198] Jêderê Berê, r. 207.

samana xwe dike qurbanî. Bi qasî ku dilê helbestvan bi keçê xweş bû, dilê wî ewqasî bi mal û saman xweş nebû. Li gor wî hemû dinya li hember hembêza jinê û sîng û memik û guvaştina ranê jinê bû, ewqasî dilbijê jinê bû. Hêmin bi awayekî bêsînor aşiqê jinê bû, lewra di vê wêneyê de jî şibandinê di navbera xwe û dastana Mem û Zînê de dike di kevinî û mezinbûna temen de.

**Dastana Şêrîn û Ferhad**

Dastaneke dildarî ye li ser axa Kurdistanê qewimiye, ku dildariyeke paqij û pak û fidakar vedihewîne. Lewma em dikarin ((*Di warê serpêhatiyê de wê bikin kurdî. Çimkî heta vêga çiyayê Bêstûn di nav axa kurdan de maye û ew hosteyî û kevirtaşî jî ku dibêjin kirdara rengîn a Ferhad e û hîn jî maye*))[199] lê ew di sînorê edebiyata folklorî yan nivîskî ya kurdî de asê nemaye, lê herwiha di edebiyata nivîskî ya gelên wek Fars, Tirk û azeriyan de jî tê dîtin. Ev dastana navdar û kezebsoj di nav gelên dinyayê de bi giştî û gelên rojhilat bi taybetî de belav bûye. Vê dastanê bandoreke mezin li ser helbestvanan pêk aniye û her yekî bi şêweyekê wêneyên xwe yên şiîrî pê bedew û dewlemend kirine. Bi sedemê wê serkêşiya nepêşbînîkirî ya Ferhad gava ji bo yara xwe Şêrîn bo dema çend salan mijûlî kunkirina çiyayê Bêstûn bû, di encamê de mercê giran ê Şêrînê cîbicî kir û di wî çiyayê dijwar de çavkaniya avê vekir û av ji çiyê derket. Piştî wan hemû hewldan û mandûbûn û di xelata gihîştina bi yara xwe pîrejinek diçe ba Ferhad û zimanê wê bi xirabî digere li ba Ferhad jê re dibêje baş e Ferhad te li hember çi ew hemû zehmetî kişand jixwe Şêrîn miriye. Ferhadê aşiq jî di dilbijîna Şêrîn bi wî çakûçê ku çiya pê kun kun kir, çakûçekî li serê xwe dide û dawî li jiyana xwe tîne. Bûyera nav vê dastanê bû çavkanî û havêyna jidayikbûna wêneyan li ba Hêmin ku dibêje:

Dêm û deşkênm camî şerab

Maçî Şîrîn nayelê tamî şerab[200]

Hêmin li jêr bandora wê dastanê wêneyeke bedew ava kiriye û Şêrîn kiriye çavkaniyeke bihêz a wê wêneyê. Naveroka wêneyê bi giştî dûrbûn e ji ax û welat û

---

[199] Dr. Îzedîn Mistefa Resûl, *Lêkolîna edebiyata folklorî ya kurdî*, beşê yekem, r. 61.
[200]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 285.

neteweyê û ezîz û yara wî, bo çareseriya wê dûrbûnê jî mey wek çareseria wê dûriyê dîtiye. Helbestvan bêhtir mebesta wî ew e ku niha li ba yara xwe bûya, tu bihayekî meyê nedibû, çimkî nêzîkiya ji yar û welat çareseriya hemû tiştî ye.

**Dastana Leyl û Mecnûn**

Ev dastan berevajî dastana Şêrîn û Ferhad e. Di bingeh de, di nav axa ereban de çavkanî girtiye. Serpêhatiya evîndariyê navbera (Leyl û Mecnûn e), ((*Leylaya keça Mehdî) û (Qeysê kurê Melûh) vedibêje. Piştre di nav miletên din ên rojhilat de belav bûye û sîmaya taybet a wan miletan wergirt. Sedemê vê berfirehiya belavbûna girêdayî wê evîndariya paqij û pak bû ku bi tena xwe bihayeke mirovî ya bilind e. Miletê Kurd jî wek yekî ji wan miletan bi nerîneke taybet li vê berhemê mêze kiriye û tevî bûna wê wek hîkayeteke folklorî, ji hêla çend helbestvanan bi zaraveyên cuda cuda (Kurmanciya Jorîn, Kurmanciya Navend û Goranî) hatiye hûnandin*)) **[201]** Lewma gelek şîrove û vegotinên cuda derbarê jiyan û serdema vê dastanê hene, lê piraniya çavkanî û şîroveyan li hev dikin ku ev herdu dildar (Leyla û Mecnûn) negihîştine hev. Di encama vê hev negihîştinê de, Mecnûn dev ji jiyana xwe ya normal berdaye û bajêr terikandiye û jiyana deşt û biyabanê hilbijartiye û li wir wefat jî kiriye. Piştî Mecnûn, Leyla jî bi rengzerî û belengazî bêyî Mecnûn maye. Hemû bûyerên nav vê dastanê bûne sedemê jidayikbûna wêneyên nû li ba helbestvanên Kurd û Ereb û neteweyên din ku bi awayekî ji awayan hewl dane wêneyên xwe yên şiîrî pê bixemilînin, lewma wek piraniya helbestvanan, Hêmin sûd ji vê dastanê wergirt û li jêr ronahiya vê dastanê wêneyên nû ava kir û dibêje:

Biro Mecnûn be Leylakey xot menaze

Kenawbangî pitr royî ewî min **[202]**

Hêmin di vê wêneyê de dastana Leyla û Mecnûn kiriye çavkaniya jidayikbûna vê wêneyê, bi şêweyekê sûd ji hezkirina Mecnûn bo Leylayê wergirtiye ku çiqasî dilbijê wê bû, her ew hezkirin jî bû hokara wê yekê ku pir di nav xelkê û piraniya miletan de belav bibe û navdar bibe. Lê Hêmin di wesfê Leyla Qasim de hawar dike

---

[201] Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 130.
[202]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 242.

Mecnûn ku tu xwe bi Leylaya xwe serbilind neke, çimkî em xwediyê (Leylayekê) ne ku navûdengê wê ji Leylaya te bêhtir e. Mebesta helbestvan bêhtir ew e ku Leylaya kurdan evîndara gel û milet û axa welatê xwe bû, ne tenî evîndara kesekî bû.

### 2.2.1.2.4. Pend û Gotinên Pêşiyan

Pend û gotinên pêşiyan berhemeke folklorê ye. Wan hemû gotin û pendên nazdar vedihewîne ku di encama tecrûbe û ezmûna jiyanê de hatine nav jiyanê û bandor li jiyana mirovan kirine û ketine bin bandora jiyana mirovan ku wiha tên naskirin ((*Hevok û peyveke kurt e û wateyeke kûr û berfireh vedihewîne*)) [203] hemû ew peyvên ku pendê pêk tînin di warê naverokê de qiyametek wateyên bedew lixwe digrin û folklora kurdî xemilandine. Lewma ((*Berhemeke edebî folklorî ye, goteyeke rêk û rewan a hunerî ya giştî ye yan tekane peyveke ravekirî şûna pendekê yan gotineke pêşiyan temam digre*))[204].

pend û gotinên pêşiyan encama ezmûn maqûl û zanayan e û her pendek ezmûnek yan zêdetir ji ezmûnekê ye, lewra hemû quncik û qorziyên jiyanê girtine, û çûye nav hemû mijar û babetan û xwe di hemû pêşhat û bûyeran de dibîne, bi şêweyeke wiha ligel bûyeran bandor li hev kirine, cudakirina wan ji pêşhat û bûyeran ne karekî hêsan e. Lewra ((*Çend tecrûbeyên xweş û nexweş ên çînên gel nîşan dide û ji şehrezayî û pisporiya pêşiyan saz bûye*))[205], lewma pêwist e helbestvan di hemû qonaxan de sûdê ji van çavkaniyên folklorî werbigrin û helbestên xwe pê dewlemend bikin. Lewra qet nabe helbestvanê hevçax bi çavekî kêm li wan berhemên folklorî binere. Çimkî ew hemû pend û gotinên pêşiyan wek durr û gewheran in di nav dinyaya edebiyatê de. Lewra divê bi şanazî û serbilindiyeke pir mezin helbestvan û tew civak jî bi rengekî giran li wan binerin û li ser herkesî jî pêwist e kêm zêde şehrezariya wî di wan pendan de hebe û wek dibistan li wan bê nerîn û sûd ji wan bê wergirtin. Hêmin wek piraniya helbestvanan sûd ji pend û gotinên pêşiyan wergirtiye û wek çavkanî bo dirustkirina wêneyan bikar aniye. Evên li jêr çend pend û gotinên pêşiyan in ku Hêmin bikar anîne.

---

[203]Dr. Îzedîn Mistefa Resûl, Lêkolîna *edebiyata folklorî ya kurdî*, beşê yekem, r. 104.
[204] Umer Şêxallah Elî, *Pendên Kurdî*, Weşanxaneya el Huriye, Bexda, 1980, r. 6.
[205] Dr. Şukrye Resûl, *Werz û salnameya mîllî di pend û helbestên kurdî de*, çapa 1, Çapxaneya Wezareta Rewşenbîrî, Hewlêr, 2005, r. 29.

(Kell be mûr bende)

Tê wateya ku herçiqasî ga bihêz be, di encamê de bi (werîs) tê girêdan û kontrolkirin. Yan herçiqasî hêz û deshilata mirov hebe jî, ji vê hêz û desthilata wî jî bihêztir û bişiyantir heye. Li jêr ronahiya vê pendê, Hêmin dibêje:

Lekoesrîn debarênim bo kurdî peragende

Legermên xerqî areq bûm çawm her le samrende

Minî zincîr pisên lêre esîrî biskî ciwanêkm

Zemane gerçî peşêwaloze kel bemû bende [206]

Helbestvan bi şêweyeke bedew û bi guherînkarî sûd ji vê penda folklorî wergirtiye û ev wêneya bedew jê afirandiye. Helbestvan bêhtir mebesta wî ew e ku Kurd bi rengekî wiha parçe bûne ku tu hêz û şiyaneke wan nemaye li vir lewra bendewarê parçeyên din e. Helbestvan xwe wek kesekî bihêz û bişiyan dîtiye, lê belê xwe wek dîlê biskên yara xwe dîtiye, lewma helbestvan kifş kiriye ku hertim pêwistiya hêzê heye.

(Çawî kwêrî pê rûn debêtewe)

Pend û gotineke pêşiyan e, tê wateya ku tiştek zêdeyî pêwist bedew û balkêş e, ev bedewî û balkêşiya wê dibe hokarek bo çakbûna çavê kor, dinyaya ronak dibîne.

lewma Hêmin li jêr bandora vê pendê dibêje:

Kurdistanî bexêr û bêr

Pêy rûn debowe çawî kwêr [207]

Helbestvan sûd ji vê pendê wergirtiye û bi şêwazeke bedew wêneyek jê dirust kiriye, bi şêweyekê bedewî û rengînî û nexşîna Kurdistanê wiha nîşan daye ku çavê

---

[206] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 284.
[207] Jêderê berê, r. 265.

kor li hember wê rewşen dibe. Ev jî mezinahî û hezkirina Kurdistanê li ba helbestvan nîşan dide.

(Siwar ta neglê nabêt be siwar)

Ev pend tê wateya ku gava kesek dest bi karekî nû dike, lê tê de serkeftî nabe yan nikare wî karî bi rêkûpêkî cîbicî bike, piştî ku tê de serkeftî nabe li xwe vedigere û planeke baştir datîne daku bikare bibe kesekî serkeftî û piştî gelek têwerbûnan dibe kesekî serkeftî, yan siwar dema pêşî li pişta heywan siwar dibe nikare xwe li ser pişta heywên rabigre û gelek caran dikeve, lê piştî rahênaneke dirêj ji nûve dibe siwarekî baş. Li jêr ronahiya vê pendê, Hêmin dibêje:

Destî da destî birayî û hate naw korî xebat

Kîjî neşmîl û lebar û şoxûşeng gwê be giwarî Kurd

Kurd gwtwye siwar ta neglê qet nabê be siwar

Êsta çapwk siware, çunke zor gilawe siwarî Kurd [208]

Helbestvan di bergekî din de, wêneyeke bedew li jêr ronahiya wê pendê çêdike. Helbestvan di vê wêneyê de mebesta wî ew e ku keçên Kurd hevawayê birayên xwe ji bo maf û azadiya xwe xebatê dikin û ev xebat pir caran ew xistine erdê, lê di dawî de sûd ji wan ketinan wergirtine û vêga çalak bûne û bûne bergirîkarên baş ên ax û welat.

(Mallî dunya çillî destane)

Ev pend yek e ji wan pendên ku pir di nav civakê de belav bûye û îşaret pê tê kirin. Wateya wê ew e ku ewên ku xwedan mal û samanekî pir in lê pir kêm wî mal û samanî di xizmeta xwe û xelkê de bikar tînin, çimkî li ba wan pere û mal û saman hertişt e, di demekê de ku pere û serwet û saman her roj di destê kesekî de ye hevawayê qirêja dest, lewma mirov ku xwedan mal û saman bû divê bizane çawa bikar bîne. Li jêr ronahiya vê pendê Hêmin dibêje:

[208] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 167

Çillkî deste mallî dunya wek dellên

Mallperest peyman şikênew bê bellên

Qedrî ciwanî kwa dezanêt mallperest

Ciwanperiste pîrî xawen zewq û hest [209]

Helbestvan ev penda folklorî wek wê wergirtiye û bi têkilkirina wê ligel çend wêneyên din tiştekî nû ava kiriye ku wêne birîqedartir kiriye. Helbestvan bawer dike kesên ku dewlemend in malperest in û mal û samana wan beriya hertiştî ye. Ew bi tu hawî bihayê jina bedew nizanin û herdem soz û peymanên xwe dişkînin. Helbestvan bêhtir baweriya wî wiha ye ku bedewperest temenmezinek e ku xwedan hesteke bedew û selîqeyeke taybet be li hember jinan û mezinahiya jinan zanibe, neku xwedan malek ku samana xwe biperêse.

(Barî hêlkan nabzêwê)

Ev pend tê wateya ku kesek hêmin û aram be, û karvedana wî li hember tu karekî nebe. Ev pend bêhtir li hember wan cure zilaman bikar tê ku pir rêza hevjînên xwe digrin, lê kesên li derdora wan bi rengekî din wê rêzgirtinê şîrove dikin û bawer dikin ku ew mêr ji hevjînên xwe ditirsin. Li jêr ronahiya vê penda folklorî, Hêmin dibêje:

Hêzî bêganey lepişt xoy dîbû, boye way dekird

Barî hêlkan nabzêwê, xaînî lasarî Kurd

Danenîşê leser ew petk û sine bêguman

To leastoyda debînî petkw û gwêlewsarî Kurd [210]

Hêmin sûd ji wê pendê wergirtiye û wêneyeke nû jê afirandiye. Helbestvan di wê wêneyê de ku afirandiye, amajeyê bi Şahê Îranê dike gava hêzên biyanî li dijî kurdan bikar anîn, li hember wê hêzê bi rengekî aram û bêdesthilat xwe nîşan dide

[209]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 279
[210]Jêderê berê, r. 169.

wek ku barê hêkan jê nabe û şiyana wî ya şikandina yek hêkê nîne. Tevî vê jî di encamê de ji hêla kurdan digihe cezayê xwe.

(Şew qellatî mêrdane)

Ev pend tê wateya ku mêrê baş û çavnetirs her karekî wî hebe di şevê de cîbicî dike. Helbestvan sûdê ji vê penda folklorî werdigre û ew kiriye çavkaniya jidayikbûna wêneyeke nû, wek Hêmin dibêje:

Pendî konaneye û kone

Kew şew qellay mêrane

Herwa tarîkan peydaba

Dir pêdedan şêrane [211]

Hêmin ev pend bi hinek cudahî wergirtiye û tevlî hinek tiştên din kiriye û wêneyeke bedew dirust kiriye. Helbestvan di pendê de ew yek eşkere kiriye ku di şevê de mirovên qenc û çavnetirs dikarin derba xwe li wan kesan bixin ku bi rengekî xirab bi wan re tevdigerin. Curek ji malwêraniyê bûye bo wan cure kesan ku di şevê de hêviyên wan çilmisîne û hatine jinavbirin, lewra gelek ji wan rika wan ji şevê bûye û hêvî xwestine ku berbang derkeve da ji tarîtiya şevê rizgar bibin.

(Kengir û qumaş nabin be wêlldaş)

Ev pend tê wateya ku (kengir) û (qumaş) du tiştên pir ji hevdu dûr in. Her vê dûriyê jî wiha kiriye ku tucarî nebin hevrê, çimkî tu pêwendî wan bi hev ve girênade, tew dûrbûna wan ji hev wek esman û erdê ye. Hêmin sûd ji vê pendê wergirtiye û kiriye çavkaniya jidayikbûna wêneyeke nû, wek Hêmin dibêje:

Ewende teske bîrî gende pyawan

Deken ferqî kiçî mîran û gawan

Delên kengir û qumaş nabin be wêlldaş

Qisey kewne pyawane û qisey baş [212]

---

[211] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 240.
[212] Jêderê Berê, r. 323.

Hêmin ev pend wek wê bikar aniye û bi cureyekî din tevlî civakê kiriye. Helbestvan bawer dike ku, kesê cudahiyê dixe navbera keçên mîran û maqûlan li hember keçên hejar û gavanan, tu armanca wî nîne ji bilî dirustkirina cudahiya çînayetî, lewma wan cure kesan rexne dike û wan wek bîrtengên gendel û genî wesf dike, çimkî li gor helbestvan di civakên hişyar de nabe ew ferq û cudakariya çînayetî hebe.

**2.2.2. Çavkaniyên Mirovayetî**

**2.2.2.1. Çavkaniyên Dîrokî**

Bi awayekî giştî helbestvanan sûdeke mezin ji wan hemû serpêhatî û bûyeran wergirtine ku di dîroka wan de yan di dîroka neteweya wan de qewimîne, bi awayekî ku kesayetî bûne qehremanên bûyeran bi giştî û serkirdên dilêr jî bi taybetî dibin sembola berxwedana bûyeran, lewra mirov tucarî nikare yan şiyana wî nîne ku çav û guhên xwe li hember serpêhatî û bûyerên dîrokê yên curbicur ên beriya xwe û serdema xwe bigre û li wan nenêre. Çimkî dîroka mirovatiyê mişt bûyer û ezmûnên cuda ye ku bi rêya wan helbestvan dikare dahatûya xwe li ser wan ava bike. Lewma nabe helbestvan bi çavekî biçûk li wan hemû bûyer û serpêhatiyan binere yan di berhemên xwe de wan piştguh bike, çimkî eger helbestvan bi vî rengî hizr bike, em dikarin bêjin beşekî mezin ê çavkaniya helbestên xwe piştguh dike û berevajî jî eger sûdê ji wan jêderên dîrokî werbigre, pireke têkiliyê di navbera niha û rabirdû de dirust dike.

Ev jî li ser jêhatîbûna helbestvanê serkeftî dimîne. Çimkî ((*Bûyer û serpêhatî û kesayetiyên dîrokî, tenê diyardeyeke gerdûnî ya serpêyî nînin ku ligel derbasbûna realîteya wan dawî li wan bê. Lê li tenişta vê jî hinek rehendên wan ên giştî hene ku bi dirêjahiya dîrokê karîbûn bimînin û xwe di formên cihê de nû bikin, hêmaya qehremantiyê di serkirdekî taybet de yan hêmaya serkeftinê di şerekî taybet de, jê re heye heta piştî xilasbûna hebûna wan a reel jî bi zindîtî di helwestên nû û bûyerên teze de dubare bibin. Di heman demê de jî hêjayî hilgirtina ravekirin û şîroveyên nû*

*ye*)) [213] Helbestvanên Kurd sûdeke mezin ji vê çavkaniyê wergirtine û têkilîhevkirineke baş û kêrhatî di navbera nû û kevin de kirine bi şêweyeke baş tevlîhev kirine.

Hêmin yek e ji wan helbestvanên ku bi sedema wê paşxana rewşenbîrî û folklorî ku di ezmûna jiyanê de wergirtiye, sûdeke mezin ji jêderên mirovatî wergirt. Bi taybetî ew bûyerên ku hatine serê kesayetiyên Kurd. Hêmin ew hemû kirin çend wêneyên bedew. Ew bûyerên ku hatin serê Komara Mehabadê, bi rengekî şêniyên wê tûşî reşbîniyê kir, nemaze bidarvekirina pêşewa Qazî Mihemed, bû jêderê herî bihêz. Bo wê bûyera dîrokî Hêmin dibêje:

Le çiwar çiray Mehabad   Le kangay bîrî azad

Destî reşî îstîbdad   Çeqandî darî bêdad

Le katî nîwe şewa   Le cengey şîrîn xewa

Kira karî narewa   Le dar dira pêşewa [214]

Di vê wêneyê de helbestvan me dibe wê rojê ku Komara Mehabadê hilweşiya û pêşewayê komarê pêşewa (Qazî Mihemed) li paytexta komarê û li meydana Çarçira ya wî bajarî ji hêla neyar û plangerên komarê hat bidarvekirin. Ew roj bû çavkaniya jidayikbûna wêneyên nû li ba helbestvan ku bi tîn û germî behsa wê bûyerê dike. Ji bilî ku dîrokê jî ew bûyer nivîsandiye, helbestvan jî di nav wêneyên xwe yên şiîrî de bihayeke mezin pê daye.

Hêmin di helbesta (Beharî Zerd) de, li ser çalakvana sivîl (Leyla Qasim) dibêje:

Le dûrî Leyla be waweylaw şîwen

Deromw polî şîngêrîm bediwa we

Gûtî Leyla hemîşe payedarî

Le jêr xaka lepêş çawan diyarî

---

213 Elî Eşrî Zayd, *Banga karakterên kelepûrî di helbesta erebî ya hemdem de*, çapa 1, Dar el Fikir el Erebî, Qahîre, 1997, r. 120.

214 *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 144.

Ke toray le çawan wek xewî min

Le biskt reştire mange şewî min

Biro Mecnûn be Leylakey xot menaze

Ke nawbangî pitir royî ewî min [215]

Têkoşera Kurd (Leyla Qasim) yek bû ji wan keçên çalakvan ku xebata nihênî li dijî rêjîma wê çaxê ya Bexdayê dikir. Di girîngtirîn û hestyartirîn saziya akademî de ku Zanîngeha Bexdayê bû, di demekê de ku hemû cureyên çalakiyên siyasî li dijî rêjîma Bexdayê qedexe bûn, kesê ku ew kar bikira rastî cezayê îdamê dihat. Leyla Qasim û hinek rêhevalên xwe bê tirs û dudilî karê siyasî bi nihênî dikirin, ((*di encamê de piştî çend kar û çalakiyên nihênî hatin girtin û di 12.05.1974an de, Leyla û çar rêhevalên xwe bi awayekî hovane hatin îdamkirin*)) [216] Vê bûyerê bi rêjeyeke berçav deng da û piraniya helbestvanên Kurd helbest li ser wê keça Kurd a çavnetirs û hevalên wê nivîsandin. Ev bûyer bû çavkaniyeke bihêz li ba Hêmin bi şêweyekê digihe asta ku ligel Mecnûn qise dike û xwe lê qurre dike û jê re dibêje tu xwe bi Leylaya xwe nebîne, çimkî navûdengî û jêhatîbûna Leylaya me ji ya Leylaya te bêhtir e.

Goran yek bû ji wan şaîrên mezin ku karîbû bandoreke eşkere li ser Hêmin dirust bike. Hêmin jî heta radeyeke zêde sûd ji şiîrên Goran wergirt. Li hember wê bandorê jî, bo koça dawî ya Goran, helbestvan Hêmin di wêneyekê de dibêje:

Her le Botanewe heta Soran

Hemû soranî şîne bo Goran

Her le kiwêstanewe heta germên

Yexeman dadirawe heta damên

Le Cizîre hetaku behrî reş

---

[215] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 342.
[216]www.sharazurpost.com>laila qasim.

Nîye kîjê serî nenabê le heş

Le Diyarbekirewe heta Wirmê

Ser be qûr mil bekwêne nêr û mê [217]

Dema Hêmin nûçeya koça dawî ya helbestvanê mezin ê Kurd, helbestvanê siruştê mamoste Goran dibihîze, ji hundir ve keseran dikşîne, çimkî herdem Hêmin bawer dikir ku Goran helbestvanekî hestnazik bû û karîbû bi nûjengeriyê derbasî nav dinyaya edebiyatê bi giştî û helbestê bi taybetî bibe. Lewma di vê wêneyê de bi koça dawî ya Goran wesfeke giranbuha kiriye, ku helbestvan bawer kiriye li her çar parçeyên Kurdistanê şîn û girî û xwelîserkirin û behîdarî û sersaxî ye, çimkî helbestvan koça dawî ya Goran wek birîneke vekirî û ziyaneke mezin li ser miletê Kurd û bi taybetî helbesta kurdî dîtiye.

Di wêneyeke din de, Hêmin bo bûyera îdama (Şêx Ebdilqadirê Nehrî û hevrêyên wî), dibêje:

Diwê şew giryam heta roj boçî bira

Mehkemeyî menhusî îstîqlal we bîrm hatewe

Rîzyan bestibû leplş çawî mina giştyan hemû

Em şehîdaney xinkawin be sed awatewe

Min leser lûtkey bilindî kêwî heq dawa dekem

Toş biparêze cenabî şêx leser rûyî tatewe [218]

Bûyera îdama (Şêx Ebdilqadirê Nehrî û hevrêyên wî), bûyerek bû ku karvedanên zêde bi dû xwe de anî. (Hêmin) jî wek her kurdekî bi vê bûyerê êşiya û bi wêneyeke şiîrî hesta xwe nîşan daye, naveroka vê wêneyê jî bêhtir gilî û nerazîbûna helbestvan e li hember wê dadgeha nedadmend a îstîqlalê ((*Çimkî gava şoreşa Şêx Seîdê Pîran di sala 1925an de pêket, şêx Ebdilqadir beşdarî wê şoreşê*

[217] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 197.
[218] Jêderê Berê, r. 383-384.

*nebû, lê Kemalîstên Tirkiyê wek derfet dîtin û tohmet li dijî wî girêdan, di encamê de, di 23.04.1925an de ew û hinek hevrêyên wî daleqandin*)) [219] ya ku bêhtir cihê dilgiraniya her kurdekî bû bêtawaniya Şêx Ebdilqadir bû, çimkî şêx di wê çaxê de dev ji her karekî siyasî berdabû, lê şoreşa Şêx Seîd wek firset dîtin û Şêx Ebdilqadir tometbar kirin. Hêmin bawer dike zulmeke mezin li şêx kirine, lewra di wêne de jî helbestvan bi hesreteke pir mezin behsa wê bûyerê dike heta digihe asta ku doza tolvedanê dike.

Hêmin yek bû ji wan şaîrên ku pir ji helbestvanê mezin ê klasîk ê Kurd (Hacî Qadirê Koyî) hez dikir. Lewma pir caran di şiîrên xwe de wesfa jêhatîbûn û kesayetiya wî mirovê mezin dike. Çimkî Hacî di jiyana xwe de gelek bûyerên biêş û jan tam kirin û ev bûyer bûne havêyna wêneyên şiîrî li ba Hêmin, wek:

Silaw ey Hacî roley zemane

Lesayeyî to herçî hemane

Hemû jînt le rêy gelda bexit kird

Heta rêgay xebatt texit kird

Gelêkt dî xerîbî û talî û siwêrî

Nebû satê lexizmet xot bibwêrî

Netirsayî û nexeclayî û nelerzî

Çi meşhurû çi meşhurî çi berzî

Hemû şagirdî ton şîrin kelaman

Letowe fêrbûn qazî û melaman [220]

---

[219] www. Radionawxo.org>haji qadir.

[220]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 254.

Hacî Qadirê Koyî ew helbestvan bû ku bandoreke wî ya mezin li ser Hêmin hebû. Bi awayekî ne tenê di warê helbestê de, lê di gelek aliyan de nemaze di warê hesta welatperweriyê de, lewra Hêmin di vê wêneyê de wesfeke kemilî ya Hacî Qadir dike. Hêmin bawer dikir her tiştê ku li ba kurdan heye û Kurd fêrî bûne, çavkaniya wê Hacî Qadir bû, çimkî Hacî ji bo kurdan gelek azar û dûriya ji ax û welêt û kesûkarên xwe kişandiye. Vê dûriyê wiha kir ku hesta welatperweriyê di dilê Hacî de rûberekî berfireh dagîr bike. Ew dûrî û ew hesta bicoş bêhtir Hacî bihêz kirine, ku Hêmin herdem wî wek mirovekî çavnetirs û jêhatî wesf kiriye ku bi rêya wê çavnetirsiyê navûdengî wî derketiye û her kes jî dizane Hacî çend birûmet e, lewma di kurdayetiyê de jî pêşewa Qazî Mihemed û mela şagirtên te bûn û ji te fêrî dersên kurdayetî û kurdbûn û kurdperweriyê bûn.

### 2.2.2.2. Çavkaniyên Olî

Dîroka dirêj û kevin a mirovatiyê her ji destpêkê ve ku ol hate ser erdê û heta îro, gelek cure ol û mezheb li ser erdê û di nav mirovan de belav bûne, her yek ji wan ol û mezheban pêrewkarên xwe yên taybet hebûn ku rêz li wê olê girtine. Lewma ol di nav civakê de reng daye û rehên xwe berdaye. Her ev rengdan jî bû ku bandor li ser mirovan dirust kir, her yekî bi şêweyekê û li gor têgihîştina xwe ola xwe bikar aniye û çarçoveya wan olan jî bi pileya yekem pişta xwe bi kitêbên esmanî û bi pileya duyem jî bi pêxemberan girêdane. Bi vî rengî ol bi civakê ve tê girêdan, lewra ((*Di nav civaka kurdewarî de jî her ji kevin de û heta îro gelek ol derketin holê wek “zerdeştî – kakeyî – êzîdî – cihûtî-filletî û misilmanî”, çend mezhebên wek “sunî û şîe” û çend rêbazên olî jî wek “Qadirî – Neqşibendî”, ji ber vê tiştekî siruştî ye eger di helbestên piraniya helbestvanên klasîk û nû de, helbestvanan helbestên olî gotibin yan wêne jê wergirtibin û mebestên xwe yên şiîrî pê nîşan dabin*)) [221], lewma her yek ji wan ol û mezheban bi şêweyekê radeya girêdana xwe bi civakê heye û belav bûye û pêrewkar û dilsozên xwe hene. Herçend Hêmin dîndarekî ewqasî bihêz nebû jî, çimkî helbestvan bêhtir ehlê mey û bade û şerabê bû, lê dîsa jî jêderên olî piştguh nekirin.

[221] Hisên Mihemed Ezîz, *Yaqût û zamrûdên kurdî*, ol û felsefe, cildê 2, Çapxaneya Şivan, 2004, r. 21.

#### 2.2.2.2.1. Ola Îslamê

Ola Îslamê çavkaniyeke bihêz a wêneyên hunerî ye. Her ji kevin de û heta îro, helbestvanên klasîk bi rengekî berfireh karîbûn sûdê ji Quranê û wêneyên tê de werbigrin, çimkî ew hemû wêneyên ku di Quranê de tên dîtin bandor û rengdana wan li ser civak û helbestvan hebû, çimkî piraniya me di dema xwendin yan guhdarîkirina li Quranê serwextî wan bûyer û serpêhatiyan bûne, helbestvanên Kurd jî bi rengekî cuda û bi teknîk û jêhatîbûn û paşxan û ezmûna xwe sûd ji wan wêneyan wergirtine û bi şêweyeke cudatir di nav civakê de bikar anîne. Pir caran jî ew hemû wêneyên ku di Quranê de îşaret bi wan hatiye kirin, helbestvan sûd ji wêneyekê wergirtiye û rehendeke din daye wêne yan helbestvan ew wêne tevlî bûyereke realîst a nav civakê kiriye, çimkî ola Îslamê bi giştî û Quran bi taybetî çavkaniya hemû cure wêneyên hunerî yên bilind e, lê Hêmin yek bû ji wan şaîrên ku herî kêm wêne ji ola Îslamê wergirt. Herçiqasî di heyama zaroktiyê de Quran xwendiye, lê ji ber hogirbûna wî bi siyaset, siruşt û kurdayetiyê ve hesta olî di dilê wî de sar bû. Helbestvan bêhtir ehlê mey û bade û şerabê bû. Lê çewt e eger em bêjin ku Hêmin bi yekcarî sûd ji ola Îslamê wernegirtiye. Di wêneyekê de dibêje:

Bezeyî kiwa le dilî berdîda
Şwmrî nagatê le namerdî da
Be qisey ewî xîreser bê
Deykûjê ba kurî pêxember bê [222]

Helbestvan naveroka vê wêneyê ji bombebarana bajarê (Bane) yê Rojhilatê Kurdistanê werdigre gava ji hêla rêjîma wê çaxê ya Iraqê hat bombebaran kirin û hemû mal û darên wê di nav xwînê de gevizand û bi carekê ew bajar di xwînê de sor kir. Li bal wê bûyerê sûd ji ola Îslamê jî wergirtiye. Mebesta helbestvan di vê wêneyê de bêhtir nebûna soz û rehmê ye di dilê wî serokê Iraqê de ku mebesta wî (Sedam Hisên) e. Helbestvan piştî bombebarana Bane gihîşte wê qenahetê ku ew rêjîm cudahiyê di navbera kesî de nake û tiştê ji destê wê bê dike û mirovan dikuje eger ew mirov kurê pêxemberê misilmanan jî be. Helbestvan di wêne de pêxemberê

[222] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 373.

misilmanan (Mihemed) (s.x), ji mirovên normal cudatir dibîne, ango dibe ku helbestvan di bin bandora ola Îslamê de mabe.  Di wêneyeke din de dibêje:

Be hîcabî îslamewe dîm ciwanê

Male babim ay lew xerew xermane

Nemdîwe mangî çiwarde wa rûnak bê

Besawî pak lenêw cixzî xermane [223]

Helbestvan di vê wêneyê de wesfeke bedewiya keçekê bi hîcaba îslamî dike. Helbestvan bi zîrekî wêneya bedewiya wê têkilî hev dike. Helbestvan bawer dike keç ji ber wê hîcabê wiha bedew derketiye. Hîcaba wê wek çavkaniyekê bo bedewiya keçê dîtiye. Ne ku keç her ji xweber bedew bû. Ev wêne nîşan dide ku eger helbestvan ne pêrewkarê Îslamê jî be, lê sozeke wî ya bedew û dîtineke wî ya taybet li ser Îslamê heye. Çimkî di vê wêneyê de bandora pakî û safîbûna îslamê li ser helbestvan derdikeve, ola Îslam çavkaniya vê wêneyê ye.

### 2.2.2.2.2. Ola Mesîhî

Ola Mesîhî jî yek e ji olên esmanî û piştî ola Yahûdî hatiye. Îsa (s.x), pêşewa û rêberê vê olê bû. Beriya ola Îslamê, hejmareke zêde ya kurdan li ser vê olê bûn. Heta niha jî pêrewkarên vê olê zêdetirîn kes in li dinyayê û kesayetiya Îsa û jiyan û serpêhatiyên wî bi rêjeyeke berçav di nav miletan de reng dane. Kitêba esmanî ya Mesîh (Încîl - Mizgînî) ye. Babetên di Încîlê de, di şêweya kurteçîrokan de ne û her yek ji wan çîrokan behsa jidayikbûna Îsa û jiyan û xaçkirina wî dike. Xwedayê mezin şiyana başkirina nexweşan û zindîkirina mirovan dabû Hezretê Îsa. Ango van hemû wêneyan bandor li ser helbestvanên klasîk û hemdem kir. Her yekî bi şêweyekê wêne wergirtin û bi stîla xwe ya taybet darîştin. Hêmin karîbû sûdê ji ola Mesîhî werbigre û wêneyan jê biafirîne wek dibêje:

Delên diktor xewî naye şewane

Le tawî rawî malos û yekane

Beşî êmey neda lew qest û xole

Mesîhî gewre estanduye tole [224]

---

[223] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 364.
[224]Jêderê Berê, r. 192.

Hêmin di vê wêneyê de adet û nerîtên ola Mesîhî dike çavkanî ji bo avakirina wêneyeke nû ku xwarina goştê beraz di wê olê de wek mînak werdigre. Tam û çêja wî goştî wiha li helbestvan kiriye ku bi dilbijîn behs bike, çimkî xwarina wî goştî di ola Îslamê de heram û qedexe ye. Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Ew tersya yî bê tirs raîmwsî xaç
Kiçî şermîn be rû sûrî denîşê
Leser rûyî to şewêkîş apoloî maç [225]

Hêmin di vê wêneyê de wesfê keçeke bedew a Mesîhî dike ku mijûlî cîbicîkirina erkê xwe yê olî ye, rûyê wê keçê dişibîne rûyê heyvê, ku çawa Apolo di sala 1969an de çû ser rûyê heyvê û bi wî rengî jî Apoloyê maçê şevekê li ser rûyê wê keçê dilûse û wê maç dike.

### 2.3. Xweza/Siruşt

Siruşt diyariya Xwedayê mezin e bo hemû ruhberên wî, bi xemilîtirîn û balkêştirîn şêwe afirandiye, daku hemû ruhberên li ser erdê her yek li ser asta xwe jiyanê di nav wê siruşta bedew de bike. Siruşt tabloyeke rengereng e. Bi rêya vê rengerengiya xwe wiha li mirovan kiriye di demên nexweş û diltengiyan de, lê bihêwirin û aram bibin. Çimkî hemû ew tiştên ku siruşt ji wan pêk hatiye wek çiya û dol û deşt û gir û derya û behr û bihar û gul û kulîlk û bilbil û xuşxuşa avê û berf û baran û dengê balinde û rojavabûn û berbang û xilmaşî û ...hwd, ev hemû bûne xemilînerên siruştê û çavkaniyek in ji bo asûdeyî û hilmijîna henaseya aram û saxlem. Lewma dema kesek nexweşê dil be yan nexweşiyeke wî hebe, bijîşk çareseriya siruştî jê re datîne ku here nav siruştê û tevlî siruştê be, bi çûna nav keskahî yan çûna ser derya û robar, çimkî ev aramiyeke rûhî didin mirov, yan gava mirov li jêr barîna berfê radiweste yan rûbirûyî çiyayekî xweşik radiweste di hundirê xwe de hest bi wê yekê dike ku heye û siruşt girîngiyê pê dide, lewra her demsalek bedewî û taybetmendiya xwe heye, lê bedewiya biharê û siruşta wê bê hempa ye, çimkî di biharê de zevî kirasê xwe yê kevin diavêje û bergê nû lixwe dike û gul û giya û çîçek jidayik dibin û dest bi jiyaneke nû dikin. Hemû ew wênekirinên siruştê

---

[225] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 364.

her yek ji wan bi tena xwe tabloyek e ji tabloyên balkêş û xemilandî û di her qorziyeke wan tabloyan de bi sedan wêneyên rengîn hene. Wan wêneyan karîbûn herin nav hizr û xeyala her helbestvanekî. Her yekî ji wan helbestvanan jî bi berfirehiya xeyala xwe û nerîna xwe û têkilbûna xwe bi wê siruştê re karîbû sûdê ji wan wêneyan werbigre û wan bike jêder û çavkaniyên dirustkirina bi sedan wêneyên şiîrî. Lewra bi tu hawî nabe helbestvan sûdê ji siruştê wernegire, çimkî têkilîkirina xeyala helbestvan û rastiya siruştê wêneyên balkêş pêk tînin. Divê helbestvan teknîka guftûgokirinê ligel siruştê bike ne tenê amrazeke xemilîner be.

Şêrko Bêkes derbarê siruştê dibêje ((*Siruşt çavkaniya yekem a hemû tiştî ye, bêyî siruşt tiştek nîne jê re bê gotin helbest. Hêza siruştê motîfeke bihêz dide hêzdariya helbestê. Ez bêyî siruşt nikarim tiştekî binivîsim ji şaxan bo gulan û av û keviran bi berdewamî dubare dibin, lê her carê bi şêweyeke nû. Siruşt beşekî mezin ê tecrûbeya min pêk tîne. Bi nerîneke nû li siruştê ez hertim rûhekî zindî li tiştên bêcan zêde dikim. Dar ne tenê dar e, lê dikare jin be, peyamek be helbestvan bixwaze bigihîne mirovatiyê. Heta niha helbestvan û edîban di nav siruştê de yarî kirine, lê bêdawî ye mirov û siruşt ji hevdu nayên cudakirin û bêyî hevdu jî najîn*)) [226], yanî hemû ew tiştên bedew ên ku di siruştê de tên dîtin, bandoreke mezin û berçav li ser helbestvanan pêk tînin.

Hêmin wek piraniya helbestvanên din, karîbû bi awayekî pir bihêz sûdê ji siruştê werbigre û di berhemên xwe de bikar bîne û bi şêweyekê sûd ji siruştê wergirt heta asta ku siruşt an xweza axivand û pê re axivî. Hêmin çavê xwe bi av û hewaya bedew a Kurdistanê xemilandiye û kaniya helbestên wî teqiyaye. Ew perwerdeyê çiya û deşt û dol û bihar û sorgul û jin û jivan û van hemûyan bû, lewma wî girîngiyeke zêde daye siruştê û wek çavkaniyeke bihêz bikar aniye. Helbestvan di (Newrozî Rizgarî) de dibêje:

Be bergî sewz razawe qed û lapal û şîw û dol

Çiroy derkirdwe dar û milî da be yektirî giyaw gol

Beser befrî kewîda kird şemalî xakelêwe xol

[226] Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 281-282.

Refîqan rojî kurdane behare cejnî Newroze [227]

Hêmin di vê helbestê de wêneyeke wiha afirandiye ku bi şêweyeke berçav siruşt tê de serdest e. Helbestvan sûd ji siruştê wergirtiye, wek nîgarkêşekî hatiye wêneya tabloya Newrozê ji me re kişandiye, bi şêweyeke pir balkêş û bihêz, çi rengên bedew hene bikar aniye ji bo bedewiya tabloyê. Diyar e ku armanca xwe jî pêk aniye. Helbestvan bi xeyala rasteqîn ligel siruştê fena bûye û vê jî kiriye ku wêneyên nû ji dayik bibin.   Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Ledunyada keme hawtay ciwanî beharî Kurdistan

Ewîş ewsal ke layêkî necatî bû le jêr destan

Le xoşî em wilateş şahîrîş bote hezar destan

Refîqan rojî kurdane behare cejnî Newroze

Be dil min lêtan dekem lewrojeda cejine pîroze [228]

Hêmin bi têkilîkirina bedewiya bihara Kurdistanê û rizgarbûna parçeyekî din ê Kurdistanê wêneyeke bedew afirandiye. Helbestvan di vê wêneyê de hawar dike, gihîştiye wê astê ku bêje li dinyayê nîne wek bihara Kurdistanê rengîn û bedew be, her ev rengînî û bedewî wiha li helbestvan kiriye ku bibe xwedanê çend destan û bi her yekî ji wan destan bedewî û rengîniya bihara Kurdistanê binivîse. Helbestvan bawer dike Newroz cejna taybet û xemilandî ya kurdan e, tu rojeke din li ba helbestvan ne cejn e, lewma di wê roja pîroz de cejnê li kurdan pîroz dike. Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Hateder mangî yekemî behar

Mêlaqe swre lelêwî cobra

Herwa kemêk dûr wenewşêk bû şîn

Wenewşêkî çon mil keç û serşîn [229]

---

[227]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 132.
[228]Jêderê Berê, r. 134.
[229]Jêderê berê, r. 98

Di vê wêneyê de helbestvan dîsa demsala biharê bi giştî û gula sosin û binefş bi taybetî dike qehremanê wêneyê. Helbestvan bêhtir amaje dide dewlemendiya axa Kurdistanê ku li tenişta hev çend cureyên gulên bedew serê xwe dertînin û dest bi jiyaneke nû dikin. Ji nav wan hemû gulan jî, behsa sosin û binfeşan dike. Li gor helbestvan bihar çiqasî qeşeng û bedew be, hebûna wan cureyên gulan xeml û bedewiyeke zêdetir didin biharê.

Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Be mindalî ke perwerdey çiya bûm

Kewim dî por û swêske û askim dî

Belawçakî leşarî kurdewarî

Kiçim dî nazenîn û naskim dî [230]

Helbestvan di vê wêneyê de siruştê dike çavkaniya jidayikbûna wêneyên nû. Naveroka wêne amaje dide ku helbestvan hîn ji zaroktiyê ve perwerdeyê siruşt û çiya û biharê bûye, bi şêweyekê hogir bûye bi dîtina wan balindeyên ku siruşt bedew kirine wek (kew, porr, sûske), lê bi mezinbûna helbestvên re, ew hemû balindeyên ku li ba helbestvan cihê balkêşiyê bûn di qonaxa zarokiyê de, guherîn bi ser wan de hat û li ba wî bûn jin û bêhtir bala helbestvan kişandin. Tiştê ku wêne ciwantir kiriye derxistina jiyana helbestvan e di qonaxên cuda de ku di her yek ji wan qonaxan de bi tiştekî bibandor bûye. Di wêneyeke din de helbestvan matmayîna xwe derbarê siruştê nîşan dide û dibêje:

Leser dundî çiyayî serberzî Helgurd

Rewey hewrim lejêr pêmda bedî kird

Temaşay dîmenî sewzî wilatim

Minî sersam û şageşke û xenî kird [231]

---

[230] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 235.
[231]Jêderê berê, r. 237.

Hêmin ev wêne bi awayekî afirandiye, gava xwînerek vê wêneyê dixwîne bila li wî welatî nejiyabe jî, lê di mezinahî û bedewiya xwezaya welêt de digihe, çimkî helbestvan bi bêrehmî wesfa siruştê kiriye û bi şêweya tabloyekê berçav kiriye. Helbestvan gava ji siruştê çavkanî werdigre, sînorek namîne daku helbestvan û siruştê ji hev cuda bike. Ji ber ku bi sermestî û aşiqî, bûye dildarê welat û av û hewa û dar û baxên welatê xwe. Lewra bedewtirîn û karîgertirîn wêne afirandiye.

Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Dîtim lenaw darw dewen

Leser çilî swre gulêk

Helkwr mabû deykird şîwen

Berî beyanî bulbulêk [232]

Siruşt di nav vê wêneyê de bi xwe wêneyek e û hilgira wêneyeke din e jî. Nabe ev xeyala şênber a helbestvan be, lê dibe ku di dema girtina vê wêneyê de bi xwe dîmen bi kameraya çavê xwe girtibe û di encamê de ew wêne afirandibe, çimkî siruşt û bilbil wêne bêhtir xemilandine û helbestvan jî bi şehrezayî û ezmûna xwe sûd ji xwendina wî biliblî dîtiye, lewra dibe ku ev bûyer bo tiştekî din mecaz be. Lewma dema helbestvan wêne ji siruştê ava dike, wan hemû sînoran têk dişkîne ku bo binyatkirina wêne bikar tîne.  Di wêneyeke din de, Hêmin dibêje:

Behare katî kare xoşewîstim boçî bême şar

Eger min bême şar kê we esto bigrê kar û bar

Emin Kirmanc û Kirmanc ke hat fеslî behar wek har

Debê bixwlêtewe kêw û telan û bendan û nisar

Heta peyda bika nan û neba bo xelkî şar hawar [233]

---

[232] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 165.
[233] Jêderê berê, r. 100.

Hêmin di vê wêneyê de siruştê dike îlham û çavkaniya wê wêneya rengereng. Helbestvan wêneya bihara gundewar dikşîne, nîşanî hemû xwîneran dide ku li gor wî jiyana gundewar ne ewqasî hêsan e, ji ber pirbûna karûbarên gundewar di demsala biharê de, daxwaza yara xwe red dike, demsala biharê wek demsala xebat û harbûna gundnişînan wesf dike, nemaze li ba Kurmancan. Helbestvan gundewar wek çavkaniya peydakirina nan wesf dike.

Di wêneyeke din de, Hêmin dibêje:

Şemal hat begale gal

Hewr bûn gewal gewal

Pişkwt gulî geş û al

Bilbil kewte nale nal [234]

Helbestvan di vê wêneyê de mizgîna hatina demsala biharê îlan dike. Bi awayekî ew nîşaneyên ku di wêneyê de amaje bi wan kiriye nîşaneya destpêka demsala biharê ne, ewr beş beş bûne li esman û hatina bayê şemal ê hînik û pişkivîna gulan amajeyên herî bihêz in bo demsaleke bedew. Hemû ew bedewiyên ku di vê wêneyê de kom kirine di teşeya tabloyeke rengereng de. Yanî siruşt çavkaniya bihêziya vê wêneyê ye.

## 2.4. Jin

Yek ji çavkaniyên bihêz ên helbesta Hêmin jin e. Helbest çiqasî bedew û nazik e, gava çavkaniya dirustbûna helbestê yan wêneyê jin be, wê çaxê wêne bedewtir û naziktir û bêhnxweştir û geştir dibe. Ji ber ku sûdwergirtin ji bedewiya jinê di helbestê de dîrokeke wê ya dûrûdirêj heye. Her ji helbestvanên klasîk heta yên hevçax û yên niha jî. Lewra helbestvanên klasîk rêçika yekem a bikaranîna vê çavkaniyê bûn di helbestê de û bi awayekî balkêş wesfa jin û bedewiya jinê kirine. Her vê bedewiya jinê wiha kiriye ku helbestvan bo bedewiya wêneyên xwe yên şiîrî jinê wek çavkanî bikar bînin. Her lewra ew wêneyên ku jin afirîner û çavkanî û

[234] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 167.

îlahmderên helbestvan bûn cudatir ji helbestên din derketine û zûtir gihîştine hundirê xwîneran. Çimkî mirov di hemû serdem û çaxan de, aşiqê jinê ye. Hêmin yek bû ji wan helbestvanên ku bandora zêde ya helbestvanên klasîk li ser wî hebû derbarê wergirtina her bîroke û xeyalekê derbarê jinê. Lewma helbestvan di bikaranîna jinê di helbestê de gihîştiye lûtkeyeke herî bilind û bedewtirîn wêne li ser şoxûşengî û bejnûbal û hembêza germ a jinê pêk aniye. Ew wêneyên ku jin jêderê dirustbûna wêneyê ne, wêne di bilindtirîn asta romantîkî û bedewiya helbesta kurdî de ne.

Helbestvan gava jinê dike jêderê wêneya hunerî tu berbestekê di navbera xwe û jinê de nahêle. Çimkî helbestvan ji destpêka xortaniya xwe ve heta dawiya jiyana xwe hertim aşiqê jinê bû. Jin li ba Hêmin ruhberekî bedew û cuda ye. Lewra jî bi şêweyeke cuda di helbestên xwe de bikar aniye û kiriye jêdera gelek helbestên xwe. Helbestvan ji bilî ku jin tenê wek çavkanî bikar aniye, lê parêzvanekî çalak ê jinê jî bû. Helbestvan bawer dikir ku divê jin bi xwe biryardera xwe be û li tenişta mêr xebatê bike. Di helbesta (Kiçî Ladê) de, wesfeke bedew a wî ruhberî dike û dibêje:

Lacangt weku gizingî tawê

Herboxoy ciwane tîf tîfey nawê

Kulmeket weku gulaley geşe

Bê surmeş çawe mesteket reşe

Weku firmêsk aşq runakî

Weku awngî beyanî pakî [235]

Hêmin di vê wêneyê de wesfeke bê makyaj û bê ritûş a keça gundî dike. Helbestvan bawer dike ku hinarikên keça gundî di bedewî û roniyê de wek tîrêjê rojê ne, lewma pêwist nake dev û çav yan rûyê xwe bi makyaj û dermanan bixemilîne. Her bi vê wesfê jî nasekine û tîrtir dike. Bi şêweyekê hinarikên rûyê wê û çavên wê yên mest ewqasî bedew û rewşen in wek rondikên aşiqan in. Rondikên aşiqan ji ber ku ji bo armanceke pak dirijin, lewra bê hîle û hîlebazî ne. Lê Hêmin li vir jî

[235] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 106-107.

nesekiniye û ew hemû bedewiyên wê şibandiye xunava berbangê ya ser pelên daran û cudahiyeke zelal jî di navbera keça gundî û keça bajarî de nîşan dide, wêne jî taybetmendiyên keça gundî nîşan dide. Ew hemû bedewiyên ku helbestvan di keça gundî de têbînî kirine, keça bajarî bi makyaj û dermanan wan bedewiyan dirust dike.

Di wêneyeke din de, Hêmin dibêje:

Caran penagey şewanim

Amêzî awellay jin bû

Germî û nermî ew amêza

Mayeyî hesanewey min bû

Derdî jiyan rencî xebat

Mandûbûnî rojî naxoş

Beşew le amêzî ew da

Hemûm dekirdin feramoş [236]

Hêmin di helbesta (Amêzî Jin) de, wêneyeke bedew ava dike ku çavkaniya wê jin e. Helbestvan li ser rûyê vê erdê, hembêza jinê bi tu cihekî din naguhere, çimkî helbestvan bawer dike ku mirov herçiqasî mandî be bi destê dewrana reş a zeman yan her kêşe û kelem û astengiyeke wî hebe, gava ku digihe hembêza germ û tije soz a jinê, ew hemû bûyerên nexweş û dijwar ku di jiyanê de rûbirûyî wan dibe ji bîra wî diçin. Helbestvan hertim şeydayê hembêza jinê û henaseya germ a jinê ye, hembêza jinê wek aramtirîn û parêztirîn wargeh bo dilxweşbûna mêr dibîne.

Di wêneyeke din de, Hêmin dibêje:

Ey kiçî ciwan kiçî lebar

Ey kiçî zana û xwêndewar

---

[236] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 217.

Ey gulale û niwalî kwêstan

Mayey şanazî Kurdistan

Tîşkî hîway diwarojî rûn

Sarêjkarî zamî derûn [237]

Karaktera sereke di vê wêneyê de keç e. Helbestvan wesfê keçê dike, lê wesf nehatiye girêdan bi wesfeke taybet, lê helbestvan bawer dike ku keç şanazî û serwet û samana her neteweyekê ye. Helbestvan keça Kurd wek rewşenî û cihê şanazîkirinê bo welat dijmêre, gihîştiye wê astê ku çiqasî mêr bo welêt pêwist e jin jî bi heman awayî pêwist e, lewra eger mêr parêzvanê welêt be, jin dibe dirustkera wî welatî, her bi vê wesfê jî jinê wek tîrêjeke ronahiyê ku di siberojê de hemû welêt rewşen û şên û avedan dike dîtiye, di dawî de her jin e dibe hêvî û xwestek û birînpêça birînên hemûyan.

Di wêneyeke din de, Hêmin dibêje:

Lade çarşêwî reşt baderkewê kumlî geşt

Çon leqernî bîstema zor heybe ew rû girtine

Kîjî xelkî bombî atomî dirust kird etoş

Herdezanî nawî (estêwlk) û (derxone) û (pine) [238]

Di vê wêneyê de bêhtirî ku wesf e, rexnegirtin e jî li keça Kurd bi giştî, çimkî helbestvan bawer dike ku şermînî hesteke nebaş û nekêrhatî ye ku di mirov de hebe nemaze di jina Kurd de jî di hinek rewşan de. Helbestvan bawer dike jin ku bixwaze mafê xwe bidest bixe, divê çavnetirs be û hevawayê jinên miletên din ku ew qonax derbas kirine heta gihîştine wê asta ku karîbûn bombeya atomî dirust bikin, lê jinên Kurd her mijûlî girêdana çarik û rûpoşê ne û nû fêrî navên bikarhênerên seretayî dibin. Helbestvan hêvîdar e ku jinên Kurd hevawayê jinên din ên dinyayê bi roleke mezin rabin di dirustkirina welatekî bedew de.

---

[237] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 202.
[238] Jêderê Berê, r. 115.

Di wêneyeke din de dibêje:

Lebarî nazenînî nermûnolî dil terî şadî

Le çawî bed bedûr bî ey kiçî ciwanî mehabadî

Le ciwandî da le pakî da nîye hawtat nazanim

Firîştey asmanî yane perwerdey perîzadî [239]

Hêmin di vê wêneyê de, wêneyeke nû ku jêdera wê jin e bi giştî û keça Mehabadê ye bi taybetî binyat dike. Helbestvan wesfeke bedew û dilterr û nazdar derbarê şoxûşengiya keça Mehabadê dike. Helbestvan hawar dike û dilûbîne ji hemû çavên neşaz û nehêja dûr bin, çimkî di pakî û bedewiyê de li tu quncikeke vê dinyayê hempayê we nîne, wesfê kûrtir dike heta digihe ku wan bi firişteyên esman û periyan re dide berhev, çimkî firişteyên esman û perî ciwantirîn û paktirîn dirustkerên Xwedayê mezin in, lewma Hêmin di wesfa jina Kurd de wan bikar tîne.

### 2.5. Realîte

Realîte çavkaniyek e ji çavkaniyên bihêz ên wêneya hunerî, bi awayekî ku wiha li helbestvan kiriye ku girîngiyê pê bide, helbestvan jî takekes e wek her takekesekî civakê ku beşdarî hemû bûyerên xweş û nexweş, tal û şêrîn, bedew û kirêt dibe. Ew hemû bûyerên ku di jiyana helbestvan de rû didin dibin çavkaniya bihêz a jidayikbûna wêneyên şiîrî yên nû li ba helbestvan. Pêwist e helbestvan jî bi şehrezayî û jêhatîbûna xwe bi wan bûyerên ku di jiyanê de diqewimin re tevbigere daku wan veguhêze nav dinyaya edebiyatê. Lê nabe helbestvan wek amraza kopîkirinê be û tiştan wek wan û bê destkarî veguhêze, lê divê bi stîla xwe ya taybet wan wêneyên ku werdigre darêje. Lê herwiha nabe ew dariştin jî wêneyan ji realîteyê dûr bixe û têkiliya wan bi realîteyê re nemîne ((*Çimkî dûrxistina realîteyê ji edebiyatê pêvajoyeke naçe nav çarçoveya rehendên sosyolojiya edebiyatê, çimkî edebiyat ji çarçoveya xwe ya civakî dernakeve*)) [240] Yanî divê pêwendiyeke bihêz û xurt di navbera hemû tekstên edebî û realîteyê de hebe bi şêweyekê wiha li hevdu bikin, her

[239] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 144.
[240] Azad Ebdilwahid, *Sosyolojiya helbesta kurdî di aliyê pîvan û kirîterên wê di nîvê yekem ê sedesala bîstan de*, Çapa 1, Çapxaneya Arabxa, Kerkûk, 2005, r. 31.

yek ji wan bibe hokara bedewkirina ya din. Ev jî bi nerîna helbestvan li ser realîteyê tê kirin. Çiqasî nerîna wî cuda be, wêneyên cuda bi reng û bêhna cuda peyda dibin, lewra herdem realîte bi roleke bilind di avakirin û afirandina wêneya hunerî de radibe. Lê ev bi şêweyekê rû dide ku fikirîn û xeyal û nerîna helbestvan li hember realîteyê cuda be, çimkî helbestvan divê bêhtir û hûrbîntir li realîte û wêneyên wê binere, lewma

(Coleridge) dibêje: ((*Çavê helbestvan wek pencereyekê ye dikare bi xwe hemû wan tiştên derdorê tê de bibîne*)) [241] Çavê helbestvan wêneyên rengereng ên realîteyê bedewtir dibîne û şehrezayê temamiya pêkhate û reng û bêhnên wê ye. Ev şehrezabûna helbestvan wiha dike ku ev wêneyên ku wan di xeyalê de ava dike yan dikevin ber sîqala xeyala helbestvan xwe wiha nîşan didin heta digihe asta sihrbûnê. Lewra divê wêneya hunerî rengdana jiyana civakê û hemû bihayên wê be.

Hêmin yek e ji wan helbestvanên ku trajedî beşek bû ji wê realîteya ku tê de jiyaye. Zulm û stemkarî û gelek kovanên din ên xwe û lawên Kurd bi çavên xwe dîtin. Yan ew civaka ku Hêmin tê de jiyaye, takekesên wê civakê negihîştine wê azadiya ku dixwestin. Lewra ew realîteya ku Hêmin tê de jiyaye bi berdewamî çavkaniya wêneyên nû û terr bû û sermestane û aşiqane di helbestên wî de reng daye. Ango realîteyê karîbû bandorê li ser wî helbestvanî pêk bîne. Baştirîn mînak jî ji wê realîteya ku bandor li ser Hêmin kiriye damezrandina Komara Mehabadê ye ku ew bi xwe jî yek ji endamên herî çalak ên wê komarê bû, lewma wê rewşê û realîteya wê çaxê ya komarê bandoreke mezin li ser helbestvan kir. Lê temenê komarê kin bû û bi plana reş a dijmin û neyarên gelê Kurd zû hat jinavbirin û ew hêviya ku li ba helbestvan û xelkê dirust bûbû zû çilmisî. Lewra dirustbûn û jinvabirina komarê bandoreke mezin li ser Hêmin kirin û bû havêyna gelek helbestên wî. Helbestvan bi taybetî roja damezrandina komarê dike jêder û wêneyeke bedew jê diafirîne, wek Hêmin dibêje:

Rojî cejin û xoşî ye têper bû rojî derd û xem

Hat şiney rehmet becarê rayrifandw birdî tem

[241] Austen Warren û Rene Welk, *Teoriya edebiyatê*, w: Mihêdîn Subhî, Çapxaneya el Terabîşî, 1972, r. 69.

Dê leher layê qaqay pêkenîn kîj û kur

Dê leher swçê nexmey sazw tarw zîlw bem [242]

Hêmin di vê wêneyê de roja damezrandina Komara Mehabadê dike çavkanî û wek rojeke cuda ji rojên normal dibîne. Hêmin bawer dike ku ew roj mîna cejnekê ye ji kurdan re. Roja şadîhêner û xweşîhêner e bi awayekî lê dinere ku heçî xem û derd û tem û şîn hebûn bi xwe re birin. Helbestvan ji ber meziniya wê rojê ji hemû aliyan ve dengê kenê keç û xort û lawên xwîngerm dibihîze. Heta digihe asta ku ji xweşiyê amûrên muzîkê deng û awazên xweş derdixin di wê roja pîroz de. Helbestvan ewqasî dilxweş e, di mezinahiya wê rojê de û di wêneyek din de dibêje:

Gerçî zistan begir daypoşî ewrogişt wilat

Xakî pakî ême xemlîwe weku baxî Îrem

Cêjnî îstîqlalî Kurdistan e rojî şadî ye

Cêjne pîroze le lawî hawlatî xom dekem [243]

Hêmin mezinahiya wê rojê dike çavkaniya jidayikbûna wêneyeke din. Naveroka wêne amajekirin e bi roja damezrandina komarê, ji ber ku Komara Mehabadê di 22yê Rêbendanê de hat damezrandin û Rêbendan jî yek e ji mehên herî sar ên sala kurdî, ku di wê mehê de berfeke zêde dibare. Helbestvan bawer dike herçiqasî berfê axa kurdan hemû nuxumandiye jî, lê nuxumandina axa welatê xwe şibandiye Baxê Îrem û bi baweriya wî ew roj, roja serxwebûna Kurdistanê ye û ew ji wê zulm û stemkarî û zindan û girtinê rizgar dibin, lewra Hêmin di wê xweşiya mezin de pîrozbahiyê li heçî hevwelatiyên Kurd bi ciwan û pîr û zarok û bi hemû çîn û tiwêjeyên wan dike. Lê tiştê ku cihê mixabinî û daxbarê ye ew hemû xweşiyên ku helbestvan li ser damezrandina komarê ava kiribûn zêde dirêj nakin û mîna her car rojên wî yên xweş dibin nexweşî û xem û azar. Ew komar hîn zû bi planên neyarên gelê Kurd jinav diçe. Ev rewş û realîteya tal dibe jêderê jidayikbûna çend wêneyan, wek Hêmin dibêje:

[242] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 123.
[243] Jêderê Berê,r. 123.

Dagîr kirawe wilatiman   Wepaş kewt xebatiman

Rûxa koşkî awatiman   Têperî rojî hatiman

Le zehmet kêşî bê beş   Le piyawî aza û rû geş

Nabînî kesê rû geş   Axinrawe lewne reş [244]

Helbestvan di vê wêneyê de, wêneya piştî hilweşandina Komara Mehabadê ji me re dikşîne. Bi awayekî ku çawa xem û kovanan girtine ser hemû canê wî û gihîştiye wê asta ku bêje tu kes nîne ku rûyê wî geş be, ev jî ji ber wê zulma mezin ku li komarê hat kirin û bi awayê herî kirêt komar hat tarûmarkirin. Lê qîma xwe bi vê tenê jî neanîn û piraniya endamên wê bidarve kirin. Hemû xwezî û hêviyên ku di komarê de dihatin dîtin, bi carekê hatin wêrankirin, her ji bo rûxandina komarê û rojên dijwar ên piştî komarê helbestvan di wêneyeke din de dibêje:

Wilatiman dagir kira   Bwînewe dîlw yexsîr

Yusif xirane naw bîr   Rawker bûne nêçîr [245]

Helbestvan ji qehra rûxandina komarê wêneyeke din ava kiriye, û bi baweriya wî ew hemû kesên ku di dema derketina komarê de destekî wan ê bilind hebû ku helbestvan wan wek nêçîrvan binav dike, hevawayê Yûsif Pêxember (s.x) ji welatê xwe hez dikirin û xelkê ji wan hez dikir, niha ew bûne nêçîr û tên nêçîrkirin û girtin û wan diavêjin binê zindanan û tevgereke xirab li hember wan tê meşandin. Lewma ev wêne hemû helbestvan tûşî reşbînî û diltengiyê dikin ku di wêneyên wî de hest bi wan tê kirin. Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Le layek kuştw bire   Le layek qatûqire

Lwjmin nan û do bire   Hemû kes halî şire [246]

Di vê wêneyê de helbestvan amaje dide wê yekê ku ligel rûxandina Komara Mehabadê milet bi şêweyeke hema hema rûbirûyî kuştin û komkujiyê bû û xelk pir

---

[244]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 141-143.
[245]Jêderê Berê,r. 142.
[246]Jêderê Berê, r. 142.

tên kuştin. Ji hêleke din ve jî birçîtî û xela û hişkesaliyê baskê xwe li ser navçeyê vedaye û çimkî ji hemû aliyan ve navçe rastî êrişan tê û tê wêrankirin û diltengî û dijwarî li navçeyê belav bûye. Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Canyan kirdin bê dade   Siwaryan kirdin pyade

Şehîd kiran begzade   Daryan kirdin amade [247]

Di vê wêneyê de helbestvan amaje dide karbidestên bilind ên komarê, ku piştî hilweşîna komarê ji xeynî laşên xwe xwediyê tiştekî din neman û ew ji hertiştî bêpar kirin û wek her kesekî normal peya ne, tiştek ji wan re nehîştin, tew camên wan ên meyvexwarinê jî jehrdar kirin, û bi vê jî nesekinîn û dest bi şehîdkirina begzade û kesûkarên karbidestên mezin ên komarê kirin û sêpiya wan jî amade kirin ji bo bidarvekirina piraniya endam û alîgirên komarê.

Di wan hemû bûyerên ku komar tûşî wan hat, bûyera herî xemgîn bidarvekirina pêşewayê komarê Pêşewa (Qazî Mihemed) bû. Hêmin bi sedema bidarvekirina pêşewayê komarê gelek wêneyên dilhejên û balkêş ava kirine, di vê wêneyê de Hêmin dibêje:

Le çiwar çiray Mehabad   Le kangay bîrî azad

Destî reşî îstîbdad   Çeqandî darî bêdad

Le katî nîwe şewda   Le cengey şîrîn xewa

Kira karî narewa   Le dar dira pêşewa [248]

Di vê wêneyê de tiştê ku bêhtir helbestvan tûşî hesret û êş û jan û derdan kiriye bidarevkirina pêşewa (Qazî Mihemed) bû. Helbestvan bi awayekî wesfê wî mirovî û rewşa piştî wî mirovî dike ku behskirin û ravekirina wê hinekî aloz e. Çimkî şehîdbûna pêşewa Qazî Mihemed helbestvan bi awayekî birîndar kir ku dermankirina wî ne hêsan e. Ji ber ku  Qazî Mihemed hem dost û hem mamoste û pêşewa û serokê komarê jî bû, lewma bi dijwartirîn şêwe wêneya şehîdbûna pêşewa ji me re dikşîne.

[247] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 141-142.
[248] Jêderê Berê, 2009, r. 144.

Her li wî bajarê ku zengilê avabûna komarê hat lêdan, di eynî wî bajarî de jî hat bidarvekirin. Helbestvan di piraniya helbestên xwe de wî karê ku li hember pêşewa Qazî Mihemed hat kirin, wek karekî nerewa û nedadmend dijmêre. Wê bûyerê bandoreke rasterast li ser raman û hizrên helbestvan dirust kir û bû sedemê jidayikbûna bi sedan wêneyan ku piraniya wan rengdana hundirê helbestvan in, ku di wêneyeke din de dibêje:

Roley wefa darî Kurd   Pêşeway aram û wird

Giyanî fîday gelî kird   Bo Kurd jiya bo Kurd mird

Pêşewa bû raber bû   Zana bû Kurd perwer bû

Xemî xelkî leber bû   Her Kurd nebû beşer bû [249]

Di vê wêneyê de helbestvan bêhtir wesfê pêşewa Qazî dike ku ji bo gelê Kurd giyanê xwe fida kir. Helbestvan bawer dike ku Qazî ne tenê mirovekî normal bû, lê zana û alim û kurdperwer bû. Bi şêweyekê her ew xilasker û roja Kurd bû, çimkî di qonaxeke wiha de karîbû komareke kurdî dirust bike ku xwedî ziman û al û yasa û destûra xwe bû heta helbestvan gihîştiye wê asta ku hîç peyveke din nemaye bo mêrxasî û çavnetirsiya wî mirovî bikar neyîne, sîfeta beşerbûnê daye tenişta wî mirovê mezin. Hemû ew taybetmendiyên ku di pêşewa Qazî de hebûn, alava agirê di hundirê helbestvên de coştir kirine û di encamê de wêneyeke bedewtir bo Qazî kişandiye û dibêje:

Roley kurdî bilîmet   Netirsay ledar û pet

Piştî nekirde millet   Wadebê zipk û hîmet [250]

Dema Komara Mehabadê hilweşiya û dagîrkeran paytexta komarê ku (Mehabad) bû kontorl kirin, daxwaz ji pêşewayê komarê kirin ku xwe radest bike, eger ew xwe radest neke, dê komkujî û wêrankirina welêt rû bide. Lê pêşewayê komarê qet ew yek qebûl nekir ku milet bike qurbanê xwe, di encamê de bêyî tirs û dudilî xwe radestî dagîrkeran kir û bi hovanetirîn şêwe ew û çend hevrêyên wî hatin

[249] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 145.
[250] Jêderê Berê, 2009,r. 144.

bidarvekirin. Ev yek wê rastiyê teqez dike ku Qazî pişta xwe neda milet. Her vê jî wiha kir navê wî bi nemirî di dilê her kurdekî de û her kesekî komarê û piştî komarê de zindî bimîne. Helbestvan bêhtir aşiqê wê çavnetirsî û helwestên wî bû, lewra heta ku helbestvan koça dawî kir yek ji aşiqên sermest ên rêbaza pêşewa Qazî bû.

Sala 1984an, hikûmeta Iraqê bajarê Bane yê Rojhilatê Kurdistanê bombebaran kir. Ev bûyer bû havêyna jidayikbûna wêneyên nû, wek Hêmin dibêje:

Bane wêrane ciger biryane

Leş sire dil pire çaw giryane

Bem behare gulî wêper per bûn

Wa bederdî xezelî payîz çûn [251]

Bane bajarekî kurdan ê bedew li Rojhilatê Kurdistanê ye. Lê ji wê roja ku helbestvan ew wêne jê re kişande, bedewiya wê noqî roket û bombeyan hat kirin, bi awayekî ku bedewiya xwe ji dest da û êdî nasîna wê zehmet bû. Bi wê bihara bedew û qeşeng gulên wê hilweşandin û her pelên gulekê bi cihekî ve çûn û belav bûn. Bihara Bane êdî dişibe payîzeke hilweriyayî. Tenê bedewiyek jî tê de nema ku dilê mirov xweş bike. Ev bûyer hemû bûn sedemê ku mirov parçe parçe be bi awayekî ku şiyana wî ya tevgerê nemîne, çimkî laş hatiye tevizandin û dil mişt bûye û çav jî bi dîtina wan dîmenan girî bûye karê wan.

Hêmin mirovekî rewşenbîr bû, dijî hemû zordariyekê bû, bi taybetî ew zordariya ku ji hêla axayên gundan li hember şêniyên gundan dihat kirin. Helbestvan bi berdewamî êriş biriye ser wan kirdeyan û ji kirdeyên wan bêzar bûye, lewra di vê wêneyê de dibêje:

Ewî axaw bê kare

Cebwnw qelsw lasare

Dizî û rê girtinî kare

Emin deylêmw bê bakim [252]

---

[251] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 270.
[252] Jêderê berê, r. 93.

Hêmin ji ber ku herdem tiyê dadmendî û peydakirina atmosfêreke mirovperwer bû ji mirovan re, axayan jî mirov wek amraz bikar anîne bo xizmeta xwe, lewma helbestvan wan wek kesên bêkar û bêkêr û serserî wesf dike, bi vê jî nasekine û bêhtir êrişî wan dike û wan wek diz û rêgir û keleş binav dike. Helbestvan bawer dike ew tenê ziyanê digihînin civakê, lewma nebûna wan ji hebûna wan çêtir e. Tevî van hemû êrişan jî xwe venadize û ji wan re dibêje ez natirsim û ez tiştê di nava xwe de dibêjim û bêminet im. Dîsa di wêneyeke din de êrişî wan dike û ji wan re dibêje:

Le talan û biro azan

Le rê girtin hemûyan wiryan

Diro nakem biprse wan

Emin deylêmw bê bakim [253]

Helbestvan bêhtir êrişî axayan dike û wan wek bedkar û talançî wesf dike. Ji wan re dibêje tekane tiştê ku şehrezayî û jêhatîbûna we tê de heye rêgirî û talankirina berîka kesên hejar û pêxwas e.

### 2.6. Çavkaniya edebiyata derdorê

Helbestvan ji bilî zimanên xwe yê zikmakî, ku berheman pê dinivîsin û pê dixwînin yan li gor wî zimanê ku pê dizanin helbestan dinivîsin û wêneyan diafirînin. Hinek helbestvanên me hene di nav edebiyata kurdî de ji bilî zimanên xwe yê zikmakî hewla fêrbûna zimanê din ên derdorê dane daku bi rêya fêrbûna zimanên biyanî serwextî berhemên wan bibin û bi şehrezayî sûd ji wan berheman werbigrin û di berhemên xwe de reng pê bidin, çimkî mirov di her serdemekê de be, çiqas zimanan bizane ewqas mirov e û ewqasî jî dikare sûdê ji wan zimanên biyanî werbigre yan eger helbestvan zimanên biyanî jî nizanibin, êdî bi rêya berhemên wergerandî karîbûn edebiyata xwe dewlemend bikin, lê neku guhastina edebiyatên biyanî wekî wan lê bi teknîkeke cudatir.

Gote dibêje: ((*Her edebiyatek ku henaseya edebiyatên din jê re neyê û ji nûve xwe danerêjê diqurmiçe û diçilmise*)) [254], ango ew tam û çêja ku helbestvan ji

[253]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 270.

edebiyatên biyanî werdigre bêhtir berhemên xwe pê çêjdartir dike, ev jî wiha dike hêsantir bê wergirtin ji aliyê wergir/xwîner, wek çawa Pîremêrd gava diçe Stenbolê fêrî zimanê tirkî dibe, fêrbûna vî zimanî hîşt ku ew şoreşeke mezin di edebiyata kurdî bi giştî û helbestê bi taybetî de pêxîne, yan xwendina berhemên edebî yên biyanî ji hêla Goran û Şêx Nûrî Şêx Salih hîşt ku ew serwextî teknîka berhemên biyanî bibin û di edebiyata xwe de bikar bînin. Ev rengdan jî bû sedem ku edebiyata kurdî û helbesta kurdî ji klasîzmê rizgar bikin û bergekî teze lê bikin. Vî bergê teze jî hîşt ku helbesta kurdî ber bi şepêleke nû here ku destpêkeke nû bû di dinyaya helbestê de. Daku helbest hertim terr û teze bimîne, divê helbestvan bi berdewamî li tiştên nû bigere û agehdarî berhemên din ên derdorê be, divê hertim dehla mejiyê xwe bi xwendinê av bide û divê qet ji xwendinê neyê qutkirin. Şêrko Bêkes dibêje: ((*Xwendin, nivîsandinê av dide. Nexwendin valabûn e, xwendin tijebûn e. Li gor vê yekê domandina xwendinê, domandina nivîsandinê bi xwe ye. Ez dikarim bêjim beşê herî zêde yê wan zanyarî û ezmûnên ku li ba helbestvan û nivîskar hene, ji gencîneya wan a dewlemend hatine û kom bûne. Lê eger xwendin dom neke, nivîsandin jî dom nake û temenê wê kurt dibe*)) [255]

Hêmin yek e ji wan şaîrên ku bi berdewamî hewl daye şiîrên wî cuda derkevin û henaseya edebiyatên din jê re bê, nemaze henaseya edebiyata farsî, çimkî ji bilî zimanê xwe yê zikmakî ku zimanê kurdî yê petî yê navçeya Mukiryan e, li bal vê jî zimanê farsî û tew şehrezayiyeke wî ya kemilî jî di rêzimana farsî de hebû. Bandora berçav a şaîrên Fars ên klasîk li ser Hêmin hebû, nemaze Mewlana Celaledînê Romî, ev bandor bi zelalî tê hestpêkirin, bi taybetî di helbesta (Naley Cudayî) de, bi temamî ketiye ber kartêkirina vê helbesta bihêz a Romî, wek Romî dibêje:

(Gwê bigre le ney çon hawar deka
Le dûrî weten berd be ba deka
Le qamîşelan çon minya birî
Le nalînî min gişt hatine girî

[254] Mihemedê Mela Kerîm, *Lêvegerek li gotara Riwange yan edebiyata realîzma sosyalîst*, li gor yar û neyarên wê, amadekirina: Hisên Arif, Çapxaneya Serdem, Silêmanî, 2005, r. 291.
[255]Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 254.

Le derdî dûrî pareye sînem
Lebo arezû dile pir le xem
Ewey ke dûr ma le nejadî xoy
Degrî daîm bo peywendî xoy [256]

Diyar e di vê helbestê de şaîrê mezin ê Fars (Mewlana Romî), behsa amûreke muzîkê ya klasîk dike ku (ney) ye. Ev amûr ji qamîşê tê çêkirin, şaîr wesfê wê amûrê dike û ji me re dibêje, ew awaza ku ji devê wê (neyê) derdikeve, ne awaza xweşî û derbaskirina demê ye, lê ew hawar û nalîna derûna wê ye, ji kovana veqetîn û firqetê wiha şîn û hawarê dike, ew hawar û nalîn jî dûriya wê ye ji qamîşên hevrêyên wê ye, çimkî bi baweriya (neyê), bi ser wê firqetê de ew hişk jî kirine û hundirê wê jî derxistine, di dilbijîna wî girî û hawar û nalîna min de hinek ji kesên ku guhdariya min dikin, hevawayê min hawar û nalîn ji wan bilind dibe û nikarin xwe li ber wan hawar û nalînên ku ji hundirê min derdikeve bigrin.  Hêmin li jêr kartêkirina vê helbestê dibêje:

Giwêm deye ey dîde mestî qît û qoz
Ta binalênim wek bilwêr be soz
Nabê qet naley ciwdayî bê eser
Ca çi ney bîka çi piyawî derbeder
Boye nalem têkelî ney kirdwe
Şîwenêkim pêye ney neykirdwe
Lêm garê ba derbirim sozî derûn
Lêmgerê ba helwerênim eşkî rûn [257]

Helbestvan di vê wêneyê de xwe şibandiye (neyê) ku helbestvanê Fars ê mezin (Mewlana Romî) di helbesta xwe ded bikar aniye ku, çawa ney ji qamîşên hevrêyê xwe hatiye veqetandin, helbestvan jî bi heman awayî amaje dide wê yekê ku ji hevrê û dost û xizm û kesûkar û welatê xwe hatiye veqetandin û dûrkirin. Vê veqetîn û firqetê jî wiha li helbestvan kiriye ku hawar û nalîna wî ji hundir derkeve û di wê

[256] Mewlana Celaledîn Romî, Deftera *yekem a Mesnewî Manewî,* w: Emîn Mutabçî, Çapxaneya Rewşenbîrî, Hewlêr, 2013, r. 12.
[257] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 280.

baweriyê de ye jî ku hawar û girî û nalîn yek in çi ney wan bike yan mirovê bêkes û derbider, çimkî herdu ji ber dûriya ezîzên xwe nalîn û dengekî kezebsoj ji wan bilind dibe. Lê helbestvan hawar û nalîna xwe ji hawar û nalîna neyê xemgîntir û bibandortir dibîne, ew vê hawar û nalînê wek hokarekî bo aramkirina dil û derûna xwe dibîne.

# 3. CURE Û ŞÊWAZÊN WÊNEYA HUNERÎ Dİ HELBESTÊN HÊMİN DE

## 3.1. Wêne Di Warê Bingehî De

**Wêneya Tek (kit)**Ji tekane wêneyeke serbixwe pêk tê ku helbestvan di tekane xetekê yan di helbestekê de binyat dike. Wêneya tak bi gelek şêwazan tê binyatkirin, çimkî ((*Wek sadetirîn pêkhateyên wênegirtinê tê hejmartin*)) [258] Lewra ev cure wêne roleke wê ya sereke heye. Kêm zêde bi qasî girîngî û bihaya xwe çalak e, çimkî ((*Bi rêya şîroveya wêneyên tek mebesta wêneyên aloz rohn dibe*)) [259]

### 3.1.1. Şêwaza Hestgorînê

Yek e ji wan şêwazên ku wêneya tek pê tê dirustkirin, ji veguherîna rol û erkê hestekê bi hesteke din pêk tê. Wek mînak veguhertina hesta dîtinê bi hesta bihîstinê, yanî tiştek bi çav tê dîtin tu rola wê didî guh, bi vî rengî ev veguhertin tê kirin di navbera her pênc hestên mirov de bo nîşandana rewşeke derûnî. Ev jî guherîna pêwendiyên siruştî ye yan damalîna sîfeta hestekê û guhertina wê bi hesteke din e ((*Pir caran helbestvan wan wêneyên ku dixwaze biafirîne, yan ew tiştê ku dixwaze nîşan bide, bi wê hesta xwe, pir caran dibe ku tîbûna helbestvan neşkîne lewma helbestvan penayî hesteke din dibe û wêneyekê li ser binyat dike, ew wêne li ser şêwaza hestgorînê tê dirustkirin û dibe rêyek bo derbirîna hestan ji hêla helbestvanan. Çimkî gava helbestvan veguhertina hestan dike wêneyan derdibire û ev wêne bergekî edebî û xeyalî lixwe dikin û di asteke bilind de dirust dibin.*)) [260] Hestgorîn xebitandina hestan e. Her yek bi erkê hesteke din ji bilî erkê xwe yê bingehînî radibe. Çimkî gava kirdara hestgorînê rû dide hesta berê bikaranîna wê lawaz dibe li hember hesta piştre, çimkî fokusa wêneyê zêdetir dikeve ber tîrêj û ronahiya hesta duyem. ((*Dîroka bikaranîna şêwaza hestgorînê di binyata wêneyên*

[258] Salih Ebûl Subh, *Bizava şiîrî li Filistîna dagîrkirî*, Dezgeha Erebî ya Lêkolîn û Belavkirinê, Beyrût, 1979, r. 42.
[259] Şino Mihemed Mehmûd, *Rola Siwareyê Îlxanîzade di nûgeriya helbesta kurdî de*, Weşanên Çarçira, Silêmanî, 2007, r. 114.
[260]Adil Mecîd Germiyanî, *Wêneya babetî di helbestên Goran û Seyab de*, nameya doktora, koleja perwerdê ya Îbn Ruşd, Bexda, 2000, r. 37.

*helbestî de ne zêde kevin e û vedigere navenda sedsala 19an. Hozanvanê fransî Charles Baudelaire (1821-1867) wek rêberê daxuyaniya bikaranîna hestgorînê di helbesta nû de tê hejmartin û wek pêşengekî helbesta sembolîk di edebiyata ewropî de tê dîtin*)) [261] Di edebiyata kurdî de jî gelek helbestvanan hewl dan ku helbestên xwe li ser vê şêwazê binyat bikin, çimkî vê şêwazê biha, girîngî û taybetmendiya xwe heye, bikaranîna vê şêwazê jêhatîbûn û berfirehiya bîr û baweriyên helbestvan diyar dike. Hêmin di çend wêneyan de bi armanca bedewkirina wêneyên xwe, ev şêwaza guhertina hestan bikar aniye, wek di vê wêneyê de dibêje:

Şemal hat begale gal
Hewir bûn gewal gewal
Pişkût gûlî geş û al
Bilbil kewte nale nal [262]

Bi giştî wêne wesfek e bo hatina demsala biharê. Helbestvan di wêneyê de bi şêweyeke bedew hestan diguhere bi şêweyekê ku dibêje: (şemal hat be gale gal) diyar e (gale gal) tê bihîstin û bi rêya guh hest pê tê kirin. Piştre helbestvan behsa çiloniya beş beş bûna ewran li esman dike ku (ewr) jî tên dîtin, yanî helbestvan hesta bihîstinê bi hesta dîtinê guhertiye, piştre veguherîna hestan berevajî kiriye di gotina (gula geş û al) ev jî dikeve ber hesta dîtinê, lê di gotina (nalenal) de ku tê bihîstin. Yanî helbestvan hesta dîtinê bi hesta bihîstinê guhertiye. Bi guhertina van hestan helbestvan wêneyeke bedew afirandiye. Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Dê leher layêkî qaqay pêkenînî kîj û kur
Dê leher swçêkî nexmey saz û tar û zîl û bem
Gerçî zistane daypoşî ewro gişt wilat
Xakî pakî ême xemlîwe weku baxî Îrem [263]

Di vê wêneyê de helbestvan di gotina (qaqay pêkenîn) û (nexmeya saz û tar) de, du gotin in ku dikevin ber hesta bihîstinê yan bi rêya guh tên bihîstin. Helbestvan li vir wan diguhere bo hesta dîtinê gava ku dibêje: (zistane daypoşî ewrowilat - berfê

---

[261]Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de,* Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 82.
[262]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 147.
[263] Jêderê Berê, r. 123.

welat nuxumandiye) ku ev bi çav tê dîtin. Bi vî awayî helbestvan bi rêya guherîna hestan ew wêne afirandiye. Helbestvan di wêneyeke din de dibêje:

Raste to ciwanî, lebarî nazdarî, şoxî, neşmîlî
Kulmet geştirin le gul û xalit reştirin le zîlî
Ciyabûnewet derde, belam toş dezanî tamî nîye
Jiwan û şew û raw û dildarî, raz û niyazî be dîlî [264]

Wêne li ser binemaya wesfê hatiye avakirin, lê helbestvan wêneya xwe bi rêya guhertina hestan ciwantir kiriye gava dibêje: (to ciwanî, şoxî), ciwanî û şoxî taybetmendiya jinên ciwan in ku bi rêya çav tên dîtin, lê gava helbestvan dibêje: (tamî nîye) ango tê tamkirin, yan dema behsa jivanê dike, pir caran di jivanê de destlêdan-pelandin pêk tê, bi vî rengî helbestvan di wêne de hest guhertine. Helbestvan di wêneyeke din de dibêje:

Her le maçî demeket bê beş bim
Lêwî wişk û demî talim ta key [265]

Di vê wêneyê de hestgorîn bi zelalî tê dîtin, gava dibêje: (maç), maç bi tenê tê encamdn, lê pêwistiya maçkirinê bi du kesan heye, yanî hesta destlêdanê bi çêjtinê guhertiye, çimkî gotiye (demî tallim), talî tê çêjtin.

### 3.1.2. Şêwaza pevguhertina hestpêkirî

#### 3.1.2.1. Bercestekirin

*((Di vê şêwazê de tiştên wateyî bi curekî tên bercestekirin ku bi yek yan bêhtir ji pênc hestan hest bi wan tê kirin. Yan em dikarin bêjin ku armanc ji vê bercestekirinê nîşandana tiştên wateyî yên şênber e di şêweya tiştên berceste û hestpêkirî de*)) [266] Ev jî hêzek e bi zimanê helbestê hatiye dayîn ku tiştên wateyî berceste bike û xwînê û giyan diyarî wan bike. Çimkî xwîn tenê hatiye taybetkirin bi mirov û ruhberan. Lê ew tiştê wateyî ku helbest dixwaze em wek mirov û ruhber wê nas bikin navê wê

[264]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r.216.
[265]Jêderê Berê, r. 243.
[266] Binere li Seyd Qutb, *Wênekirina hunerî di Quranê de*, çapa 11, Weşanxaneya el Şirûq, Qahîre, 1989, r. 72.

kiriye berceste, nemaze bercesteyeke zindî. Hêmin wek piraniya helbestvanan ev şêwaz di binyata helbestên xwe de bikar aniye wek di vê wêneyê de dibêje:

Dek bexêr bêy çi xoşî reşe me
Taku to hatî û têparî rojî reşî me
Êsteke kurde hemû bê hem û bê derd û bê xeme
Şade, azade, deka geltew gep, keyf û geme
Nîştîman hemû razawye, baxî Îreme [267]

Di vê wêneyê de bi giştî helbestvan amaje dide hatin û bihayê meha reşemiyê, ku helbestvan (reşemî) berceste kiriye, çimkî jê re dibêje bixêr hatî yanî meha reşemî hatiye, hatin jî hewcedarî enerjiyekê ye daku wiha li tişt bike li ser piyê xwe bimeşe yanî helbestvan xwîn xistiye nav laşê reşemiyê û ew livandiye. Ev amajeya endîşeya helbestvan e ku ew sînor bezandiye û berceste kiriye. Çimkî meha reşemî bi enerjiya xwe hatiye û hatiye bercestekirin, ango hest pê tê kirin. Di wêneyeke din de dibêje:

Jîn be yexsîrî dîlî û bê kelke
Boye lemêje le jînim ter im
Guzeran bo min lenaw aw xelke
Sexte naxoşe çonî rabwêrim [268]

Di vê wêneyê de helbestvan (jîn) wek kesekî xwedî giyan û ceste (laş) nîşan daye, lê di bingeh de jîn navekî wateyî ye û nakeve ber tu hesteke mirov de. Bi vî rengî helbestvan jîn di şêweya kesekî (bend an dîl)kirî de nîşan daye ku tawanekê dike û cezayê wî jî bendkirina di hundirê zindanê de ye. Yanî helbestvan sîfetek dayê ku di bingeh de ne ya wê ye û bi vî awayî ew berceste kiriye û wek mirovekî pê re tevgeriyaye. Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Ey sirwe bakey beyanî were
Be şine şin û pişwî xot tûnd ke
Leser em dunya newyem labere
Heta detwanî emin bilind ke [269]

---

[267] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 127.
[268] Jêderê berê, r.162.
[269] Jêderê Berê, r. 162.

Wêne li ser binemaya bercestekirinê hatiye dirustkirin, dema helbestvan daxwazê ji (sirra bayê) dike da were, sirra bayê jî di bingeh de navekî wateyî yê ravekirî ye, helbestvan hêz û şiyan daye sirra bayê û doz lê kiriye her dema ku hat heta dikare wî bilind bike. Tiştê bêgiyan jî nikare ji xweber kesekî yan tiştekî bilind bike. Di vê xalê de navê wateyî hatiye bercestekirin. Di wêne de jî diyar e ku helbestvan wek mirovekî bi sirra bayê re tevgeriyaye dema jê xwestiye ew bê û hatin jî hewcedarî şiyan û enerjiyê ye.

### 3.1.2.2. Şêwaza bi ten kirin (bi laş an bi gewdekirin)

Di vê şêweyê de helbestvan peyveke wateyî bikar tîne û sîfetên bergewdeyî didiyê, yanî pêdana qeware û teşe bi tiştên wateyî. ((*Eşkere ye ku hemû tiştên hestewer, ruhber be yan bêgiyan, zindî yan mirî be, aqildar be yan bêaqil, ten (bedenekî) wan heye*)) [270] Eger tiştên hestewer bi hemû cureyên xwe tenekî wan hebe, êdî tiştên wateyî tu ten û bedenekî wan tune. Li ser vê taybetmendiyê, helbestvan teşe yan ten diyarî tiştên wateyî dikin, tabloyên xwe li ser vê şêwazê dirust dikin, ango bi ten kirin yanî pêdana laş bi tiştên wateyî, lewra ((*Hinek jê re dibêjin wesfa madî, çimkî tiştên manewî dişibîne madî*)) [271] Tiştê ku vê şêwazê ji şêwazên din cuda dike ew serxwebûna helbestvan e ku bi kêfa xwe tiştên wateyî diguhere madî û wan dike xwedî qeware. Di vê wêneyê de helbestvan dibêje:

Koşkî zordarî cimîwe, nemawe zulm û bê dad
Wek beheşt xemlîwe xakî pakî kurdan azad
Mulkî Azerbaîncanîş bote mehmwr û azad
Dujminî bêgane bitbînim hemîşe pest û naşad
Çon bibwye bahîsî em dû xake ciwane [272]

Ev malikên helbestê ji çar wêneyan pêk tên. Bêguman mirov pir caran ji ber wê rewşa ku tê de dijî rûbirûyî çend bûyerên xweş û nexweş dibe. Di vê wêneyê de helbestvan bêhtir bi şêweyeke azad û têkilîhev wêne afirandine, di gotina (koşka

[270] Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, Binyata *wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî 2004, r. 137.
[271] Dr. Şukrya Resûl, *Edebiyata kurdî û hunerên edebiyatê*, Hewlêr, 1989, r. 58.
[272] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 140.

zordarî), zordarî tiştekî wateyî ye û tu bedeneke wê tune, helbestvan ew bi ten kiriye û qeware jê re afirandiye, yanî wêne li ser binemaya bi ten kirinê hatiye binyatkirin. Di wêneyeke din de Hêmin dibêje:

Ewcar hestewe biro berew jiwr
Mewêste heta teşkî asman
Bimbere nizîk adoyî rûn û geş
Necatim bide le kawlî xeman [273]

(Xem) tiştekî wateyî ye û tu bedenekî wê tune, lê helbestvan bi rêya şêwaza bi ten kirinê hatiye daku wê bike peyveke bi qeware, peyva (kawl) jê re daniye, mebest ji (kavil) xaniyekî biçûk ê nexilaskirî ye, helbestvan sîfeta bi ten kirinê daye xeman û wêneyeke bedew çêkiriye. Diyar e ku laşê xeman tune, lê bi vê derbirînê helbestvan qeware û laş pê daye. Daku li ba xwîner di dema xwendinê de di zihnê wî de qewareya wê hebe, bi vî rengî helbestvan tiştên wateyî bi qeware dike û tenekî ji wan re dirust dike.

#### 3.1.2.3. Şêwaza bi kes kirin

Ji wan hemû tevger û sîfet û taybetmendiyên siruştî ku di mirovekî normal de tên dîtin û guhastina wan bo tiştên bêgiyan pêk tê. Bi kes kirin berhema endîşe û dîtina berfireh a helbestvan e, çimkî pêdan an lêzêdekirina wan tiştên ku di mirov de hene bo tiştekî bêgiyan girîngî û bihayê xwe heye. Çimkî wek ku helbestvan giyan bi ber kevir an dar an her tiştekî bêgiyan de bike, ev jî di aliyê bîr û baweriyê de hinekî zehmet e. Çimkî bi kes kirin berhema endîşeya berfireh e ((*Helbestvan bi lêzêdekirina siruşta mirovî yan zêdekirina taybetmendiya mirov bo ser wan tişt yan wan ruhberên ku ne mirov in yan bêgiyan in radibe*)) [274] Yanî pêdana heman rol û taybetmendiya mirov bo tiştên bêgiyan ên siruştê. Ev jî tê wê wateyê ku helbestvan hevrêyên nû bo hez û meraqên xwe yan xweşî û nexweşiyên xwe peyda dike, yan eşkerekirina wê jiyana veşartî ku di tiştên bêgiyan ên derdora me de heye, bi awayekî di dema vê guhastinê de hest û soza xwe derdibire, wê çaxê tiştekî bêgiyan wek mirov tevger pê re tê kirin. Wek helbestvan di vê wêneyê de dibêje:

---

[273] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 163.
[274] Cabir Ehmed Isfûr, *Wêneya hunerî di mîrasa rexneyî û rewanbêjî de*, r. 325.

Rojgarî siple bo min boseyekî nayewe

Nemdî her tîrêkî deyhawê berw sînem nabê [275]

Helbestvan di vê wêneyê de bi rêya şêwaza bi kes kirinê ev wêne dirust kiriye di gotina (rojgarî siple) ango heyama bêmirwet ku kemîn li ber helbestvan vedaye. Di bingeh de mirov dikare kemînê ji mirov re vede. Yanî ev kar taybet e bi mirov, helbestvan li rojgarê ango li çerx û dewranê zêde dike. Bi vî rengî helbestvan ev wêne li ser bingeha bi kes kirinê dirust kiriye ku ew sîfet û taybetmendiya mirov daye rojgarê. Bêguman şaîr dizane ku ew sîfeta rojgarê tune ku tîran biavêje yan kemînan ji mirov re vede, lê xeyal an endîşeya şaîr û şêwaza wî ya derûnî şêwaza bi kes kirinê kiriye armazek bo kêşana wê rewşa ku hest pê kiriye. Wiha jî wêneyeke bedew ji dayik bûye. Di wêneyek din de şaîr dibêje:

Mang le ast henyeyî şermezar bowe

Biroy dî hîlal, xoy le birçowe [276]

Helbestvan vê wêneyê jî li ser binemaya (esasê) bi kes kirinê dirust dike gava şaîr dibêje (mang şermezar bowe), di bingeh de şermezarbûn taybet e bi mirov û mirov li hember kesekî ji ber karekî şermezar dibe, lê şaîr sîfeta şermezarbûnê daye heyvê. Bi vî rengî şaîr ev wêne afirandiye.

### 3.2. Wêne Di Warê Hestbarî Û Zihnî De

#### 3.2.1. Wêneya Hestbarî

Wan hemû wêneyan li xwe digre ku dikevin ber hestekê ji hestên mirov ku ji hestên (dîtin-bihîstin-bêhnkirin-çêjtin û destlêdan)ê pêk tên. Hemû wêneyên ku helbestvan wan di jiyana xwe ya rojane dirust dikin bi rêya yekê ji van hestan e. Xwîner jî her bi rêya yekê ji van hestan wêneyan werdigre. Ango hest bi berdewamî wê pêwendiya ku di navbera helbestvan û xwîner de heye nû dikin û rengekî têgihîştinê di navbera wan de pêk tînin. Helbestvan jî wan wêneyên ku di siruştê de hest bi wan dike wek xwe û deq bi deq venaguhêze, lê hest û sozên xwe davêje ser wêneyê û bi şêweyeke nû berçav dike, ((*Çimkî dirustkirina wêneyên hestbar ne*

[275] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 140.
[276] Jêderê Berê, r. 163.

*tomareke fotografî ya siruştê û çavlêkirin e. Rast e helbestvan bi rêya hestan diçe nav siruştê û dîmeneke balkêş jê werdigre, lê wek xwe wernagire, lê guherîn tê ser û wê dike destçêkira xwe*)) [277] Lewra gava helbestvan wêneyekê bi rêya yekê ji van hestan werdigre çiqasî teknîk û şehrezayiya xwe di wêne de bikar bîne ewqasî wêneya wergirtî bedewtir derdikeve û dûr dikeve ji çavlêkirina deq bi deq, wê çaxê bandoreke zêdetir li ser xwîner jî çêdike.

Eşkere ye ((*Gava helbestvan wêneyeke şiîrî di helbestekê de diafirîne, wexta xwînerê şiîrhez û rexnegirê jêhatî wan helbestan dixwîne yan guhdariyê li wan dike, hest dike her wêneyek bi rêya hestekê baştir jê re tê wergirtin, yanî çiqasî ew wêne bi hesta dîtinê û bi çav wan werdigrin û dibînin bi rêya hestên din ên mirov wek bihîstin û çêjkirin û bêhnkirin û destlêdana wan wêneyan werdigirin*)) [278] Çimkî ne merc e gava helbestvan wêneyekê bi rêya yekê ji van hestan ava dike, xwîner her bi tenê bi rêya wê hestê wêne werbigre, çimkî bikêr tê ku wêneyek bi rêya hestekê hatibe dirustkirin, lê bi rêya hesteke din bê wergirtin, çimkî dibe ku ew wêne bi rêya hesta bihîstinê hatibe çêkirin, lê gava xwîner wêne dibîne, wêne li ba wî bedewtir û bihêztir derdikeve wek ku li ba helbestvan hatiye çêkirin, bi mercê ku xwîner şiîrhez be. Helbestvan bi rêya her yekê ji van hestan kariye wêneyên hunerî çêbike.

#### 3.2.1.1. Hesta Dîtinê

Ew hemû wêneyên ku bi rêya çav tên wergirtin dikevin ber vê hestê. Hesta dîtinê di ser hemû hestan re ye, çimkî ji hemû hestên din zelaltir e û bêhtir ji rastiyê nêzîk e. ((*Hesta dîtinê di jiyana mirov de gelek zanyariyan digihîne mejî, bêyî ku berketina rasterast di navbera mirov û tiştan de pêwist bike, tenê bi rêya wan tîrêjên ronahiyê ku ji tiştan tên bo çav, di çav de jî diguhere bo nameya damara dîtinê û ber bi qalikê mejî dikevin rê, di rawestgeha dawî de jî tên ravekirin û wate ji wan re tên danîn û têgihiştin rû dide*)) [279] Hêmin wek piraniya helbestvanan karîbû bi şêweyeke baş vê hestê bikar bîne û wêneyên bedew jê çêbike. Wek di vê wêneyê de helbestvan dibêje:

---

[277] Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî 2004, r. 137.
[278] Dr. Derya Cemal Hewêzî,*Wêneya rûnbêjî di dîwana (Şehîd bi tenya piyase dekat)ya Qubadî Celîzade*, Çapxaneya Belavokên Silêmaniyê, 2009, r. 112.
[279] Sabir Bekir Mistefa,*Tîrajek ji psîkolojiya rengan*, Kovara Raman, hejmara 33, 1999, r. 206.

Xozge wek xor nemdîbaye şewî tar

Xozge tawê ramnebwrdbye bebê yar

Xozge pîrî lelay nedekird im

Xozge le yekm jiwange da demird im [280]

Di gotina (Xozge wek xor nemdîbaye şewî tar) helbestvan bi rêya şibandinê ev wêne dirust kiriye. Di heman demê de jî, çimkî dibêje (nemdîbaye), xor ango tavik an rok tê dîtin. Mebesta helbestvan ew e ku çawa tav şevê nabîne û hemû temenê xwe di ronahiya rojê de derbas dike, helbestvan jî xweziyê dixwaze ku wî jî mîna rokê tucarî şeva tarî nedîtiba. Her yek ji wan wêneyên ku di wêneya giştî de tên dîtin, helbestvan bi dilbijîn wesfa wan kiriye, koma giştî ya wêneyan, wêneyeke balkêş e ku bi rêya hesta dîtinê hatiye çêkirin.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Lade çarşêwî reşt ba derkewê kulmî geşt

Çûn le qernî bîstema zor heybe ew rû girtine [281]

Wêneyeke hesta dîtinê ye. Ku di gotina (ba derkewê kulmey geşit) de bi diyarîkirî derdikeve ku mebesta helbestvan hesta dîtinê ye. Hesta dîtinê kiriye amrazek ji bo dirustkirina vê wêneyê. Helbestvan bi rêya wê hestê peyama xwe digihîne wan keçên ku bi rêya sergirêdanê rûçikên xwe yên bedew dinuxumînin. Mebesta wî bêhtir derketina hinarikên spî û bedewiya keça Kurd e. Derketin an derxistina hinarikan bi çav tê dîtin. Di wêneyeke din de dibêje:

Dekem ca seyrî estêran û heldemjim şiney şew ba

Şew bêdengî çend xoşe, xozge hemîşe her şew ba [282]

Di vê wêneyê de helbestvan heta radeyeke baş sûd ji hesta dîtinê wergirtiye, bi awayekî ku di şeveke sahî ya salê de derketiye derve daku bi hilmijîna bayê hînik ê şevê re li stêrkên esman binere. Wêneya hestbar di gotina (seyrî estêran dikem) de hatiye avakirin. Gava helbestvan sêra esman kiriye, di xeyala wî de ev wêne dirust bûye. Helbestvan di şevê de dema sêra derdora xwe kiriye rengekî xilmaşiyê dîtiye. Ji wê xilmaşiyê xwezî xwestiye ku hertim dem şev bûya.

---

[280]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 419.
[281]Jêderê Berê, r. 115.
[282]Jêderê Berê, r. 161.

### 3.2.1.2 Hesta Bihîstinê

Wan wêneyan li xwe digre ku bi hesta bihîstinê tên hestpêkirin. ((*Xwîner wêneya hunerî bi hesta bihîstinê werdigre, wek mînak helbestvan di wesfa biharê de dîmena ajelên gund ji me re dikşîne, wek xwendina kevokan û qebeqeba kewan û çîveçîva balindeyan ku di nav bax û bistanan de deng û vedengeke dilrevîn diyarî wî dikin. Her yek ji van jî bi rêya hesta bihîstinê tê wergirtin*)) [283] Hêmin wek piraniya helbestvanan karîbû bi awayekî baş wê hestê bikar bîne û wêneyên bedew jê biafirîne. Wek di vê wêneyê de helbestvan dibêje:

Nîwe şewe dinya xamoş
Dête giwêm ahengêkî xoş
Ahengêkî giyan perwere
Şadî hêne xefet bere
Ahengêkî dil newaze
Tare yolone ya saze
Na..na..ahengî bilwêre [284]

Wêneyeke hesta bihîstinê ye. Helbestvan bi gotina (dête giwêm ahengêkî xoş) û (ahengî giyanperwer) û (ahenga dilnewaz) û (ahenga bilwêr), ev wêne hemû helbestvan ew bi rêya hesta bihîstinê wergirtine û wêneyên bedew ji wan dirust kirine. Ew hemû ahengên ku helbestvan di wêne de bikar anîne mebesta wî ew awaz e ku ji bilûrê derdikeve, ew awaza ku bi şadîhêner û xemrevîn wesf kiriye ku ew bihîstine.  Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Peyamî min be gwêy ew dilbere nazdare ranaga
Nesîm (bêsîm) debînê şil debê bem kare ranaga [285]

Wêneyeke hesta bihîstinê ye. Helbestvan di wêne de nîşan dide ku peyamek pê re ye û nizane çawa bigihîne guhê dilbera xwe yan wê mirova ku hiş û bîra helbestvan dagîr kiriye. Gihandina peyamê bo guhê kesa mebest wêneya hesta bihîstinê ye. Gava şaîr piştrast dibe ku ew bi xwe nikare peyamê bigihîne, neçar dibe

[283] Profesorê alîkar Newzad Weqas Seîd, *Wêneya şiîrî di helbestên Racî de,* Kovara Akademya Kurdî, Çapxaneya Hacî Haşim, hejmar 22, Hewlêr, 2012, r. 72.
[284] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r .
[285] Jêderê Berê, r 270 .

hawara xwe bigihîne bayê şemal, bayê şemal jî diweste û nikare wê peyamê bigihîne. Çimkî bawer dike hilgirtina wê peyamê zehmet e. Helbestvan hesta bihîstinê kiriye amrazek bo dirustkirina wê wêneya hunerî. Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Çon nenalê ew diley engawteye
Berd le berdî bêtewe xo dengî heye [286]

Wêne li ser binemaya hesta bihîstinê hatiye dirustkirin, dema helbestvan gotiye (Berd le berdî bêtewe dengî heye) ku du berd (kevir) li hev dikevin dengekî derdixin. Helbestvan sûd ji wî dengî wergirtiye û ew wêne jê afirandiye. Helbestvan di wêne de dilê xwe wek wan keviran dibîne ku deng ji wan bilind bûye, çimkî dilê helbestvan jî hatiye hingavtin û hawar û nalîn jê radibe. Bi sedema wan dengan ku ji dilê helbestvan û keviran radibin tê zanîn ku wêneyeke hesta bihîstinê ye. Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Min çirîkem hemû çemenî pir kirdwe
Êste naye le gerûm bêcige le naley xemgîn [287]

Wêneyeke hesta bihîstinê ye. Di gotina (çirîke) û (nale) de, her du ji devê mirov derdikevin, her yek ji wan awazek wê heye. Ku bi rêya guh hest bi wan tê kirin. Helbestvan sûd ji wê rewşa ku tê werbûye dîtiye ku di jiyana xwe de gelek êş û derd û kul û jan dîtine, nîvê wê jî xweşî û tama jiyanê nekiriye. Li beramberî wan hemû nexweşiyan her carekê kiriye çîveçîv bi awayekî ku dol û newal tije kiriye. Ewqasî kiriye çîveçîv, êdî ne nalenal be ji gewriya wî dernakeve.

### 3.2.1.3. Hesta Bêhnkirinê

Hinek wêneyên hunerî hene dikevin ber hesta bêhnkirinê. Di wesf û bikaranînên şaîr de derdikevin. Şaîr karîbû sûdê ji vê hestê werbigre û çend wêneyan pê biafirîne. Wek di vê wêneyê de dibêje:

Ta gulaley bon xoşî tiropkî kiwêstan
Be girî muşekî bêgane biprwên, degirim [288]

---

[286] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 281.
[287] Jêderê Berê, r. 323.
[288] Jêderê Berê, r. 210.

Wêne dikeve ber hesta bêhnkirinê û wêneyeke livbar e, şaîr dibêje heta gulale (nîsanok) bi agirê moşekan bên hûrkirin digirîm, çimkî eger moşek berdewam bin ew bêhna nîsanokan a xweş namîne û sîfeta berdewambûnê daye wêneyê. Helbestvan sûd ji çûna xwe bo (kiwêstan) zozanan jî dîtiye û bêhna xweş a gulan bandor lê kiriye. Lewma jî li ser jinavçûna wan gulan giriyaye. Ji hesta bêhnkirinê ev wêne hatiye avakirin.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Le malî xom dekem bonî xerîbî
Ke bêzar im lehe şitêkî hemane [289]

Wêne bi giştî dikeve ber hesta bêhnkirinê, bi taybetî di gotina (bonî xerîbî – bêhna xerîbiyê) de, helbestvan bêzariya xwe ji her tiştî nîşan dide ku di mala wî de heye. Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Bonî xoşî helale
Piyaw mest deka le niwale
Wek şehîde gulale
Le xiwên da şelale [290]

Helale (lale) curekî gulan ê bêhnxweş e. Helbestvan jî sûd ji bêhna wan gulên lale wergirtiye dema gotiye (bonî xoşî helale), diyar e ku bêhnkirin jî bi rêya bêvilê hest pê tê kirin. Helbestvan ji bilî vê wêneyeke şibandinê dirust kiriye dema gulale (nîsanok) şibandiye şehîdan, çimkî gulale rengê wan sor e, mirov jî gava şehîd dibe laşê wî ji ber xwîna wî sor dibe. Wêne bi rêya hesta bêhnkirinê hatiye dirustkirin. Vê teknîkê jî wêne ciwantir kiriye.

---

[289] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r.200.
[290] Jêderê Berês, r.150.

#### 3.2.1.4. Hesta Çêjtinê

Hesta çêjtinê ew hest e ku şêrînî û talî û şorî û tirşî û tamên cuda cuda yên fêkî û xwarin û diyardeyên jiyanê pê tê tamkirin. Helbestvan gelek wêne dirust kirine, emê çend mînakan nîşan bidin. Wek di vê wêneyê de helbestvan dibêje:

Be mindalî le lêwî to astandume maç
Be pîrîş lezetî ew maçe şîrînem ledem dernaçê
Be sed diktor û derman û perstarê nakirê çarey
Kesêk tîrî mijolî ew kiçey le dil raçê [291]

(Şîrîn) bi hesta çêjtinê tê hîskirin. Di gotina (Be pîrîş lezetî ew maçemm ledem dernaçê) de, hesta çêjtinê tê hîskirin. Herwiha di gotina (kesek tîrî mijolî ew kiçey ledil ra çê) de, diyar e tîra mijangan di dil re naçe, lê tenê mirov dikare tîran di dilê kesekî re bike. Ango ev wêne li ser binemaya bi kes kirinê hatiye avakirin.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Em şerabe tale dermanî xeme
Lêy heram bê ew kesey derdî keme
Em şerabe ale bi bê derd niye
Lêy heram bê ew kesey reng zerd niye [292]

(Tal) bi hesta çêjtinê hest pê tê kirin, di heman demê de di gotina (em şerabe tale dermanî xeme), wêneyeke rawestiyaye, çimkî şaîr gihîştiye wê baweriyê ku şerab dermanê xeman e. Temamiya wêneyê wêneyeke hesta çêjtinê ya bedew e ku şaîr bi rêya wê hestê wêneya xwe çêkiriye.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Arezûme hîç nebê carê maç kem zarî to
Arezûyî min çûke, ema ta bilêy şîrîne [293]

(Şîrîn) bi rêya hesta çêjtinê hest pê tê kirin. Ev wêne ji bilî hesta çêjtinê, hesta berketinê (destlêdan an pelandinê) jî tê de heye, çimkî helbestvan doza maçê ji lêva

---

[291]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 181.
[292] Jêderê berê, r. 274.
[293]Jêderê berê, r. 115..

yara xwe kiriye. Maç jî bi rêya berhevketina du kesan tê kirin. Ji bilî vê wêneyeke livbar e jî, çimkî helbestvan gotiye (maç kem), rawestana maçê tune.

#### 3.2.1.5. Hesta Berketinê (Destlêdan - Pelandinê)

Ev hest wan wêneyan li xwe digre ku bi rêya hesta berketinê yan destlêdanê hest bi wan tê kirin, wek (nerm û req, şil û tund, sar û germ) yanî ((*Berketin hesteke girîng e di kifşkirina bedewiya tiştan de û hin caran şûna hesta dîtinê digre û jê jî bibandortir dibe. Ev hest gelek sîfetên derbirînê ku ligel rewşa wî ya derûnî kêrhatî be diyarî mirov dike*)) [294] Lewra qet nabe helbestvan vê hestê piştguh bike çimkî hinek wêne hene ku dikevin ber hestên dîtin an bihîstinê, cudatir e ji wê yekê ku bi berketin an destlêdan hest pê tê kirin. Hêmin karîbû hinek wêneyan bi rêya vê hestê dirust bike, wek di vê wêneyê de dibêje:

Ke rêk dekwşim pencey nerim
Leşî sirim debê gerim
Bizey şîrînî ser lêwê
Hestî pîranem debizêwê [295]

Livandina hesta helbestvan û “bize” ango girnijîna li ser lêvê, wêneyên livbar in, gotinên (rêk dekûşim) û (leşî gerim), ev gotin hemû bi rêya hesta berketinê dirust bûne, çimkî guvaştin ango guvaştina pence û tiliyên nerm bi rêya hesta berketinê hest pê tê kirin, yan bi rêya berketinê tu hest dikî laşê mirov sar e yan germ e. Temamiya wêneyê bi rêya hesta berketinê dirust bûye. Helbestvan ew hest kiriye amrazek bo derbirîna sozên xwe yên asêmayî. Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Ew kesey pence bikwşê car û bar
Ew kesey destî bigate gerdenî yar
Ew kesey raymusî kulmey tas û lus
Ew kesey têy helnedabê çarenûs [296]

---

[294]Ebdulselam Salar Ebdulrehman, *Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Salih de*, nameya doktora, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006, r. 8.
[295]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 299.
[296] Jêderê berê, r. 276.

Helbestvan di vê wêneyê de sê wêneyên bedew bi rêya hesta berketinê afirandine, wêneya yekem (kuşînî pencolle), gava mirov penceya kesekî diguvêşe hest bi germî û nermiya wê pencey dike, ev jî derdixe ku ji ber berketinê hest pê tê kirin. Di wêneya duyem de (dest gihîştin bi gerdenî yar), ev jî dîsa bi rêya hesta berketinê hest pê tê kirin. Di wêneya sêyem de (ramusînî kullmey lûs) bi rêya hesta berketinê derdikeve ku kullme ango hinarik lûs -şahîk e yan zivir e, ji bilî vê wêne wêneyeke livbar e, çimkî helbestvan sîfeta livînê daye guvaştina penceyê dema dibêje carûbar. Temamiya wêneyê wêneyeke bedew e.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Kiwanê ew pence ke tûnd dekuşê memkî tûnd
Kiwanê ew pêye ke bo jiwan deçû gundû gund
Kiwanê ew çawe ke her ciwanî debînî û çîdî
Kiwanê ew bîre ke heldefrî berew berzî û dûnd [297]

Di vê wêneyê de helbestvan bêhtirî hestekê û bêhtirî wêneyekê bikar aniye. Di wêneya yekem de ku dibêje (dekuşî memkî tund) ev wêne dikeve ber hesta berketinê, çimkî guvaştina memikan bi rêya dest dibe. Wêneya duyem wêneyeke livbar e, çimkî helbestvan dibêje ew piyê ku diçû jivanê gund bi gund sîfeta livînê pê daye. Di wêneya sêyem de, wêneyeke hesta dîtinê ye, çimkî dibêje çavên wî tenê bedewî didîtin. Di wêneya çarem de jî wêneyeke livbar û şênber e, çimkî bîr wateyî ye, helbestvan ew şênber kiriye gava ku gotiye bîr hildifire, helbestvan sîfeta livînê jî pê daye.

### 3.2.2. Wêneya Zihnî (Jîrî)

Wan wêneyan li xwe digre ku her di bingeh de nakevin ber tu hestekê ji hestên mirov, lê wêne wateyî ne û tenê bi xeyal û hizrê tên hîskirin. "Eger wêneya hestbar bikeve ber yek ji her pênc hestên mirov, lê wêneya zihnî-jîrî nakeve ber tu hestekê û wêneyeke wateyî ye û ji hundir ve dizê. Ji ber hişyariyê tê zanîn."[298] Ango pêwistiya hestkirina bi wêneya zihnî bi cure taybetmendiyekê heye berevajî wêneya hestbar, çimkî wêneya zihnî ji hundir ve çavkanî digre. Bercestekirina hundirê mirov e ku

[297] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 419.
[298] Aso Umer Mistefa, *Bihayên estetîkî yên şiîrî li ba Pîremêrd û Şêx Nûrî Şêx Salih û Goran*, nameya masterê, koleja perwerde, zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2007, r. 109.

bandora derdorê li ser heye. Hêmin heta radeyekê karîbû sûdê ji vê cureya hestê werbigre û wêneyan jê dirust bike. Wek ku di vê wêneyê de dibêje:

Teşena botewe nasorî derûnm dîsan
Zamî kone û be meyî konî debê merhem kem
Mişt û malî dewê awêneyî jengawî xeyal
Mest û gêjim, heta gal be camîcem kem [299]

Xeyal û hesta helbestvan ewqasî bilind bû heta gihîştiye asta ku behsa derûna xwe bike, bi awayekî wek ku derûna wî mişt be, çimkî helbestvan dibêje (nasorî derûnm), mebesta helbestvan ji nasorî derûn ew e ku derûna wî seranser nexweş ketiye, bo çareseriya vê nexweşiyê jî helbestvan meya kevin wek derman dîtiye daku wê hemû nexweşiya nava xwe pê derman bike. Ev wêne wêneyeke zihnî ye, çimkî helbestvan behsa tiştekî dike ku nakeve ber tu yekê ji hestan ku ew jî hundirê wî bi xwe ye

### 3.3. Wêne di aliyê rawestan û tevgerê de

#### 3.3.1. Wêneya Rawestiyayî

Ev wênedi şêweya tabloyeke rawestiyayî de ye û tevger û livîn tê de tune. Kirdar berdewamiya tevger û bizavê diyarî wêne nakin û di rewşeke neguhêr û rawestiyayî de ye. Ev wêne wesfê tiştekî ji me re dike ku ne di rewşeke cihgirtî de ye. Çimkî ((*Ev wêne rasterast e, mecalekî wî yê diyarkirî heye ku tu bihayekî siruştdarî yan navxweyî hilnegirtiye, hêlên wê cihgirtî ne û geşbûna wê rawestiyaye. Xisletên wêneya rawestiyayî ji wesfkirina tiştekî di çirkeyeke diyarkirî de pêk tê û girîngiyê dide xasiyetên wê yên hestbar, bêyî ku guherîn û pêşketina wî tiştî di demeke demdirêj de nîşan bide*))[300] Lewra me wêneya rawestiyayî şiband tabloyeke cihgîr ku tu nûbûnek di qonaxekê ji qonaxên temenê wê de nayê dîtin û her neguhêr dimîne, çimkî ((*Ew wêne rasterast rehend diyarkirî ye ku hêlên wê aramiyek wergirtine û geşbûna wan rawestiyaye*)) [301] Dema her tiştek jî ji geşbûnê rawestiya û

---

[299] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 419
[300]Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî 2004, r. 213.
[301]Hitler Ehmed Heme, *Wêneya şiîrî li ba Nalî*, nameya master, koleja ziman, Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2001, r. 109.

gavan ber bi bedewî û nûbûna xwe ve naavêje, lê bi awayekî ji awayan di rewşeke sekinî de dimîne heta ku ji ((*wêneyeke fotografîk nêzîk dibe*)) [302] Eger ji wêneya fotografîk jî nêzîk bû, hemû cureyên hewldanê pê re bêsûd in. Herçiqasî helbestvan jî hewla guherînê tê de bide, çimkî ew wêne careke din venagere destpêka dirustbûn û binyatkirina xwe. Çimkî wêneya rawestiyayî ew wêne ye ku mewdaya wê diyarkirî ye û dûrî hest û sozdariya helbestvên e; ku kirdar rolê tê de nabîne û wek xwe dimîne. Lewra wêneya rawestiyayî ew wêne ye ku şiyana kirdar tê de nîne ku tevgerê bidiyê. Helbestvan gelek wêneyên bi vî rengî dirust kirine, wek vê wêneyê ku tê de dibêje:

Weham bîstwe serdemî pêşû

Le gewre şarêk nazdarêk hebû

Kiçêkî qît û qoz û keleget

Şakarî nexş û destî keleget [303]

Di vê wêneyê de gotinên (serdemî pêşû), (nazdarêk hebû), (nexşî tebîet), wêneyên rawestiyayî ne, her yek ji van wêneyan wêneyeke ku ji wiha zêdetir tîrêjan nadin û bi cihgirtî mane û geşbûn di wan de nayê dîtin. Bi giştî wêne wêneyeke sekinî ye.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Şînim gelêk gêra şadîm kem dîwe

Xoşî delên heye, belam nemdîwe

Helwedabûm ledwî perî azadî

Tûşî nebûm ne lew dîw ne lem dîw [304]

Wêneyeke wesfê ya rawestiyayî ye, mewdayên wê diyarkirî ne û xilas bûne, geşbûn tê de nemaye, tîrêjên wê diyarkirî ne û ji geşbûnê rawestiyane û berdewamî tê de tune, lewma wêne ji wî sînorê ku jê re hatiye kişandin derbas nebûye. Helbestvan

[302] Hitler Ehmed Heme, *Wêneya şiîrî li ba Nalî*, nameya master, koleja ziman, Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2001, r. 109
[303] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 342.
[304] Jêderê berê, 2009, r. 316.

di gotina (şînî gelêk gêrawe) de demên wê derbas bûne û di rewşeke rawestiyayî de maye, lewra wêne rawestiyayî ye. Di gotina (şadî kem dîwe) ev gotin jî derbas bûye û tîrêjên din jê re nayên, di heman demê de wêneyeke şênber e, çimkî şadî navekî wateyî ye wiha lê kiriye bê dîtin. Di gotina (xoşî nedîwe) de, helbestvan gava behsa vê gotinê dike, berê qewimiye û dema wê derbas bûye, lewra ev wêne wêneyeke rawestiyayî ye.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Eger çî royî qet qet naçî leyadim

Dekem yadt be yadî towe şadim

Ke barget bo hewar têkna ezîzim

Şika estundekî tawlî miradim [305]

Wêneyeke rawestiyayî ye, mewdayên wê diyarkirî ne û xilas bûne ji geşbûnê û tîrêjên din jê re nayê. Di gotina (egerçî royî) de, hest bi wêneya rawestiyayî tê kirin. Çimkî dema wê derbas bûye û careke din venagere. Yan di gotina (şika estûndekî tawlî miradim), ev wêne jî bi heman rengî ji geşbûnê rawestiyaye û di rewşeke sekinî de tê dîtin. Bi giştî wêneyeke bedew a rawestiyayî ye.

### 3.3.2. Wêneya livbar/bi tevger

Ev wêne ku berevajî wêneya rawestiyayî ye, wan hemû wêneyan lixwe digre ku di rewşa geşbûn û livîn û wergirtina tîrêjên nû de ne, ((*Ev wêne berdewamî û tevger û bizavê nîşan dide. Wêne ji hêzê neketiye û berdewamiyê nîşan dide. Diyar e naveroka tevgerê jî di wêne de xwe di rîtm û tîrêja berdewam de vedişêre, ligel danîna kirdar wek bingeha wêne û şepêla siruştî, bi taybetî ew kirdarên ku tevgerê digihînin*))[306] Tevger jî di wêneyê de bi berdewamî nûgeriyê bi wêneyê nîşan dide, çimkî ((*Cure tazegerî û zindîbûnekê li wêneyê zêde dike û bedewiyekê jî diyarî tabloyê dike*))[307] Ew hemû nûgerî û zindîbûn berhema xeyal û berfirehiya bîr û

---

[305] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 175.

[306]Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 178.

[307]Dr. Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 284.

baweriyên helbestvan e. Çiqasî xeyal berfireh be tevgereke zêdetir û enerjiyeke zêdetir di wêneyê de tê dîtin, çimkî wêneya livbar an livok tîrên wê ji geşbûnê nakevin û bi berdewamî di tevgerê de ne, bi vî rengî wêneyê ava dike. Helbestvan karîbû sûdeke baş ji vê cureyê werbigre û wêneyên xwe yên hunerî pê dewlemend bike. Wek di vê wêneyê de helbestvan dibêje:

Katêk kazîwe pêş gizing bulbul

Leşeqey balî da heta kin gul

Gutî ey nazenînî hîşwe firoş

Kem kem diyare bêwefay toş [308]

Li vir helbestvan wêneya livok dirust kiriye. Di gotina (leşeqey balîda heta lay gul) bi rohnî berdewamiya tevger û bizavê bi wêneyê dide, her vê jî wiha kiriye ku wêne bi berdewamî tîrêjên teze jê re bêne, xwe nû bike û sînorên xwe yên rawestiyayî derbas bike. Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Were yarim, were ey taze yarim

Were estêrekey şewgarî tarim

Were ey şaparî balî xeyalim

Were ey şew çiray rûnaky malim [309]

Wêneyeke livbar e. Berdewamî tê de heye. Di bizav û geşbûnê de ye. Di gotina (were) de, ku temamiya wêne li ser hatiye avakirin, tîrêjên xwe li ser wêne belav kirine û terrbûn, tevger û tezebûn dane wêneyê. Wêne ji destpêkê û heta dawî di tevgerê de ye. Di gotina (estêrey şewgar) de wêne hatiye bi ten kirin. Wêne bi giştî wêneyeke livok a balkêş e, çimkî şaîr daxwaz ji yara xwe kiriye were ba wî. Ev kar jî tevger û bizav tê de heye û berdewamî daye wêneyê.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

---

[308] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 135.
[309] Jêderê berê, r. 297.

Bela daxekem nîme bal û per

Ke bifrim, birom xom bidem necat

Biçme şiwênê lêy nabê bedfar

Lebaweş bigrim nobûkî awat [310]

Wêneyeke livbar e û tevgereke berdewam tê de heye. Di gotina (bifrim), (birom), (biçim), her yek ji van gotinan cure tevger û bizavek tê de heye bi rêya van gotinan helbestvan tevger û tîrêjên teze li wêne zêde dike. Herçiqasî firrîn û çûyîn, rawestiyan di wan de heye jî, lê rawestan dom nake, çimkî lûsîn li pişt firînê ye. Rawestan li pişt çûnê ye. Bi giştî wêne livok e.

### 3.4. Wêne di aliyê şêwazê de

#### 3.4.1. Wêneya Efsaneyî

Em dikarin bibêjin efsane ((*Ji hewldana mirov daku gerdûn û hurdekariyên wê têbigihe yan ji ravekirina mirov derbarê wan diyardeyan pêk tê. Bêguman efsane berhema xeyalê ye. Herwiha ji têgeheke diyarkirî û felsefeyeke seretayî peyda bûye*))[311] Ji ber efsane di qonaxeke seretayî ya mirov de ji dayik bûye û di encama pêdiviyên jiyana mirov de dirust bûye, ((*Efsane berhemeke kevnare ya hemû mirovatiyê ye û rengereng e û di encama pêwistiyên jiyanê û meraqên bêdawî yên mirov de komî ser hev bûye û civiyaye û gihîştiye îro*)) [312] Guman tê de tune ku mirovê seretayî li hember diyarde û bûyerên sosret ên siruştê û gerdûnê di tirs û dudiliyeke pir mezin de jiyaye, xwe bê desthilat û bê şiyan dîtiye, di rewşeke derûnî ya pir xirab de jiyaye, nekariye tu şîroveyekê bo tişt û diyardeyên derdora xwe bike, di encama vê newêrekî û tirs û dudiliyê de, berê xwe daye efsane û xeyalê û bi vî awayî ew tirs û dudiliya ku di hundirî wî de hebû, nehîştiye. Vê jî wiha kiriye ku hesta mirovbûna xwe wek xwe bihêle û parêzvaniyê lê bike, jixwe eger mirov ku ew

---

[310] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 163.

[311] Kameran Mukirî, *Edebiyata Folklorî ya Kurdî*, çapxaneya Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 1984, r. 39.

[312] Dr. Mewlûd Îbrahîm Hesen, *Pêkhateya efsaneya kurdî*, çapa 1, Çapxaneya Renc, Silêmanî, 2007, r. 60.

hest û tirs û dudiliya ku di hundirê wî de heye bi rêya xeyal û efsaneyan dernebirîba, bêguman cudahiyeke wî ya berçav ligel ruhberên din nedibû. Çimkî ruhberên din eger curek ji tirs û dudiliyê jî di hundirê wan de hebe, ji ber nebûna zimanê axaftinê şiyana wan a valakirin û derbirîna wê tirsê tune. 

Efsane ((*Yekem qonaxa hizrîna felsefî nîşan dide, ev qonaxa felsefî ya seretayî, wek qonaxên felsefî yên din, di encama kûrbûna li ser diyardeyên gerdûnê û têkiliya wan bi jiyana mirov re, li ser erdê peyda dibe*))[313] Ev hemû têbînî û têfikirîn û hizrîn jî di qalibê hîkayet û çîrokên efsaneyî û dûrî rastiyê de hatine nîşandan. Xeyal jî bi roleke sereke di awayê birêveçûna bûyer û serpêhatiyan de rabûye. Ew hemû bûyer jî xwe di şêweya çîrokvaniyê de nîşan didin û heta radeyekê wê realîteyê diafirînin ku efsane jê hatiye avakirin. ((*Ev derbirîn xistine şêweya çîrokekê ku sereta û girêk û bûyera ji nişka ve û encama wê heye*))[314], bi şêweyeke giştî û helbest bi taybetî yek e ji wan berhemên mirov ku, di avakirina wê de sûd ji efsaneyan hatiye wergirtin, helbestvanan jî karîbûn metinên helbestên xwe bi efsaneyan dewlemend û bedewtir bikin, bi mercê ku bikaranîna efsaneyê ne wek xwe be, lê divê sûdwergirtina helbestvan rêjeyî be û wê çaxê xwîner jî ji xwendina wêneyê bêzar nabe.

Hêmin yek e ji wan helbestvanên ku di nav helbestên wî de çend efsaneyên curbicur tên dîtin. Ev jî tê wateya ku helbestvan sûd ji efsaneyan wergirtiye û ji bo ezmûna xwe ya helbestvanî bikar anîne. Wek di vê wêneyê de dibêje:

Dêwî şer simkol daka û debolênê delê:

Bo leser danî êwe tewr zînm dewê

Bo firîştey dad be sîney pir le kînew daxewe

Hate Kurdistan gutî: recmî şeyatînm dewê [315]

Di vê wêneyê de helbestvan ((*Dêwî şer wek sembola dagîrkerên Kurdistanê bikar aniye çawa Kurdistanê dagîr dikin û xêr û bêrên wê ji xwe re dibin. Herwiha (firîşte) sembola qencî û xêr û ronahiyê li hember (dêwî şer) bikar aniye, ku sembol e*

[313] Dr. Nebîle Îbrahîm, *Efsane*, w: Mihemed Bedrî, Çapxaneya Alla, Bexda, 1986, r. 14.
[314] Rêbîn Xelîl Qadir, *Hêmaya efsaneyî di helbestên Hêmin de*, Kovara Raman, hejmara 159, 2010, r. 49.
[315] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 361.

*bo kesên xêrxwaz û dadmend li ba helbestvan ku dixwazin rûbirûyî dagîrker û stemkaran bibin*)) [316] Yan bo wan kesan bikar aniye ku dadmend in û dixwazin dadmendî û wekheviyê belav bikin û rê li ber dijminkarî û şer û pevçûn û aloziyan bigrin. Helbestvan di dirustkirina vê wêneyê de sûd ji sembolên efsaneyê wergirtiye. Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Hemû humrî têyda nîye xoşî ebed mestî

Xidr awî heyatî bo çi bû fêrî şerabî ba [317]

Helbestvan di vê wêneyê de amajeyê dide efsaneya (Xoce Xizr) ku qaşo dibêjin Xoce Xizr li ava jiyanê geriyaye, piştî lêgerîneke zêde gihîştiye wê avê û av jê vexwariye û nemirî bidest xistiye. Lê helbestvan bêhêvî ye û dibêje bila nemire jî çimkî jiyana wî heta dawî xweşî tê de nîne û nexweşî derdikeve pêşberî wî. Yanî ev nemirî bi kêrî çi tê? Di wêne de bêhtir mebesta helbestvan ew e ku jiyan bi nemirî û şadî xweş e.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Pêm perî û şihr û mosîqa toran

Boye birdyanewe serê Goran

Ya xiway ciwanî ture bû leman

Ew çirayeyî rewa nedî pêman [318]

Di vê wêneyê de ((*Helbestvan xwe tenê bi sembolên efsaneyên kurdî ve girênedaye, lê wek helbestvanekî jêhatî û xwedî ezmûn sûdeke mezin ji sembolên efsaneyî yên Yûnan û Roman wergirtiye, wek mînak her du sembolên efsaneyî (periya şiîrê û ya muzîkê) û (xudayê bedewiyê), bikar aniye çimkî helbestvan ev wêne bo*

---

[316] Rêbîn Xelîl Qadir, *Hêmaya efsaneyî di helbestên Hêmin de,* Kovara Raman, hejmara 159, 2010, r. 57.
[317] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 183.
[318] Jêderê berê, r. 57.

*koça helbestvanê mezin (Goran) gotiye*))[319], ku helbestvan di vê wêneyê de Goran wek çira û gewher bo derdorê dîtiye.

### 3.4.2. Wêneya Derûnî (Psîkolojîk)

((*Helbestvan xwedî hest û sozeke nazik e û cuda ye ligel hest û sozên li ba kesekî asayî û şiyaneke wî ya bêsînor heye bo kêşana wêneyên şiîrî. Wêneya şiîrî jî di bingeh de pêkhateyeke têkilhev e ji hest û sozên helbestvan, bêyî hest û soz nabe û wêne herdem sozdar e û tijî hest e, tew di wan deman de jî ku li pişt sîbera wêneyên madî jî hatiye veşartin. Rexnegir tên ku li hev bikin li ser girîngiya wêneya derûnî ku bingehek e hemû cureyên wêneyê li ser tê avakirin, lewma hin caran helbest derbirîn e ji wê rewşa derûnî ya zatî ku helbestvan di tê de vedigezive* )) [320] Wêne hertim tijî ye bi wê soza ku di derûna helbestvan de dizê û dibe çavkaniya dirustkirina gelek wêneyên hunerî. Herdem jî ew wêne kêm zêde şiyana wan a kifşkirina hest û sozên hundirê xwîneran heye, çimkî pir caran hatiye dîtin helbestvan bi wêneyeke sade temamiya xwîner û derdor girtiye, ku ev jî rêyeke bihêz e bo zanîna wê yekê ka gelo heta çiqasî wêne ew nerîna helbestvan li ba xwe binyat kiriye li ba xwîner jî girîngî pê tê dayîn, ango eger hat û her wêneyek hest û soz tê de hebû em wek wêneya derûnî bijmêrin, êdî her wêneyeke hunerî dibe wêneyeke derûnî, lê wêneya derûnî ew wêne ye ku meraq û arezûyên qedexekirî nîşan dide. Bi giştî şiyana wêneyên derûnî ya livandina hest û nestan heye, bi rastî hestên ku di derûna helbestvan de veşartî dimînin piştî pêkhatina wan di wêne de ji me re eşkere dibin. Ev jî dibe motîfek bo kifşkirina helbestekê ku wê rewşa derûnî derbibire. Hêmin wek helbestvanekî xwedî ezmûn di vî warî de karîbû çend wêneyên bedew ên derûnî dirust bike. Wek di vê wêneyê de helbestvan dibêje:

Jiyanim pir e le renc û na muradî

Behelkewtîş nehetim tûşî şadî

[319]Rêbîn Xelîl Qadir, *Hêmaya efsaneyî di helbestên Hêmin de*, Kovara Raman, hejmara 159, 2010, r. 49.

[320]Seid Farûq Yûsif Şêx Bizênî, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Ehmed Muxtar Caf*, Çapxaneya Rewşenbîrî ya Hewlêrê, Hewlêr, 2011, r. 168.

Dilim hênde tenge her jêy to debê bes

Etoş mehkûmî hepsî na muradî [321]

Helbestvan wêneyeke derûnî ya bedew dirust kiriye, gava dibêje jiyana min tijî renc –ked û zehmetî û bêmiradî ye, bi vê wêneya derûnî behsa rewşa xwe ya têkçûyî dike, bi rêya vê wêneya derûnî xwîner agehdar dike ku bi wî rengî jiyanê dibe serî. Yan di wêneyeke din de dibêje dilê min ewqasî teng e her cihê te tenê tê de heye. Helbestvan tevî ku jiyaneke nexweş û dijwar derbas dike, hezkirina wî ji yara wî re bêsînor e heta digihe wê astê ku bêje dilê min tenê cihê te tê de dibe û bes.

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Heta nêley neye awrgî dil, çem pir le nem nabê

Heta nem danebarê şînî em awrge kem nabê [322]

Helbestvan di vê wêneyê de behsa wê xema mezin dike ku bi curekî dilê wî guvaştiye û bêhn lê çikandiye, lê dîsa jî helbestvan hîn jî her xweragir e û dibêje heta ku bi temamî dilê min bi nalenalê nekeve şiyana wî ya tijîkirina çem tune, çimkî helbestvan di wê baweriyê de ye nalîna wî cuda ye ku nalîna çem tijî dibe û hesret û nexweşî di dil de kêm dibe, bi şêweyeke demkî asûde û aram dibe. Wêne wêneyeke derûnî ya balkêş e, çimkî helbestvan di hundirê xwe yê asêmayî de digihe û derdên dilê xwe derdibire. Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Were ba dest le balat werênim

Were kulmem le julmey to xişênim [323]

Wêneyeke derûnî ye. Helbestvan daxwazê ji yara xwe dike bê û wan meraqên seksî yên asêmayî ku di hundirê wî de asê mane bi endamên laşê yara xwe bivemirîne, çimkî helbestvan ji dilbijîn û zêde nedîtina yara xwe wêneya derûn û arezûya xwe ji me re kêşaye ku heta asteke zêde dilbijê yara xwe ye. Ev jî ji ber bîrkirina zêde û endîşeya tîr a helbestvan dirust bûye, çimkî dest lê dan li laşê yarê û hinarik bi hinarikê ve xişandin heta radeyekê meraqa helbestvan a seksî vedimirîne.

---

[321] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 174.

[322] Jêderê Berê, r. 259.

[323] Jêderê Berê, r. 298.

### 3.4.3. Wêneya Sembolîk

Sembol di dinyaya edebiyatê de ne tiştekî nû ye, lê di edebiyatên kevin de jî berçav dibe. Mebest ji bikaranîna sembolan li ba helbestvan bo wê rewşê vedigere ku tê de jiyaye. Sembol rohnkirin û berçavkirina aliyê duyem ê wan mebestan e ku helbestvan nikarîbû bi azadî wan di helbestên xwe de nîşan bide. Çimkî bi kêmanî her sembolek ku di helbestê de tê bikaranîn du aliyê wê hene, aliyek ji wan mebest ji wateya peyvê bi xwe ye ku her kes tê de digihe, em dikarin wek teşeya peyvê binav bikin, lewma nasîna teşeya sembolê pêwistiya wê bi xwînerê astbilind tune, çimkî eşkere ye. Lê aliyê duyem ê sembolê ku mebesta me naveroka sembolê ye, bo ravekirin û şîrovekirina her xwînerekî ew şiyana wî tune aliyê duyem ê sembolê kifş bike, lê ew şiyan li ba xwînerên astbilind û astnavîn heye. Yanî sembol di edebiyatê de pêk tê ji ((*Amadekirin bi peyvekê ku wateya tiştekî hestbar an zihnî dide, bo demeke diyarnekirî bi hûrbînî û cuda li gor xeyala nivîskar û xwîner jî cuda ne ji têgihîştin û kifşkirina mewdaya wê li gor asta wan a rewşenbîrî û nazikiya hesta wan, hinek ji wan aliyekî jê dibin, hinekên din aliyekî din, yan bi eşkereyî derdikeve û rewşenbîr bi hêsanî tê de digihe*)) [324] Yanî eşkere ye zanîn û têgihîştina wateya sembolê ku di helbestê de dikare li gor asta xwîner nirxandinê jê re bike, bi awayekî bikaranîna sembolê li gor qonax û serdemê guherîn bi ser de tê bi awayekî ku bikaranîna sembolê di edebiyata kurdî de di salên 70 û 80yan de cudahiyeke zêde hebû ((*Çimkî wêneyên wan bi şêweyeke diyar û eşkere wateyê nadin dest, lê mij û moran tê de heye, ev jî ne jixweber bû, lê hokarê siyasî wiha kiriye ku helbestvan bi sembolan mebesta xwe derbibire daku ew tiştê ku mebesta wî ye bi wêneyeke sembolîk a bedew bide xwîner û ew jî şiyana xwe bixebitîne daku sembolan bibîne û bandoreke wê ya baş li ser nûkirin û tezekirina helbesta kurdî hebû*)) [325] Ango sembol derfetê dide me ku em li pişt tekstê li tiştin din binerin, vêca ew lênerîn li ser xwîner bi xwe rawestiyaye, wek me amaje pê kir çiqasî xwîner şehreza û jêhatî be ewqasî şiyana wî bi gihîştina naveroka sembola bikarhatî heye.

---

[324] Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991),* Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî 2004, r. 202.

[325] Dr. Husê Xazî Kake Emîn Gelalî, *Rêbaza nûjenkirina helbesta kurdî li Başûrê Kurdistanê di navbera salên 1980-1991 de,* Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr, 2010, r. 52.

Hêmin helbestvanek bû di helbestên xwe de pir caran sembol bikar aniye. Tiştê ku hîşt helbestvan sembolan bikar bîne rewşa siyasî bû. Wek helbestvan di vê wêneyê de dibêje:

Herwek girî agirî Newroz

Remzî azadî bê û pîroz

Hezaran Kawey zehmet kêş

Pal pêwe binê berew pêş [326]

Di vê wêneyê de helbestvan du wêneyên sembolîk ên bedew nîşan dane ku (girrî agirî Newroz) û (Kawey zehmetkêş) in. Bikaranîna van herdu sembolan di vê wêneyê de, bêhtir rewşa siyasî wiha li helbestvan kiriye raza dilê xwe bi sembolan derbibire. Di sembola yekem de (girrî agirî Newroz) nîşane ye bo azadî û serxwebûn û nûbûnê, çimkî li ba gelê Kurd, Newroz sembola herî mezin a serkeftina kurdan e. Lê sembola duyem (Kawey zehmetkêş), bikaranîna vê sembolê li ba kurdan bo wê yekê vedigere ku em her sal bîranîna cejna Newrozê pîroz dikin, çimkî bi rêya hêz û zend û bendên Kawa azadî û nûbûn hatin holê, dema karîbû Ejdehakê xwînmij bi çakûçê xwe bikuje. Wêne wêneyeke sembolîk a bedew e. Çimkî di nav kurdan de pir belav e, lewra bi hêsanî aliyê duyem ê wêneyê tê kifşkirin. Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Boye dêwî îsthmar

Kone perstî zordar

Zalim xiwên rêj, bed kar

Boyan amade kirawe dar [327]

Wêneyeke sembolîk e. Bi heman şêweya wêneya berê, helbestvan ji ber rewşa siyasî sembol bikar aniye. (Dêwî îsthmar) ew sembol e ku helbestvan bikar aniye û giraniya wêneyê li ser e. Di bingeh de (dêw) nîşaneya hovîtî û bêrehmiyê ye, li kêleka dêw (îsthmar) bikar aniye. Ku mebesta wî dagîrker e, bêhtir li ba helbestvan bo wê mebestê hatiye bikaranîn ku çawa dagîrkeran bi hovîtî û bêrehmî xaka kurdan

[326] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 205.
[327] Jêderê Berê, r. 145.

dagîr kirin û di heman demê de jî xelkê diperçiqînin û wan wek amraz bikar tînin. Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Emnîye wek qel û dal

Bilaw bûnewe naw gel

Kê azaye bilê lel

Heta bîken şêt û şel [328]

Ji bilî ku wêneyeke şibandinê ye, di heman demê de wêneyeke sembolîk e jî. Çimkî helbestvan sembola (qel û dal) bikar aniye. Bikaranîna vê sembolê ji ber rewşa siyasî ye. Emnîye hêzeke taybet e bo serkutkirina xelkê, lê tiştê ku emnîye li ber çavê helbestvan reş kiriye ku ew şibandine qel û dalan (qijalk û qertelan), bêrehmî û bêminetiya wê hêzê ye, wek ku qel û dal li ser laşekî mirî dilûsin di demeke kin de wî laşî dixwin û wêran dikin, bi heman şêweyê jî ew hêza taybet a emnîye wek wan qel û dalan in ku ketine nav xelkê û rehmê li kesî nakin, bêrehmiya wan kiriye ku helbestvan wan bişibîne qel û dalan.

### 3.4.4. Wêne di aliyê ronbêjiyê de (zelalbêjî-eşkerebêjî)

Ronbêjî zanistek e û lêkolîn dike ka çawa dikare yek wateyê bi çend şêwazên cuda derbibire ku di aliyê hûrbînî û gihandina wateyê de cuda ne. Mebest ew e gava peyveke wek (bexşindeyî) yan (azayetî-lehengî) dikare bi gelek rê û şêwazên curbicur bê behskirin ku nivîskar an axêver kîjan li ba wî ji hemûyan baştir be, wê hildibjêre daku wateya wê bi roniyeke pir û bihêz wê bandorê derbibire ku dixwaze bigihîne.

Ronbêjî bihêztirîn beşê rewanbêjiyê (belaxet) ye û mecalekî berfireh di ziman û edebiyatê de dagîr kiriye û roleke wê ya berçav di ronkirina wate û mebest û xemlandina hunerên edebiyatê de heye ((*Ronbêjî mijareke pir berfireh e û wan hemû tiştan lixwe digre ku perdeyê ji ser rûyê derbirînê didin alî û berçav dikin yan bîr û baweriyekê digrin û nîşan didin daku xwîner yan guhdar bikare bigihe bingeh û*

---
328. *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 143.

*kûrahiya mebestan û wan fêm bike*)) [329] Mebest ji ronbêjiyê bêhtir derxistina aliyê duyem ê wateya mecazî ya peyvê ye, bi cureyekî hin peyv hene bêhtirî wateyeke wan heye, her yek ji wan wateyan dikare bo mebestên cuda bên bikaranîn.

((*Ronbêjî çalaktirîn beşê rewanbêjiyê ye û bi roleke diyar û bibandor di binyata wêneya şiîrî de radibe. Ji wan têgehên li şûnmayî ku ji wateya wêneyê nêzîk dibe, hertim helbestvanan di hemû serdeman de ew bikar anîne û kirine amrazek bo gihandina mebestên xwe bo xwîneran, ango ew zanist e ku bi çend rêyên cuda yek wateyê ji me re derdibire û ronkirinê li ser wateya mecazî dide*)) [330] Yanî em dikarin bêjin ronbêjî ew amraz e ku erkê wê rakirina wê mij û moranê ye ku li ser wateya peyvan tê dîtin. Roleke mezin a hemû hunerên rewanbêjî di dirustbûna wêneya hunerî de heye ((*Rewanbêjî derbirîna hest û sozê ye bi hêsanî û bi eşkereyî ligel derfet wergirtin û hêma bo mebest kirin*))[331] Yanî rewanbêjî peyameke dûre hest û soz e ku ruhekî nihênî kêm enerjî bi ber tê danîn, daku ew derbirîn û hêmakirin bi zindî bimîne, lewra ((*Rola hunerên rewanbêjî ewqasî bilind dibe li gelek cihan hunerên ronbêjî tevlî têgeha wêne dibin. Hinek lêkolînvan di wê baweriyê de ne ku têgeha wêne baskê xwe li ser temamiya şêweyên rewanbêjiyê vedide û bawer dikin ku her wêneyek dirust nabe eger ne li ser bingeha derbirîna metaforîk be, yanî tu wêneyek ji wateyên dirust yan ferhengî yên wesfî yên peyvê dirust nabe. Di vî warî de wêne dibe hevwateya metaforê bi hemû cureyên wê ve*)) [332] Lewma piraniya helbestvanan vê hunerê bikar tînin bo bedew derketina wêneyan li ba xwîner. Wêneya ronbêjî jî dikare bi çend cureyan be wek:

[329] Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî di edebiyata kurdî de*, ç 1, Çapxaneya (Dar el Cahiz), Bexda, 1972, r. 14.
[330]Dr.Ferhad Qadir Kerîm, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012, r. 196.
[331]Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî di edebiyata kurdî de*, ç 1, Çapxaneya (Dar el Cahiz), Bexda, 1972, r. 14.
[332]Dr. Serdar Ehmed Hesen Gerdî, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî 2004, r. 25.

### 3.4.4.1. Wêneya Lêkçûnê - Mînandinê

Wêneya lêkçûnê hunereke ji hunerên rewanbêjî û dikeve ber beşê ronbêjî. Lêkçûn ji şibandina tiştekî ku sîfeteke qels tê de heye bi tiştekî din ku heman sîfet bi şêweyeke eşkere tê de heye pêk tê. Ev jî pêwistiya wê bi hûrbînî û bîrtûjî û xeyaleke berfireh heye. Yek e ji xemilîtirîn şêwazên derbirînê û çavkaniyeke sereke ya helbestê ye û ji wan hunerên ronbêjî ye ku pir zû bala lêkolînvan û rexnegiran dikşînin. Ev jî ji ber wê rola wê ku bi taybetî di helbestê de heye. ((*Lêkçûn pêwendiyeke berawerdî ye di navbera du aliyan de bi sedemê yekbûn û hevbeşiya wan di xasiyetekê yan di haletekê de yan di çend xasiyet û haletan de. Ev pêwendî dikare bê dayîn bo hevbeşiyeke hestbar û dikare bê dayîn bo hevbeşiyekê ku ji hukm û pêwistiyeke zihnî ku herdu aliyên berawerdkirî bi hev ve girêdide, bêyî ku pêwist bi wê yekê bike ku herdu alî di laş de û di hemû xasiyetan de bişibin hev*))[333].

Her vê yekê jî kiriye ku bibe yek ji girîngtirîn hunerên ku wêneya ronbêjî dirust dikin, lewma ((*Mînandin wek sadetirîn cureyê wêneya ronbêjî tê hejamrtin. Lewra di helbestên nû û kevin de jî pir tê bikaranîn. Ew jî ew cure wênekêşan e ku pişta xwe bi du aliyan girêdide. Lê em nikarin wan bigihînin pileya yekbûnê, lê pêwendî li ser binemaya cudahiya her yekê ji wan bi tenê tê avakirin. Lê dîsa jî ne bêpar e ji hevgirtinê û bandorê li hev dikin*)) [334] Ev cure ronbêjî helbestvan armanca dike gotineke rewan ji xwîner re bêje. Daku wêneyên hevbeş an nêzîkî hevdu berçavî wan bike û wan pê bide nasîn. Di pêkhateya vê hunerê de çar rêgez hene (şibandî, pêşibandî, amraz û şibîn), du rêgezên (şibandî û pêşibandî) sereke ne û bêyî amadebûna wan huner dirust nabe, du rêgezên din jî (amraz û şibîn) ne sereke ne, lewma nebûna wan bandorê li ser pêkhateya wêneyê nake. Di helbestên Hêmin de lêkçûn rûberekî berfireh dagîr dike.

Wek di vê wêneyê de helbestvan dibêje:

Dûr qaqayekm gwê lêbû

Detgut gûlem pêwedenê

---

[333] Dr. Derya Cemal Hewêzî, *Wêneya rûnbêjî di dîwana (Şehîd bi tenya piyase dekat)ya Qubadî Celîzade*, Çapxaneya Belavokên Silêmaniyê, 2009, r. 61-62.

[334]Hawjîn Silêwe Îsa, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009, r. 92.

Çon be êwarey payzîş

Îywa heye pêdekenê [335]

((*Helbestvan wêneyeke xwe di rewşeke xemgîn de dikşîne, ku xembar e û kesek jî qaqa dikene –bi pirqînî dikene- û ew ken wek gulleyan e li ba helbestvan, çimkî ne dema ken e û helbestvan pir pê seyr e ku di wê seqaya xemgîn û rewşa nexweş de û di êvara payîzê de kesê wiha heye ku dikene*))[336] Di vê wêneyê de rêgezên şibandinê bi vî rengî derdikevin.

Qaqa……….şibandî

Detgut……..amraz

Gulle……….pêşibandî

Êş û azar…..rûyê şibînê

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Dilî şahîr weku awêne deçê

Gulekem to dilekem meşkêne

Raste zor naske, ema ke şika

Weku xencer debrê awêne

Di vê wêneyê de helbestvan xwe wek mirovekî dilnazik dibîne ku bi her cure gotinekê bibandor dibe, lewra daxwazê ji yara xwe dike ku doza her tiştekî kir bi tu hawî dilê wî neşkîne, çimkî gava dilê helbestvan bişke parçeyên şikestî dibin amraza birrînê û yara wî birîndar dike, di vê wêneyê de rêgezên şibandinê bi vî rengî derdikevin.

Dilê helbestvan……….şibandî

Weku……..amraz

---

[335]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 289.

[336] Dr. Husên Xazî Kakemîn – Karwan Selîm Qeyteran, *Wêneya hunerî di helbesta Êwarey Payîz a Hêmin de*, Kovara Zanîngeha Rraperîn, j 2, Silêmanî, 2014, r. 134.

Nazikiya dil…….pêşibandî

Di nîvê malika dawî ya wêneyê de, di egera şikestina dilê helbestvan de, wêneya şibandinê bi vî rengî rêgezên wê diguherin.

Awêne ……….şibandî

Wek ……..amraz

Xencer……….pêşibandî

Birrîn…..rûyê şibînê

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Ke to toray le çawan wek xewî min

Le biskt reştire mange şewî min [337]

Di vê wêneyê de helbestvan amaje dide wê yekê ku yara wî ew terikandiye û xwe nîşanî wî nade, bi nerîna wî ji wexta ku yara wî li ber çavan diyar nemaye her tişt li ber çavên wî guhertiye û bi wî rengî heyveron li ber çavên wî wek biskên yara wî reş bûye, di nîvê malika yekem de rêgez bi vî rengî derdikevin.

To ……….şibandî

Herwek ……..amraz

Xew……….pêşibandî

Torran …..rûyê şibînê

Di nîvê malika duyem de wêneya rewşa helbestvan e piştî li ber çav nemana yara wî gava ku dibêje: ji biskê te reştir e heyverona min – le biskit reştir e mangeşewî min. Rêgez bi vî rengî derdikevin.

Heyveron – mangeşew……….şibandî

Bisk…….pêşibandî

[337] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 183.

Reşahiya biskên wê û reşahiya mangeşewê …..rûyê şibînê

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Kulmeket weku gulaley geşe

Bê surmeş çawe mesteket reşe

Weku firmêskî aşq runakî

Weku awngî beyanî pakî [338]

Helbestvan di vê wêneyê de bi rêya mînandinê wesfê bedewiya jinekê kiriye. Wêne bêhtir hevdudandî ne, bi curekî hinarika wê jinê şibandiye laleyan di geşî û bedewî û ronî û pakiyê de, sîfeta reşiyê bi çavê wê jinê daye, dûre lêçûneke din jî kiriye, dema ew jin şibandiye rondikên aşiqan di pakî û roniyê de, çimkî rondikên aşqian ji bo evîneke pak tên rijandin.

Kullme ……….şibandî

Wek ……..amraz

Gullale……….pêşibandî

Geş …..rûyê şibînê

Helbestvan wesfeke taybet a din a wê jinê dike û rêgez bi vê şêweyê dirust dibin.

To ……….şibandî

Weku ……..amraz

Firmêskî aşiq……….pêşibandî

Ronakî, awng …..rûyê şibînê

338 *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 107.

### 3.4.4.2. Wêneya Mecazî

Mecaz beşdariyeke çalak di binyatkirina wêneya hunerî de dike. Bikaranîna peyvekê ye di hevokê de bo wateyeke din, ji bilî ku wateya xwe ya ferhengî û rasteqîn bikar bîne, bi wî mercê ku pêwendî di navbera wateya rasteqîn û wateya mecazî de mînandin be û nîşaneyek hebe ku mebest ji wê hevokê wateya mecazî ya peyvê ye û ne wateya rasteqîn e, ew peyv li şûna tiştekî bikar tê, lêçûnek di navbera peyva jê xwestî û bo xwestî de heye, çimkî ev herdu rêgezên sereke yên mecaz ango xwastinê ne. Ne merc e herdu rêgez di mecazê de derkevin.

Tzvetan Todorov derbarê xwastinê ango mecazê de dibêje: ((*Bikarnîna peyvekê ye bi wateya wê û wateyke cuda jî*)) [339] Yan bikaranîna peyveke taybet bi rêgezekê bo rêgezeke din, di encamê de wêneyeke cuda ji herdu rêgezan dirust dibe, di heman demê de jî di rûyekî de dişibe herduyan. Di xwastinê de tenê yek ji her du rêgezên sereke derdikeve, ew jî bi piranî jê xwestî ye. Hin caran bo xwestî jî derdikeve û wê çaxê jê xwestî dernakeve û tenê girêdanekê ji jê xwestî werdigre û xwastina berhiş dirust dike. Ji bilî rêgezên wê yên sereke wek (jê xwestî û bo xwestî) rêgezên wê yên din jî hene bi navê (mecaz û (nîşane), nîşane ew e ku dibe belge li ser wê yekê ku mebest ji peyvê wateya wê ya mecazî ye, neku wateya rasteqîn. Di xwastinê de, (mecaz) li hember lêçûnê nabe derkeve, çimkî eger derkeve wê çaxê xwastin an mecaz namîne û dibe şibandin. Herwiha.

Cahiz dibêje: ((*Xwastin ango mecaz navlêkirina tiştekî ye bi tiştekî din eger şûna wê girt*))[340] Ev jî wateya wê ew e ku helbestvan gava xwastinê bikar tîne ew tişt mebesta wî tune ku bikar aniye, lê mebesta wî navekî din e, lewma helbestvan ku xwastinê bikar tîne tu rêya wî ya din tune daku îlhama soza xwe ya asêmayî pê derbibire, herwiha derbarê cudahiya lêkçûn û xwastin an mecazê de, John Milton dibêje: "Zehmet e em cudahiya gewherî di navbera xwastin û lêçûnê d bibînin, di warê taybetmendiya bingehînî de xwastin lêçûneke kurt û himbiz e)) [341] Hêmin di helbestên xwe de pir caran mecaz an xwastin bikar aniye, çimkî wek aliyekî girîng dîtiye her lewma jî girîngiyeke zêde pê daye.

---

[339]Cebar Ehmed Hisên, *Estetîka metina helbesta kurdî ya Kurdistana Iraqê 1950-1970*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2008, r.357.
[340]Hitler Ehmed Heme, *Wêneya şiîrî li ba Nalî*, nameya master, koleja ziman, Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2001, r. 17.
[341]Dr. Kemal Marûf, *Rexneya nû ya kurdî*, Silêmanî, 2007, r. 137.

Wek di vê wêneyê de helbestvan dibêje:

Ax dîsan çûme jêr balî

Reşî şewgarî tenyayî

Ax debê dîsan biçêjim

Jehrî talî cûdayî [342]

((*Helbestvan wêneyeke xeyalî dikêşe ku bi neçarî û ah û nalenal diçe jêr baskê reş ê şevê wek şevgerê tenêtiyê, ango şewgarê tenyayiyê dişibîne balindeyekî bêyom û şûm, lê şevgerê tenyayiyê nehatiye bi wê jî xwastin dirust bûye*)) [343] Di vê wêneyê de bi vî rengî rêgezên xwastinê derketine.

Balinde…….jê xwestî

Şewgarî tenyayî…..bo xwestî

Balî reş…….peyva mecazî

Ballî reş……nîşane

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Şewane hawnşînî camî badem

Be ba deba pejar û xem be ba dem

Ke destî rojgar bayda serî min

Serî şûşey şerab waçake badem [344]

Li vir wêneya xwastinê heye ku destê rojgare, helbestvan di vê wêneyê de amaje dide hevrêtiya xwe ligel cama badeyê, çimkî bawer dike ku bi rêya badeyê ew hemû xem û kovanên tûşî wî hatine namînin. Di wêne de rêgezên xwastinê bi vî rengî derketine.

---

[342] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 183.

[343] Dr. Husên Xazî Kakemîn – Karwan Selîm Qeyteran, *Wêneya hunerî di helbesta Êwarey Payîz a Hêmin de*, Kovara Zanîngeha Rraperîn, j 2, Silêmanî, 2014, r. 134.

[344] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 175.

Mirov……jê xwestî

Rojgar …..bo xwestî

Dest …….peyva mecazî

Serbadan ……nîşane

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Ew kesey hênde nebû zwîr û zigar

Wanekewte ber çepokî rojgar [345]

Wêneya xwastinê ew e ku helbestvan neketiye ber çepeliya rojgar ango felekê. Li vir helbestvan sîfeta mirov daye bi rojgarê û li ser şêwaza bi ten kirinê dirust bûye, lê mirov nehatiye û wêneya xwastinê dirust bûye.

Mirov……jê xwestî

Rojgar …..bo xwestî

Çepok …….peyva mecazî

Çepok ……nîşane

Di wêneyeke din de helbestvan dibêje:

Nîme awelê le goşey bê kasîda xem nebê

Cake ew lêreş wefay her mawe sayeyî kem nebê [346]

Wêneya xwastinê di xemê de ye, ji ber ku helbestvan di wêneyê de amaje dide wê yekê ku bêkes ketiye û tu hevrê û dostekî wî tune ji xeynî xemê. Wêne li ser şêwaza bi ten kirinê dirust bûye. Rêgezên xwastinê jî bi vî rengî derketine.

Mirov……jê xwestî

Wefa …..bo xwestî

Wefa …….peyva mecazî

Çepok ……nîşane

[345] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 275.
[346] Jêderê Berê, r. 173.

### 3.4.4.3 Wêneya Dirkeyî –metafor -

Dirke yan metafor jî hunerek e ji hunerên rewanbêjî li gor vê dabeşkirina ku ji bo hunerên rewanbêjî hatiye kirin dikeve ber beşê ronbêjiyê. ((*Dirke ew e tu peyvekê yan çend peyvan bînî ku wateyeke wan a dirust hebe, her di wê çaxê de di hevokê de wateyeke din bidî dest wan û mebest ev wateya dawî be, dîsan divê wateya dirust û resen mebesta te be, çimkî tu nîşaneyek tune dijberiya wê yekê bike ku wateya wê ya resen mebesta te be*)) [347] Derbarê karîgeriyên din wek hunereke ronbêjî bi taybetî ew wêneyên hunerî ku wek wêneyên ronbêjî naskirî ne, pênaseyeke rewşentir bo dirke hatiye kirin, tê gotin.

((*Dirke wêneyeke ronbêjî ye li ser bingeha pêwendiyekê di navbera du wateyan de tê avakirin, pêwendiyeke hatiye bestin di navbera wê wateya eşkere ku têgeh bi xwe digihîne ligel wê wateya ku di guhastinê de mebesta wî ye, çimkî bihayekî wî yê rasteqîn tune bo eşkeriya têgehê bi tena serê xwe, lê tenê pêngavek e ku rêgehê rewşen dike bo wateyeke din, ew wateya ku axaftin mebest dike*)) [348] Dirke jî karîgeriya xwe heye di ziman û edebiyatê de roleke wê ya taybet heye di pêşxistina van herdu aliyan û gihandina wateyê de, lewra eger tu bixwazî behsa babetekê bikî, lê rasterast navê babetê bilêv nekî û bi rêya çend peyvên din mebesta xwe derbibirî, li ba helbestvanan pêwistiyeke afirandina şiîrî ye û hokarekî bihêz e bo bedewkirina wêneya hunerî. Metafor di sadetirîn berçavkirina xwe de ((*Pêk tê ji wê yekê ku rasterast navê sîfet yan mewsûf neyê dayîn, çimkî bi sedema tiştên din tê kifşkirin û ji rêçika hevokê derdikeve*)) [349] AngoHêmin sûdeke mezin ji bikaranîna vê hunera rewanbêjî wergirtiye, çimkî helbestvan pir caran mebestek di hundirê wî de ye, lê ji ber hinek hokaran nikarîbû vê mebestê derbibire, lê bi rêya tiştekî din mebesta xwe gihandiye, wek di vê wêneyê de dibêje:

Le xelkî waye kabra awrî pêye

Leswêy mal û dirawê balî girtbû [350]

---

[347]Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî di edebiyata kurdî de*, ç 1, Çapxaneya (Dar el Cahiz), Bexda, 1972, r. 88.
[348]Dr. Derya Cemal Hewêzî, *Wêneya rûnbêjî di dîwana (Şehîd bi tenya piyase dekat)*, Çapxaneya Belavokên Silêmaniyê, 2009, r. 61-62.
[349]Dr. Husên Xazî Kakemîn – Karwan Selîm Qeyteran, *Wêneya hunerî di helbesta Êwarey Payîz a Hêmin de*, Kovara Zanîngeha Rraperîn, j 2, Silêmanî, 2014, r. 134.
[350]*DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 325.

Di gotina (kabra awrî pêye) de metafor heye, helbestvan bo bilez çûna bo cihê mebestê bikar aniye, lê helbestvan rasterast dernebiriye, ji ber ku nexwestiye mebesta xwe bi eşkereyî derbirbire, (awr pê bûn) kiriye mebest bo gihandina mebesta xwe. Helbestvan di vê wêneyê de mebesta wî bêhtir ew kes in ku bilez in û dixwazin bi lezgînî bibin xwediyên hertiştî. Di wêneyeke din de dibêje:

Kurî kurdî le xwênî xoy degewzî

Kiçî kurdî serî kirdbwe ejno [351]

Wêne li ser bingeha dirke yan metafor dirust bûne, di xêza yekem de di gotina (le xwênî xoy degewzî) de, metaforeke ron e ku helbestvan bo kuştin û gurandina kurdan bikar aniye, çimkî helbestvan ji ber rewşa siyasî yan taybetî nikarîbû bi azadî bîr û baweriya xwe bêje. Di xeta duyem de di gotina (serî kirdbwe ejno), dirke ye. Helbestvan bo xem û xembarî û derdeserî bikar aniye, ji ber ku bi baweriya helbestvan para keça Kurd di jiyanê de her xem û xemgînî û derdeserî bû, lewma helbestvan raz û nihêniya dilê xwe bi şêwaza dirkeyî - metaforîk derbiriye. Di wêneyeke din de dibêje:

Kemêk rawestw carabird

Ew lawey cadey depêwa [352]

Di xeta duyem de wêne li ser bingeha dirke dirust bûye, di gotina (ew lawey cadey depêwa) dirke ye. Helbestvan ji pir çûnûhatina lawekî bi ser cadeyê de, mebesta xwe gihandiye, îcar ji ber her hokarekî be wek metafor derbiriye. Di wêneyeke din de dibêje:

Eto ke pelkt wa swr û geşe

Derûnt boçî xelwzî reşe [353]

---

[351] *DîwanaHêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 109.
[352] Jêderê Berê, r. 288.
[353] Jêderê Berê, r. 98.

Di xeta duyem de û di gotina (derûnt boçî xellozî reşe) dirke bi ronî tê hîskirin. Helbestvan bêhtir mebesta wî dilpîsî, zikreşî û hesûdiya mirov e. Çimkî nabe rû weha geş û bedew be û hundir jî bi vî rengî reş be. Helbestvan bawer dike ev du tiştên dijî hev in.

YÖK watermark

## 4.Encam

Di encama lêkolîna xwe de, em gihîştin çend rastiyan û çend xal ji me re zelal bûn:

1. Wêneya hunerî ne tenê pêkhateyek e bo bihêzkirin û bedewkirina helbestê, lê beşekî girîng e di hundirê helbestê bi xwe de. Ev girîngî û bikaranîn jî girêdayî xeyal û endîşeya helbestvan e. Herçiqasî helbestvan wêneyan bi kameraya çav û xeyalê bigre, bêguman wêne bedewtir li ba xwîner derdikevin. Bedewiya wêneyan jî li ser teknîka helbestvan dimîne.

2. Rêgezên wêneya hunerî ku (soz, bîr, endîşe, xeyal, nest û realîteyê) lixwe digre, rêgezên bihêz in bo geşbûna wêneya hunerî. Ev rêgez hemû mîna hev girîng in. Her yek ji wan bandor û rola wê di avakirin û bihêzbûn û bedewkirina wêneya hunerî de heye. Bi awayekî ku bikarneanîna her yekê ji van rêgezan dibe sedemê seqetbûna wêneyê.

3. Di helbesta kevin de, wêne wek amraza xemilandinê hatiye dîtin, lê di helbesta nû de wêne wek alî û beşekî girîng di helbestê de hatiye dîtin û her vê yekê jî kiriye ku lêkolînên serbixwe li ser wêneya hunerî bên kirin, daku em girîngî, erk û bihayê wêneya hunerî fam bikin, çimkî di dema niha de wêneya hunerî ne tenê wek amraza xemilandinê tê dîtin.

4. Çavkaniyên xweyî û babetî bi roleke rasterast radibin di çawaniya avakirina wêneya hunerî de li ba helbestvan. Di heman demê de çavkaniyên xwecihî yên wek edebiyata pêşiyan û kelepûra gelêrî û dastan û çend berhemên din ên gelêrî çavkaniyên wiha ne ku helbestvan herdem bikar anîne daku wêneyên nû û teze ji wan ava bike.

5. Siruşt (Xweza) û jin û realîte û edebiyata derdorê wek edebiyata farsî ji wan çavkaniyên bihêz bûn ku helbestvan di dirustkirina wêneyan de bikar anîne û ji wan jêderan gelek wêneyên bedew afirandine.

6. Wêneyên hunerî di aliyê hestbarî û zihnî de, beşekî girîng ên wan wêneyan in ku helbestvan pişta xwe bi wan girêdaye. Bi taybetî wêneyên hestbar û di wan de jî di rêza yekem de pişta xwe bi hesta dîtinê girêdaye. Piştre jî hesta bihîstinê û hestên (bêhnkirin, çêjtin û pelandin “destlêdanê”) bi rola xwe rabûne. Di vî alî de, xeyala hûrbîn a helbestvan bi roleke sereke radibe di warê rawestan û tevgerê yan çawaniya dirustbûna wêneya zihnîli ba helbestvan.

7. Di şêwaza hestgorînê de, şiyaneke helbestvan a berfireh heye di aliyê avakirina wêneyê de li gor vê şêwazê. Di pêkhatina wêneya tek de şêwazên (hestgorîn, pevguhertin û berhişkirin, bergewdekirin û bi ten kirin û bi kes kirin) bi roleke radibin di dirustkirina wêneyên hunerî de.

8. Di pêkanîna wêneyên hunerî yên Hêmin de, çend cure û şêwazên cuda hatine bikaranîn di aliyê teşeyê de bêhtir wêneyên (efsaneyî, derûnî û sembolîk) hatine bikaranîn. Di aliyê rewanbêjiyê de jî, bi pileya yekem şibandin û dûre wêneyên xwastin (mecaz) û wêneyên dirkeyî (metafor) hatine bikaranîn.

## 5. JÊDER

### KURDÎ

### PERTÛK


ARÎF, Hisên, *Koktêl*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2005.

AŞNA, Umêd, Teşe û naverok çend lêkolîn li ser edebiyata kurdî, 2007, r. 61.

AWARE, Muhsin, *Rengdana wêne di helbesta nû ya kurdî de*, Kovara Roşinbîrê Nû, hejmar 75, 1979.

BÊKES, Şêrko, *Derbendî Pepûle*, Swêd (Stockholm), 1991.

BELEKÎ,Yadgar Resûl, *Sîmayên nûjenkirina helbesta kurdî (1893-1932)*, Çapxaneya Wezareta Perwerde, Hewlêr, 2005.

BESÎR, Kamîl Hesen *Rexnesaziya pêrewkirina dîrokê,* Çapxaneya Korra Zanyarî ya Iraqê, Bexda, 1983.

DEŞTÎ, Osman, *Hêminname*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2009, r. 161.

*Dîwana Ehmed Muxtar Caf*

*Dîwana Goran*

*Dîwana Hacî Qadirê Koyî*

*Dîwana Hêmin Mukiryanî*, çapa 1, Weşanxaneya Çarçira, Silêmanî, 2009, r. 299.

*Dîwana Mehwî*

*Dîwana Melayê Cizîrî*

*Dîwana Mewlewî*

*Dîwana Safî Hîranî*

EBDILWAHID, Azad *Sosyolojiya helbesta kurdî di aliyê pîvan û kirîterên wê di nîvê yekem ê sedesala bîstan de*, Çapa 1, Çapxaneya Arabxa, Kerkûk, 2005.

EBDULLA, Rojan Nûrî, *Ferhenga ziman û têgehsaziya kurdî*, çapa 1, Hewlêr, 2007.

EEBDILKERÎM, Mihemed Mela *Dîwana Goran*, cildê 1, Çapxaneya Komeleya Zanistî ya Iraqê, Bexda, 1980.

EHMED, Safiye Mihemed, *Şêwaza helbestên kurdî yên Pîrbal Mehmûd*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2014.

EHMED, Xorşîd Reşîd, *Rêbaza romantîkî di edebiyata kurdî de*, r. 40.

ELÎ, Umer Şêxallah, *Pendên Kurdî*, Weşanxaneya el Huriye, Bexda, 1980.

ERÎSTOTALIS, *Hunera Şiîrê (Şiîrnasî),* w: GERDÎ, Ezîz, Çap û Weşanên Rênima, Silêmanî, 2004.

ESKER, Dana, *Wate û hêmayên veşartî yên tekstê*, çapa 1, Hewlêr, 2009.

ESWED, Newzad Ehmed, *Ezmûna xwendina çend rûpelên rexneyî*, Silêmanî, 2006.

EZÎZ, Hisên Mihemed, *Yaqût û zamrûdên kurdî*, ol û felsefe, cildê 2, Çapxaneya Şivan, 2004.

FETAH,Rizgar Umer, *Romansîzm di helbestên Hêmin û Mihemed Nûrî de*, Çapxaneya Mukiryanî, Hewlêr, 2013.

GELALÎ, Husê Xazî Kake Emîn, *Rêbaza nûjenkirina helbesta kurdî li Başûrê Kurdistanê di navbera salên 1980-1991 de*, Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr, 2010.

GERDÎ, Ezîz *Rewanbêjî di edebiyata kurdî de*, ç 1, Çapxaneya (Dar el Cahiz), Bexda, 1972.

GERDÎ, Serdar Ehmed Hesen, *Binyata wêneya hunerî di helbesta kurdî de (1970-1991)*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî 2004.

HEBÎBELAH, Cemal, *Derwazeya şiîrnasînê*, Hewlêr, 2012.

HEFÎDZADE, Farûq, *Helbest û strana folklorî ya kurdî*, Çapxaneya Newres, Silêmanî, 1982.

HÊMIN, Dîwana, *Tarî û Rohn*, ç 1, Çap û Belavkirina Çarçira, Silêmanî, 2009.

HESEN, Mewlûd Îbrahîm, *Pêkhateya efsaneya kurdî*, çapa 1, Çapxaneya Renc, Silêmanî, 2007.

HEWÊZÎ, Derya Cemal, *Wêneya rûnbêjî di dîwana (Şehîd bi tenya piyase dekat)ya Qubadî Celîzade*, Çapxaneya Belavokên Silêmaniyê, 2009.

HISÊN, Cebar Ehmed, *Estetîka metina helbesta kurdî ya Kurdistana Iraqê 1950-1970*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2008.

HORAS, *Hunera şiîrê*, w: EZÎZ, Hemîd, Çapxaneya Zeman, Bexda, 1979.

ÎBRAHÎM, Nebîle, *Efsane*, w: Mihemed Bedrî, Çapxaneya Alla, Bexda, 1986.

ÎSA, Hawjîn Silêwe, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Şêrko Bêkes de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2009.

ÎSMAÎL,Nesredîn Reûf, *Erkê helbestê di edebiyata kurdî de 1920-1958*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2010.

KERÎM, Azad Ebdilwahid, *Sosyolojiya helbesta kurdî*, 2005, çapa 1.

Kerîm, Ferhad Qadir, *Binyata wêne di helbestên Hemdî de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2012.

KERÎM, Mihemedê Mela, *Lêvegerek li gotara Riwange yan edebiyata realîzma sosyalîst*, li gor yar û neyarên wê, amadekirina: Hisên Arif, Çapxaneya Serdem, Silêmanî, 2005.

*KURDÎ, Dîwana*, 2010.

KURDO,Mihemed, *Lêgerîna li helbest û cudahiyê*.

MARÛF, Kemal , *Rexneya nû ya kurdî*, Silêmanî, 2007.

MEHMÛD, Fazîl Mecîd, *Siruşt di helbesta Goran de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2007.

MEHMÛD,Şino Mihemed, *Rola Siwareyê Îlxanîzade di nûgeriya helbesta kurdî de*, Çapxaneya Çarçira, Silêmanî, 2007.

MEWLÛD, Rêzan Salih, Hizrîna şiîrî di navbera rêbaza klasîk û rêbaza romantîk ya kurdî de di Kurmanciya Jêrîn de, Çapxaneya Şehab, Hewlêr, 2009.

MIHEMED EMÎN, Ebdilqadir, *Wêneya şiîrî di rêbaza romantîk ya kurdî de*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2002.

MIHEMED, Dilşad Elî, *Binyata helbestê di helbesta kurdî de*, Çapxaneya Renc, Silêmanî, 1998.

MIHEMED, Dilşad Elî, *Dilan û ezmûnkirina şiîrî*, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2007.

MIHEMED, Mesûd, *Çepkêk li gulzara Nalî*, Weşanên Aras, Hewlêr, çapa 2, 2007.

MISTEFA, Sabir Bekir, *Tîrajek ji psîkolojiya rengan*, Kovara Raman, hejmara 33, 1999.

MÎRAWDELÎ, Kemal Memend, *Felsefeya bedewiya hunerê (estatîka)*, Çapxaneya Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 1979.

MUKRÎ, Kameran, *Edebiyata folklorî ya kurdî*, beşê yekem, Çapxaneya Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 1984.

*NALÎ, Dîwana*, çapa 6, Çap û Weşanên Kurdistan, Sine, 2006, r. 100.

OSKARMAN, *Tuhfeya Muzeferî*, Pêşgotin û saxkirin û anîna ser rênivîsa kurdî MUKRYANÎ, Hêmin beşê yekem, Çapxaneya Korrî Zanyarî Kurd, Bexda, 1975.

PERRINE, Laurence ,*Helbest çi ye*, w: XOŞNAW, Ebûbekir, Çapxaneya Pîremêrd, Silêmanî, 2008.

PÎRBAL, Ferhad , *Dîroka hunera şêwekarî li Kurdistanê*, (ji kevin de heta salên 1950), 2006.

QEBANÎ, Nizar Çend gotar, w: BABAN, Teha, Weşanên Navenda Edebî û Ronakbîrî ya Gelawêj, Silêmanî, 2004.

QEREDAXÎî, Fûad, *Riwangeh û şîroveyên kor, riwangeh yar û nayarên wê*, amadekirina Hisên Arif, Dezgeha Çap û Weşanê ya Serdem, Silêmanî, 2005.

RESÛL, Îzedîn Mistefa, *Lêkolîna edebiyata folklorî ya kurdî*, beşê yekem.

RESÛL, Şukrye, *Werz û salnameya mîllî di pend û helbestên kurdî de*, çapa 1, Çapxaneya Wezareta Rewşenbîrî, Hewlêr, 2005.

RESÛLl, Şukriye, *Edebiyata kurdî û hunerên edebiyatê*, Çapxaneya xwendina bilind, Hewlêr, 1989.

ROMÎ, Mewlana Celaledîn, Deftera *yekem a Mesnewî Manewî*, w: MUTABÇÎ, Emîn, Çapxaneya Rewşenbîrî, Hewlêr, 2013.

SABÎR, Perêz *Rexne û meseleyên nûkirina helbestê*, Dezgeha Çap û Weşanên Aras, Hewlêr, 2008.

SADÛN, Saman Îzedîn, *Binyata hunerî di helbestên Letîf Helmet de*, Çapxaneya Kemal, Silêmanî 2010.

*SAFÎ HÎRANÎ, Dîwana*, Çapxaneya Wezareta Perwerde, Hewlêr, 2004.

SECADÎ, Aladîn, *Edebiyata kurdî, lêkolîn li ser edebiyata kurdî*.

ŞAREZA, Kerîm, *Wêneya şiîrî di helbesta kurdî de çawa dirust dibe û bi çi mebestekê tê wergirtin*.

ŞÊX BIZÊNÎ, Seid Farûq Yûsif, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Ehmed Muxtar Caf*, Çapxaneya Rewşenbîrî ya Hewlêrê, Hewlêr, 2011.

ŞIWANÎ, Refîq, *Edebiyat û civak, gotareke edebî*, Çapxaneya Wezareta Rewşenbîrî, Hewlêr, 2008.

XEZNEDAR, Marif, *Dîroka Edebiyata Kurdî*, Cildê 7, Çapa 1, Çapxaneya Aras, Hewlêr, 2006, r. 423.

**KOVAR Û ROJNAME**

EBDILWAHÎD, Azad, *Semaya berfa êvaran*, Kovara Rojî Kurdistan, hejmara 58, 1980.

FELLAH, Kakey, *Wêneya şiîrî çi ye*, Kovara Karwan, hejmara 49, 1986.

ELWENÎ, Necm, *Nîşandana wêne di dîwana Pirrim le Eşqî Toda*, Rojnameya Kurdistanî Niwê, hejmara 531, 2007, Silêmanî.

KAKEMÎN, Husên Xazî –QEYTERAN, Karwan Selîm, *Wêneya hunerî di helbesta Êwarey Payîz a Hêmin de*, Kovara Zanîngeha Rraperîn, j 2, Silêmanî, 2014.

KERÎM, Zahir Letîf, *Nirxandina teorî li dînamîkiya helbestvanên durû*, Kovara Ayînde, hejmar 76, 2005.

QADIR, Rêbîn Xelîl, *Hêmaya efsaneyî di helbestên Hêmin de*, Kovara Raman, hejmara 159, 2010.

ROJBEYANÎ, Îsmaîl, *Çend têbîniyek derbarê helbesta me ya îro*, Kovara Beyan, hejmara 64, Tîrmeha 1980.

SALIH, Tariq, *Wêneya hunerî di hinek helbestên Goran de*, Kovara Raman, hejmar: 199, 2013.

SEÎD, Newzad Weqas, *Wêneya şiîrî di helbestên Racî de*, Kovara Akademya Kurdî, Çapxaneya Hacî Haşim, hejmar 22, Hewlêr, 2012.

TENYA, Îsmaîl, *Wêneya Şiîrî*, Kovara Karwan, hejmara 11, 1994, Xula Raperîn.

**TEZÊN EKADÎMÎ**

EBDULREHMAN, Ebdulselam Salar, *Wêneya hunerî di helbestên Şêx Nûrî Şêx Slaih de*, nameya doktora, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, Silêmanî, 2006.

EHMED, Kejal Heme Emîn, *Binyata wêneya hunerî di helbestên Ferîdûn Ebdul Berzencî de*, nameya master, koleja ziman, Zanîngeha Silêmaniyê, 2010.

EZÎZ,Qumrî Seîd, *Helwest di helbesta kurdî de*, nameya doktora.

GERMÎYANÎ, Adil Mecîd, *Wêneya babetî di helbestên Goran û Seyab de*, nameya doktora, koleja perwerdê ya Îbn Ruşd, Bexda, 2000.

HEME, Hitler Ehmed, *Wêneya şiîrî li be Nalî*, nameya master, koleja ziman, Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2001.

MISTEFA, Aso Umer, *Bihayên estetîkî yên şiîrî li ba Pîremêrd û Şêx Nûrî Şêx Salih û Goran*, nameya masterê, koleja perwerde, zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2007.

XEFÛR, Rêzan Mihemed, *Rêbaza romansîzmê di şiîra kurdî de 1918-1945*, nameya master, Koleja Perwerde, Zanîngeha Selahedîn, Hewlêr, 2005, r. 112.

**SAYTÊN ELÎKTRONÎ**

www.hemenmwkryani.net 20-1-2016 .

WWW. Radionawxo.org>haji qadir. 28-12-2015.

www.sharazurpost.com>laila qasim 25-12-2015.

**EREBÎ**

**PERTÛK**

EBÛ HEMADE, Atif Wêneya hunerî di helbestên Mehmûd Derwêş de, Çapxaneya Yekîtiya Giştî ya Navendên Çandî, Xeza, 1998.

EBÛL SUBH, Salih, *Bizava şiîrî li Filistîna dagîrkirî*, Dezgeha Erebî ya Lêkolîn û Belavkirinê, Beyrût, 1979.

ESAF, Ebdullah *Wêneya hunerî di helbesta pêşbînîker de*, cildê 1, Çapxaneya Dîcle, Sûriyê, 1996.

HÎLAL, Mihemed Xenîmî, *Lêkolîn derbarê ekolên helbestê û rexneya wê*, Çapxaneya el Nehze, Qahîre.

HÎLAL, Mihemed Xenîmî, *Rexneya edebî ya nûjen*.

ISFÛR, Cabir Ehmed, *Îmaja Hunerî di Kelepora Rexneya Rewanbêjî de*, Dar el Seqafe Welneşr, Qahîre, 1974.

ÎSMAÎL, Îzedîn *El Edeb We fnun,* Cildî.6, Dar al Fikrî El Erebî, 1976 .

ÎSMAÎL, Îzedîn Şîrovekariya tekstê di edebiyatê de, Çapxaneya Ewde û Seqafe, Beyrût, 1980.

NAFÎ, Ebdilfetah Salih, *Wêne di helbestên Beşar Bin Berd de*, Çapxaneya Fikir, Oman, 1983.

QUTB, Seyd *Wênekirina hunerî di Quranê de*, çapa 11, Weşanxaneya el Şirûq, Qahîre, 1989.

SALIH, Buşra Mûsa *Wêneya hunerî di rexneya helbesta erebî ya nûjen de*.

SÎ DÎ LWÎS, *Wêneya şiîrî,* w: Ehmed Nesîf el Cenabî, çapa 1, Bexda, 1982.

SPENDER, Steven, *Jiyan û Helbestvan,* w: EL BEDEWÎ, Mistefa Pirtûkxaneya Anglo-misrî, Qahîre.

WAREEN, Austen û WELK, Rene *Teoriya edebiyatê,* w: SUBHÎ, Mihêdîn Çapxaneya el Terabîşî, 1972.

ZAYAD, Elî Eşrî *Banga karakterên kelepûrî di helbesta erebî ya hemdem de*, çapa 1, Dar el Fikir el Erebî, Qahîre, 1997.

**XWE JÎNENÎGARÎ**

Sala 1985 an li bajêrê silêmanî hatîm dinyayê, lise û zanînga her li wê derê qedadndî ye, zewcyam û dû zarokê mn jî hene, Niha jî xebat dikim ku lîsansa bilinda xwe li zanîngehe yuzuncu yîlê biqedînim.